



K.T.

Zanîngeha Mardîn Artukluyê

Enstîtûya Zimanên Zindî yên li Tirkîyeyê

Şaxa Makezanîsta Ziman û Çanda Kurdî

Teza Lîsansa Bilind

**DU XEBATÊN DESTPÊKÎ YÊN BI ÎNGİLÎZÎ YÊN  
RÊZIMANA KURMANCÎ: ANALÎZEKE  
ZIMANZANÎ Û RÊZIMANÎ**

Sami TAN

14711024

Şewirmend

End. Hdk. Dr. Mustafa ASLAN

Mêrdîn 2018

K.T.

Zanîngeha Mardîn Artukluyê  
Enstîtûya Zimanên Zindî yên li Tirkîyeyê  
Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

Teza Lîsansa Bilind

**DU XEBATÊN DESTPÊKÎ YÊN BI ÎNGILÎZÎ  
YÊN RÊZIMANA KURMANCÎ: ANALÎZEKE  
ZIMANZANÎ Û RÊZIMANÎ**

Sami TAN  
14711024

Şewirmend  
End. Hdk. Dr. Mustafa ASLAN

Mêrdîn 2018

# TAAHHÜTNAME

TÜRKİYE’DE YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Mardin Artuklu Üniversitesi Lisansüstü Eğitim-Öğretim ve Sınav Yönetmeliğine göre hazırlamış olduğum “**Du Xebatên Destpêkî yên Bi Îngilîzî yên Rêzimana Kurmancî: Analîzeke Zimanzanî û Rêzimanî**” adlı tezin tamamen kendi çalışmam olduğunu ve her alıntıya kaynak gösterdiğimi ve tez yazım kılavuzuna uygun olarak hazırladığımı taahhüt eder, tezimin kağıt ve elektronik kopyalarının Mardin Artuklu Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü arşivlerinde aşağıda belirttiğim koşullarda saklanmasına izin verdiğimi onaylarım. Lisansüstü Eğitim-Öğretim yönetmeliğinin ilgili maddeleri uyarınca gereğinin yapılmasını arz ederim.

Tezimin/Projemin 1 yıl süreyle erişime açılmasını istemiyorum. Bu sürenin sonunda uzatma için başvuruda bulunmadığım takdirde, tezimin/projemin tamamı her yerden erişime açılabilir.

05/03/2018

Sami TAN

## KABUL VE ONAY

Sami Tan tarafından hazırlanan “Du Xebatên Destpêkî yên Bi Îngilîzî yên Rêzimana Kurmancî: Analîzeke Zimanzanî û Rêzimanî” adındaki çalışma, 05.03.2018 tarihinde yapılan savunma sınavı sonucunda jürimiz tarafından Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı, **YÜKSEK LİSANS TEZİ** olarak oybirliği ile kabul edilmiştir.

[İmza]

[Unvanı, Adı ve Soyadı Başında]

Doç. Dr. Abdurrahman Adak

Dr. Öğrt. Üy. Osman ASLANOĞLU

Dr. Öğr. Üyesi Mustafa ASLAN

## PÊŞGOTIN

Zimanê kurdî li Rojhilata Navîn piştî erebî, tirkî, farisî zimanê çaremîn e. Li Tirkîye, Îran, Iraq, Sûrîyeyê bi milyonan kes bi vî zimanî dipeyivin. Her wekî Leezenberg (2014) daye xuya kirin, zimanê kurdî pêşî li medreseyên kurdan di sedsala 17'an de bi *Serfa Kurmancî* ya Elîyê Teremaxî bûye zimanê perwerdeyê. Di sedsala 18an jî bala geştyar û mîsyoneran kişandiye. Li Ewropayê yekemîn berhema der barê zimanê kurdî de di sala 1787an de li Îtalyayê ji hêla Garzonî ve hatiye nivîsandin. Piştî Garzoni li rojhilat û rojava gelek mîsyoner, geştîyar û peywirdarên welatên cur bi cur bi armancên têvel der barê zimanê kurdî berhem nivîsandine. Her wiha di sedsala 19 û 20an de ji kurdan jî gelek zanyar û zimanzanan der barê ziman û rêzimana kurdî de berhem dane.

Me di vê teza xwe de du heb ji wan berheman kirin warê lêkolînê. Yek ji wan, di sala 1869an de ji hêla mîsyonerê amerîkî Samuel A. Rhea ve hatiye nivîsandin, ya duyemîn jî di sala 1922yan de bi destê serpelê îngilîz R. F. Jardine ve hatiye nivîsandin. Berhema pêşîn der barê kurmançîya Hekarîyê de ye û ewa duyemîn jî der barê Kurmançîya Behdînan de ye.

Her du jî li qadê hatine amadekirin, armanca wan fêrkirina zimanê kurdî û pê re jî hêskirina kar û barên kesên ku dê nû werin herêmê ye. Me ew her du berhem ji ber girîngîya wan a dîrokî û ji ber ku li qadê hatine amadekirin, zimanê devokî tê de bingeh hatiye girtin, wekî warê lêkolînê neqandin. Di vê tezê de, di ser wan re hewl hatiye dayîn ku bi kurdîya kurmançî ji bo ziman, zimanzanî û rêzimana kurmançî hîmek were danîn da ku xebatên rêzimana kurmançî ji çarçoveya rêzimana klasîk derkevin û zêdetir li gorî pîvanên zimanzanîyê werin amadekirin.

Ev tez ji sê beşan pêk tê. Di beşa yekem de bi awayekî giştî ji alîyê binyad û formê ve ziman û rêzimana kurdî hatiye nasandin. Di vê beşê de zimanê kurdî li gorî lêkolînên zimanzanên navneteweyî û xwecihî, li pey çavkanîyên zimanzanîyê hatiye

nasandin. Di vê beşê de cihê zimanê kurdî di nav zimanên cîhanê de, têkilîya zimanê kurdî bi zimanên din ên îranî re, nemaze jî bi zimanê farisî re hatiye gotûbêjkirin, qala zaravayên zimanê kurdî hatiye kirin û deqeke biçûk bi pênc zaravayên kurdî hatiye pêşkêşkirin. Di dawîya vê beşê de rêzimana kurmancîyê bi nêrîneke zimanzanî hatiye pêşkêşkirin, pê re jî fonetîka kurmancîyê (dengsazî û dengzanî), morfolojî; sentaks û watenasî hatine ravekirin. Bi vê yekê, hatiye xwestin ku pîvanên nirxandina her du berhemên mijara lêkolînê bîn diyarkirin.

Di beşa duyem de raborîya xebatên der barê kurdî de hatiye vegotin. Pêşî qala xebatên li medreseyan kurdan hatiye kirin. Piştî wê, xebatên li Rojhilat û hin xebatên ku di sedesala 20an de ji hêla kurdan hatine kirin bûne mijara lêkolînê û herî dawî jî xebatên li Ewropayê hatine kirine di vê beşê de cih girtine.

Di beşa sêyem de her du xebat li gorî pîvanên zimanzanî û rêzimanî bi rêbazeke berawirdî hatine pêşkêşkirin û analîzkirin. Di dawîya her berhemê de jî nirxandineke giştî li ser berhemê hatiye kirin, piştî her du xebat hatine berawirdkirin û hewl hatiye dayîn ku çarçoveyeke nû ji bo rêzimana nûjen a kurmancî were destnîşankirin.

Di amadekirina vê berhemê de piştgirî û alîkarîya gelek kesan çêbû. Serê pêşîn ez spasîya şêwirmendê xwe Alk. Doç. Dr. Mustafa Aslan û Doç. Dr. Abdurrahman Adak dikim. Her wiha hevala min a hêja Ronayî Onen bi pêşniyarên xwe gelekî alîkariya min kir, ez spasîyên xwe jê re dikim. Her wiha hevalê min ê ezîz Zana Farqînî di pêvajoya amadekirina tezê de bi dîtî û pêşniyarên xwe gelekî ji min re bû alîkar, ez ji wî re jî spasîyên xwe pêşkêş dikim.

Spasîyeke taybet ji bo mamê me yê manewî H. Memî, heke piştevanîya wî nebûya dê barê me girantir û karê me diwartir bûya. Spasîyeke taybet jî pêşkêşî heval û hogirên me yê ezîz Hamdullah û Sevda Orak Reşîdoglu dikim. Ked û piştgirîya wan di domana xwendin û amadekirina tezê de hêz û şiyana da me.

Ez hêvî dikim ku ev lêkolîn di warê zimanzanî û rêzimana nûjen a kurdî de rêya kesên ku dixwazin di qadê de xebatê bikin, hinekî be jî ronî bike.

Sami TAN  
Mêrdîn 2018

## KURTE

Yekemîn pirtûka rêzimanê ji hêla Panînî ve li Hindistanê hatiye nivîsandin û li Ewropayê jî yekemîn pirtûka rêzimanê ji hêla *Dionysius Thrax* (B.Z 170-90) ve hatiye nivîsandin. Yekemîn berhema rêzimanê ya bi zimanê kurdî bi navê *Serfa Kurmancî* di sedsala 17an de ji hêla Elîyê Teremaxî ve hatiye nivîsandin. Di vê berhemê de Elîyê Teremaxî rêzimana erebî bi kurmancî rave dike. Yekemîn berhema ku ji hêla ewropîyan ve hatiye nivîsandin *Grammatica e Vocabulario Della Lingua Kurda* (Rêziman û Ferhengoka Zimanê Kurdî) ye ku di sala 1787an de ji hêla Garzoni ve bi îtalî hatiye nivîsandin. Piştî berhema Garzoni, xebata Rhea ya ku tevî xebata Jardine bûne mijara teza me tên.

Her wekî me li jor jî da zanîn, mijara vê tezê rêzimana kurmancî ye. Di vê tezê du xebatên destpêkî yê rêzimana kurmancî ku bi zimanê îngilîzî hatine nivîsandin; bi nêrîneke zimanzanîya giştî hatine analîzkirin. Navê xebata yekemîn a ku bûye mijarê tezê, *The Brief Grammar and Vocabulary of The Kurdish Language of The Hakari District* (Kurteyek ji Rêziman û Ferhengoka Zimanê Kurdî ya Herêma Hekarî) ye ji hêla Samuel A. Rhea hatiye nivîsandin û ku di sala 1869an de di kovara *Journal of the American Oriental Society* de wekî gotar hatiye weşandin.

Her çî xebata duyemîn e, ji peywirdarê rêveberîya mandatîya îngilîz ê li Iraqê serpelê îngilîz R. F. Jardine ve hatiye nivîsandin. Ew xebata bi navê *Bahdînan Kurmanjî a Grammar of The Kurmanjî of The Kurds of Mosul Division and Surrounding Districts of Kurdistan* (Rêzimana Kurmancîya Kurdên Parêzgeha Musil û Herêmên li Derdora Wê yê Kurdistanê) di sala 1922yan li Bexdayê hatiye çapkirin.

Ev her du xebat jî ber girîngîya xwe ya dîrokî û ji ber ku xebatên qadê ne, bûne mijara teza me. Li ser bîngeha analîza rêzimanî û zimanzanî ya van her du

berheman di vê tezê de hewl hatiye dayîn ku bi zimanê kurdî (zaravayê kurmançî) çarçoveyeke nû ji bo rêzimana nûjen a kurdîya kurmançî were danîn.

**Peyvên Sereke:** Ziman, zimanzanî, rêziman, kurdî, rêzimana kurdî, kurmançî, rêzimana kurmançîyê





## ÖZET

Tarihte ilk dilbilgisi kitabı Hindistan’da Panini tarafından kaleme alınmıştır. Avrupa’da ise ilk dilbilgisi çalışması *Dionysius* (170-90 M.Ö) tarafından kaleme alınmıştır. Kürtçe kaleme alınan ilk Kürtçe gramer çalışması di sedsala 17an de Elîyê Teremaxî tarafından *Serfa Kurmancî* adıyla yapıldığı bilinmektedir. Bu çalışmada Arapça grameri Kürtçe anlatılmaktadır. Avrupa’da ise ilk Kürtçe dilbilgisi çalışması *Garzoni*’nin 1787 yılında İtalyanca basılan *Grammatica e Vocabulario Della Lingua Kurda* adlı çalışmasıdır. Bu çalışmadan sonra ise tezimizin konusu olan *Samuel A. Rhea*’nin 1869 yılında basılmış olan Hakkari bölge ağzının incelendiği kısa çalışması gelmektedir.

Yukarıda da belirttiğimiz gibi, tezin konusu Kürtçe’nin Kurmancca lehçesinin grameridir. 19. ve 20. yy. başlarında İngilizce olarak yazılmış iki Kurmancca gramer çalışmasıdır. Bu çalışmalardan Amerikalı misyoner Samuel A. Rhea ’nin *The Brief Grammar and Vocabulary of The Kurdish Language of The Hakari District* (Hakkari Bölgesi Kürtçesinin Gramer ve Lugaçhasından Bir Özet ) adlı çalışması 1869 yılında *Journal of the American Oriental Society* adlı dergide makale olarak yayınlanmıştır.

Tezin konusu olan diğer çalışması ise, Irak’ın İngiliz manda yönetiminde görevli olan Yüzbaşı R. F. Jardine tarafından 1922 yılında yayınlanan *Bahdinan Kurmanji a Grammar of The Kurmanji of The Kurds of Mosul Division and Surrounding Districts of Kurdistan* (Bahdinan Kürtçesi; Kürdistan’ın Musul Bölgesi ve Çevresinde Konuşulan Kürtçe’nin Grameri) adlı çalışmasıdır. İnceleme konumuz olan her iki çalışma da belli bir alan çalışmasına dayanan betimsel dilbilgisi çalışmalarıdır.

Bu eserler İngilizce kaleme alınmış ilk kurmancca dilbilgisi eserleri olmaları ve alanda yapılmış betimsel çalışmalar olmaları nedeniyle tercih edilmişlerdir. Her

iki eser dilbilimsel bir bakış açısıyla analiz edilerek, modern Kurmanca grameri için yeni bir çerçeve oluşturulmaya çalışılmıştır.

**Anahtar Sözcükler:** Dil, dilbilim, gramer, Kürtçe, Kürtçe Dilbilgisi, Kurmanca, Kurmanca Dilbilgisi



## ABSTRACT

In history, the first grammar book was written by *Panini* in India, while in Europe, the first study on grammar was carried out by *Dionysius* (170-90 BC). The first study on grammar work in Kurdish is considered to be *Serfa Kurmancî* (Kurmanji Grammar) that was written by Ali Taramakhi in 17<sup>th</sup> Century. In this work Taramakhi introduces the Arabic grammar in Kurdish. The first European work on Kurdish grammar was *Garzoni's Grammatica e Vocabulario Della Lingua Kurda*, which was published in Italian in 1787. Following this publication came the first of the works examined within this thesis, a short study of the dialect of the Hakkari region written by *Samuel A. Rhea* in 1869.

As we mentioned above, the subject of this thesis is the grammar of the Kurmanji dialect of Kurdish, and the research topic of the thesis is two Kurmanji grammars written in English in the 19th and early 20th centuries. These two works; *The Brief Grammar and Vocabulary of The Kurdish Language of The Hakari District* which was written by Samuel A. Rhea, and was published in *Journal of the American Oriental Society* in 1869 and the *Bahdinan Kurmanji a Grammar of The Kurmanji of The Kurds of Mosul Division and Surrounding Districts of Kurdistan* which was written by Captain R. F. Jardine and published in 1922 in Baghdad were examined from a general linguistic perspective

Both works (of Rhea and Jardine) are descriptive grammatical studies based on a specific field study. These works were selected as the subjects of this thesis because of their historical importance and because they are the descriptive field works. Both works are analyzed according to the general linguistic criterias, and in the conclusion, a proposition is made for the establishment of a new framework for modern Kurmanji grammar.

**Key Words:** Language, linguistics, grammar, Kurdish, Kurdish Grammar, Kurmanji, Grammar of Kurmanj

## NAVEROK

PÊŞGOTIN .....	I
KURTE .....	III
ÖZET.....	V
ABSTRACT.....	VII
NAVEROK .....	VIII
DESTPÊK.....	1

## BEŞA YEKEM

NÊRÎNEKE GIŞTÎ LI ZIMANÊ KURDÎ .....	7
1.1. WATE Û PEYWIRA ZIMÊN.....	7
1.2. DÎROKA XEBATÊN LI SER ZIMAN Û ZIMANZANÎYÊ .....	9
1.2.1. Serdema Kevneşopîya Rêzimanan.....	10
1.2.2. Pêla Rêzimana Gerdûnî .....	11
1.2.3. Serdema Rêbaza Berawirdî.....	12
1.2.4. Zimanzanîya Binyadger .....	12
1.2.4.1. Derdora Zimanzanîyê ya Pragê.....	13
1.2.4.2. Binyadgerîya Îngilîz.....	13
1.2.4.3. Binyadgerîya Danîmarkî .....	14
1.2.4.4. Binyadgerîya Amerîkî.....	14
1.2.5. Zimanzanîya Nû.....	15
1.2.6. Zimanzanîya Erkî.....	16
1.3. CIHÊ KURDÎ DI NAV ZIMANÊN CÎHANÊ DE.....	16
1.3.1. Zimânên Îranî û Kurdî .....	17
1.3.2. Têkilîya Kurdî û Farisî.....	20
1.3.3. Zaravayên Kurdî .....	24

1.3.3.1. Rêzîleya Guherîna Dengan di nav Zaravayên Kurdî de.....	25
1.3.3.2. Deçek ji bo Hevrûkirina Zaravayên Kurdî .....	26
1.4. RÊZIMANA KURMANCÎ.....	27
1.4.1. Fonetîka Kurmancîyê.....	29
1.4.2. Morfolojîya Kurmancîyê .....	33
1.4.2.1. Qertafên Kêşanê yên Kurmancîyê .....	34
1.4.2.1.1. Qertafên Kêşanê yên Têkildarî Navdêr, Cînavk û Rengdêran ....	34
1.4.2.1.2. Qertafên Kêşanê yên Kurmancîyê yên Têkildarî Lêkerê .....	34
1.4.2.2. Qertafên Bêjesaz .....	36
1.4.2.2.1. Pêşgirên Kurmancîyê .....	36
1.4.2.2.2. Paşgirên Kurmancîyê .....	37
1.4.2.3. Ji Rehên Lêkeran Qertafên Bêjesaz .....	42
1.4.2.4. Navbergir (navbend) .....	42
1.4.2.5. Navgir.....	43
1.4.2.6. Kategorîyên Rêzimanî.....	43
1.4.2.6.1. Beşên Axaftinê di Kurmancîyê de.....	44
1.4.2.6.1.1. Navdêr.....	45
1.4.2.6.1.2. Cînavk.....	47
1.4.2.6.1.3. Rengdêr.....	48
1.4.2.6.1.4. Hoker .....	50
1.4.2.6.1.5. Daçek .....	51
1.4.2.6.1.6. Gihanek.....	52
1.4.2.6.1.7. Baneşan.....	52
1.4.2.6.1.8. Lêker .....	53
1.4.2.6.2. Kategorîyên Têkildarî Navdêrê .....	54
1.4.2.6.2.1. Zayenda Rêzimanî .....	55
1.4.2.6.2.2. Mêjer.....	57
1.4.2.6.2.3. Binavkarî û Nebinavkirî.....	58
1.4.2.6.2.4. Rewşên Navdêrê .....	59
1.4.2.6.2.4.1. Rewşa Xwerû .....	59
1.4.2.6.2.4.2. Rewşa Tewandî .....	60
1.4.2.6.2.4.3. Rewşa Bangnîşanî .....	61

1.4.2.6.2.4.4. Rewşên Navdêran ên din.....	62
1.4.2.6.3. Kategorîyên Têkildarî Lêkeran.....	64
1.4.2.6.3.1. Kes û Kesandin .....	65
1.4.2.6.3.2. Ergatîfî .....	66
1.3.2.6.3.3. Xuyang.....	68
1.4.2.6.3.4. Dem û Rawe.....	68
1.4.2.6.3.4.1. Raweyên Pêşkerî .....	69
1.4.2.6.3.4.1.1. Dema Niha.....	69
1.4.2.6.3.4.1.2. Dema Bê .....	71
1.4.2.6.3.4.1.3. Dema Borîya Têdeyî (Sade) .....	72
1.4.2.6.3.4.1.4. Dema Borîya Dûdar.....	72
1.4.2.6.3.4.1.5. Dema Borîya Berdest .....	73
1.4.2.6.3.4.1.6. Çîrokîya Dema Borîya Têdeyî .....	74
1.4.2.6.3.4.2. Raweyên Xwestekî.....	74
1.4.2.6.3.4.2.1. Raweya Fermanî.....	75
1.4.2.6.3.4.2.2. Dema Niha ya Xwestekî.....	76
1.4.2.6.3.4.2.3. Dema Borî ya Xwestekî .....	78
1.4.2.6.3.4.2.4. Xwestekîya Pêknehatî .....	79
1.4.2.6.3.5. Avani.....	81
1.4.2.6.3.5.1. Avaniya Lebatî .....	81
1.4.2.6.3.5.2. Avaniya Tebatî.....	82
1.4.2.6.3.5.3. Avaniya Hokerî .....	83
1.4.3. Sentaksa Kurmancîyê .....	83
1.4.3.1. Analîzkirina Hevokên Kurmancîyê.....	84
1.4.3.2. Di Kurmancîyê de Rêzbûna Peyvan .....	87
1.4.4. Watenasî.....	87
1.4.4.1. Peyv û Wate .....	88
1.4.4.2. Hevok û Wate.....	89
1.4.4.3. Peywira Wateyî .....	90
1.4.4.4. Wate li gorî Peywendîya Peyvan .....	90
1.4.4.4.1. Peyvên Sîwaneyî û Binsîwaneyî .....	91
1.4.4.4.2. Peyvên Sernimûne.....	91

1.4.4.4.3. Peyvên Hemwate .....	92
1.4.4.4.4. Peyvên Dijwate.....	92
1.4.4.4.5. Peyvên Hemdeng.....	93
1.4.4.4.6. Peyvên Hemreng .....	93
1.4.4.4.7. Peyvên Pirwate .....	93

## **BEŞA DUYEM**

### **RABORÎYA XEBATÊN LI SER ZIMANÊ KURDÎ..... 94**

2.1. LI ROJHILAT XEBATÊN LI SER KURDÎ.....	94
2.1.1. Li Medreseyan Xebatên li ser Kurdî.....	94
2.1.2. Hin Xebatên li ser Kurdî di Dewra Osmaniyan de .....	96
2.1.3. Di Sedsala 20an de Hin Xebatên Kurdan ên li ser Kurdî .....	98
2.2. LI EWROPAYÊ HIN XEBATÊN LI SER KURDÎ.....	101
2.2.1. Li Ewropayê Yekemîn Xebata Kurdî .....	102
2.2.2. Xebatên Kurdî li Rûsyayê.....	102
2.2.3. Xebatên li ser Kurdî li Fransayê .....	104
2.2.4. Xebatên Kurdî li Îngilistanê.....	105
2.2.5. Xebatên Kurdî li Almanyayê .....	106
2.2.6. Xebatên Kurdî li Welatên din ên Ewropayê .....	107
2.2.7. Xebatên Kurdî li Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê.....	107

## **BEŞA SÊYEM**

### **PÊŞKÊŞKIRIN Ê ANALÎZA BERAWIRDÎ YA DU XEBATÊN RÊZIMANA KURMANCÎYÊ ..... 109**

3.1. XEBATA SAMUEL A. RHEA .....	109
3.1.1. Jîyana Samuel A. Rhea .....	110
3.1.2. Li gorî Rheayî Fonetîka Kurdî.....	110
3.1.2.1. Di Xebata Rheayî de Dengdêrên Kurmancîyê .....	111
3.1.2.2. Di Xebata Rheayî de Nedengdêr.....	112
3.1.2.3. Li gorî Rheayî Fonolojîya Kurdî.....	113
3.1.3. Morfolojîya Kurmancîyê di Pirtûka Rheayî de.....	117
3.1.3.1. Li gorî Rheayî de Qertafên Kêşanê yên Kurmancîyê .....	117

3.1.3.2. Di Xebata Rheayî de Qertafên Bêjesaz.....	119
3.1.3.3. Li gorî Xebata Rheayî Kategorîyên Rêzimanî .....	120
3.1.3.3.1. Cînavk di Xebata Rheayî de .....	122
3.1.3.3.2. Rengdêr di Xebata Rheayî de .....	123
3.1.3.3.3. Hoker di Xebata Rheayî de .....	124
3.1.3.3.4. Daçek di Xebata Rheayî de .....	124
3.1.3.3.5. Gihanek di Xebata Rheayî de .....	125
3.1.3.3.6. Hejmar di Xebata Rheayî de.....	125
3.1.3.3.7. Baneşan di Xebata Rheayî de .....	125
3.1.3.3.8. Lêker û Kategorîyên Rêzimanî yên Têkildarî Lêkerê .....	125
3.1.3.3.8.1. Kes û Kesandin di Xebata Rheayî de.....	125
3.1.3.3.8.2. Ergatîfî di Xebata Rheayî de.....	126
3.1.3.3.8.3. Dem û Rawe di Xebata Rheayî de .....	127
3.1.3.3.8.4. Avanî di Xebata Rheayî de .....	137
3.1.3.3.8.4.1. Avanîya Tebatî .....	137
3.1.3.3.8.4.2. Avanîya Hokerî .....	138
3.1.4. Li gorî Xebata Rheayî Sentaksa Kurmancîyê.....	139
3.1.5. Nirxandina Giştî ya Berhema Rheayî .....	140
3.2. XEBATA SERPEL R. F. JARDINE.....	140
3.2.1. Jiyana R. F. Jardine .....	141
3.2.2. Li gorî R. F. Jardine Deganîya Kurmancîyê.....	141
3.2.2.1. Dengsazî.....	142
3.2.2.2. Dengzanî (Fonolojî) .....	144
3.2.3. Morfolojîya Kurmancîyê di Pirtûka Jardine de .....	145
3.2.3.1. Beşên Axaftinê .....	151
3.2.3.1.1. Navdêr .....	151
3.2.3.1.1.1. Qertafên Kêşanê yên Têkildarî Navdêrê.....	151
3.2.3.1.1.2. Kategorîyên Rêzimanî yên Têkildarî Navdêran .....	152
3.2.3.1.1.2.1. Zayend.....	153
3.2.3.1.1.2.2. Mêjer .....	153
3.2.3.1.1.2.3. Binavkirin.....	154
3.2.3.1.1.2.4. Piçûkkirin .....	154



3.2.3.1.1.2.5. Rewş û Tewanga Navdêran.....	155
3.2.3.1.2. Rengdêr .....	156
3.2.3.1.3. Cînavk .....	158
3.2.3.1.4. Hoker .....	160
3.2.3.1.5. Daçek.....	161
3.2.3.1.6. Gihanek .....	161
3.2.3.1.7. Baneşan .....	161
3.2.3.1.8. Hejmar .....	162
3.2.3.1.9. Lêker.....	162
3.2.3.1.9.1. Kesandin û Qertafên Kesandinê .....	163
3.2.3.1.9.2. Kêşan û Rehên Lêkeran .....	165
3.2.3.1.9.3. Amraz û Qertafên Kêşanê yên Têkildarî Lêkeran .....	165
3.2.3.1.9.4. Ergatîfî .....	165
3.2.3.1.9.5. Dem û Rawe.....	167
3.2.3.1.9.6. Avanî di Xebata Jardine de.....	181
3.2.4. Di Xebata Jardine de Sentaksa Kurmancîyê.....	183
3.2.5. Di Berhema Jardine de Watenasî.....	188
3.2.6. Nirxandina Giştî ya Berhema Jardine .....	188
3.3. BERAWIRDKIRINA HER DU XEBATAN.....	190
<b>ENCAM.....</b>	<b>192</b>
<b>ÇAVKANÎ.....</b>	<b>197</b>
<b>PÊVEK.....</b>	<b>204</b>

## DESTPÊK

Li gorî xebatên der barê zimanan de, li ser rûyê cîhanê derdora 6 hezar ziman hene. Her çi qas ziman, wekî navgîneke derbirîna hest û ramanan hatibe pênasekirin jî, ew di heman demê de di warê parastin û pêşvebirina çand û nasnameya çandî de jî xwediyê cihekî taybet e. Ziman wekî navgîna ragihandinê di derdoreke civakî de pêk tê, hem hest û ramanên takekesî nîşan dide, hem jî bîr û boçûnên civakê di nava xwe de dihewîne. Lewma jî zimanê me bi awayekî zelal nîşan dide ka em kî ne û ji kîjan civakê ne.

Mijara zimên di dîrokê de hê di destpêkê de bala zanyar û lêkolîneran kişandiye û zimanzanî “li ser kelepore û daneheva 2500 salî, bi ked û xebata gelek zanyar û zimanzanan pêk hatiye” (Kıran & Kıran, 2000:19). Berhemên pêşîn ên der barê zimanan de li gel jêderk û binçîneyên zimanan, rêzik û rêpîvanên zimanan anku rêziman ji xwe re kirine mijarê lêhûrbûn û têfikirînê.

Yekemîn pirtûka rêzimanê ya zimanên ewropî ji hêla *Dionysius Thrax* (170-90 B.Z) ve hatiye nivîsandin. “Navê vê pirtûkê *Techne grammatike* ye, ev pirtûk bi gelemperî mijarên têkildarî fonetîk û morfolojî di nava xwe de dihewîne, vê xebatê li ser xebatên rêzimanê yê piştî xwe bandoreke taybet hiştiye” (Aydın, 2007:20).

Herçî zimanê kurdî ye, li Rojhilata Navîn piştî erebî, farisî û tirkî, zimanê mezintirîn koma zimanî ye. Zimanê kurdî bi binyad û binçîneya xwe “ji malbata Hind-Ewropa, ji baskê zimanê bakurê rojavayê Îranê ye” (Adak, 2015: 17).

Dabeşkirina zimanên îranî li gorî dabeşbûna cografîk pêk tê. Zimanên bakur û başûrê rojavayê îranê li gorî fonetîka dîrokî ji hev cuda dibin. Gelek zimanzan balê dikêşin ser vê guherîna dangan a bi rêk û pêk, bo nimûne MacKenzie (1961) di gotara xwe ya bi navê *The Origin of Kurdish* (Binçîneya Kurdî) de di vî warî de hinek mînak dane.

**Mînak:**

“M&lt;V/W

<b>Kurdî</b>	<b>Avestayî</b>
<i>nav/naw</i>	<i>naman</i>
<i>havîn /hawîn</i>	<i>hamîna</i>
<i>dû(v)</i>	<i>dûma</i>

**Kurdî** **Farisî***kevan/kewan* *keman***K>X****Kurdî** **Farisî***ker* *xer**kenîn* *xendîden***Kurdî** **Avestayî***kanî* *xan*” (MacKenzie, 1961: 70-71)

Zimanê kurdî her wekî gelek zimanan xwedîyê zaravayên cur bi cur e. Cara pêşîn Şerefxanê Bedlîsî di berhema xwe ya bi navê *Şerefname (1597)* de qala zaravayên zimanê kurdî kiriye. Li gorî wî, “kurd dabeş dibin ser çar beşên mîna kurmanc, lor, kelhûr û goran” (Bedlîsî, 2007: 101).

Zimanzanê kurd Qanatê Kurdo jî di berhema xwe ya bi navê *Gramêra Rêzimanê Kurdî* de bi van gotinan qala zaravayên kurdî kiriye: “Bi gotin û nivîsarên zanyarên kurd ên Ewropa û Sovyetistanê zimanê kurdî parve dibe ser van zaravayên jêrîn: kurmancî, zazakî, lûrî, gûranî. Bi melûmetîyên wan zanyaran zaravayê kurmancî yê herî mezin û berbelav e, ew parve dibe ser du koman: kurmancîya bakur, kurmancîya başûr” (Kurdo, 1990: 8). Zaravayên kurdî bi gelemperî wekî; kurmancî, soranî, kirmanckî (zazakî), guranî, lorî tèn destnîşankirin.

Zimanê kurdî di bin serwerî û desthilatîya mîrgehên kurdan de li medreseyên Kurdistanê wekî alîkar hatiye bikaranîn. Di bin banê medreseyên kurdan de berhemên der barê wêje û zimanê kurdî de hatine nivîsandin. Yekemîn berhema rêzimanê bi zimanê kurdî ji hêla Elîyê Teremaxî ve bi navê *Serfa Kurmancî* di sedsala 17an de hatiye nivîsandin. Teremaxî di vê berhemê de mijarên rêzimana erebî bi kurmancî rave û pêşkêş kirine û hin caran jî ew bi rêzimana kurmancî û farisî

re berawird kirine. Her wiha piştî Teremaxî jî, li Rojhilat û Rojava gelek kesan li ser zimanê kurdî xebat kirine.

### **Mijara Lêkolînê**

Ji sedsala 18an pê ve zimanê kurdî bala mîsyoner, geştîyarên ewropî jî kişandiye, lewma jî yekemîn pirtûka der barê rêzimana kurdî de ya li Ewropayê hatiye çapkirin, ji hêla *Garzonî* ve di sala 1787an de bi îtalî hatiye nivîsandin. Navê vê berhemê *Grammatica e Vocabulario Della Lingua Kurda* (Rêziman û Ferhenga Zimanê Kurdî) ye. Duyemîn pirtûka der barê rêzimana kurdî de ji hêla mîsyonerê amerîkî Rheyî ve hatiye nivîsandin. Navê wê jî *The Brief Grammar and Vocabulary of The Kurdish Language of The Hakari District* (Kurteyek ji Rêziman û Ferhenga Zimanê Kurdî ya Herêma Hekarî) e û di sala 1869an de di kovara *Journal of the American Oriental Society* de li Philadelphiayê çap bûye.

Ev xebata Rheyî û di gel pirtûka serpelê îngilîz Jardine ya bi navê *Bahdinan Kurmanji a Grammar of The Kurmanji of The Kurds of Mosul Division and Surrounding Districts of Kurdistan* (Rêzimana Kurmancîya Kurdên Parêzgeha Musil û Herêmên li Derdora Wê) bûye mijara vê tezê.

Rheyî ev xebata xwe piştî jiyana demeke dirêj a li herêmê ji bo hêskirina karê pêşrewên xwe yê mîsyoner amade kiriye. Her çî xebata Jardine e, ew jî ji hêla serpelekî dewleta îngilîz ve dîsa bi armanca hêskirina karên peywirdarên li Iraqê hatiye nivîsandin. Ev her du berhem jî bi zimanê îngilîzî ne û armanca wan xebatan hêskirina zimanê kurdî ye. Mijarên rêzimana kurmancîyê bi zimanê îngilîzî hatine rave û şîrovekirin.

Ev her du xebatên ku me ji bo teza xwe wekî bingehe wergirtine heta radeyekê xebatên qadî ne, anku li ser kurmancîya gelêrî ya herêmekê hatine amadekirin û xebatên rêzimana şayesî ne. Amadekarên van berheman her çî qas ne zimanzan bin jî, ji teoriyên zimanzanî û rêzimanan agahdar in, lewma jî wan xwestiye li gorî hêz û şiyana xwe, xebateke têr û tesel bikin. Ji ber vê yekê, ev her du xebatên destpêkî yê rêzimana kurmancî girîng hatin dîtin û bûn mijara vê tezê.

## **Armanç û Girîngîya Lêkolînê**

Armanca vê tezê bi nêrîneke zimanzanîya giştî (general linguistics) nirxandina du berhemên pêşîn ên rêzimana kurmançî ye û bi vê nirxandinê re jî ji bo rêzimana nûjen a kurmançî diyarkirina çarçoveyeke nû ye. Di vê tezê de ev her du xebatên destpêkî yên rêzimana kurmançîyê bi rêbazeke berawirdî hatine analîzkirin û li ser vê bingehê hewl hatiye dayîn ku bi zimanê kurdî zaravayê kurmançî çarçoveyeke giştî ji bo zimanzanî û rêzimana kurmançîyê were pêşkêşkirin.

Her wekî me di beşa Raborîya Xebatên li ser Zimanê Kurdî de jî da xuyakirin, piranîya xebatên rêzimana kurmançîyê ku bi kurdî hatine amadekirin, xebatên rêzimana rêzikparêz in, ji zimanê gelêrî zêdetir zimanê nivîskî bingeh girtine. Ew berhem ji hêla kesên kurmançîxêv ve hatine amadekirin, lewma jî wan ji bilî berhemên nivîskî wekî zimanê devkî bi tenê devoka herêmên xwe bingeh girtiye. Vê yekê jî nehiştiye ku zimanê nivîskî yê kurmançîyê bikare hemû formên gelêrî yên zimanê kurdî bigire nava xwe, gelek formên gelêrî yên resen û qedîm ji ber vê rêzikparêzîya hişk li derveyî zimanê nivîskî mane. Armanca vê tezê bi analîzkirina van her du xebatên destpêkê, ji bo lêkolînerên li ser xebatên rêzimana kurmançî pêşkêşkirina perspektîf û asoyeke nû ye.

## **Rêbaza Lêkolînê**

Di vê xebatê de serê pêşîn mijar, armanç û rêbaza xebatê hatiye destnîşan kirin, piştê der barê wate û girîngîya ziman, dîroka ziman û zimanzanîyê de kurteagahîyek hatiye pêşkêşkirin. Piştî wê, cih û warê zimanê kurdî di nav zimanên cihanê de, xebatên der barê zimanê kurdî de hatine vegotin. Li pey wê di war û biwarên sereke yên zimanzanîya giştî (fonetîk, morfolojî, sentaks û semantîk) de rewş û taybetîyên kurdîya kurmançî hatine destnîşankirin, kategorîyên rêzimanî yên kurdîya kurmançî hatine destnîşankirin.

Bi vê yekê jî pîvanên ku dê her du berhemên mijara lêkolînê li gorî wan werin nirxandin hatine destnîşan kirin. Piştî vê yekê, ev her du berhem bi nêrîneke zimanzanîya giştî, li gorî pîvanên fonetîk, fonolojî, morfolojî, sentaks û semantîk bi rêbazeke birawirdî hatine pêşkêşkirin û analîzkirin.

Di berawirdkirinê de berhemên zimanzanîya giştî (Bussman, Chalker & Weiner, Cambell, Korn) û berhemên nû yên der barê zimanê kurdîya kurmancî (MacKenzie, Bedirxan & Lescot, Kurdo, Tan, Thackston) de wekî palpişt û çavkanî hatine bikaranîn.

Di mijara jêgiranê de jî çavkanîyên bi kurdî yên ku jêgiran bi awayekî resen hatine veguhastin, destkarî di rastnivîs û rênûsa kesê/a jê jêgiran hatiye kirin nehatiye kirin. Di dawîya her berhemê de, der barê wê berhemê de li gorî pîvanên zimanzanîya giştî nirxandineke giştî hatiye kirin. Di encamê de her du berhem bi awayekî birawirdî hatine nirxandin.

Ji bo ku hemû kes bikarin ji vê berhemê sûd wergirin, me her du berhemên mijara lêkolînê pêşî li kurmancî wergerandin, piştî jêgiran ji wan wergeran kirin. Lewma jî heke di wergerê de kêmasî çêbûbin, ew kêmasî yên me ne.

### **Sînorên Lêkolînê**

Me di vê tezê de xebata xwe bi kurdîya kurmancî sînardar kiriye. Her çî qas xebatên der barê kurdîya soranî û kirmanckî de li ber destên me hebûn jî, em derbasî mijara zimanzanî û rêzimana kurdîya soranî û kirmanckî nebûne. Her wiha di warê di beşa *Raborîya Xebatên Li Ser Zimanê Kurdî* de jî me xebata xwe bi sedsala 20an bi sînor kiriye, berhem û xebatên di sedsala 21ê de li derveyî vê tezê ne.

Di amadekirina vê tezê de me ji çavkanîyên sereke yên der barê zimanzanî, zimanê kurdî û kurdîya kurmancî sûd wergirtiye. Ziman li gorî pîvanên zimanzanîya binyadgerî hatiye pênasekirin, dîroka ziman û zimanzanîyê bi awayekî giştî hatiye pêşkêşkirin. Piştî wê taybetîyên zimanê kurdî, cihê wî di nav zimanên cîhanê de, zaravayên kurdî, kategorîyên rêzimana kurmancî hatine ravekirin. Di dawîyê her du xebatên rêzimana kurmancîyê li gorî pîvanên zimanzanîya giştî hatine nirxandin.

### **Kêşe û Astengên Lêkolînê**

Di vê xebatê de kêşe û arîşeya sereke di warê zimên de derket pêşberî me. Her wekî me li jorê jî qal kir, piranîya berhemên di vî warî de ne bi kurdî, lê bi zimanên din hatine amadekirin. Di warê zimanzanîya giştî de hema bibêje bi

kurmancî tişteke nehatiye nivîsandin. Lewma jî me di xebata xwe de bi gelemperî ji çavkanîyên bi zimanê îngilîzî û tirkî sûd wergirt.

Kurdîkirina van çavkanîyan bi xwe re kêşeya termînolojîyê anî. Di warê zimanzanî û rêzimanê de termînolojîyeke yekgirtî nîn e. Me di vê xebata xwe de termînolojîya ku *Koma Xebatê ya Weqfa Mezopotamyayê* pêşniyaz dike, bingehe girt. Lê belê ew xebat jî hemû têgih û termên zimanzanî û rêzimanê di nava xwe de nahewîne, lewma jî hin caran me têgihên nû vedîtin an jî dariştin. Ji ber vê yekê me di dawîya vê xebatê de ferhengokeke jî bi cih kiriye.

Di vê ferhengokê de hinek têgih bi kurmancî, tirkî û îngilîzî hatine pêşkêşkirin. Ji ber ku xebatên bi vî rengî bi kurdîya kurmancî kêm hatine kirin, zimanê wê jî heta radeyekê sext û dijwar e. Ew qada ku me li serê xebat kiriye, ji bo kurmancî heta radeyekê qadeke beyar e, tê de zêde berhem nehatine dayîn, xebatên bi vî rengî heke valahîyeke biçûk jî dagirin, cihê kêfxweşîyê ne, lê belê ji ber heman sedemê xebatên wiha ji kêmasîyan jî xalî nabin.

# BEŞA YEKEM

## NÊRÎNEKE GIŞTÎ LI ZIMANÊ KURDÎ

### 1.1. WATE Û PEYWIRA ZIMÊN

Wate û peywira zimên çi ye? Ji bo ku mirov bersiva vê pirsê bide, divê mirov serê pêşîn bala xwe bide çîroka pêkhatina zimanan. Pêkhatina van zimanan jî wekî heyber û giyanewerên din xwedîyê dîrokeke kûr û dûr e. “Îro li ser rûyê cîhanê nêzî 6 hezar ziman hene. Hinek ji wan jî hêla bi milyonan kesî ve tên bikaranîn, hinek ziman jî bi tenê çend kes bi wan dipeyivin. Ziman ji bo hin civakan pir girîng e, di wan civakan de heta yek bi ser zimên nekeve, wekî mirov nayê dîtin” (Özsoy, Balçı, Turan, 2012:3).

Diyardeyeke ewende girîng, pênasekirina wê jî girîng e, lê belê pênasekirin çendî girîng be, ew qas jî dijwar e, ji ber ku gelek aliyên vê diyardeyê hene. Ji ber vê yekê pênasekirin û ravekirinê cuda yên zimên derketine holê. Her zanyar û lêkolînerekî/ê girîngî daye aliyekî zimên û ew alî zêdetir derxistiye pêş. Hinekan civakîbûna zimên, hinekan aliyê çandî yên zimên, hinekan jî wekî navgîna ragihandinê ziman derxistiye pêş. Em hinekî bala xwe bidin van pênase û ravekirinan.

Di ferhenga ziman û zimannasîyê ya Routledge de ziman bi vî rengî hatiye pênasekirin: “Ziman navgînek e ji bo derbirîn û parvekirina raman, diyarde, zanîn û agahîyan, her wiha jî ji bo pevgihandin û veguhastina ezmûn û pêzanînan. Ziman di pêvajoyeke serwestbûna hizirî de pêk tê, tûşî hinek qewimînên civakî û guherîn û pêşveçûnên dîrokî dibe” (Bussmann, 2006: 627).

Di ferhenga zimanzanîyê ya Kamîle Îmer, Ahmet Kocaman û A. Sumru Ozsoy de jî pênasekirina zimên wiha ye: “Pergala pêkanîna ragihandinê ya ku ji nîşaneyên bêsedem pêk tê; teveka têgihên piralî.” (Îmer, Kocaman, Ozsoy 2011:87)



*Dilbilime Giriş* (Destpêka Zimanzanîyê) ya Zeynel Kıran- Ayşe Kıran ziman wekî pergala nîşaneyên dengîn a hevpar edi nav endamên komeke zimanî de” (Kıran& Kıran, 2010:45), pênase kiriye.

Sumru, Balcı û Turan (2012) di pirtûka xwe ya bi navê *Genel Dilbilim-I* (Zimannasîya Giştî-I) de *ziman wekî pergaleke rêzikan* hatiye binavkirin. Li gorî vê xebatê di zimên de hem nîşaneyên dengîn hene, hem jî rêzîkên pevgihaştina wan nîşaneyan hene. Her nîşane li gorî rêzîkekê cihê xwe di nav vê pergale de digire. Zanîna zimanekî hem naskirina nîşaneyên dengîn ên wî zimanî ye, hem jî zanîn û şiyaneya bikaranîna van rêzikan e. Zanîna rêzikan jî têgihastin û rastbikaranîna rêzîkên danganî (fonetîk), peyvsazî (morfolojîk), hevoksazî (sentaksî) û watenasî (semantîk) ye.

### **Ziman û Çand**

Her wekî ji van pênasekirinan jî tê fehmkirin, ziman berî her tiştî navgîna bingehîn a ragihandina hest û ramanan e. Her wiha ziman şiyana û behremendiya bingehîn e ku mirovan ji giyanewerên mayî cuda dike. Ev hêz û şiyaneya ku em qal dikin, berhemendîya mirov a zimanî ye. Bi vî awayî axêverên zimanekî dikarin hevokeke ku heta wê demê wan nebihîstiye pêk bînin û bi lêv bikin.

Ziman ji ber ku navgîna pevgihandin û pevguhastina hest û ramanan e, di pêkhatin û teşegirtina çand û nasnameya civakê de xwedî cih û peywireke taybet e. Her wekî Alessandro Duranti (1997) di berhema xwe ya bi navê *Linguistic Anthropology* (Antropolojîya Zimanzanî) de daye xuyakirin, “Çand li ser bingehêke razber karîger dibe, ev razberkirin jî bi rêya zimên pêk tê.” (Duranti, 1997:53) Her wiha *Edward Sapir* (1884-1939) ziman ji bo pêkhatin û pêşketina çandê wekî merc û bingeha pêşîn pênase kiriye. (Duranti, 1997:56)

Lewma jî ji bo ragihandineke karîger pêdivî bi fehmkirin û naskirina têkilîya di navbera ziman û gelê ku wî bi kar tîne de heye. Gava ku mirov hînî zimanekî dibe, di heman katê de mirov hêza civakî û çandî ya ku bi wî zimanî karîger dibe jî hîn dibe. Her wekî çawa her mirovekî zimanek heye, her civakê jî zimanek heye ku pê hest, helwest û ramanên xwe îfade dike.

Ji ber vê yekê ziman wekî *dergûşa çandê* jî hatiye pênasekirin. Ziman wekî navgîna ragihandinê di derdoreke civakî de pêk tê. Lewma jî hem hest û ramanên takekesî nîşan dide, hem jî bîr û boçûnên civakê di nava xwe dihewîne. Her wiha zimanê me bi awayekî zelal nîşan dide ka em kî ne, ji kîjan civakê ne. Ne tenê nasnameya me ya neteweyî, hin caran nasnameya me ya civakî û çînî jî nîşan dide. Zimanzanê kurd *Feqî Huseyn Sağniç* di berhemana xwe ya navê *Hêmana Rêzimanê Kurdi* de girîngîyeke taybet daye peywendîya ziman û nasnameyê. Lewma jî wî gotiye: “Zman ji çar endamên netewî (zman, welat, çand û bazar) endameki ji gişkan gringtîre. Zman çeka serbestî, serxwebûn û serfiraziya gel û netewiyê. Zman neynika çand, pişe, dilan, wêje, afirandin û pêşve çûnêye.” (Sağniç, 1991:7)

## 1.2. DÎROKA XEBATÊN LI SER ZIMAN Î ZIMANZANÎYÊ

Ji bo ku mirov rewşa îroyîn a xebat û lêkolînên der barê ziman û zimanzanîyê de fehm bike, divê mirov pêşî bala xwe bide dîroka xebatên der barê zimên de. Bi vî awayî mirov dikare binçîne û palpiştî teorîyên îro yê zimanzanîyê baştir fehm bike û li ser vê bingehe xebat û berhemên der barê kurdî de jî baştir binirxîne. Bo nimûne, heta ku mirov qonaxa dûvedirêj a zimanzanîya berawirdî û li ser wê bingehe destnîşankirina têkilîya genelojîk a di navbera zimanan de nas neke, mirov mijara malbata zimanan baş fehm nake. Ji ber vê yekê em ê di vê beşê de hinekî bala xwe bidin ser dîroka xebatên ziman û zimanzanîyê.

Zimanzanî berî ku bibe zanistek di gelek qonaxan re derbas bûye. Deqên pêşîn ên der barê zimên de berî 4 hezar salan li ser kevîr û zinaran hatine nivîsandin. Her wekî *Zeynel Kiran* û *Ayşe Kiranê* jî daye xuyakirin, “zimanzanî li ser keleşor û daneheva 2500 salî bi ked û xebata gelek zanyar û hezkiriyên zimên pêk hatiye” (Kıran& Kıran, 2000:19).

Dema ku mirov bala xwe dide pirtûk û gotarên der barê dîroka zimanzanîyê de, mirov dibîne ku berhem û xebatên der barê zimên de berî 4 hezar salî diçin. Yekemîn berhema zimanzanî berî 4 hezar salî, bi zimanê sumerî hatiye nivîsandin. Ev berhem lîsteya navên sumerî ye.

Her wekî Campbell (2002) dide xuyakirin, di destpêkê de mijara zimên di nav beşên din ên zanistê de dihat nirxandin. Lewma jî mijara zimên heta *Zimanzanîya Binyadgerî* nebû zanistêke serbixwe. Lê dîsa jî xebatên zimên di destpêkê de wekî xebatên rêzimanê dest pê kirin.

### 1.2.1. Serdema Kevneşopîya Rêzimanan

Li pey agahîyên ku Campbell (2002) dane, yekemîn pirtûka rêzimanê ji hêla *Paini (Panîni)* ve li Hinda Berê B.Z 500'î hatiye nivîsandin. Di berhema navborî de fonetîk û morfolojîyê cih girtiye. Li Yûnana Antîk xebatên der barê zimên de bi giranî bal kişandiyê ser jêderka zimên, beşên axaftinê, têkiliya di navbera zimên û ramanê de, herî zêde jî têkiliya di navbera teşe û wateyê de. Fîlozofên yûnanî herî zêde serê xwe li ser wê yekê êşandine; gelo têkiliya di navbera peyvê û wateya wê de têkiliyeke li ser lihevkerinê ye yan jî têkiliyeke surîştî ye. Di vê serdemê de du nêrînên dijber; surîştî û lihevkerinî derketine holê.

Li gorî bawerîya surîştîparêzan di navbera peyvên û heyberên ku ew nîşan didin de têkiliyeke surîştî heye. Lê belê alîgirên nêrîna lihevkerinî tu têkiliyeke surîştî di navbera peyvê û heybera ku ew nîşan dide de nabînin û napejirînin. Li gorî bîr û boçûna wan peyv li ser bingeha lihevkerineke giştî pêk hatine. Platon (427-347 B.Z) di xebata xwe ya bi navê *Cratylus* de, her wekî **Sokrates** (469-399) piştevanîya têkilîyeke surîştî kiriye, li hemberî vê *Aristo* (384-322) ramana têkilîya li ser hîmê lihevkerinê parastiyê.

Li gorî Aydın, “Yekemîn pirtûka rêzimanê ya zimanên ewropî ji hêla *Dionysius Thrax* (170-90 B.Z) ve hatiye nivîsandin. Navê vê pirtûkê *Techne grammatike*” ye. Ev pirtûk der barê zimanê yûnanî de ye û bi gelemperî mijarên têkildarî fonetîk û morfolojî di nava xwe de dihevwîne. Vê xebatê li ser xebatên der barê rêzimanê de yê piştî xwe bandoreke taybet kiriye” (Aydın, 2007:20).

Di zimanzanîya Yûnanîya Antîk de mijara sentaksê piştî çend sedsalan dibe mijara lêhûrbûn û lêkolînê, cara pêşîn *Apollonius Dyscolus* (110-175 P.Z) bala xwe daye vê mijarê. Xebatên zimanzanîyê yê li Romayê berdeewama xebatên Yûnana

Antîk in. Di van xebatan de bala zanyaran bi giranî li ser morfolojîyê, bi taybetî jî li ser beşên axaftinê, herî zêde jî teşe û dirûvê lêker û navdêran bû.

Li nav ereban di sedsala 7an de xebatên zimanzanîyê bi bandora kelepora Yûnana Antîk a rêzimanê dest pê dikin. Ev xebat jî bi gelemperî morfolojî û fonetîkê digirin nava xwe. Yekemîn xebata li nav ereban xebata *Ebûl Eswed ed Dualî* (607-668) e. Kelepora erebî bandor li kelepora îbranî ya di vî warî de kiriye, ji ber ku kelepora îbranî piştî kelepora erebî bi demeke kurt anku di sedsala 9an de dest pê kiriye. *Saadya bin Josef el Feyyûmî* (882-942) yekemîn pirtûka rêzimanê û ferhenga îbranî nivîsandîye. Kelepora xebatên rêzimanî yên îbranî di sedsala 13an de bi xebata *David Qîmhî* (1160-1235) gihaşt asta herî bilind. Vê xebatê bandoreke berbiçav li xebatên zimanzanîyê yên li Ewropayê kiriye.

Di heman demê de anku di serdema navîn de (500-1400 P.Z) li Ewropayê xebatên li ser zimanê latînî çêbûn. Di domana demê re zimanên xwecihî jî hêdî hêdî bûn zimanên nivîskî. Ji ber ku di vê serdemê de zimanê latînî wekî tekane zimanê nivîskî derketibû pêş. Ji bo axêverên resen ên vî zimanî xebatên rêzimana pedagojîk derketin. Di sala 1000î de serkeşeyekî pirtûkeke rêzimana latînî ji bo zarokên ku bi zimanê Anglo-Sakson xeber didin amade kir.

### **1.2.2. Pêla Rêzimana Gerdûnî**

Di sedsala 12an de ramana gerdûnîbûna taybetîyên sereke yên rêzimanî bi serkêşîya lêkolînerên mîna *Roger Bacon* (1214-1294) derket pêş. Bacon da zanîn ku, “taybetîyên sereke yên rêzimana hemû zimanan di bingeha xwe de mîna hev in û tiştên cuda zêde ne tiştên girîng in” (Campbell, 2002:3).

Di vê demê de xebateke girîng li Îzlandayê ji hêla yekî nenas ve hatiye kirin. Wî di xebata xwe de bal kişandîye ser cudatîya bilêvkirin û rastnivîsa ku li ser bingeha latînî pêk hatibû. Di vê xebatê de nivîskar bal kişandîye ser hinek taybetîyên fonolojîk ên zimanê îzlandî. Di vê xebatê de cara pêşîn dengên bingehîn ên ku wateyê diyar dikin anku fonem û dengên din ji hev hatine cudakirin, lê belê ev xebat hata sala 1818an nehatiye çapkirin.

### 1.2.3. Serdema Rêbaza Berawirdî

Ji sedsala 15an pê ve bi seferên kolonyalîzmê re ewropî li Afrîka û Amerîkayê bi zimanên cur bi cur re rû bi rû mane. Agahiyên der barê van zimanan de ji hêla vekoler, rêveberên kolonîyan, geştyar û mîsyoneran ve hatine berhevkirin. Zanyaran daneyên van zimanan kom kirine û dane ber hev.

Di sedsala 16an de ramanê nû derketiye pêş; li gorî vê ramanê, piraniya zimanên li Ewropayê malbateke têkildarî hev pêk tînin, ew ziman hemû zarokên dayikekê ne. “Wekî avakerê teorîya zimanên Hind-Ewropî û zimanzanîya berawirdî *William Jones* (1746-1794) tê nasîn. Lê kesê ku pêşî têkiliya di navbera zimanê sanskrîtî û zimanên ewropî de nas kirî ne Jones e. Bo nimûne *Adreas Jager* berî wî bi sedsalekê bal kişandiye ser vê mijarê” (Cambell, 2002:5).

Di encamê de em dişên bibêjin ku mijara malbata zimanan piştî vê yekê berbelav bû û hinek malbatên din ên zimanê hatin destnîşankirin. Di vê serdemê de rêzimana piraniya zimanên ewropî û hinek zimanên ne-ewropî jî hatin nivîsandin. Di vî warî de mîsyoneran rist û peywireke girîng hilgirt ser milên xwe.

### 1.2.4. Zimanzanîya Binyadger

Xebatên li ser zimên di dawîya sedsala 19’an û destpêka sedsala bîstan de bi xebatên *Ferdinand de Saussure* wekî zanist hatin pesendkirin. Heta hingê xebatên der barê ziman de bi gelemperî bi nêrîneke dîrokî û hevrûkerî dihatin kirin. Bi taybetî Saussure ev nêrîna kevneşopî daye alîyekî, bal kişandiye ser zimanê heyî anku ji xebatên dûvdemî (dîyakronîk) zêdetir, xebatên pevdemî (senkronîk) derketine pêş û serdest bûne.

Li gorî Saussure, pêvajoya ragihandina zimanî berî her tiştî pêvajoyeke civakî û giyanî ye. Saussure ziman (langue) û peyv (parole) ji hev cuda kirine. Li gorî wî, “ziman (langue) di ser takekesan re ye, teveka civakê eleqedar dike, pergaleke razber e. Ev pergal di navbera mirovan de danûstandinekê pêk tîne. Li alîyê din, peyv (parole) alîyê şênber û kargîn ê zimên e. Pergala razber xwe bi riya pêkhatina şênber û kargînî nîşan dide” (Rifat, 1990:16).

Her hêman û nîşaneya zimanî divê bi têkilî û rengvedana xwe ya li gel hêmanên din were nirxandin. “Mirov dikare pergala zimanî bişibîne listika kişikan; tiştê ku nirx û peywira kevirên kişikê diyar dike ne gewherê wî kevirî ye, rêzika listikê û têkilîya wî kevirî bi kevirên din re ye” (Rifat, 1990:17).

Di zimên de du alî; *nîşander* û *nîşanber* hene ku ew jî ji hêmayeke bihîzîyarî û hêmayeke razber pêk tînin. Têkilîyek di navbera wê *hêmaya bihîzîyarî* û diyardeya aşopî de heye. Têkilîya di navbera nîşander û nîşanber de têkilîyêke bêsedem e, li ser lihevkerinê pêk hatiye. Ev têkilî, ne têkilîyêke surîştî, lê belê têkilîyêke civakî ye. Her wiha ew hêmaya bihîzîyarî li gorî rêzêkê pêk tê, lewma jî ew *hêmaya rêzîleyî* ye. Di zimanzanîya destpêkê de fonetîk û fonolojî li pêş bûn, di sala 1886an de Komeleya Navneteweyî ya Fonetîkê (IPA) hate avakirin. Di vê serdemê de pisporên denganiyê *Henry Sweet* (1845-1912) û *Baudouin Courtenay* (1845-1929) bêyî haya wan ji hev hebe, deng (phone) û dengê bingehîn (phonem) ji hev cuda kirin. Li welatên cur bi cur der barê ziman de xabatên cuda hatine kirin û li ser navê xebatên zimanzanîya binyadger teorîyên têvel hatine pêşkêşkirin. Mirov dikare çend heb ji wan dibistanên zimanzanîya binyadger wiha rêz bike:

#### **1.2.4.1. Derdora Zimanzanîyê ya Pragê**

Vê derdorê ziman, ji aliyê ragihandinê ve hildaye dest, “ji hêmanên zimanî wêdetir wan bala xwe daye ser têkilîya di navbera van hêmanan de û her hêman li gorî têkilîya wê ya bi hêmanên din reyên di nava heman pergale de nirxandiye” (Rifat, 1990: 22).

Teorîya ragihandinê *R. Jakobson*, “*Bêjer* li gorî rêzîkekê ji *bihîzer* re peyamekê dişîne. Li gorî Jakobson peywira bingehîn a ziman, peywira ragihandinê ye” (Rifat, 1990:30).

#### **1.2.4.2. Binyadgerîya Îngilîz**

Di zimanzanîya îngilîz de kesê ku zêdetir bandor li zimanzanîya cîhanê kiriye *Daniel Jones* e. Berhemên wî *Outline of English Phonetics* (Kurteya Denganiya

Îngilîzî) û *English Pronouncing Dictionary* (Ferhenga Bilêvkirinê ya Îngilîzî) li seranserî cîhanê hatine bikaranîn.

Lê belê, li Îngilîstanê xebatên zimanzanîya giştî bi xebata *J.R. Firth* (1890-1960) dest pê dikin. Firth yekemîn kes e ku li Zanîngeha Londonê kursîya zimanzanîyê vekirîye. Wî demekê li ser Hindistanê li ser zimanê hindî jî xebat kiriye û xebatên wî wekî *Ekola Londonê* hatiye binavkirin. Ew li dijî ramana ku “peyv wekî deng li pey hev rêz dibin” rabûye û ji yek bi yek deng wêdetir bala xwe daye ser *dahûrandina pêlawazî* (prosodic analysis), her wiha wî li ser wateyê jî xebat kiriye. Firth bi xwe teorîyeke rêzimanê pêk neanîye, lê belê şagirtê wî *Halliday, Systemic Functional Grammar* (Rêzimana Erkî ya Sîstemîk) pêk anîye û vê teorîyê di warê *zimanzanîya tetbîqî* (applied linguistics) de bandor li zimanzanên li Amerîka, Awistralya, Îspanya, Çîn û Japonyayê kiriye.

#### **1.2.4.3. Binyadgerîya Danîmarkî**

Pêşengê Ekola Kopenhagê *Louis Hjelmslev* (1899-1965) e. Wî tevî *Hans Uldall* (1907-1957) rêbazeke nû ya bi navê *glossematic* bi pêş xistiye. Ew rêbaza navborî di pergala zimên de bala dikêşe ser têkiliya di navbera yekeyên zimanî de. Ev teorî ji teorîyên din ên zimanî razbertir e, di salên 1930î û 1960î de vê teorîyê bandoreke zêde li zimanzanîya danîmarkî kiriye. Li derveyî Danîmarkayê rêzimana erkî û teorîyên semîotîk ên li Fransayê di bin bandora teorîya glossematics de mane.

#### **1.2.4.4. Binyadgerîya Amerîkî**

Pêşengên zimanzanîya amerîkî kesên mîna *Franz Boas* (1885-1942), *Edward Sapir* (1884-1939) û *Leonard Bloomfield* (1887-1949) in. Di sedsala 19an de xebatên dîyakronîk ên zimanzanîya hevrûyî yên li ser zimanên ji malbata Hind-Ewropayê bandor li ser teveka zimanzanan kiribû. Lê belê di sedsala 20an de van xebatan cihê xwe ji zimanzanîya hevdemî (senkronîk) re hişt û berê xebata zimanzanên amerîkî jî kete aliyê zimanên xwecihî yên amerîkî. Bo nimûne armanca sereke ya *Boas* ev bû ku berî mirina van zimanan agahîyên pêwîst der barê wan de berhev bike û binyad û dirûvê van zimanan destnîşan bike. Rêbaza ku *Boas* û şagirtên wî der barê vekolan û dahûrandina van zimanan de bi kar anîn, bîngeha zimanzanîya binyadgerî ya amerîkî

pêk anî. *Boas* tevî şagirtên xwe li ser wê bawerîyê bû ku divê her ziman li gorî forma xwe, bi têgihên xwe yên xweser werin ravekirin, divê mirov hemû zimanan nexe qalibê zimanên Hind-Ewropayî.

Li gorî bawerîya binyadgerên amerîkî her ziman bi awayekî derûnî girêdayî awayê jiyane û bîr û ramanên axêver bi xwe ye. Bi vê bawerîyê jî cara pêşîn binyadgerên amerîkî bal kişand ser têkilîya çand û ziman. *Franz Boas* bi xebata xwe ya bi navê *Race, Language and Culture* (Ziman, Regez û Çand) [1940] bal kişandiye ser vê têkilîyê. Kesên ku herî zêde di vî warî de xebitîn û nav û deng dan zimanzanên mîna *Edward Sapir* (1884-1939), *Leonard Bloomfield* (1887-1949) in.

Li gorî *Sapir*, ziman anku reftara zimanî her wekî huner, ahengên ayînî, reftara civakî, pergaleke ji hêmayan hevedudanî ye. *E. Sapir* tevî *B. L. Worf* diangaşt ku “têkilîyeke taybet di navbera ziman û ramanê de heye, heke mirov bala xwe bide zimanê civakekê, mirov dikare der barê awayê hizirîna wan de hinek daneyan bi dest bixe. Li hêla din *L. Bloomfield* ziman wekî reftareke bingeşîn pênase kiriye, alîyê wateyî yê zimên ji qada lêkolînî veder kiriye. Wî xwestîye ku ziman jî wekî hemû reftarên mayî, di çarçoveya tek û bertekê de were vekolan û nirxandin” (Rifat, 1990:44).

### 1.2.5. Zimanzaniya Nû

Di sedsala bîstan de zimanzanî li ser du bingeşan bi pêş ket; form û fonksîyon. Di zimanzaniya formî de piştî hinek xebatên li ser şopa *Bloomfield* ku giranî didan ser hevoksazîyê, di 1957an de bi xebata *Syntactic Structures* (Sazûmanên Hevoksazîyê) ya Noam Chomsky rewş guherî û bandora Chomsky û peyrevên wî di qadê de diyarker bû. Li gorî ramana Chomsky “rêziman pergaleke sînordar e ku mirov dikare pê hejmareke bêsînor a hevokên zimanekî pêk bîne” (M. Rifat, 1990, 63).

Bi vê mekanîzmayê hevokên rêzimanî yên zimanekî dihatin hilberandin, ji ber vê yekê jî ji tradîsyonê re *generative grammar* (rêzimana hilberînî) hat gotin. Ramana teorîya hilberînî di nava çend dehsalan de bi lez û bez pêş ket, nûbûnên berbiçav li xwe wergirtin. Li gel ramanên chomskyparêziya navendî, hindêk ramanên



alternatîf ên teorîya rêzimana hilberînî jî pêk hatin, her wekî watenasîya hilberînî, rêzimana erkî ya ferhengî, rêzimana binyadî ya komeka giştîgir (generalized phrase structure grammar) û hwd.

### **1.2.6. Zimanzanîya Erkî**

Li Ewropayê di salên 1950î de li ser bingeha dibistana Pragê û xebatên *Firth* zimanzanîyeke nû pêş ket. Ev pêşketin jî bi şerkêşîya *Andre Martinet* (1908-1999) û *Micheal Halliday* de di bin navê zimanzanîya erkî (functional linguistics) pêk hat. Li gorî *Martinet* (1998), ziman ew berhemendîya mirov e ku mirov pê hest û ramanên xwe radigihînin hev û peywira sereka ya zimên pevgihandina hest û ramanan e.

Her wekî *Nurcan Delen Karaağaç* (2009) jî daye zanîn, zimanzanîya erkî hewl daye ku wekî navgîneke ragihandinê pêkhatina zimên analîz bike, anku têkilîya di navbera hemû yekeyên zimanî de li gorî rist û peywira ku ew di dema ragihandinê de pêk tînin rave û analîz bikin. Armanca vê teorîya zimanzanîyê diyarkirina cih û peywira hemû diyardeyên ragihandinî ye. Ravekirina erkî dixwaze taybetîyên zimanekî yê ku wî ji zimanên din cuda dike, destnîşan bike.

Ev lêkolîn û teorîyên der barê zimên de bandora xwe li warê rêzimanê jî kir û ew ji qalib û qalikê berê derxistin. Li gorî wê jî reng û naveroka xebatên rêzimanî jî guherî, çarçoveya xebatên rêzimanî berfirehtir bû. Em jî piştî van agahîyên gelemperî yê der barê zimanzanîyê de hinekî bala xwe bidin ser rave û pênasekirina rêzimanê ji ber ku armanca vê lêkolînê analîzeke zimanzanî û rêzimanî ya du xebatên destpêkî yê rêzimana kurmancîyê ye.

### **1.3. CIHÊ KURDÎ DI NAV ZIMANÊN CÎHANÊ DE**

Zimanê kurdî li Rojhilata Navîn piştî erebî, farisî û tirkî, zimanê mezintirîn koma zimanî ye. Her wekî David McDowall (2007) daye xuyakirin kurd zêdetirî du hezar sal in hene, lê di destpêka sedsala 20an de tevî gelên din ên mîna tirk û ereban wekî civakekê xwe nîşan daye. Li gorî Öpengîn û Haig (2014) kurdî têgiheke sîwanî ya komeke ziman û zaravayên bakurê rojavayê îranê ye ku li Rojavayê Îranê, bakurê

Iraqê, Rojhilatê Tirkiye û Suriyeyê girseyeke di navbera 25-30 milyon kes pê dipeyivin.

Li alfyê din di Ansîklopedîya Îslamê de kurdî bi vî rengî hatiye pênasekirin: “Kurdî ji malbata Hind-Ewropayê, ji baskê zimanê bakurê rojavayê Îranê ye” (Adak, 2015: 17). Jaffer Sheyholislami di gotara xwe ya bi navê *The Language Varieties of Kurdish* (Guhartoyên Zimanê Kurdî) de zimanê kurdî wiha pênase kiriye: “Kurdî zimanekî bakurê rojavayê îranê ye. Ew jî baskekî malbata hind-îranî ye ku şaxeke mezintirîn malbata zimanî ya li ser rûyê cîhanê, anku malbata hind-ewropî ye” (Sheyholislami, 2015: 31).

Dema ku mirov bala xwe bide hinek peyvên hevpar ên ji çend zimanên hind-ewropî, mirov xizmantiya zimanê kurdî bi van zimanan re bi awayekî zelal dibîne.

<i>Kurdî</i>	<i>Îngilizî</i>	<i>Almanî</i>	<i>Fransî</i>
stêr	star	stern	astre
nû	Ne"w	nue	nouveau
nav	name	name	nom
dot	doughter	tochter	fille
bira	brother	bruther	frère
dilop	drop	tropfen	goutte
neh	nine	neun	neuf
hêk	egg	ei	oeuf

(Tan, 2015:23).

### 1.3.1. Zimanên Îranî û Kurdî

Kurdî, ji milê hîndî di nava malbata zimanên îranî de cih digire. Zimanên mîna farisî, peştûyî û belûcî xizmên kurdî ne. Abdurrahman Adak (2015) dîroka zimanên îranî li ser sê qonaxan dabeş dike; qonaxa dawîn piştî îslamê dest pê dike. Qonaxa navîn ji berî mîladê di sedsala sêyem de dest pê dike, heta berî mîladê 2000î diçe. Di serdema navîn de zimanên îranîyên sereke; partî (B.Z 200- P.Z 220) û farisîya navîn (220-650) in. Li gorî Adak kurdî ji zimanên serdema navîn nêzî

zimanê partî ye. Her wiha ji bo qonaxa destpêkê jî ew zimanê kurdî digihîne zimanê medî (B.Z 700- B.Z. 500).

John Limbert di gotara xwe ya bi navê *The Origin and Appearance of The Kurds in Pre- Islamic Iran* (Li Îrana Berî Îslamê Pêkhatin û Diyarbûna Kurdan) de der barê têkiliya kurdan û medan de wiha gotiye: “Her çiqas hinek zanyar angaştî xizmantîya kurd û medan nepejirînin jî daneyên zimanî û erdnîgarî palpiştîya vê xizmantîyê dikin. Tevî belawelabûna hozên kurd li herêmeke berfireh jî hemû zaravayên kurdî taybetîyên sereke yên xwe

parastine. Ev yek jî nîşan dide ku serçavîyavan zaravayan zimanekî xurt ê qedîm e. Lewma jî reng e kurdî paşmayîya zimanê medî yan jî zimanekî piştî têkçûna împaratorîya Asûrî ya sala 612an (B.Z) be. Ji alîyê erdnîgarîyê ve jî rewşeke balkêş heye, lewre li gorî Herodutus sînorên rojava yên împaratorîya Medan çemê Kizilirmak e ku niha jî sînorên kurdan ê li rojava dîsa ev çem e” (Limbert, 1968:45).

Limbert di heman gotara xwe de balê dikêşe ser destxeteke ermenkî ya ku ji sedsala 15an maye û li gorî baweriya wî ji ber belgeyê qedîmtir hatiye wergirtin, der barê vê mijarê de ev tişt hatine gotin: “Di vê belgeyê de bi heft zimanan duayeke ola îsewî heye, yek ji van zimanan wekî zimanê medî hatiye binavkirin, ew dua bi zaravayekî bakurê îranê ye ku gelekî nêzî kurdîya bakur (kurmancî) e” (Limbert, 1968:45).

D.N. MacKenzie (1959) jî di gotareke xwe de qala wê belgeyê dike. Ew ji nivîsa Prof. H. W. Bailey heman duaya bi çend zimanan vediguhêze, yek ji van zimanan jî medî ye. Duaya navborî bi vî rengî ye:

**“Bi farisî:**

\* *Pāk-ī xudā, pāk-ī tavānā, pāk-ī bē marg, avar xāch \$usī bahr-ī mā, rahmat kun "var mā.*

**Bi erebî:**

\* *Quddūs allāh, quddūs al-qādir, quddūs mā-yixdūh [ya'xuduhu]-al-mawt, alladī insalab, irhmnā.*

**Bi tirkî:**

\* *Arî tangrî, arî güçlü, arî aîalsîz, yîsa kî xaça çîgtîng, rahmât qîlyîl bizâ.*

**Bi medî:**

\* *Păkiž xudê, păkiž zahm, păkiž vēmarg, kōy hātî xāçê îž kir ma, řahmatê ma.*

**Bi alfabeya kurdî:**

“*Pakij xûdê, pakij zehm, pakij vêmerg, ko hatî xaçê, ij kirme, rehmetê me.*”

**Bi kurmanciya îro:**

*Paqij xwedê, paqij zexm, ku hatî xaçê, rehmet bike li me.*” (Tan, 2015:23).

Ji bo zelalkirina têkilîya kurdî û partî jî em dikarin ji nivîsa Agnes Korn û Carina Jahani ya bi sernavê *Grammaticalisation In The Verb System in Iranian* (Rêzimanîbûn di Pergala Lêkerên Îranî de) hevokeke ji zimanê partî û kurdîya wê pêşkêş bikin:

**Partî:** *azhişthêmsêwag (ez hişt hêm sêwag)*


**Kurdî:** *ez hiştîm sêwî*” (Korn & Jahani, 2015:2).

Ji bilî vê mînakê jî em dikarin bi hevrûkirina van çend peyvan xizmantîya kurdî û partî dest nîşan bikin:

Partî	Kurdî
azem	ez
zamad	zava
zan	zanîn
zird	zere
angaw	hengaw
gandag	gend

(Mahamadi, 1996: 66-69)

Ahangar, Oostendorp û Soohanizimanên îranî wiha dabeş kirine:



(Ahangar, Oostendorp, Soohani, 2013:121)

### 1.3.2. Têkilîya Kurdî û Farisî

Wekî ku ji tabloya jorîn xuya dike wekî zimanên nûjen jî zimanên mîna farisî, belûçî û peştûyî xizmên zimanê kurdî ne. Ji van zimanan, farisî di nav zimanên îranî de bi wêje û çanda xwe derketiye pêş. Ji ber vê yekê, her wekî Mc Dowall (2007) jî bal kişandiye ser, hinek kesan xwestiye ku zimanê kurdî wekî lehçeyeke zimanê farisî nîşan bidin, lê zimanzanên mîna Minorsky (1988) diyar dikin ku zimanê kurdî digel xizmantiya xwe ya bi zimanê farisî re jî zimanekî serbixwe ye. Minorsky her du ziman wekî du zimanên serbixwe destnîşan kirine û di asta fonetîk, morfolojîk û sentanksê de bal kişandiye sercudatîya her du zimananû di warê fonetîkê de ev mînak dane:

Kurdî	Farisî
zird	dil
agir	azar
masî	mahî
nivêj	namaz

(Minorsky, 1988:73).

Dabeşkirina zimanên îranî li gorî dabeşbûna cografîk pêk tê. Zimanên bakur û başûrê rojavayê îranê li gorî fonetîka dîrokî ji hev cuda dibin. Gelek zimanzan mîna balê dikêşin ser vê guherîna dengên a birêkûpêk, bo nimûne MacKenzie (1961) di gotara xwe ya bi navê *The Origin of Kurdish* (Resenîya Kurdî) de di vî warî ev mînak dane:

**Mînak:**

*M < V/W*

**Kurdî**                      **Avestayî**

*nav/naw*                      *naman*

*havîn /hawîn*              *hamîna*

*dû(v)*                          *dûma*

**Kurdî**                          **Farisî**

*kevan/kewan*              *keman*

*K > X*

**Kurdî**                          **Farisî**

*ker*                              *xer*

*kenîn*                          *xendîden*

**Kurdî**                          **Avestayî**

*kanî*                            *xan*

(MacKenzie, 1961: 70-71).

Her wiha Alexander Johannes Edmonds di gotara xwe ya bi navê *The Dialects of Kurdish* (Zaravayên Kurdî) de der barê zimanê kurdî de wiha gotiye: “Kurdî zimanekî Hind-Ewropî ye, mirov hê bi zelalî bibêje yek ji zimanê bakurê rojavayê îranê ye. Zimanekî nêzikî farisî ye, lê her wekî hinekan berê îdia dikir ne zaravayekî wî zimanî ye.” (Edmonds, 2012:2).

Ji bo mijar zelaltir bibe, em ê pêşî tabloya Agnes Korn (2014) a der barê îsoglosên zimanên rojavayê îranî de pêşkêş bikin û piştre jî bi nimûneyan cudatîyên kurdî û farisî destnîşan bikin.

Îraniya pêşîn	Avestayî	Partî	Zazakî	Belocî	Kurdî	Farisiya Nû	Farisiya Navîn	Farisiya Qedim
*ś	s	s	s	s	s	h	h	ð
*ž	z	z	z	z	z	d	d	d
*pas-ča "behind"	pas-ča	paš	?	paš	paš	pas	pas	pasā
*śu	sp	sp	sp	s(?)	s(?)	s	s	s
*ðr	ðr	hr	(h)r	s	s	s	s	ç
*č /V_V	č	ž	ĵ	č	ž	z	z	č
*ĵ	ĵ	ž	ĵ	ĵ	ž	z	z	ĵ
*rž	rz	rz	rz	rz	?	l	l	rd
*rd	rd	rd	ř	rd	?	l	l	rd
*du	duu	b	b	b(?)	d	d	d	duv
*hu-	x <sup>w</sup>	wx	w	w, h	xw	x <sup>w</sup>	xw	uv
*ðu	ðβ	f	w	h?	h?	h	h	ðuv
*u-	v	w	v	g(w)	b	g, b	g, w	g, d

Tabloya isoglosên zimanên rojavayê îranê di serdemên kevnare, navîn û nû de (Agnes Korn)

Dema ku em bala xwe didin vê tabloyê ji aliyê guherîna dengan ve nêzî partî ye. Di kêm dengan de kurdî nêzî farisîya navîn û û kevnare dibe.

### Rêzîleya Guherîna Dengan a Kurdî û Farisî

#### V/B

Kurdî	Farisî
şev/şew	şeb
bav/baw	bab
tav/hetaw	tab
xew	xab

#### J/Z

Kurdî	Farisî
jehr	zehr
roj, roz, roc	roz
jîn, cenî	zen
jîn, ciwiyayîn	zîndegî

Di vê mijarê de kirmanckî ji kurmancî û farisî cuda dibe.

**S/H:**

<i><b>Kurdî</b></i>	<i><b>Farisî</b></i>
<i>masî</i>	<i>mahî</i>
<i>asin</i>	<i>ahen</i>
<i>ask</i>	<i>ahû</i>

**V/(Ş)M**

<i><b>Kurdî</b></i>	<i><b>Farisî</b></i>	
<i>Çav/çaw/ çim</i>	<i>çeşm</i>	
<i>zava</i>	<i>damad</i>	
<i>nav/ naw/ nam</i>	<i>nam</i>	

Di vî warî de kirmanckî nêzî zimanê farisî dibe.

**Z/D**

<i><b>Kurdî</b></i>	<i><b>Farisî</b></i>
<i>zava/ zama</i>	<i>damad</i>
<i>zanistin</i>	<i>danisten</i>
<i>zerya</i>	<i>derya</i>

**K/X**

<i><b>Kurdî</b></i>	<i><b>Farisî</b></i>
<i>ker</i>	<i>xer</i>
<i>kenîn</i>	<i>xenden</i>
<i>kirîn</i>	<i>xerîden</i>

(Tan, 2015:27-28).



### 1.3.3. Zaravayên Kurdî

Zaravayên kurdî serê pêşîn ji hêla Şerefxanê Bedlîsî ve di pirtûka bi navê *Şerefname* de hatine destnîşankirin. Şerefxan di vî warî de wiha gotiye: “Hozên kurd çar qism in û ziman û wêjeya wan ji hev cuda ye: Ewel kurmanc, duyem lor, sêyem kelhur, çarem goran” (Bedlîsî, 2007: 101).

Piştî Şerefxanê Bedlîsî jî gelek kesan mijara zaravayên zimanê kurdî hildaye dest. Bo nimûne di *Ansîklopedîya Îslamê* de zaravayên kurdî wiha hatine dabeşkirin: “Baskê kurmancî di nav xwe de dibe du beş; kurmancîya jorîn û kurmancîya jêrîn; lê belê îro ji kurmancî bi tenê kurmancîya jorîn tê fehmkirin, ji kurmancîya jêrîn re soranî tê gotin. Baskê duyemîn ê kurdî goranî ye. Ev bask jî îro tevî zazakî, wekî goranî-zazakî tê binavkirin. Baskê sêyemîn ê kurdî jî lûrî ye, di nava lûrî de devokên mîna kirmaşanî, bextîyarî, xaneqînî, mendelewî, feylî, lekî, kelhûrî, mamesanî hene” (Adak: 2015:17).

Jaffer Sheyholislami der barê zaravayên kurdî de ev agahî dane: “Kurdî wekî zimanekî makro bi kêmanî ji pênc komezaravayan pêk tê: Kurdîya bakur (kurmancî), kurdîya naverast (soranî), kurdîya başûr (kirmaşanî, feylî, kelhûrî), zazakî û goranî/hewramî” (Sheyholislami, 2015:30).

Digel hinek arîşeyan jî îro kurdî bi gelemperî wekî pênc zarava tê dabeşkirin. Lê her zarava xwediyê çend jêrzavarayan e. Zaravayên sereke yên kurdî ev in:

1-Kurmanciya jorîn anku kurdîya bakur mezintirîn zaravayê kurdî ye.

2- Kurmanciya naverast wekî soranî jî tê binavkirin û bi tenê beşek ji kurdên Îran û Iraqê pê dipeyivin.

3- Kurdîya başûr wekî pehlewani, kirmaşanî jî tê binavkirin, ew jî wekî soranî bi tenê li Iraq û Îranê tê bikaranîn.

4- Goranî/ Hewramî: Gelek zimanzanên Rojava goranî/hewramî ji kurdî cuda dikin. Lê belê lêkolînerên kurd bi gelemperî lihevkerî ne ku piraniya axêverên vî zaravayî xwe wekî kurd dibînin.

5- Kirmanckî wekî zazakî, dimilî, kirdkî jî tê binavkirin. Ew jî wekî goranî/hewramî ji hêla gelek zimanzanan (MacKenzie; Korn; Edmond û hwd.) ve ku piraniya wan ewropî ne, wekî zimanekî cuda hatiye destnîşankirin. Lê belê her wekî Sheyholislami (2015) jî daye xuyakirin, ji bilî hinek xwendeyên zazakî, piraniya axêverên kirmanckî (2-3 milyon) bêyî ku guh bidinê ka hinekên din zimanê wan çawa bi nav dikin, xwe wekî kurd dibînin û zimanê xwe jî wekî parçeyekî zimanê kurdî dibînin.

Ji bo ku di warê zaravayên kurdî de zelalîyek çêbe, em ê pêşî hinek guherînên dengan ên rêzîkî tevî çend mînakên pêşkêş bikin û piştê jî dubeytiyeke Baba Tahir bi pênc zaravayên kurdî bidin.

### 1.3.3.1. Rêzîleya Guherîna Dengan di nav Zaravayên Kurdî de

Mirov dikare di zaravayên kurdî de hin guherînên dengan ên rêzîkî wiha rêz bike:

#### V - W

Kurmancî	Kirmanckî	Soranî
şev	şew	şew
av	aw	aw
şivan	şiwane	şivan
gavan	gawan	gawan

Di vî warî de zaravayên kurdî bi tevekî ji zimanên başûrê rojavayî cuda dibin, taybetîyên zimanên bakurê rojavayê Îranê nîşan didin.

#### B - V

Kurmancî	Kirmanckî	Soranî
ba	va	ba
baran	varan	baran
berf, befir	vewr	befir

bîst	vîst	bîst
bîr	vîr	bîr

Di vî warî de zaravayê kirmanckî ji zaravayên din cuda dibe. Her wekî diyar e kurmanckî û soranî di vê îsoglosê de nêzî zimanên başûrê rojavayî dibin, lê belê kirmanckî taybetîyê zimanên bakurê rojavayê Îranê diparêze.

#### M- V/ W

Kurmanckî	Kirmanckî	Soranî
çav	çim	çaw
gav	gam	hengaw
nav	name	naw
ev	eno/ ena/ enê	eme

#### XW / W

Kurmanckî	Kirmanckî	Goranî	Soranî
xweş	weş	weş	xoş
xwendin	wendene	wanden	xwendin
xwarin	werdene	warden	xwardin

(Tan, 2015:30-31).

### 1.3.3.2. Deqek ji bo Hevrûkirina Zaravayên Kurdî

Dubeytiya Baba Tahirê Hemedanî ku di sedsala 11'an de bi zaravayê lûrî hatiye nivîsandin, bi her pênc zaravayên kurdî:

#### *Lûrî*

*Mû an espîde baz em Hemedanî*

*Lane der kuh darem der nîhanî*

*Be balî xûd perem kûhan be kûhan*

*Be çengî xûd kerem nexçîrebanî*

### **Soranî**

*Emin ew spî bazem Hemedanî  
Ke hêlanem le kêwe le nîhanî  
Be balî xom îdî difîrrim keja û kej  
Be çingî xom dekem nêçîrwanî*

### **Goranî**

*Min helûy sefîd Hemedanî  
Lanem na ce kû kes pey nezanam  
Keşa û keş yek ser megîlû we bal  
Be çeng neçîran mewzûne we dam*

### **Kirmanckî**

*Ez eno spîbaz a Hemedanij  
Alînê mi ko cayê nimate der o  
Ez bi baskê xo perîna ko bi ko  
Bi çengê xo kena neçîrwanî*

### **Kurmancî**

*Ez ew spîbaz im Hemedanî  
Hêlîna min li çiya li cihê nehênî  
Bi baskên xwe difîrim çiya bi çiya  
Bi çengê xwe dikim nêçîrwanî (Yıldırım, 2013:239)*

## **1.4. RÊZIMANA KURMANCÎ**

Her wekî ji wateya peyvê jî xuya ye, rêziman rêz û rêçikên zimên nîşanî mirov dide. Rêziman, lêkolîn û lêhûrbûna li ser rêz û rêçikên zimanekî xwezayî ye. Deng, kîte, peyv, komek û hevok li gorî hinek rêz û rêzikan pêk hatine; rêziman van rêz û rêçikan nîşanî mirov dide.

Her wekî David Crystal (2008) daye xuyakirin, di rêzimana kevnare de bi tenê kategoriyên rêzimanî yên têkildarî morfolojî û sentaksê dibûn mijara lêkolîn û lêhûrbûnê. Berê dema ku rêziman dihat gotin, bi tenê warên mîna peyvsazî (morfolojî) û hevoksaziyê (sentaks) dihatin bîra mirovan. Lê îro bergeha rêzimanê

firehtir bûye, qadên zimanzanîyê yêna mîna dengnasî (fonetîk), dengzanî (fonolojî), rastnivîsîn (ortografî), watenasî (semantîk), kirdarînasî (pragmatîks) ketine nava qada rêzimanê.

Li gorî van pîvanan, bavê zimanzanîya nûjen *Ferdinand de Saussure* (1959), rêziman wekî pergaleke amûrên derbirîne ya lêkolîna zimên pêname kiriye. Li gorî wî rêzimana rastîn ewa hevdemî (senkronîk) ye.

Ferhenga bi navê *Dictionary of Language and Linguistics* (Ferhenga Ziman û Zimanzanîyê) rêziman wiha rave kiriye: “Rêziman pêzanîn û lêkolîna li ser rêzikên peyvsazî, hevoksazî yêna zimanekî surîştî ye. Di vê pênamekirina kevneşopî de beşên mîna fonetîk, fonolojî û semantîk li derveyî qada rêzimanê dimînin” (Bussman, 2006:482).

Di ferhenga bi navê *Dictionary of English Grammar* de rêziman wekî “teveka pergala zimanekî ye ku hevoksazî, peyvsazî, watenasî û denganiya wî zimanî digire nava xwe” (Chalker & Weiner, 2003:177).

“Rêziman agahî û pêzanînen axêverên zimanekîne ku wan der barê zimanê xwe debi awayî surîştî, jixweber û bêhemdî wergirtine. Ev rêziman, *yeke şayesî* (descriptive) ye. Ev agahî û pêzanîn jî dengsazî (rêzikên pevgihaştina dengan ên ji bo pêkanîna peyvan), peyvsazî (rêzikên ku pêkhatina hundirîn ên peyvan diyar dikin), hevoksazî (rêzikên ku bi pevgihaştina peyvan ji bo pêkanîna komek û hevokan) û watenasîyê (rêzikên diyarkirina wateya peyvan) digire nava xwe” (Özsoy û Balcı û Turan, 2012: 10).

Di pirtûka *Genele Dibilim-I* (Zimanzanîya Giştî-I) de ji bilî *rêzimana şayesî*, qala *rêzimana rêzikparêz* û *rêzimana fêrkerî* jî hatiye kirin. Li gorî ravekirina vê pirtûkê, rêzimana rêzikparêz, danîn û parastina rêzikên zimanî û zimanekî li gorî van rêzikan bingeh digire. Alîgirên vê rêzimanê, diyar dikin ku hinek form û rêzikên ku ketine zimên çewt in, hinek jî rast in. Ew dixwazin ku form û rêzikên *çewt* ji zimanê nivîskî bîna vederkirin. Herçî rêzimana fêrkerî ye, wan pirtûk û berhemên rêzimanî digire nava xwe; ewên ku bi armanca fêrkerîne hatine nivîsandin.

Gelo zimanzan û rêzimanzanên kurd rêziman çawa pênase kiriye? Mîr Celadet Bedirxan di kovara Hawarê de rêziman wiha pênase kiriye: “Bi kurtî gramêr tevayîya qeydeyên rastaxaftin û rastnivîsandina zmên e. Ev qeyde bi xwe ji zmên têne der. Belê herkes bi zmanê xwe ê mader bêî ko bide eqlê xwe rast daxêve. Ev rastî bi hin qeydan têtê pê û mirov di dema xeberdanê de bêî ko bizane bi wan ve diçe. Gramêrzan li van qeydan hûr dibin van ji hev derdixînin û disenifinin. Tevayîya van qeydan gramêr bi xwe ye.” (Hawar, Cild.2, R. 688)

Li aliyê din, Reşîdê Kurd di berhema xwe ya bi navê *Rêzimana Kurdî* de rêziman wiha rave kiriye: “Rêziman zanîna peyve û nivîsandinê ye. Ziman li ser hin awa û rêzanan ava ye. Bi rêya van rêzanan, rêziman pêş me dike. Lewra jê re rêzana peyv û nivîsandina durist jî têtê gotin” (R. Kurd, 1996:10).

#### **1.4.1. Fonetîka Kurmancîyê**

Her wekî têtê zanîn danganî di nava xwe de li ser du beşên bingehîn; dengsazî û dengzanî şax vedide. Di beşa dengsazîyê de zimanzan ji sê alîyan ve bala xwe didin dengên zimanî;

1- **Pêkanîn:** Di rêgeha dengî de awayê pêkhatina dangan rave dike.

2- **Akûstîk:** Kesên di vî warî de dixebitin bala xwe didin pêlên dengî yê ku ji devê mirov derdikevin û heta ku ew digihêjin kerika guhên mirov, rêya ku digirin.

3- **Têgihan:** Ev beş jî wergirtin û têgihastina pêlên dangan ji xwe re dike mijar.

Di xebatên rêzimanî de bi gelemperî cîderk û awayê pêkhatina dangan dibe mijar. Di xebatên rêzimanîya nû de dengên bingehîn ên zimanekî destnîşan dikin û ji aliyê cîderk û awayê pêkhatinê ve wan rave û şîrove dikin.

Li aliyê din di her zimanî de pergaleke dangan a xweserî wî zimanî heye. Binbeşa zanista danganîyê ya bi navê *dengzanî* (fonolojî) bala xwe dide wê yekê ka di zimanekî de kîjan deng hene (kîjan dengên bingehîn in, kîjan rengedeng in), ew deng çawa rêz dibin, çawa û li gorî kîjan rêzikan diguherin.

Xebatên der barê rêzimana kurmancîyê de hewl dane dengên bingehîn ên kurdî destnîşan bikin. Bo nimûne, Celadet Bedirxan di Hawarê de 31 dengên bingehîn ên kurdî destnîşan kirine û alfabeya xwe ya kurdî li gorî wê durist kiriye. Di pirtûka rêzimana kurmancîyê ya Roger Lescot û Celadet Bedirxanî (2001) de dengên bingehîn ên kurdî wiha hatine destnîşan kirin:

DIRÊJ			KURT	
	<i>Pêşderkî</i>	<i>paşderkî</i>	<i>pêşderkî</i>	<i>paşderkî</i>
<b>Bilind</b>	î	û		î, u
<b>Navincî</b>	ê			
<b>Nizim</b>		a, o	e	

(Lescot&Bedirxan, 2001: 8)

Di heman berhemê de nedengdêr (dengdar) ên kurmancîyê jî wiha hatine destnîşankirin:

“**Lêvî:** p (bêjen); b (bijen); f (bêjen, fîzekî); v (bijen- fîzekî); m (difnî- girtî); w (dulêvî – bijena domdar).

**Diranî:** t (bêjen - girtî); d (bijen-girtî); s (bêjen -fîzekî); z (bijen - fîzekî); r (herikokî- lerezokî); l (herikokî - rexkî); n (girtî - difnî).

**Pêşesmandevî:** ç (xişokî, nîvgirtî), c (bijen- xişokî- nîvgirtî); ş (bêjen- fîzekî); j (bijen- fîzekî); y (nîvdengdêr)

**Esmandevî û qirikî:** k (bêjen -girtî); g (bijen - girtî); q (bêjen -girtî); x (bêjen- domdar), ç (bijen - domdar)” (Lescot&Bedirxan, 2001:16-17).

W. M. Thackston dengên kurdî wiha dabeş kirine:

Dengdêr		
Tîp	IPA	Mînak
î	[i]	nîv [niv]
î	[I]	dîl [dIl]
ê	[e]	hêz [hez]

e	æ	berhem [bærhæm]
û	[u]	bûn [bun]
u	[ʊ]	du [dʊ]
o	[o]	nod [nod]

Nedengdêr	<i>dulêvî</i>	<i>diranlêvî</i>	<i>diranî/ pidûyî</i>	<i>esmandevî</i>	<i>paşesmandevî</i>	<i>zimanokî</i>	<i>qirikî</i>
<i>peqokî</i>	p, p̣ b		t, ṭ d		k, ḳ g	q	
<i>fîzekî</i>		f v	s z ş j	ç, ç̣ c	x x̣		h, ḥ '(eyn)
<i>dîfnî</i>	m		n				
<i>nîvdengdêr</i>	w			y			
<i>lerzokî</i>			r, ṛ				
<i>rexkî</i>			l				

(Thackston, 2006:1-2).

Di xebata me ya bi navê “*Rêzimana Kurmancî*” de dengên bingehîn ên kurmancîyê wiha hatine destnîşankirin:

<b><i>Dengên Kurdî bi Alfabeya Navneteweyî ya Fonetîk (IPA)</i></b>			
<b><i>Tîpen kurdî</i></b>	<b><i>IPA</i></b>	<b><i>Mînak (kurdî)</i></b>	<b><i>Mînak (IPA)</i></b>
a	[a]	bav	[bav]
b	[b]	ber	[bar]
c	[dʒ]	cih	[dʒih]
ç	[tʃ <sup>h</sup> ]	çar	[tʃ <sup>h</sup> ar]
ç	[tʃ <sup>s</sup> ]	çav	[tʃ <sup>s</sup> av]
d	[d]	dar	[dar]
e	[ɜ]	berhem	[bɜrhɜm]
ê	[ə]	hêz	[həz]



f	[f]	find	[fɪnd]
g	[g]	gul	[gœl]
h	[h]	havîn	[havin]
i	[ɪ]	dil	[dɪl]
î	[i]	nîv	[niv]
j	[ʒ]	jar	[ʒɑr]
k	[k <sup>h</sup> ]	kurd	[k <sup>h</sup> œrd]
k	[k <sup>ç</sup> ]	kur	[k <sup>ç</sup> œr]
l	[l]	lêv	[ləv]
m	[m]	mar	[mar]
n	[n]	nav	[nav]
o	[o]	nod	[nod]
p	[p <sup>h</sup> ]	pir	[p <sup>h</sup> ɪr]
p	[p <sup>ç</sup> ]	pênc	[p <sup>ç</sup> œndʒ]
q	[q]	qad	[qad]
r	[r]	kirin	[k <sup>ç</sup> ɪrɪn]
r	[r]	kirîn	[k <sup>h</sup> ɪrɪn]
s	[s]	sêv	[sœv]
ş	[ʃ]	şîr	[ʃɪr]
t	[t <sup>h</sup> ]	tev	[t <sup>h</sup> œv]
t	[t <sup>ç</sup> ]	tarî	[t <sup>ç</sup> ɑrɪ]
u	[œ]	du	[dœ]
û	[u]	bûn	[bun]
v	[v]	tav	[t <sup>ç</sup> œv]
w	[w]	wan	[wan]
x	[x]	xanî	[xani]
x	[χ]	xar	[χɑr]
y	[j]	yek	[jɜk <sup>ç</sup> ]
z	[z]	zêr	[zœr]

(Tan, 2015:34).

### 1.4.2. Morfolojîya Kurmancîyê

Her wekî Ozsoy, Balci û Turan (2012) jî daye xuyakirin, morfolojî balê dikêşe ser peyvvan, pê re jî teşe û pêkhatina wan, dabeşkirin û senifandina wan, pêvajoyê û qewimînên hizirî yên ku rêzik û rêgezên pêkhatin û dariştina peyvvan bi rê ve dibin, dike mijara lêkolîn û lêhûrbûnê. Di morfolojîyê de hêmana herî biçûk morfhem e.

Di her zimanekî de tevnek û honakeke hundirîn a peyvê heye, peyv dibe ku ji morfemekê yan jî ji çend morfeman pêk hatibe. Bo nimûne dema ku em dibêjin “dara gûzê” em qala du bêjeyên ferhengî (dar û gûz) dikin, lê belê ji aliyê morfolojîk ve di vê ravekê de çar morfem hene; dar (navdêr), -a (veqetandek), gûz (navdêr), -ê (qertafa tewangê). Lewma jî morfemek dibe ku bêjeyeke ferhengî (dar, gûz) yan jî bêjeyeke peywirî (-ê, -a) be. Bêjeyên peywirî jî dibe ku wekî/-a/ û /-ê/ girêdayî bin yan jî wekî /li/, /ji/, /û/yê serbixwe bin.

Her mirov bi awayekî jixweber di pêvajoya wergirtina zimanê zikmakî de hem dengrêzîya wî zimanî, hem jî awayê pêkhatina peyvvan jixweber werdigire. Dengrêzî awayê rêzbûna dangan nîşan dide. Hin awayên rêzbûna dangan di wî zimanî de peyv û morfemekê pêk tînin, hinek pêk naynin. Wekî mînak, dengên *a, l, k* di kurdî heke wekî *kla, alk, lka* rêz bibin tu wateyê nadin, lê belê heke wekî *kal, lak* rêz bibin wateyekê didin.

Wekî din jî, hin deng tînin ber hev, hinek nayên; bo nimûne di kurdî de du dengdêr nayên ber hev, dema ku hatin jî yan dengek ji wan dikeve, yan jî dengekî alîkar (y, w, h) dikeve navberê.

Di kurdîya kurmancî de ji aliyê pevysazîyê ve peyv du cure ne; xwerû û nexwerû, ewên nexwerû jî dibin sê cure; hevedudanî, pêkhatî û tevlihev. Mijareke din a tîkildarî morfolojîyê qertaf in, ew jî dibin du cure; qertafên kêşanê û qertafên dariştina peyvvan.

### 1.4.2.1. Qertafên Kêşanê yê Kurmancîyê

Qertafên kêşanê, wateyêke nû li peyvê bar nakin, bi tenê rewşa wê diguhêrin. Bi kurtasî qertafên kêşanê ev cure qertaf in ku tu wateyê li bêjeyan zêde nakin, li şûna wê, bêjeyan ji aliyê dem, kes, rawe, mêjer û zayendê ve tamam dikin. Qertafên kêşanê jî wekî qertafên bêjesaz du cure ne; hinek pêşgir in, hinek jî paşgir in.

#### 1.4.2.1.1. Qertafên Kêşanê yê Têkildarî Navdêr, Cînavk û

##### Rengdêran

Di kurmancîyê de beşên guhêrbar ên axaftinê (navdêr, cînavk, lêker) qertafên kêşanê digirin. Her wekî me di mijara *beşên axaftinê* de jî destnîşan kiriye, navdêr û cînavk qertafên tewangê, qertafên nenasîyê û qertafên bangnîşanê digirin. Bo nimûne navdêr û cînavk di kurdî de bi van çend dirûvan derdikevin pêşberî me.

	Xwerû / Binavkirî	Tewandî	Nebinavkirî	Nenavkirî û tewandî	Raveka binavkirî	Raveka nebinavkirî	Bangnîşanî
<b>Nêr</b>	heval ew	hevalî / hevêl ewî	hevalek yek	hevalekî yekî	hevalê qenc ewê qenc	hevalekî qenc yekî qenc	hevalo
<b>Mê</b>	heval ew	hevalê ewê	hevalek yek	hevalekê yekê	hevala qenc ewa qenc	hevaleke biçûk yeka biçûk	hevalê
<b>Pirhejmar</b>	heval ew	hevalan ewan	hevalin hin	hevalinan hinan	hevalên min	hevaline xweşik hinênxweşik	hevalino

Her wiha rengdêr jî qertafê payeyê digirin, her wekîbaş> baştir>baştirîn... Herçî lêker in ew jî qertafên kesandin, dem û raweyan digirin.

#### 1.4.2.1.2. Qertafên Kêşanê yê Kurmancîyê yê Têkildarî

##### Lêkerê

Qertafên têkildarî lêkerê, qertafên kêşana lêkerê ne. Di kurdî de lêker li ser du rehan (reha dema niha, reha dema borî) tê kêşanê, ew reh qertafên cur bi cur ên têkildarî dem û raweyan digirin. Em dikarin wan qertafan wiha rêz bikin:

1) *Qertafa dema niha /di-/:diçim, dikim, didim, dixwazim, dibêjim...*

2) *Qertafên raweya fermanî*

a) /bi-/ (pêşgira raweya fermanî)

b) Paşgirên raweya fermanî: /-e/ (yekhejmar):*biçe, bixwe, bide, bigire*; /-in/ (pirhejmar): *biçin, bixwin, bidin, bigirin*

3) *Cînavkên kesandinê (nîşaneyên kesandinê)*

a) /-im/, /-î/, /-e/, /-in/:*dikim, dikî, dike, dikin, dikin, dikin.*

4) *Qertafên demên borî*

a) Qertafên dema boriya dûdar /-iye/ (yekhejmar), /-e/ pirhejmar:*hatîye / hatine, gotîye / gotine, xwestîye / xwestine, dîtîye / dîtine, kirîye/ kirine...*

b) /di-/ dema boriya berdest (çîrokiya dema niha):*dihat, digot, dixwest, didît, dibir, dikir....*

5- *Qertafên raweya daxwazî*

a) /-a/ (paşgira raweya daxwazî)

b) /bi-/ (pêşgira raweyên merc û daxwaziyê):*bigota, bikira, bida, bista, bifirota, bixwesta...*

5- *Qertafên neyîniyê*

a) Qertafa neyîniyê ya raweya fermanî /me-/:*meke, meçe, mexwe, mede, megire, megirî....*

b) Qertafa neyîniyê ya dema niha /na-/:*nakim, naçim, nadim, naxwim, nagirim, nastînim...*

c) Qertafa neyîniyê ya dema bê /ne-/:*dê neke, dê neçe, dê neyê, dê negire, dê nestîne...*

d) Qertafa neyîniyê ya demên borî /ne-/:*neçû, nekir, nedîtibû, nedixwest...*

e) Qertafa neyîniyê ya hinek lêkerên awarte /ni-/:*nikarim, nizanî.*

### 1.4.2.2. Qertafên Bêjesaz

Qertafên bêjesaz dema têne pêşî yan jî paşîya peyvan, wateyeke nû didin wan. Hinek ji wan qertafan bi dawîya peyvê ve dibin, ji ber vê yekê ji wan re “paşgir” tê gotin. Hinek qertaf jî dikevin ber peyvan, ji wan re jî “pêşgir” tê gotin. Her wiha di kurmancîyê de navgir û navbergir jî hene.

#### 1.4.2.2.1. Pêşgirên Kurmancîyê

Pêşgir ew cure qertaf in ku têne ber peyvê û wateyeke nû li peyvê bar dikin. Pêşgir bi xwe ne xwediyê tu wateyê ne, yan jî wateya wan a bingehîn hatiye jibîrkirin. Hin caran jî digel ku wateya wan tê zanîn jî, ew qertaf bi karê pêşgîrekê radibe, lê bi xwe ne pêşgir e.

*/zir-/: zirbav, zirdiran, zirbira, zirgizêr, zirhinar, zirtilî...*

“Ev pêşgir di kurmancîyê de bi serê xwe wateyekê nade, lê belê di kirmanckî de di wateya vir û derew de tê bikaranîn. Jixwe ew pêşgir jî wateya “derewîn” dide peyvê” (Tan, 2015: 65)

*/man-/:* Ev pêşgir hin caran wekî “ma” û “mê” jî derdikeve pêşberî mirov, peyva mak anku dayik ji vir tê. Ev pêşgir jî têkildarî peyva mê ye, ku zayendê nîşan dide. Di kurmanciya nûjen de */mak/* jî hêdî hêdî rengê pêşgîrekê digire.

*Mînak: manga, manker, maker, makezagon, makeşar, makeşêr, makeziman, makurk, makmij, mêkew, mêkund...*

Her wiha rayeka dema niha ya hinek lêkerên xwerû morfemeke nû pêk tînin, ew morfem hin caran dibin qertaf bi peyvekê yan jî bi qertafekê dibin û peyveke nû pêk tînin.

*Mînak: tîravêj, dûrbîn, dengbêj, barkêş, hînker, hilgir...*

#### Pêşgirên Lêkersaz

*/ra-/: rabûn, rakirin, raxistin, raborîn, ragirtin, ragihandin, raguhastin, raspartin, rakêşan, raçandin, radan, rahiştin, rahejandin, raketin...*

*/da-/: dadan, daketin, dagirtin, daxistin, dawêşandin, dabestan, daborîn, daqurtandin, dabirîn, dahatin, dahanîn, dagerîn, dakişîn, dawêşandin...*

*/hil-/: hilgirtin, hildan, hilanîn, hilhatin, hilsengandin, hilpekandin, hilavêtin, hilavistin, hilberandin, hilbestîn, hîlbûn, hilkirin, hîlbijartin, hîlborîn, hîlciniqîn, hîlçinîn, hîlçûn, hîlfirîn, hilkeftin, hîlgavtin, hilgerîn, hilhiştin, hilkelîn, hilkulîn, hilkutan, hilpişkîn, hilweşandin, hilkişîn...*

*/ve-/: vebûn, vekirin, vedan, vegirtin, vegerandin, vexwendin, vegotin, veşartin, vehiştin, veman, vemalan, veşûştin, vekêşan, veguhastin, veguherîn, vehatin, vehewandin, vehesan, vehûnan, veçirandin, vejenandin, veketin, veqetandin...*

*/wer-/: wergirtin, wergerandin, werçerxan, werçûn, werdan, werfirandin,, werkirin, werkutan...*

#### **1.4.2.2.2. Paşgirên Kurmancîyê**

Paşgir ew cure qertaf in ku tên dawiya bêjeyekê û wateyêke nû didin wê. Paşgirên resen jî bi serê xwe ne xwediyê tu wateyê ne, bi tenê wateyêke didin bêjeya ku pê ve dibin. Di kurmancî de hejmara paşgiran gelekî zêde ye. Berevajî pêşgiran, paşgirên ku rengdêr û navdêran çêdikin gelekî zêde ne, lê paşgirên ku lêkeran çêdikin gelekî kêr in.

*/-a/: beza, zana, nebîna, reva, kara, fehma...*

*/-ahî/, /-awî/, /-ayî/, /-wî/: dûrahî/dûrayî, ronahî/ ronayî, ewrayî/ ewrawî, rêwî, bawî, tawî...*

*/-e/: şane, nîşane, pare, xane, bêje, rêje, şande, şîre, dane, nerme, awarte, bende, bere, çêre, birûske, bizmare ...*

*/-ak/: civak, honak, mînak, ronak, sêlak, şilak...*

*/-al/: heval, delal, çengal, kendal, tengal...*

*/-ane/: mêrane, merdane, şêrane, dostane, tirane...*

*/-anî/: mêranî, xortanî, pîranî, mehanî, jinanî, keçanî, bûkanî...*

*/-ar/:* *mirar, guhar, kovar, komar, kêmar, cotar, gotar, xewar, nivîsar, keynar...*

*/-asa/:* *hûtasa, dêwasa, perasa, qerasa...*

*/-asî/:* *kêmasî, kurtasî, tengasî, kirdasî...*

*/-atî/:* *mirovatî, kirîvatî, xwişkafî...*

*/-awer/:* *cengawer, dilawer, cemawer, pêlawer...*

*/-bar/:* *xembar, guhêrbar, dîtbar, tawanbar, gunehbar*

*/-baz/:* *rimbaz, serbaz, canbaz, hîlebaz...*

*/-bend/:* *nalbend, kemerbend, sazband, solbend...*

*/-çe/:* *derîçe, deryaçe, baxçe, navçe, xalîçe, xwençe, nalçe, nîvçe...*

*/-dank/:* *derzîdank, kildank, çaydank...*

*/-dar/:* *kardar, maldar, kovandar, rêzdar, qerzdar, birîndar, xwîndar...*

*/de/:* *talde, diyarde, piyade, gêjde, kirde, revde...*

*/-dêr/:* *çavdêr, dengdêr, navdêr, rengdêr...*

*/-ek/:* *kulek, çilek, dizek, serek, pişteşek, birek, tirek, fisek, silek...*

*/-ende/:* *kujende, balende, firende, dirende, mayende*

*/-er/:* *bîner, bêjer, kujer, pêjer...*

*/-êr/:* *qilêr, gelêr, dilêr, şilêr...*

*/-gar/:* *rojgar, şûngar, yadîgar, pêgar...*

*/-geh/:* *pêgeh, bergeh, wargeh, şargeh, nîşangeh, kargeh, girtîgeh, bingeh...*

*/-gîn/:* *lezgîn, xwazgîn, mizgîn, sergîn, xemgîn...*

*/-istan/:* *gulistan, daristan, xerîbistan, goristan, şaristan...*

*/-il/:* *zengil, gungil, çîkil, dikil, çakil...*

*/-îçk/:* *spîçk, sorîçk, zerîçk...*

*/-île/:* şepîle, tepîle, zerîle, arîle...

*/-îsk/:* Çimçilîsk, pêpelîsk, pêyîsk...

**-ng/:** nêzing (nezîk), êzing, daring, rojing, koling, girîng,

kereng, bêjing, sorîng, çolang, gedeng, zavang, birang, xweying...

*/-xane/:* dermanxane, mêvanxane, karxane, dersxane, pirtûkxane, meyxane, nexweşxane, nivîsxane...

*/-î/:* Ev paşgir bi van peywiran radibe:

**1- Ji navdêran navderêke din çêdike:** kêrî, nêrî, serî, derî, kerî...

**2- Ji lêkeran, rengdêran ango raweya çêbiwar çêdike:** Ketî, şûştî, xistî, biraştî, bijartî, kelandî, helandî, mirandî, kuştî, qelaştî...

**3-Rengdêr û hokeran dike navdêr:** sarî, germî, kalî, tehlî, tûjî, gêjî, bilindî, xweşî, derengî, lezgînî...

**4-Mensûbiyetê nîşan dide:** botî, serhedî, xerzî, semsûrî, sêrtî, mêrdînî, qafqasî, silivî, gundî, bajarî, hewremanî...

**5-Navê zimanan pêk tîne:** kurdî, tirkî, almanî, erebî, farisî, îngilîzî...

*/-în/:* zêrîn, zîvîn, şîrîn, darîn, kevirîn, goştîn...

*/-înî/:* çavînî, kurdînî, goştînî, keçînî, dilînî, hevalînî., lawînî..

*/-inc/:* serinc, gazinc, qolinc, sarinc...

*/-incek/:* pirîncek, marîncek...

*/-îne/:* yekîne, tevîne, çavîne...

*/-ij/:* paqij, mêwij, lavij...

*/-oşk/:* beqmaroşk, dapîroşk...



*/-tî/:* nezantî, merivtî, biratî, hevaltî, kerîtî, xayîntî, kurdîtî...

*/-ik/:* kêrik, darik, keçik, jînik, sîrik, pîrik, kalik, xweşik, dayik, berxik, karik, guharik, bêrik, lihêfik...

*/-k/:* binkirask, bincilk, berdilk, berçavk, jêderk...

*/-kar/:* cotkar, xebatkar, goşkar, serkar, xwendekar, nivîskar...

*/-kî/:* devkî, nivîskî, serserkî, çitîkî, paşpêkî...

*/-lan/:* mozelan, kuçelan, borelan, marelan, berdelan...

*/-lka/:* hasûlka, pişûlka, xwezilka, qestîlka...

*/-mend/:* bawermend, hunermend, aqilmend, dewlemend...

*/-nak/:* tirsnak, xeternak, derdnak, endîşenak...

*/-ok/:* kenok, şermok, qeşmerok, revok, qeliştok, bezok, qelînok, şekirok, gezgezok, xaşxaşok, xapînok, şevşevok, pitpitok, bilbilok, dilok, xalxalok, mijmijok, binefşok, bazinok, bizmarok, teyrok, benok, benîştok, dudevok....

*/-ole/:* hişkole, tirole, pirole, girole, rîxole...

*/-onek/:* tirsonek, bizdonek, fisonek...

*/-or/:* gulor, gilor, kilor, gincor...

*/-ox/:* dayox, firoştok, kirox, gotox...

*/-oyî/:* şeroyî, şermoyî, germoyî...

*/-saz/:* çeksaz, diransaz, dermansaz...

*/-ûd/:* şerûd, sirûd...

*/-ûn/:* *kaşûn, dijûn, gerdûn, qelûn, şitûn...*

*/-ûr/:* *destûr, bilûr, şilûr, qabûr, rencûr...*

*/-van/:* *aşvan, dergevan, baxçevan, gavan, mazûvan, rezvan, tenûrvan, nêçîrvan, tembûrvan, bilûrvan, berxvan...*

*/-war/, /-wer/:* *şalwar, berwar, xwendewar...*

*/-waz/:* *şaşwaz, cihêwaz...*

*/-yar/:* *bextyar, pirsyar, cotyar, kiryar, şandyar, zanyar, firoşyar, kuştyar, biryar...*

### **Paşgirên Lêkersaz**

Ev cure paşgir du hebin; “-în” “-andin”. Bi van her du paşgiran ji rengdêr, navdêr, lêker û bêjeyên ne kurdî lêker têne çêkirin. Paşgira “-în” lêkerên negerguhêz, “-andin” jî lêkerên gerguhêz pêk tîne. Her wiha çend heb paşgirên din ên mîna */-ijîn/* û */-ijandin/*, */-isîn/* û */-isandin/* bi baweriya me ew jî têkildarî */-în/* û */-andin/* in.

#### **Mînak:**

*Ji rengdêran:* *sorandin, xweşandin, tengjandin, repisandin, xemilîn, xemilandin, dirandin, keskandin...*

*Ji navdêran:* *kelîn / kelandin, revîn / revandin, firîn / firandin, çêrîn / çêrandin, gerîn / gerandin, kenîn / kenandin, livîn / livandin, êşîn / êşandin....*

*Ji lêkeran:* *kişîn / kişandin, guherîn / guherandin, nivîsandin, gihîn / gihandin, mirin / mirandin, pijîn / pijandin, şewitîn / şewitandin...*

*Ji kokên bêjeyên biyanî:* *elimîn / elimandin, helîn / helandin, acizîn / acizandin, sekinîn / sekinandin, şewirîn / şewirandin, herimîn / herimandin, cihenimîn / cihenimandin, heyirîn / heyirandin, meşîn / meşandin...*

### 1.4.2.3. Ji Rehên Lêkeran Qertafên Bêjesaz

Divê bê gotin ku di kurancî de bi alîkariya rayeka dema niha ya lêkeran jî gelek paşgir bi dest dikevin.

*Ji kirinê /-ker/: karker, zêrker, zîvker, çêker, têrker...*

*Ji avêtinê /-avêj/: tîravêj, rimavêj, ronavêj...*

*Ji rêtinê /-rêj/: avrêj, xwînêrêj ...*

*Ji kêşanê /-kêş/: şûrkêş, qelûnkêş, cixarekêş, esrarkêş...*

*Ji birinê /-ber/: rêber, rênçber, dilber...*

*Ji mêtinê /-mij/: xwînmij, şîrmij...*

*Ji sotinê /-soj/: dilsoj, malsoj..*

*Ji malaştinê /-mal/: destmal, pêşmal...*

*Ji kuştinê /-kuj/: agirkuj, mêrkuj, hêvîkuj...*

*Ji kotinê /-koj/: hestîkoj, darkoj...*

*Ji tiraştinê /-tiraş/: dartiraş, sertiraş...*

*Ji pehtinê /-pêj/: aştêj, nanpêj..*

*Ji gotinê /-bêj/: dengbêj, çîrokbêj, stranbêj...*

*Ji biraştinê /-birêj/: goştbirêj...*

*Ji xwarinê /-xur/: goştخور, giyaxur, nanخور, kurtêخور...*

### 1.4.2.4. Navbergir (navbend)

Navbergir ku bi îngilîzî jê re “*interfix*” tê gotin, ev cure qertaf in ku dikevin navbera du peyvên û wan digihînin hev, bi wî awayî dibin navgîna dariştina peyveke nû. Di kurdî de fonemên /e-/ , /-an/ê vêpeyirê bi cih tînin.

*/-e-/: germegerm, zîngezing, şîregerm, tîremar, reşeba, kurtedem, saregerm, çirkeçirk, kurtepişt, xuşexuş, gijegij, tîretîr, şîngeşîng, darebî, rengereng, kurtenûçe...*

*/-an/: seranser, beranber...*

Di vî warî de gihaneka “û” jî xwediyê erkeke balkêş e. Ew gihanek bi awayê “o” dikeve navbera du peyvên û dibe navbergir, her wiha heman “o” tê dawiya peyvê jî. Peywira wê nêzîkî “circumfix” ankubazînegirê ye.

*Mînak: serobino, şaşomaşo...*

#### 1.4.2.5. Navgir

Navgir ku bi îngilîzî jê re *infix* tê gotin dikeve nava peyvê ûwateyeke nû dide wê. Di kurdî de dengê /-a-/ dikeve nava hinek lêkeran û ji wan navdêran çêdike.

*Mînak: şewitîn>şewat; xebitîn> xebat; filitîn> felat; weşîn> weşan; seridîn> serad; gerîn >geran; hewîn> hewan...*

#### 1.4.2.6. Kategorîyên Rêzimanî

Mijareke têkildarî morfolojîyê jî, mijara kategorîyên rêzimanî ye. Ew jî bi awayekî kevneşopî du bir in; kategorîyên morfolojîk anku beşên axaftinê yên mîna navdêr, rengdêr, cînavk, lêker, hoker, daçek, gihanek û baneşan û taybetîyên rêzimanî. “Ev jî dabeş dibin ser du biran; kategorîyên rêzimanî yên têkildarî navdêran ên mîna zayend, rewş, mêjerê û kategorîyên têkildarî lêkerê ku ew jî avanî, rawe, kes, xuyang in” (Bussman, 2006:484).

Wekî din jî di zimanekî de hinek taybetî û diyarde hene ku dibin nîşaneyên nasnameya zimanekî, çawanîya wî diyar dikin. Ew taybetî di dabeşkirin û senifandina zimanan de jî ji aliyê pêkhatin û binyadê ve cihê wî zimanî di nav zimanên cîhanê de nîşan didin. Ji van taybetiyan re kategoriyên rêzimanî tê gotin.

Zimanzan û rêzimanzanên ku li ser zimanê kurdî xebitîne, di berhemên xwe de cih dane kategorîyên rêzimanî yên kurdî. Ew jî di çend astan de li ser rêzimana kurdî rawestîyane, pêşî taybetîyên kurdî yên mîna zayend, tewang, mêjer hildane dest, piştê jî beşên axaftinê ji hev cuda kirine û ji bo hemû beşên axaftinê nimûne pêşkêş kirine. Bo nimûne Roger Lescot û Celadet Bedirhan (2001) di berhema xwe ya bi navê *Kürtçe Grameri* (Rêzimana Kurdî) de di bin beşa morfolojîyê de pêşî kategorîyên mîna zayend, mêjer, veqetandek, qertafên nenasîyê pêşkêşkirine, piştê qala tewanga navdêr û kêşana lêkeran hatiye kirin. Piştî wan mijaran beşên axaftinê yek bi yek hatine destnîşankirin. Her wiha W. M. Thackston (2006) di berhema xwe ya bi navê *Kurmanji Kurdish* (Kurdîya Kurmancî)bal kişandîye ser kategorîyên mîna zayend, mêjer, tewang û nasî/nenasî, piştê jî derbasî mijara beşên axaftinê bûye.

#### 1.4.2.6.1. Beşên Axaftinê di Kurmancîyê de

Beşên axaftinê ku wekî cureyên peyvan jî tên binavkirin, dabeşkirina bêjeyên zimanî li gorî pîvanên wateyî û teşeyî ye. Her wekî Bussman (2006) amaje pê kiriye, dabeşkirin û diyarkirina beşên axaftinê cara pêşîn ji hêla *Dionsyius Thrax* ve berî zayîne di sedsala yekem de hatiye kirin. Thrax ev heşt beşên axaftinê destnîşan kirine: navdêr, lêker, rengdêr (hevalnav), artîkel, hoker (hevalkar), cînavk, daçek, gihanek.

Di kurdî de jî piranîya pirtûkê rêzimanê cih didin van heşt heban. Lê belê Celadet Bedirxan di Hawarê de beşên axaftinê wekî birên qisetê bi nav kirine û deh heb birên qisetê nîşan dane. “Di zmanê kurdmancî de birên qisetê deh in: navdêr, veqetandek, rengdêr, pronav, lêker, jmarnav, hoker, daçek, gihanek, baneşan.” (Bedirxan, 1998:714)

Hinek rêzimanzanan jî kategorîyên rêzimanî yên têkildarî navdêrê bi navdêrê re û yên têkildarî lêkerê jî bi lêkerê ne dane. Bo nimûne zimanzanê navdar ê kurd Qanatê Kurdo (1990) di berhema xwe ya bi navê *Gramera Zimanê Kurdî* de wisa kiriye.

Zimanzan bi gelemperî beşên axaftinê wekî beşên wateyî û beşên peywirî ji hev cuda dikin. Hinek jî wekî beşên guhêrbar û neguhêrbar ji hev cuda dikin. Celadet Bedirxan jî di xebata xwe ya di Hawarê de beşên axaftinê ji aliyê guhêrbarîyê ve ji hev cuda kirine û wiha gotiye: “Birên qisetê ji awirê guhêrbarîyê ve bi du biran leva dibin: guhêrbar û neguhêrbar. Ji birên qisetê pênc gubêrbar û pêncên din neguhêrbar in. Bêjeyên guhêrbar ew in ko di qisetê de şikilên xwe ên eslî diguhêrînin, tene tewandin û dikevin şikilê din. Bêjeyên neguhêrbar ew in ko di qisetê de şikilên xwe ên eslî tucaran naguhêrînin û hergav weke xwe dimînin.

#### **Bêjeyên guhêrbar:**

*Navdêr:* Cemşîd , Sînemxan, kaxez, kerî, şîpane, piling, Herekol, can, qencî, spîtahî...

*Veqetandek:* ê, a, ên, ek, in.

*Pronav:* ez, we, ew, yên min, evê ha, çi, kî, kê, ko, kîjan...

**Jmarnav:** yek, du sed, heştek, nîvyek, çare çar, yeko yeko, pênc bi pênc...

**Lêker:** were, dixwar, dê bihata, ketibû, divêt, nivisandin, xwendî bûn, daket, çikandin

**Bêjeyên neguhêrbar:**

**Rengdêr:** gewr, nû, qenc, bilintir, helesor, mezin, spehî, nizim.

**Hoker:** holê, îro, hingê, nik, bes, kêmkû, kengê, niho, no, belê...

**Daçek:** di, li, ji, di ... de, ji ... re, der, digel, berî, paşî, piştî...

**Gibanek:** wek, û, an, lê, ko...

**Baneşan:** lê, lo, ax, hey, way, ho, ox...” (Bedirxan, 1998:714-715).

Zimanzana amerîkî Laura Boulden di berhema xwe ya bi navê “*Basic Sorani Grammar* (Rêzimana Seretayî ya Soranî)” de beşên axaftinê wiha destnîşan kirine:

Beşekanî axawtin	
A- wişey tewaw	B- wişey natewaw
1- naw (navdêr)	1- prîpozîşin (daçek)
2- cênaw (cînavk)	2- emrazî peywendî (gihanek)
3- firman û çawk (rader û lêker)	3- emrazî sersûrman û bangêşîn
4- awelnaw (hevalnav)	4- partîkal
5- awelfirman (hevalkar)	
6- hejmare (hejmarnav)	

(Boulden, 2008: 48)

Her wekî ji tabloyê jî diyar e, Boulden jî beşên axaftinê wekî “tewaw” û “netewaw” dabeş kirine.

Em ê li vê derê li gorî ferheng û pirtûkên rêzimanî û zimanzanîyê yê mîna David Crystal (2008), Dr. Ebaselî Vefayî (2012) van beşên axaftinê rave bikin.

#### 1.4.2.6.1.1. Navdêr

Di ravekirina toreyî de navdêr wekî navê kes, cih û tiştan” hatiye pênasekirin, lê belê ev ravekirin ji ber xumamîya wateya diyardeyên “nav” û “tişt” bûye mijara

gengeşe û nîqaşan. Lewma jî zimanzanan navdêr li pey pîvanên morfolojî û sentaksê ji nû ve rave kirine. “Li gorî pîvanên rêzimanî navdêr ew cureyê peyvan e ku li gorî rewş û mêjerê tê keşanê. Her wiha ew di hevokê de xwedîyê cih û peywireke diyarkirî ye. Bo nimûne, ew carinan biker carinan jî bireser e” (Crystal, 2008:333). Navdêr di nava xwe de wekî serenav û hevenav dabeş dibin û ji alîyê zayend, mêjer û rewşê ve tînan analîz kirin.

***Mînak:***

*Heyla Bêzê, li te bêzarê!*

*Çelemçîtî da ber şarê*

*Sêva sorê li ser gulîya darê*

*Lawno! lêxin bînin xwarê!*

*Bêzê kevoka belek e*

*Firek da xwe çû felek e*

*Yarên Bêzê sed û yek e*

*Bêzê kevoka spî ye*

*Firek da xwe çû banî ye*

*Yarên Bêzê sed û sî ye*

(Cîgerxwîn, 1988:93).

\*\*\*

***WELE NAÇIME BER GARANÊ***

*Wele naçime ber garanê*

*Bileh naçime ber garanê*

*Serê malê bidin nanê*

*Wele naçime ber garanê*

***Keçik*** nedin ramîsanê

*Bileh naçime ber garanê*

*Ew garana ga û golikan*

*Wele naçime ber garanê*

*Min çêrandî li ber tatikan*

*Bileh naçime ber garanê*

*Serê malê nede nanê*

*Wele naçime ber garanê*

*Keçik nedin ramîsanê*  
*Bileh naçime ber garanê*  
(Cîgerxwîn, 1988:95)

#### **1.4.2.6.1.2. Cînavk**

Di dabeşkirina rêzimanî de “cînavk ew cureyê peyvan e ku di senifandina rêzimanî de wekî cureyeke girtî ya peyvan tê binavkirin. Ew cihê navdêr û raveka navdêrî digire anku wê dinimîne” (Crystal 2008: 391). Dema mirov nexwaze navdêrê dubare bike, mirov li şûna wê cînavkê bi kar tîne. Ew jî dabeş dibin wekî cînavkên kesane, cînavkên şanîdanê, cînavkên xwedîtîyê, cînavkên nebinavkirî, cînavkên girêkî, cînavkên pirsîyarî, cînavkên veşerok û hwd. Cînavk hin caran taybetiyên navdêra ku dinimînin ji aliyê zayend, mêjer û rewşê ve nîşan didin.

##### ***Mînak:***

*Min dî kareke xezala,*  
*Horîke cinetê, werdekeke golê,*  
*Kevotkeke serê bircê,*  
*Li devê derê konekî diçe û tê ye.*  
*Hûn qîzik in diçin ba hev dinê ye,*  
*Tu ji min ra bêjî, ew qîzik qîza kêye?*  
*Keçik divê -Dewrêşo, bavo,*  
*Ew qîzika tu salixê wê didî,*  
*Qîza Fariz begêye,*  
*Navê keçikê Binevşê ye.*  
(Cindî, 2008:35).

\*\*\*

*DE BIHÊR BIHÊR*  
*De bihêr bihêr dayikê*  
*Teçî ji min e xwayîkê*  
*Ez ê te bidim nûşokê*  
*Nûşoka min û kê ye?*  
*Nûşoka te û Xurşîd e.*



*Xurşîd didim ber avê*  
*Lê bireşînim gulavê*  
*Birakê min e min navê.*  
*(Cîgerxwîn, 1988:104)*

### 1.4.2.6.1.3. Rengdêr

Ev cure peyv hevaltîya navdêrê dike û wê ji aliyê rewş, çendanî û çawanîyê dide nasîn. Qanatê Kurdo rengdêr wekî “xeysetnav” bi nav kiriye û wiha pênase kiriye: “Ji wan xeberanra dibêjin xeysetnav, yên ku cûre, reng û rûyên tiştan, teherê navan nişan dîkin,” (Kurdo, 1990: 79)<sup>1</sup>. Rengdêr du cure ne; rengdêrên çawanîyê ku rengdêrên resen in, rengdêrên pêşkerî ku di bingeha xwe de tişteki din in, piştî ku tên ber navdêrê dibin rengdêr. Dengdêr çawanîyên xwe bi du awayan nîşan didin; Her wekî di mînakên xwarê de diyar e, bi lêkera /bûn/ a ku rewşê nîşan dide.

#### **Mînak:**

*Ava vê kanîyê pir sar e.*  
*Min duh êvarî xwarineke xweş xwar.*

Ji bilî wê jî rengdêrên çawanîyên xwe di ravekê de wekî raveker nîşan didin.

#### **Mînak:**

*Bêzê kevoka belek e*  
*Firek da xwe çû felek e.*  
*Bêzê kevoka sipî ye*  
*Firek da xwe çû banî ye (Cîgerxwîn, 1988: 93)*

Rengdêr bi navdêrê re tê bikaranîn, bi tena serê xwe nayê bikaranîn. Heke bi tena serê xwe were bikaranîn êdî ew ne rengdêr, êdî cihê navdêrê girtîye. Hingî wekî navdêr tê bikaranîn.

#### **Mînak:**

*Çavreşa min were..*

---

<sup>1</sup> Di vê berhemê de /i/ û /î/ wekî tirkî bi /ı/ û /i/ hatine nîşandan, her wiha paşdaçek /ra/ jî pê ve hatiye nivîsandin. Me destê xwe nedaye rastnivîsa wî.

Taybetîyeke rengdêr jî ew ku xwedîyê sê astên pileyî ye. Piledarî xwe bi du awayan nîşan dide:

1- Bi riya paşgirên piledarîyê;

Her wekî; *baş > baştir > baştirîn...*

**Mînak:** *Ev kar **baş** e, lê ew ê din **baştir** e, barê **baştirîn** evê han e.*

2- Bi alîkarîya hokerên mîna, pir, gelek, piçekî, zêde, herî, tewrî û hwd.

*Ew zilam **gelekî** çavsor e.*

*Mirovê **herî** jîr li gundî dijî.*

*Gula min **ji hemû** gulan bedewtir e.*

Mirov dikare rengdêran bike du beş; rengdêrên çawanîyê û rengdêrên diyarkirinê. Rengdêrên diyarkirinê di bingeha xwe de ne rengdêr in, beşên din ên axaftinê ne, gava ku tên ber navdêrê dibin rengdêr.

### **Cureyên Rengdêran**

1- Rengdêrên çawanîyê (wesfîn)

2- Rengdêrên şanîdanê

3- Rengdêrên çendanîyê (hejmarîn)

4- Rengdêrên nebinavkirî

5- Rengdêrên pirsiyarî

### **Mînak:**

*“Ez bi xulama qend û darê,*

***Wê** bejin û balê,**wan** sîng û bera,*

*Ezê li ser sîngê **kever** da çêkim xan û manê, koçik û sera.*

*Memikê keleş kawa min **mînanî coteke fîncanê ferfûrî,***

*Meriv dayne ser taximeke zêr zîvîn,*

*Bide destê axalera...*

*Keçê, bira destê min li ber destê te tobebe,*

*Destê min ji pêş emelê malê nebe,*

*Bira devê min li xala sûretê **sor** biketa,*

*Bira **sed** darî binê pîyê min xistana,*

***Sêsid** zêrî cirma min û tebe.*

*Keçê, kulmalbavê,*

*Were em qewil-qirarê xwe hevra bikin...*

*Kuro, kulmalbavo,  
Diçî kavila Ezurma şewîfî  
Qutînga derd û dermana ji minra bikir,  
Heçî temya min li teye,  
Bîne li cî, paşê bizivir” (Cindî, 2008: 72).*

#### **1.4.2.6.1.4. Hoker**

Ew cureya peyvan e ku hevaltîya lêkerê dike û ji alîyê çawanî, dem, cih û bergeh ve rewşa wê zelaltir dike. Peywira sereke ya hokerê destnîşankirina rêbaza tevgera lêkerê ye. Ji bo ku mirov hokerê binase, mirov ji lêkerê pirsên mîna çawa, li ku, kengî dike, bersiva wa hokeran dide dest. Bersiva çawa *hokerên çawanîyê*, bersiva “*li ku, ji ku, bi ku ve, di ku re...*” *hokerên cih û bergeh*, bersiva kengî jî *hokerên demê* didin.

##### ***Mînak:***

*Ez duhpîr zû hişyar bûm.*

*Ew bi lez û bez ji malê derket.*

Her wiha hoker pileya rengdêr û hokereke din jî nîşan dide.

##### ***Mînak:***

*Hogir pîr hêdî dimeşe.*

*Bejna wî pîr kurt e.*

##### ***Nimûne:***

*Lê domamê, te zû bigota,*

*Min ê qayîşa piştta xwe bifrota...*

(Cindî, 2008:123).

\*\*\*

***Sibe zû çûme mala birangê xwe bi mêvanî,***

*Min ê çavê xwe yê kor, guhê xwe yê kerr*

*Ne malxwê ye, ne kevanî.*

(Cindî, 2008:230).

### 1.4.2.6.1.5. Daçek

Ev beşa axaftinê peywendîya di navbera hêmanên cur bi cur ên hevokê de peywendîyê pêk tîne. Ew bi gelemperî di hevokê de awa, dem û cih nîşan didin. Daçek bi giştî berî navdêr û cînavkan tên. Hin daçek sade ne, hinek jî hevedudanî ne. Hin caran jî wekî bazinedaçek (pêşdaçek û paşdaçek) in, navdêrê digirin nava xwe.

#### **Mînak:**

*Kurik **li** malê ye.*

*Pirtûk **li ser** maseyê ye.*

*Pisîk **di bin** maseyê **de** ye.*

\*\*\*

#### **EZ BI XULAMA**

*Ez **bi** xulama qend û darê,*

*Bejin û balê, sîng û bera,*

*Ezê **li ser** sîngê kever **da** çêkim xan û manê, koçik û sera.*

*Memikê keleş kawa min mînanî coteke fîncanê ferfûrî,*

*Meriv dayne **ser** taximeke zêr zîvîn,*

*Bide destê axaleran...*

*Keçê, bira destê min **li ber** destê te tobe be,*

*Destê min **ji pêş** emelê malê nebe,*

*Bira devê min **li** xala sûretê sor biketa,*

*Bira sed darî **li bin** pîyê min xistana,*

*Sêsid zêrî cirma min û te be.*

*Keçê, kulmalbavê,*

*Were em qewil-qirarê xwe **bi** hev **ra** bikin...*

*Kuro, kulmalbavo,*

*Diçî kavila Ezurma şewitî*

*Qutînga derd û dermana **ji** min **ra** bikir,*

*Herçî temya min **li** te ye,*

*Bîne **li** cî, paşê bizivir.*

(Cindî, 2008:72).

#### 1.4.2.6.1.6. Gihanek

Ev cure peyv di hevokê de peyvên û komekan digihînin hev. Gihanek bi serê xwe ne xwediyê tu wateyê ne, lê bêjeyan, komek û hevokan bi hev ve girê didin, an jî peyvekê, komekekê bi hevokekê ve girê didin. Bi piranî gihanek bi tenê peyv û hevokan bi hev ve girê nadin, pê re ji aliyê wateyê ve jî wan tekûztir dikin. Peywira gihanekekê dibe ku pêkanîna ahengê be, her wekî /û/, /an/, /lê/ yan jî dibe ku pevgihandina sedemî be her wekî *ji ber ku, lewma, ji lew re* û hwd.

##### **Mînak:**

*Lê belê bira min nizanbû dunya ha ye,  
Dunya sultan Silêman pêxemberra nemaye.*  
(Cindî, 2008:72).

\*\*\*

*Kuro gede, kelikçîya kelik kejî  
Kuro gede, her ro, her gav neyê neseke hewişa mala mino.  
Kuro gede, ezê navê te nizanim  
Ji ber eşqa, ezê tera dibêim to zevangê bavê mino...*  
(Cindî, 2008:108).

#### 1.4.2.6.1.7. Baneşan

Ew beşeke axaftinê ye ku neguhêrbar e û bi beşên din re nakeve peywendîya sentaksî. Tekane peywira baneşanê diyarkirina hestên berz û bilind e. Her wekî *ax!*, *oxweş!*, *errrik!*, *tew tew!* û hwd. Hin caran peyvên din jî dema ku bi awayekî tund tînd derbirîn wekî baneşan tînd dîtin. Her wekî “*her bijî!*, *noş!*” û hwd.

##### **Mînak:**

*Tew, tew, Kulik go:  
-Dayê malxirabê,  
Hey lê li min, hey lê,  
Hey wî, wî, wî, wî,  
Tu min netirsîne ji xalan e,  
Hey wî, wî, wî, wî.*

*Lingê min kevirî çexmax e,  
Terêşî dara keve,  
Hey wî, wî, wî, wî,  
Mala donzde hezar malî Gêşî,  
Hey wî, wî, wî, wî.  
Hema îzina xwedê ez ê bînim koka biran e.  
**Hey wî, wî, wî, wî,**  
**Ax, hey wî, wî, wî, wî,**  
**Ax, hey wî, wî, wî, wî...***  
(H. Cindî, 2008:108)

\*\*\*

*Were Xezalê, were delalê,  
De rabe hogra mn delalê,  
De rabe hogira min hevalê,  
**Wey, wey, wax...***  
(H. Cindî, 2008:187)

\*\*\*

***Mîrê min, hey wax, hey wax,**  
Qeda bê herçar roj û rojgarê te dinyayê.*  
(H. Cindî, 2008:214)

#### **1.4.2.6.1.8. Lêker**

Ew cureyê bêjeyê ye ku bi awayekî rêzimanî hêmana sereke ya pêveberê ye û bizavekê yan rewşekê nîşan dide. Di gelek zimanan de bi mebesta pêkanîna ahenga bi bikerê re, lêker li gorî dem, rawe, avanî û rewşê tên kişandin. Ji aliyê peywirê ve lêker bi tenê yan jî tevî lêkerên din pêvebera hevokê pêk tînin. Heke di hevokê de hêmanên mîna bireser, têrker û hokerî hebin, hingî hêmana ku herî zêde bandorê li hêmanên mayî dike lêker bi xwe ne. Ji ber vê yekê li gorî gelek teorîyên zimanzanîyê lêker girîngtirîn pêkhênera hevokê ne.

#### **Mînak:**

*Ey hevala evîndar*

*Tu jî wek min birîndar  
Kengî ko em **digihên** hev  
Bi dilxweşî, roj û şev  
Gul û çîçek **geş dibin**  
Dilê daran **xweş dibin**  
Sunbil hawîr **dihejin**  
Tev sitêrik **dirijin**  
Çiya **bilinddibin** jor  
Cîhan **dibit** keskesor  
(...)*

*Ey hevala evîndar  
Tu jî wek min birîndar  
**Wer** da em **herin** şoreş  
Ew **guh nedin** şeva reş  
**Bibin** wek bûk û zava  
Berî roj **here** ava  
Perda şevê **bê** ser me  
**Bext pêwan** **be** li ber me  
(...)*

(Cegerxwîn, 1982:163-164)

#### **1.4.2.6.2. Kategorîyên Têkildarî Navdêrê**

Di zimanekî de hinek taybetî û diyarde hene ku dibin nîşaneyên nasnameya zimanekî, çawaniya wî diyar dikin. Ew taybetî di dabeşkirin û senifandina zimanan de jî ji aliyê pêkhatin û binyadê ve cihê wî zimanî di nav zimanên cîhanê de nîşan didin. Ji van taybetiyan re kategoriyên rêzimanî tê gotin.

Ev taybetiyên rêzimanî bi gelemperî diyardeyên mîna zayend, mêjer (pirhejmarî / yekhejmarî), kesandin, binavkirin (nasî / nenasî), rewş, dem, rawe, xuyang in. Hinek ji van kategoriyan têkildarî navdêrê ne, hinek jî têkildarî lêkerê ne.

#### 1.4.2.6.2.1. Zayenda Rêzimanî

Di zaravayên bakur (kurmançî û kirmanckî) ên kurdî de zayenda rêzimanî heye; hinek peyv nêr, hinek mê û hinek jî nêtar in. Di kurmançiyê de beşên axaftinê yên mîna navdêr, cînavk, xwedan zayend in. Di kurmançiyê de peyvek an nêr an mê hin caran jî nêtar e.

Zayend di kurmançiyê de xwe bi riya tewang û veqetandek û qertafên bangnîşanîyê dinimîne. Di kurmançiyê de zayend bi tenê di rewşa yekhejmariyê de peyda dibe. Her wiha ji bo ku zayend diyar bibe, divê peyv an bitewe yan jî veqetandekê bigire.

Em vê mijarê li ser gotinên stranekê nîşan bidin.

*Avka ji çiyê tê,*

*Ez avê venaxwim,*

*Ji nav gul û gîhê tê,*

*Bêhna yarê jê tê.(...)*

(Cindî, 2008:16).

Her wekî ji mînakê diyar e, di rêzika *Avka ji çiyê tê* de peyva *avk* mê ye, *çiya* nêr e. Ev yek jî di peyva *avk* de bi alîkariya veqetandeka /-a/ û di peyva “çiya” de jî ji nîşaneyê tewangê /-ê/ya dawîya *çiyê* diyar dibe. Her wiha di hevoka *Bêhna yarê jê tê* de jî, *bêhn* û *yar* her du jî mê ne, lê belê zayenda /*bêhn*/ê ji veqetandeka /-a/yê, zayenda /*yar*/ê jî ji qertafa tewangê /-ê/ tê fehmkirin.

*D. N. MacKenzie* (1954) jî di gotara xwe ya bi navê *Gender in Kurdish* (Di kurdî de Zayend) de ev taybetîya kurmançiyê destnîşan kiriye ku di zaravayên bakur ên kurdî de veqetandekên kurdî û qertafên tewangê di kurdî de zayenda rêzimanî nîşan didin.

Her wiha *Haig* û *Öpengin* (2014) jî di gotara xwe ya bi navê *Gender in Kurdish Structural an Socio-cultural Dimension* (Di kurdî de zayend û biwarên wê yên civakî-çandî) de bi van gotinan bal kişandiye ser vê taybetîya kurdî: “Zimanên pêşîn ên belgekîrî nîşan didin ku wan zimanan jî her wekî zimanên qedîm ên Hind-



Ewropî sê cure nişaneyên zayenda rêzimanî hebûn, lê belê ev taybetî di zaravayên navendî û başûr ên kurdî de zayenda rêzimanî di cînavkan de jî nemaye. Di kurdîya bakur de di navdêr û cînavkan de wekî nêr û mê hatiye parastin” (Haig&Öpengin, 2014: 1).

*Gerardo Barbera* (2001) di gotara xwe ya bi navê *Exploring Gramamatical Gender in New Iranian Languages and Dialects: An Overview with Some Typological Considerations* (Vekolana Zayenda Rêzimanî di Ziman û Zaravayên Îranî yên Nû de: Lênêrîneke Gelemperî, Tevî Hinek Têhizirînen Tîpolojîk) de daye xuyakirin ku ji zimanên nû yên îranî birek zimanên mîna tatî, peştûyî, kurdî (kurmancî) zayenda rêzimanî di nava xwe de dihewînin. Di hinek zimanên mîna farisî, kurdîya başûr, talîşî, gilekî, mazenderanî, belûçî de zayenda rêzimanî nemaye. Barbera zayenda rêzimanî ya di kurdî de bi vî rengî destnîşan kiriye:

“1) Navdêra yekhejmar a tewandî: nêr: /-î/ (ez hespî dibînim.); mê: /-ê/ (ez mehîne dibînim.)

2) Vetandeka navdêra yekhejmar: nêr: /-ê/ (hespê boz, hespê Soro, hespê min), mê: /-a/ (mehîna qenc, mehîna Soro, mehîna min)

3) Qertafa nebinavkirî ya ravekê: nêr: /-ekî/ (hespekî boz); mê: /-eke/ (mehîneke qenc).

4) Cînavka kesane ya kesê sêyem ê yekhejmar: nêr: wî (hespê wî), mê: wê (hespê wê)” (Barbera, 2001:3).

Li vê derê tiştek hatiye jibîrkirin, ew jî rewşa banglêkirinê ye, di vê rewşê de jî navdêr qertafên /-o/, /-ê/ û /-ino/ digire, ji van qertafan /-o/ (nêr) û /-ê/ (mê) zayendê nişan didin. Ji bo vê yekê jî ji stranên kurdî em mînakên bidin:

### ***Lê Nûrê***

*Lê Nûrê, Nûrê, Nûrê lê lê Nûrê*

*Biçûkê, bê qisûrê, lê lê Nûrê*

*Porsorê, gulîhûrê, lê lê Nûrê*

*Qîza şêxê Bizgûrê lê lê Nûrê*

(Cegerxwîn, 1988:68).

### *Lo Şivano*

*Lo şivano lo lo şivano*

*Dil bi kulo bi kovano*

*Serê dostê bi qurbano*

(Cegerxwîn, 1988:66).

### **1.4.2.6.2.2. Mêjer**

Her wekî zayendê, mêjer jî bi riya tewang û veqetandekê tê nîşandayîn. Lê, heke peyv di rewşa xwerû de be, hingî bi alîkariya kesandina lêkerê tê nîşandan. Veqetandekên binavkirî û nebinavkirî her du jî mêjerê nîşan didin. Celadet Bedirxan di Kovara Hawarê de li ser vê mijarê wiha gotiye: “Ew nemaze ji mêjerê lêker, tewang û veqetandekê dixuyin.

<b>Yekhejmar</b>	<b>Pirhejmar</b>
Ev mehîn <b>e</b> .	Ev mehîn <b>in</b> .
Min mehîn dît.	Min mehîn dît <b>in</b> .
Ez mehînê dibînim.	Ez mehî <b>nan</b> dibînim.
Ez mehî <b>nekê</b> dibînim.	Ez mehî <b>nina</b> dibînim.
Ez ê ji te re mehî <b>neke</b> qenc peyda bikim.	Ez ê ji te re mehî <b>nine</b> qenc peyda bikim.
Ev kurê kê ye?	Ev kurê <b>n</b> kê ne?
Mehînê xwar.	Mehî <b>nan</b> xwar.
Tu vî hespî dibînî?	Tu van hesp <b>an</b> dibînî?

(Bedirxan, 1998:779).

### *Xezala min*

*Xezala min, delala min*

*Hey hêrî hêrî hêrî*

*Xezala min min, delala min*

*Xezala li berya jêrî*

*Xezala min, delala min*

*Koçera ser bihêlî*

*Xezala min, delala min*

*Koçeran pez da bêrî*  
*Xezala min, delala min*  
*Xezalên beryê çar in*  
*Xezala min, delala min*  
*Her çar jî bi kum û şar in*  
*Xezala min, delala min*  
*Her çar jî bi dost û yar in*  
 (Cegerxwîn, 1988:54).

#### 1.4.2.6.2.3. Binavkarî û Nebinavkirî

Di kurmanciyê de peyv heke qertafên nebinavkirinê negirtibe, binavkirî ye. Di zaravayê soranî de rewş berevajî ye anku peyva binavkirî qertafê digire. Di kurmanciyê de qertafa nenasîyê ji bo yekhejmarîyê /-ek/ û ji bo pirhejmarîyê /-in/ e. W. M. Thackston di berhema xwe ya bi navê *Kurmanji Kurdish, A Reference Grammar with Selected Readings* (Kurdîya Kurmancî Rêzimanekê Çavkanî bi Xwendinên Berhevkirî) de li ser vê mijarê wiha gotiye: “Nîşaneyê binavkirî ji bo navdêrên yekhejmar (çi nêr, çi jî mê) paşgira /-ek/ (ji bo peyvên ku bi dengdêrên diqedin dibe /-yek/) e û bi dawîya navdêrên xwerû ve dibe. Navdêranebinavkirî hem nêr, hem jî mê dikevin rewşa tewandî û qertafên tewangê ji bo nêr /-î/, ji mê /-ê/ digirin û dibin /-ekî/ (nêr), /-ekê/ mê.

*mirov > mirovek*  
*Mirovek hat.*  
*Ez mirovekî dibînim.*  
*kitêb > kitêbek*  
*Li ser masê kitêbek heye.*  
*Ez kitêbekê dibînim.*

Paşgira nenasîyê ji bo pirhejmaran /-in/ e û li gorî ya yekhejmarîyê kêmtir tê bikaranîn. Ew jî bi dawîya navdêra xwerû ve dibe. Ew jî qertafa tewangê /-an/ digire û dibe /-inan/.

*kur > kurin*  
*derî > derînin*

*îstgeh >îstgehin”*

(Thackston, 2006:11)

***Mînak:***

*Go, gede lawiko, te xewnek dîtiye di xewnê da*

*Darek hêşîn bûye di hewşa mala bavê min da*

(Cindî, 2008:141)

*Çû toxana binya malê ye*

*Çevê xwe gerand li eşîrê, li obê ye,*

*Bala xwe dayê kareke xezalan*

*Horîyeke cinetê*

*Werdekeke golê,*

*Kevotkeke serê bircê,*

*Li devê derê konekî diçe û têye.*

*Nezara çevê wî kete kêrsim û dîndara wê ye.*

(Cindî, 2008:34).

#### **1.4.2.6.2.4. Rewşên Navdêrê**

Di kurmancîyê de navdêr di sê rewşên sereke de; “xwerû (direct case)”, “tewandî (oblique case)” û “banglêkirinê (vocative case)” de derdikeve pêşberî mirov. Bi riya vê pergale di hevokê de kirde û bireser; dîsa biresera rasterast û ya nerasterast; bireser û têrker ji hev tên cudakirin. Her wiha di ravekê de raveker û raveber bi vî awayî ji hev tên derxistin. Me berê dabû xuyakirin ku bi riya tewangê zayend û mêjera bêjeyê tên nîşandayîn.

##### **1.4.2.6.2.4.1. Rewşa Xwerû**

Navdêr di rewşa xwerû anku rewşa navkî de qertafên tewangê nagire, bi tenê qertafên nasî û veqetandekan digire. Lêker her tim li gorî navdêr û cînavka xwerû tê kişandin. Thackston (2006) der barê mijarê de diyar kiriye ku navdêr di rewşa navkî de tu dawîkeran nagire û di vê rewşê de navdêrên pirhejmar jî wekî yên yekhejmar in. Navdêrên yekhejmar bi gelemperî yan nêr an jî mê ne, di navdêrên pirhejmar de zayend nîn e û ew wateyeke gelemperîbûnê didin.

#### 1.4.2.6.2.4.2. Rewşa Tewandî

Di rewşa tewandî de navdêr (çi nas, çi nenas) qertafên tewandê digire. Celadet Bedirxan di Hawarê de ev mijar wiha rave kiriye: “Zimanê kurdmacî zimanekî tewangbare. Yanî bêjeyên wî di qisetê de weke xwe namînin û li gora cihê ko di qisetê dedikevinê û wezîfa ko li ser xwe digirin têne tewandin û hin parkît bi wan ve dibin, an hin tîpên wan bi tîpine din diguhêrin. (...)

**Tewanga navdêran:** Navdêr, hevenav bin sernav bin, li gora mêjer û zayêndên xwe têne tewandin. Bi gelemperî û diyekejmariyê de navdêrên nêr bi « î » yê û navdêrên mê bi « ê » yê û gelemjara her diwan bi « an » ê têne tewandin . Ev parkît bi paşiya navdêran ve dibin.

*Hesp hat. Hesp hatin.*

*Mehîn hat. Mehîn hatin.*

Di komekên jorîn de navdêrên *hesp* û *mehîn* nehatine tewandin. Ji ber ko ew her du jî di wan komekan de kirar in û kirar nayine tewandin. Lê ev navdêr bi xwe di komekên jêrîn de hatine tewandin. Ji ber ko tê de êdî ne kirar lê bireser in.

*Ez hespî dibinim. Ez hespan dibînim.*

*Ez mehîne dibînim. Ez mehînan dibinim.*

Di mîsalên jorîn de navdêr hemî bireserê lêkerê ne. Lê navdêr bireserê navdêreke din jî dibin. Hingê jî navdêr têne tewandin.

#### **Mînak:**

*Ev goştê çelekê ye.*

*Ava golê şêrîn e.*

*Di çiyayên Kirdistanê de her texlît dehbe û cenawir hene.*

*Gola Wanê goleke spehî ye.”*

(Bedirxan, 1998:793).

#### **Mînak:**

***Yekjimêr – mê:***

*Baranek barî ji hewrên biharê*

*Baranê şil kir lê desmala yarê*  
*Geşt û seyran e lê li binya vê darê*  
(Cegerxwîn, 1988:23).

**Yekjimar- nêr:**

*Dilê min hêlîna teyrê narî,*  
*Teyrê malxirav hêlîna xwe çêkirîye vî zinarî*  
(Cindî, 2008:167).

**Pirhejmar:**

*Ramûsana gewran û rindan,*  
*Çîlan û bedewan-*  
*Mînanî hingiv rûnê tev helandî,*  
*Meriv ji xortê xelqê ra*  
*Dayne ser pirtî nanê di genimî...*  
(Cindî, 2008:58).

### 1.4.2.6.2.4.3. Rewşa Bangnîşanî

Di dema banglêkirinê de navdêr qertafên bangnîşanî digirin.

<b>Qertafên bangnîşanî:</b>
<b>- o</b> (yekhejmar/nêr)
<b>-ê</b> (yekjimêr/ mê)
<b>-(i)no</b> (pirhejmar)

**Mînak:**

**Yekjimar-mê:**

*Lê Nûrê, Nûrê, Nûrê lê lê Nûrê*  
*Biçûkê, bê qisûrê, lê lê Nûrê*  
*Porsorê, gulî hûrê, lê lê Nûrê*  
*Qîza şêxê Bizgûrê lê lê Nûrê*

**Yekhejmar- nêr:**

*Eman dilo, eman dilo*  
*Ji derdê yarê tu bi kulo*  
*Janê eşqê avêt dilo*  
*Dil û kezeb tev bûn kulo*  
*Yar bû gul ez bûm bilbilo*  
(Şêrîn, 1994:22).

***Pirhejmar:***

*Malîno, gundîno, bejina kawa mine kine,*  
*Morî, mircanê situ da, zend bazine.*  
*Par vî çaxî kewa gozel yeke torine, nazike wê qîzîn bû, îsal pêra lê dinhêrim,*  
*ketîye destê kotî şindokê mêrê xwe, bûye pîrejin*

Her wekî ji van mînakan jî diyar e, navdêr di dema banglêkirinê de qertafên bangnîşanî digirin û dikevin rewşa bangnîşanî. Ji bilî vê formê, carinan di dema banglêkirinê de navdêr qerfata pirhejmariyê ya tewangê jî werdigire. Her wekî *gelî hevalan!*, *Gelî birayan!* û hwd.

#### **1.4.2.6.2.4.4. Rewşên Navdêran ên din**

Di lîteratûrê de **rewşa bireseriyê** (causative) navdêrê heye, ew amraz navdêrê dixê rewşa bireserê. Di kurmanciyê de tewang kirde û bireserê ji hev cuda bike jî, ne nîşaneyê diyarkirina bireserê ye. Di hin pirtûkên rêzimanê de ev yek hatiye kirin, lê ev yek şaş e. Ew qertafên tewangê ku navdêrê dixin rewşa bireseriyê, di kurmanciyê de ji ber pergala ergatîfîyê di demên borî de (her wiha xwestekî yên ku li ser rayeka dema borî ya lêkerê ava dibin jî) bandorê li bireserê nakin, bi tenê di demên niha û bê de bireser tewandî ye. Her wiha ji ber ku daçek navdêrên piştî xwe dixin rewşa tewandî, ne tenê navdêrên ku bireser in, her wiha navdêrên ku bireserên nerasterê û têrker in jî dikevin forma tewandî. Bi kurtasî tewang biresera rasterast, biresera nerasterast û têrkeran ji hev cuda nake. Ew bi tenê kirde û bireserê ji hev cuda dike, li gorî demê cihê hêmana tewandî diguhere.

***Mînak:***

*Zinêr av vexwar.*  
*Zinar avê vedixwe.*

Hin kategoriyên rêzimanî yê ku cih û rewşa navdêrê nîşan didin, di kurdî de, her wekî hinek zimanên din ên Hind-Ewropî bi daçekan têne nîşandayîn. Navdêra ku piştî daçekê tê dikeve forma tewandî.

**Rewşa cihî (locative):** Ev rewşa di îngilîzî de bi *preposition*ên “in” û “at” tê nîşandayîn, di kurmançiyê de bi alîkariya daçekên *li* û *di...de* pêk tê. Daçeka *li* gelek daçekên hevedudanî yê *li ser, li ber, li nav, li pêş, li paş, li dor, li bin, li rex / nik / balpêk* tîne. Her wiha komedaçekên *di ...de* jî hinek daçekên hevedudanî yê *mîna di bin de, di nav de, di kêlekê de* û hwd. pêk tîne. Lê belê zêde bandora van daçekan li ser dirûvê navdêrê çênabe, bi tenê wan dixe forma tewandî û hew.

**Rewşa derketinê (ablative):** Ev rewş jî bi daçeka *ji* pêk tê. Her wekî tê zanîn di îngilîzî de *prepositiona from* heman peywirê bi cih tîne. Her wekî *ji dibistanê hat, ji malê derket, ji min veqetiya* û hwd.

**Rewşa amrazî, (instrumental):** Ev jî bi daçeka *bi* pêk tê. Zimanê îngilîzî de jî ev peywir *ji* hêla daçeka *by* ve tê bicihanîn. Her wekî *bi pênûsê nivîsand, bi balafîrê çûn Mêrdînê*.

**Rewşa berpêbûnê (dative):** Îro di kurmançiyê de tu amraz bi ber çavan nakevin. Di soranî de daçeka *bovê* peywirê bi cih tîne, di farisî de daçeka *be* bi heman peywirê radibe, lê di kurmançiyê de, ne daçek ne jî qerfatek vê peywirê bi cih tîne. Bi tenê forma tewandî ya navdêra ku piştî lêkera berpêbûnê tê, wê rewşê nîşan dide. Lê belê di kurmançî de di zimanê axaftinê de bi dawiya lêkeran ve dengê /-e/ heye, mirov dikare wê /-e/yê wekî bermahiya amraza berpêbûnê binirxîne. Her wekî *hate malê, kete erdê, rahişte pirtûkê* û hwd.

**Rewşa xwedantîyê (genitive):** Di kurmançiyê de ev rewşa bi ravekê pêk tê. Her wekî; *bavê min, birayê te, xwişka xezalê...*

### ***Bêrîvanê***

*Bêrîvanê, ramûsanekê ji te dixwazim,*

*Kubar-kubar xwe li ba neke,*

*Cêrêavaxwe hilde,*

*Ber kanînga derê mala bavê min*



*Xwe li me neke.*  
*Keçê, kulmalbavê,*  
*Were ramûsanekê li min kerem ke,*  
*Sala îsal bi avrûyê çeva xirab neke...*  
***Bêrvana min cêrê ava xwe hilda,***  
*Kubar-kubar dixingirî,*  
*Meşya ber kanînga derî **mala bavê min** dibuhurî.*  
*Heçî kesî bêje - **bêrvana te** ne rind e,*  
*Mîna **şûrekî Misirê,***  
*Xencerekeceferî,*  
*Kêreke almastî,*  
*Gulleke şeşagirî*  
*Serê **kezeba min** dane -*  
*Çar tilî serê **kezeba min** dibirî.*  
 (Cindî, 2008:31).

Hin caran jî veqetandek û cînavkên koma duyemîn tên berhev û vê rewşê pêk tînin. Wekî encama gelemperî ya kategoriyên rêzimanî yên têkildarî navdêrê em dikarin bibêjin, navdêr di kurdî de bi van çend dirûvan derdikeve pêşberî me.

	Xwerû / Binavkirî	Tewandî	Nebinavkirî	Nenavkirî û tewandî	Raveka binavkirî	Raveka nebinavkirî	Bangnîşanî
<b>Nêr</b>	heval	hevalî / hevêl	hevalek	hevalekî	hevalê qenc	hevalekî qenc	hevalo
<b>Mê</b>	heval	hevalê	hevalek	hevalekê	hevala min	hevaleke biçûk	hevalê
<b>Pirhejmar</b>	heval	hevalan	hevalin	hevalinan	hevalên min	hevaline xweşik	hevalino

#### 1.4.2.6.3. Kategoriyên Têkildarî Lêkeran

Ev kategorî ji hêmanên mîna kes, dem, rawe û avaniyê pêk tînin. Di kurdî de ev kategorî bi alîkariya hinek qertaf û amrazan xwe nîşan didin.

### 1.4.2.6.3.1. Kes û Kesandin

Di kurmancî de kes bi alîkariya *amrazên kesandinê*têne nîşandan. Rêzimanzanên kurd li ser binyada van amrazan xwediyê bîr û boçûnên cuda ne. Di serî de Celadet Bedirxan, hinek rêzimanzan wan amrazan bi lêkera /bûn/<sup>2</sup> ve girê didin. Di dema niha de gava ku mirov bala xwe dide rewşa lêkera /bûn/ê mirov xwediyên vê hizir û ramanê mafdar dibîne. Lê gava ku mirov di dema borî de bala xwe dide rewşê, mirov dibîne ku tu têkiliya amrazên kesandinê bi lêkera /bûn/ê re nîn e. Ji bo mijar baştir were fehmkirin em bala xwe bidin vê tabloyê:

<b>Dema niha</b>	<b>Dema borî</b>
Ez baş <b>im</b>	Ez baş bû <b>m</b>
Tu baş <b>î</b>	Tu baş bû <b>yî</b>
Ew baş <b>e</b>	Ew baş bû-
Em baş in / <b>în</b>	Em baş bû-( <b>î</b> ) <b>n</b>
Hûn baş <b>in</b>	Hûn baş bû- <b>n</b>
Ew baş <b>in</b>	Ew baş bû- <b>n</b>

Hinek rêzimanzan amrazên kesandinê bi lêkera *hestena* farisî ve girêdidin, ev raman jî li gorî baweriya me ne di cih de ye, lewre di farisî de jî hinek amrazên kesandinê bi lêkera *bûden* û *hestenê* ve girêdidin, lê belê gelek kes jî wan wekî *şînase* bi nav dikin. Ji ber ku rayeka dema niha ya lêkera /bûn/a ku rewşê nîşan dide di kurmancî de nemaye, li şûna wan bi tenê amrazên kesandinê têne bikaranîn.

Di kurmancî de kêmasiya van cînavkên kesandinê ev e ku ji bo sê kesên yekhejmar cînavkên cihê ne, lê belê cînavkên kesandinê ji bo her sê kesên pirhejmar yek e. A rast di zimanê devkî de cînavka kesandinê ya kesa/ê yekemîn a pirhejmar /-în/ e. Ev di klasîkên kurdî de jî hatiye bikaranîn, hin devokên kurmanciyê de hê jî tê parastin, lê belê di zimanê nivîskî de nîn e. Ev rewş bandora van cînavkan kêmbike. Lewre ji bo kesên pirhejmar mirov ji bêgavî digel wan cînavkên kesane jî bi kar tîne.

Niha ji bo zelalkirina mijarê em dişên çend nimûneyan pêşkêş bikin.

<sup>2</sup> Li vê derê divê em diyar bikin ku di kurdî de du lêkerên /bûn/ hene, yek ji wan hevokên navdêrî çêdike û rewşê nîşan dide, ewa din jî rûdan û qewimînekê nîşan dide. Lêkera /bûn/a ku rêzimanzan amrazên kesandinê pê ve girê didin, /bûn/a yekemîn e, ku rewşê nîşan dide.

### ***Lê lê kinê***

*Lê lê kinê lê lê mala minê way way*  
*Ez ne kin **im** lê lê pel dirêj im way way*  
*Tak rihanan lê lê pel dirêj **im** way way*  
*Aqilê xortan lê lê ez **tavêjim** way way*  
*Ez ne kin im lê lê ne kinik **im** way way*  
*Tak rihanan lê lê pel hûrik **im** way way*  
*Aqilê xortan lê lê sivik **dikim** way way*  
*(Cîgerxwîn, 1988: 65).*

### **1.4.2.6.3.2. Ergatîfî**

Taybetîyeke din a kurdî jî taybetîya ergatîfîyê ye. Ev jî taybetîyeke zimanên qedîm ên îranî ye. Pêşî em bala xwe bidin ravekirin û pênasekirina ergatîfîyê. “Ergatîfî ew tişt e ku bikera hevoka lêkera têper, wekî biresera hevoka bi lêkera têneper bi nîşanekeke morfolojîk were nimandin.” (Bynon, 1979 211:) Ergatîfî du cure ne; ergatîfîya sentaksî û ergatîfîya morfolojîk. Zimanên hind-îranî ji aliyê morfolojîk ve ergatîf in. Ji van zimanan belûçî, hindî û zaravayên bakur ên kurdî di dema borî de ergatîf in. Theodora Bynon di gotara xwe ya bi navê *The Ergative Construction in Kurdish* (Avanîya Ergatîf di Kurdî) de daye zanîn ku van zimanên hind-îranî de ergatîfî bi demên borî berbendkirî ye û di van zimanan de du rewşên navdêrê (rewşa xwerû û ya tewandî) hene. Di vê gotarê de ji bo nîşandana ergatîfîyê ev hevok wekî mînak hatine pêşkêşkirin:

*“A- Lêkera têneper di dema niha de*

*1- Hesp dikeve.*

*2- Hesp dikevin.*

*B- Lêkera têneper di dema borîya têdeyî de*

*3- Mirov hat.*

*4- Mirov hatin.*

*C- Lêkera têper di dema niha de*

*5- Hesp mirovî dibîne.*

6- *Hesp mirovan dibîne.*

D- *Lêkera têper di dema borîya têdeyî de*

7- *Şivên hesp dît.*

8- *Şivên hesp dîtin.*

9- *Şivanan hesp dît.*

10- *Şivanan hesp dîtin.*

Ji van hevokan hevokên rêza (D) hevokên ergatîf in. Ji ber ku kirdeya van hevokan tewandî û bireser xwerû ye û lêker li gorî biresera xwerû hatiye kişandin. Ji zimanên îranî zimanê di belûçî de jî heman rewş heye.”(Bynon, 1979: 212-213).

Agnes Korn di gotara xwe ya bi navê *The Ergative System in Balochi From a Typological Perspective* (Di Zimanê Belûçî de Pergala Ergatîve, ji Perspektîva Tîpolojîk) de der barê ergatîfiya vî zimanî de wiha gotiye: “Her wekî gelek zimanên îranî yên nûjen, piranîya zaravayên belûçî diyardeya ergatîfiya parçeyî (split ergative) nîşan didin. Wate, ev ziman di hemû demên bi rayeka dema niha de avanîyeke nomînatîf nîşan dide; di van hevokan de lêker di rewşa xwerû û bireser (obje) di rewşa tewandî de ye. Di van hevokan de lêker li gorî kirde tê kişandin. Di hevokên bi rayeka dema borî de jî avanîya ergatîf heye anku bi tenê kirdeya hevokên bi lêkerên teneper di rewşa xwerû de ye, li hemberî vê yekê bikera hevokên bi lêkera têper di rewşa tewandî de ye û bireser di rewşa xwerû de ye” (Korn, 2009: 44-45).

Li alîyê din, di zaravayên başûr ên kurdî û zimanê farisî de ev rewş nîn e. Di hemû deman de lêker li gorî kirdeyê tê kişandin. Her wekî Bynon (1979) jî destnîşan dike ev hevokên li jorê bi kurmançîya jêrîn (sorani) bi vî rengî ne:

A- *Lêkera teneper di dema niha de*

1- *Espeke ekewêt..*

2- *Espekan ekewin.*

B- *Lêkera teneper di dema borîya têdeyî de*

3- *Piyaweke hat.*

4- *Piyawekan hatin.*

*C- Lêkera têper di dema niha de*

*5- Espeke piyaweke ebînêt.*

*6- Espeke piyawekan ebînêt.*

*D- Lêkera têper di dema borîya têdeyî de*

*7- Şwaneke espekey bînî.*

*8- Şwaneke espekanîbînî.*

*9- Şwanekan espekeyan bînî.*

*10- Şwanekan espekanyan bînî. (Bynon, 1979: 216).*

### **1.3.2.6.3.3. Xuyang**

Xuyanga rêzimanî “Kategorîyeke têkildarî dem û raweyên lêkeran e, di lêkeran de qala nîşaneyên lêkerî dike, ew ên ku mawe û domdarîya rûdan û qewimînê nîşan didin” (Crystal, 2008:38). Di xuyangê de mirov bala xwe dide aliyên mîna ka kar qedîyaye yan jî neqedîyaye; didome yan jî dubare dibe û hwd. Di kurmancî de di navbera dema borîya têdeyî û dema borîya dûdar de têkilîyeke xuyangê heye. Di kurmancîya nivîskî ev xuyang hene:

Xuyanga adetî: Hogir her tim tê mala me.

Xuyanga berdewam: Hogir dinivîse; Hogir ê dinivîse; Hogir dinivîsîye.

Xuyanga dubareyî: Hogir firaqan dişo û vedişo an jî dişoteve.

Xuyanga netemam: Hogir firavînê dixwe.

Xuyanga temam: Hogir hatiye; Hogir hatibû

Her wekî ji van nimûneyan jî diyar e, di kurmancîyê de dubarekirin bi alîkarîya pêşgira /-ve/ yan jî paşgira /-eve/ pêk tê. Domdarî bi alîkarîya pêşgira /di-/, morfema /ê/ û paşgira /-e/ pêk tê.

### **1.4.2.6.3.4. Dem û Rawe**

Dem û rawe jî du kategorîyên sereke yên rêzimanî ne. Her wekî tê zanîn di rêzimanê de lêkerên kişandî raweyan pêk tînin, ew jî dibin du cure:

*1) Raweyên pêşkerî*

*2) Raweyên xwestî (sewirandî)*

Ev her du cure rawe jî ji aliyê peyvsaziyê ve dibin du cure:

- 1) *Raweyên ku li ser rayeka dema borî ava dibin.*
- 2) *Raweyên ku li ser rayeka dema niha ava dibin.*

#### **1.4.2.6.3.4.1. Raweyên Pêşkerî**

Ev rawe bûyer û qewimînên pêkhatî, ew ên di qonaxa pêkhatinê û ew ên ku dê pêk werin, nîşan didin. Bi kurtasî raweyên pêşkerî deman nîşan didin. Ji van deman hinek li ser reha dema niha ava dibin, hinek jî li ser reha dema borî ava dibin. Demên ku li ser reha dema niha ava dibin bi rewşeke ku hê pêk nehatîye û di qonaxa pêkhatinê de ye, nîşan didin. Herçîdemên ku li ser reha dema borî ava dibin jî qewimîn û bûyereke ku pêk hatiye û dem di ser re derbas bûye nîşan didin. Di demên borî de tiştê hêjayî qalkirinê rewşa ergatîfîyê ye, di van demê de lêkerên têper li gorî bireserê têne kişandin. Di kurmacîyê de demên borî yên sereke ev in:

- 1) Dema borîya têdeyî (sade)
- 2) Dema borîya dûdar
- 3) Dema borîya berdest (çîrokîya dema niha)
- 4) Çîrokîya dema borîya têdeyî(dema borîya dûr)

Di kurmacî de dem bi vî rengî ne:

- 1) Dema niha
- 2) Dema bê
- 3) Demên borî:
  - a) Dema borîya têdeyî
  - b) Dema borîya dûdar
  - c) Dema borîya berdest
  - d) Çîrokîya dema boriya têdeyî (dema boriya dûr).

#### **1.4.2.6.3.4.1.1. Dema Niha**

Ev dem kar û barekî di pêvajoya pêkhatinê de nîşan dide. Di vê demê de reha dema niha ya lêkerê, pêşgira /di-/ û qertafên kesandinê digire. *W. M. Tackston* ev mijar wiha rave kiriye: “Dema niha ya kurmacîyê beranberî dema fireh a îngilîzî (I

work) û dema niha (I am working) tê. Ew dem li ser reha dema niha ya lêkerê ava dibe” (Thackston, 2006:33).

Wî daye zanîn ku reha lêkeran bi gelemperî nerêzikî ye û divê mirov ji ber bike, ji bo vê rewşê jî lêkerên *dîtin>binû xwestin>xwazwekî* mînak dane. Her wiha wî daye xuyakirin ku lêkerên bi dawîkerên /-an/, /-iyan/, /-în/ û /ûn/ rêzikî ye û bi xistina van dawîkeran bi dest dikeve. Her wiha lêkerên bi /-andin/ê diqedin jî rêzikî ne û ew /-andin/ dibe /-în/.

Thackston di vî warî ev mînak dane:

<b>çûn/-ç- (reha bi nedengdêrê diqede)</b>	<b>Çûn/ neyînî</b>	<b>şûstîn/-şo- (reha bi dengdêrê diqede)</b>	<b>Şûştin/ neyînî</b>
ez diçim	ez naçim	ez dişom	ez naşom
tu diçî	tu naçî	tu dişoyî	tu naşoyî
ew diçe	ew naçe	ew dişo	ew naşo
em diçin	em naçin	em dişon	em naşon
hûn diçin	hûn naçin	hûn dişon	hûn naşon
ew diçe	ew naçin	ew dişon	ew naşon

(Thackston, 2006:34).

***Mînak:***

*Bavê Bavo dûrebînê ber çevê xwe **dixîne**,*

*Koma celaliya Şerefxanî şewitîda ha **dibîne**.*

(H. Cindî, 2008:46).

\*\*\*

*Herê avê, herê avê,*

*Tu şev **diçî**, tu ro diçî,*

*Kesî **nakî** pirs û silavê.*

(Cindî, 2008:170).

\*\*\*

*Mirin usan e:*

*Wexta meriv kal **dibe**, pîr **dibe**, yan jî cahil e, bê sehet e,*

***Dimire, diçe xwera disitire.***

*(Cindî, 2008:176).*

Wekî ji mînakan jî diyar e, ev dem hin caran karekî ku her tim pêk tê yan jî tê kirin nîşan dide, hin caran jî kar û barê di qonaxa pêkhatinê de ye, nîşan dide.

#### **1.4.2.6.3.4.1.2. Dema Bê**

Ev dem jî li ser reha dema niha ava dibe, her wekî C. Bedirxan û Roger Lescot (2001) di pirtûka xwe ya *Grammaire Kurde* (Rêzimana Kurdî) de diyar kiriye, forma lêkerê wekî dema niha ya xwestekî ye. Hevoka dema niha ya xwestekî amraza dema bê /ê/, /dê/ digire. Her wekî;

<b>Çûn:</b>	<b>Neyînî</b>
<i>Ez ê biçim.</i>	<i>Ez ê neçim.</i>
<i>Tu yê biçî.</i>	<i>Tu yê neçî.</i>
<i>Ew ê biçe.</i>	<i>Ew ê neçe.</i>
<i>Em ê biçin.</i>	<i>Em ê neçin.</i>
<i>Hûn ê biçin.</i>	<i>Hûn ê neçin.</i>
<i>Ew ê biçin.</i>	<i>Ew ê neçin.</i>

***Mînak:***

*Ez ê bînim, ez ê bînim*

*Ez ê Hemo axa bi xwe re bînim*

*Koma eşîrê pê re bînim*

*Girtikê xwe ji te bistînim.*

*(Cegerxwîn, 1988:106).*

\*\*\*

*Quling, merimo, berya wêran rê dirêj e*

*Mal xiravo, berya wêran rê dirêj e*

*Ez qulinga dewsa wara hine kerr in, hine gêj in*

*Quling, de tu were ez û tu va em ê destê hevdû bigirin*

*Ez ê halê xwe û te ra çend kilama vira bêjim.*

*(Cindî, 2008:66).*



### 1.4.2.6.3.4.1.3. Dema Borîya Têdeyî (Sade)

Ev bûyer û rûdanên ku di demeke diyar de pêk hatiye û bi dawî bûye nîşan dide.

*Mînak: Me par mala xwe ji gund anî bajêr.*

Du mînak ji stranên Mihemed Şêxo:

#### *Dunya bû buhar*

*Dunya bû buhar, xunav hate xwar*

*Li ser geya û gul cejna dost û yar*

*Neçe seyranê bejinrihanê*

*Soz û qirarên te kanî gula dîlanê*

*Nehate ba min şeng û zerya min*

*Agir berda dilê min, yara min ew bû*

(Şêrîn, 1994:7).

\*\*\*

*Xem û xeyalên te ez revandim*

*Çol û belana te ez gihandim*

*Ji ber te sotim, te ez şewandim*

*Bayê evîniya te ez hejandim (...)*

(Xêrîn, 1994:12).

### 1.4.2.6.3.4.1.4. Dema Borîya Dûdar

Di vê demê de bûyer û rûdan di dema borî de pêk hatiye, lê belê em niha li ser encamên wê dipeyivin, an jî encam û bandora wê li ber çavên me ye. Hin caran ev dem ji bo rûdanên ku em nû pê dihesin jî tê bikaranîn.

*Agirê derdê te îro sotime wek perperîk*

*Awirên wan her du çavan li vekirine sed birîn*

(Şêrîn, 1994:18).

Her wekî ji van rêzikan jî diyar dibe, di vê demê de bûyerek heye ku encama wê li ber çavan e. Di vê mînakê de jî heman rewş heye:

*Heps û zindan kûr û tarî xewa min nayê*  
*Ji eşq û evîna gulê **ketime** belayê.*  
(Şêrîn, 1994:31).

Stranbêj heke bigota, *ketim belayê* wisa diyar dibû ku ew ketiye belayê û lê ji belayê rizgar bûye, lê dema dibêje, *ketime belayê* ew tê wê wateyê ku hê jî di nav belayê de ye. Di vê mînakê de jî heman rewş bi ber çavan dikeve.

#### **1.4.2.6.3.4.1.5. Dema Borîya Berdest**

Ev demeke hevedudanî ye û di dema borî de qala bûyereke domdar dike. Heke tiştek di dema borî de li ser hev hatibe kirin, hingî em vê demê bi kar tînin. Her wekî me li jorê jî da xuyakirin, navekî din ê vê demê jî *çîrokiya dema niha* ye anku dema niha ya di dema borî de ye. Îcar em dikarin bi çend mînanan mijarê zelaltir bikin.

##### **Mînak:**

*Çûme mêrgê zemîn li dest,*  
*Ewan ji xwera mirazek **dixwest.***  
(Cindî, 2008:171).

*Bêrîvana min cêrê ava xwe hilda,*  
*Kubar kubar **dixingirî***  
*Meşya ber kanînga derî mala bavê min **dibuhurî.***  
*Heçî kesî bêje - bêrîvana te ne rinde,*  
*Mîna şûrekî Misirê*  
*Xencereke ceferî*  
*Kêreke almastî,*  
*Gulleke şeşagirî*  
*Serê kezeba min dane*  
*Çar tilî serê kezeba min **dibirî.***  
(Cindî, 2008:31).

#### 1.4.2.6.3.4.1.6. Çîrokîya Dema Borîya Têdeyî

Ji vê demê re wekî *dema borî ya dûr* jî tê gotin. Heke du bûyer li pey hev pêk hatibin, ji bo bûyera pêşîn çîrokîya dema boriya têdeyî tê bikaranîn. Ev dem bi taybetî di hevokên hevedudanî de tê bikaranîn. Her wekî; “*Gava ku ez gihastim malê bavê min ji malê derketibû.*”

Her wekî xuya ye, bûyera “derketina ji malê” berî “gihaştina malê” pêk hatiye.

##### Zerî domam

*Zerî domamê ewiran û ezmanan ringering e,  
Zerî domamê hilda mîrkut çû dora sîngî kon e,  
Telamek jê pekiyabû, (li) gûzeka zerî domama min ketibû,  
Xizêma zerî domamê ji bêvilê firîbû.*  
(Cindî, 2008:89).

Herçî çîrokîya *dema boriya dûdar e*, zêde nayê bikaranîn. Di vê demê de karek, kirin heye ku di dema borî de bêhemdî hatiye kirin û mirov piştî pê hesiyaye. Em mînakekê jî stranan bidin û mijarê bi dawî bikin:

*Ezê vê sibê çûbûme ser mele- xewna min dernanî,  
Ez çûbûme ser keşîş - xewna min şiro nekir,  
Ezê dîsa por û poşman vegeyriyabûm.*  
(Cindî, 2008:140)

#### 1.4.2.6.3.4.2. Raweyên Xwestekî

Di van raweyan de ew kar û bar tîn vegotin ku me ew di dil û serê xwe re derbas kirine lê belê hêştî me ew pêk neanîne yan jî me nekariye em pêk bînin. Ev cure rawe ji ber ku hêvî û daxwazên me di nava xwe de dihewînin, wekî raweyên xwestekî jî hatine binavkirin. Di kurdî de pêşgira raweyên xwestekî/bi-/ ye. Ev qertaf tê pêşiya rayekan û tevî qertafên kesandinê lêkeran dixwe forma raweyên xwestekîyê.

1) Raweya fermanî

- 2) Dema niha ya xwestekî
- 3) Dema borî ya xwestekî
- 4) Dema borî ya pêknehatî
- 5) Dema bê ya pêknehatî (çîrokîya dema bê)

#### 1.4.2.6.3.4.2.1. Raweya Fermanî

Ev rawe ji aliyê wateyê ve kar û daxwazekê nîşan dide ku pêkanîna wî kar û wê daxwazê li ser yekî/ê tê ferzkirin. Ferman li kesê(n) duyemîn anku bihîzer û guhdêr tê kirin. Qertafa raweya fermanî ji bo kesên duyemîn ên pirhejmar qertafa kesandinê ya pirhejmariyê /-in/êye. Lê belê ji bo kesê/a duyemîn qertafa fermanê /-e/ ye. Ev /-e/ bes di raweya fermanî de heye, ji bilî wê bi ber çavan nakeve.

Her wiha qertafa forma neyînî ya raweya fermanî jî di hinek devokan de wekî raweyên din /ne-/ ye û di hinek devokên kurdî de /me-/ ye, ev qertafa /me-/ jî jî xwesarî raweya fermanî ye, di raweyên din de nayê dîtin. Taybetiyeke din a têkildarî mijarê jî ev e; di lêkerên ku bi pêşgiran pêk hatine de qertafa /bi-/ dikeve.

Em ê niha pêşî çend lêkeran di forma raweya fermanî de wekî tablo pêşkêş bikin û piştê jî ji zargotin û wêjeya kurdî çend mînakên pêşkêş bikin.

<i>Lêker (rader)</i>	<i>Ferman (yekhejmar)</i>	<i>Ferman (pirhejmar)</i>
<i>xwarin</i>	<i>bixwe /mexwe</i>	<i>bixwin / mexwin</i>
<i>kirin</i>	<i>bike / meke</i>	<i>bikin / mekin</i>
<i>raxistin</i>	<i>raxe / ramexe</i>	<i>raxin / ramexin</i>
<i>avêtin</i>	<i>biavêje /meavêje</i>	<i>biavêjin / meavêjin</i>
<i>kirîn</i>	<i>bikire / mekire</i>	<i>bikirin / mekirin</i>
<i>veşartin</i>	<i>veşêre /vemeşêre</i>	<i>veşêrin / vemeşêrin</i>

Mînak:

*Evdo babo, tu **bike** kar e*

*Malan bar kir ji êvar e*

*Kê ez kuştim, şêr esmer e*

*Bînin, bînin, hespan **bînin***

*Teng û bera lê **bişidînin**,*

*Mala Evdo pê birevînin*

(Cindî, 2008:68).

\*\*\*

*Tişê bike bilezîne*

*Têjîrê ji xêm bikişîne*

*Teng û bûsa bişidîne*

*Xu bi kavrîn ra bigêjîne*

*Pirsekê ese min ra bîne*

(Cindî, 2008:100).

### 1.4.2.6.3.4.2.2. Dema Niha ya Xwestekî

Ev rawe bi xwe ne demekê, lê daxwazekê nîşan dide. Her wekî Thackston (2006) jî daye xuyakirin li ser reha dema niha tê avakirin, di vê demê li şûna pêşgira /di-/ ya dema niha ya pêşkerî, pêşgira /bi-/ ya raweyên xwestekî tê.

**Mînak:**

<b>Xwestin &gt; xwaz</b>	
<i>Erênî</i>	<i>Neyînî</i>
<i>Ez bixwazim.</i>	<i>Ez nexwazim.</i>
<i>Tu bixwazî.</i>	<i>Tu nexwazî.</i>
<i>Ew bixwaze.</i>	<i>Ew nexwaze.</i>
<i>Em bixwazin.</i>	<i>Em nexwazin.</i>
<i>Hûn bixwazin.</i>	<i>Hûn nexwazin.</i>
<i>Ew bixwazin</i>	<i>Ew nexwazin.</i>

Li ser vê demê bi alîkariya hinek lêker û daçek û amrazan gelek rawe (hekanî, bilanî, dibetî...) pêk tên. Ji aliyê dirûvê lêkerê ve ev hemû mîna hev in, bi tenê lêker, daçek û amrazên ku wateya wan ji hev cuda dikin, dihêlin ku em navên cuda li wan raweyan bikin.

<i>Amraza raweyê</i>	<i>Lêker</i>	<i>Rawe</i>
<i>Bila</i>	<i>biçe/neçe</i>	<i>bilanî</i>
<i>Divê</i>	<i>bike/neke</i>	<i>divêtî</i>

<i>Heke</i>	<i>bîne/neyne</i>	<i>hekanî</i>
<i>Dikare</i>	<i>bixwe/ nexwe</i>	<i>şiyani</i>
<i>Dixwaze</i>	<i>were/neyê</i>	<i>daxwazî</i>
<i>Dê</i>	<i>biavêje/neavêje</i>	<i>dema bê</i>
<i>Dike</i>	<i>bilîze/nelîze</i>	<i>dema bê ya nêzik</i>
<i>Dikare/ dişê</i>	<i>bikire/nekire</i>	<i>şiyani</i>
<i>Xwezî</i>	<i>vegere/venegere</i>	<i>daxwazî</i>

Di vê mijarê de aliyekî hêjayî dabaşkirinê jî rewşa dema bê ye. Dema ku mirov ji aliyê pêkhatinê ve lê binêre, di kurmanciyê de dema bê jî dikeve nav kategoriya raweyên sêwirandinê, lê belê ev dem ji aliyê wateyê ve plan û bernameyekê di nava xwe de dihevine lewma jî di nav raweyên pêşkerî de hatiye bicihkirin. Her wiha çirokiya dema bê jî bi awayê pêkhatina xwe û bi wateya xwe divê di nav koma sêwirandinên pêknehatî de were bicihkirin. Lewre tê de tiştek heye ku pêkanîna wê hatiye sêwirandin, lê belê dem di ser re derbas bûye û pêk nehatiye.

### **Mînak:**

*Mîro qurban, roja me derketiye aliyê Gêrsê rojhilatê  
Bira kula Xudê bi kul be, têkeve mala Welîyê Wanê,  
Mururê Kopê, Cendirsîyê Gêrsê, îzbaşîyê bi Xelatê,  
Çawa îro sê ro, sê şeve digirim pey Mehmed, Dewrêş,  
Li beladiyê cesûsîyê, Taqîbatê.*

(Cindî, 2008:137).

\*\*\*

*Xewa kê tê, bila here razê,  
Xewa kê nayê, bila rûne, ez jê ra bêjim.*(Celîl,1978:118).

\*\*\*

*Felekê mala xweyî şewitîyê, tê dikişî, nakişî qe newastî,  
Notila çemê dorê kefe, gerrîneka bûne hestî,  
Gere (divê) meriv îtbara xwe cahil-cûhilê vî zemanî neyne.*

(Cindî, 2008:169).

### 1.4.2.6.3.4.2.3. Dema Borî ya Xwestekî

Ev rawe li ser reha dema borî ya lêkerê, bi alîkarîya reha dema niha ya lêkeran /bûn/ û qertafên kesandinê pêk tê. Her wek;

#### Hatin

<i>Erênî</i>	<i>Neyînî</i>
<i>Ez hatibim</i>	<i>Ez nehatibim</i>
<i>Tu hatibî</i>	<i>Tu nehatibî</i>
<i>Ew hatibe</i>	<i>Ew nehatibe</i>
<i>Em hatibin.</i>	<i>Em nehatibin.</i>
<i>Hûn hatibin.</i>	<i>Hûn nehatibin.</i>
<i>Ew hatibin.</i>	<i>Ew nehatibin.</i>

#### Dîtin

<i>Te ez dîtibim.</i>
<i>Min tu dîtibî.</i>
<i>Wan ew dîtibe.</i>
<i>Wî em dîtibin.</i>
<i>Me hûn hatibin.</i>
<i>Te ew hatibin.</i>

Li ser vê demê jî gelek rawe bi alîkarîya hinek lêker û amrazan pêk tên. Hin caran jî di pêkanîna hevokên hevedudanî de tê bikaranîn.

Hatîn (têneper)			Gotin (têper)		
<i>Heke</i>	<i>ez</i>	<i>hatibim</i>	<i>min</i>	<i>ev peyv</i>	<i>gotibe</i>
<i>Divê</i>	<i>tu</i>	<i>hatibî</i>	<i>te</i>	<i>ew kar</i>	<i>kiribe</i>
<i>Xwezî</i>	<i>ew</i>	<i>hatibe</i>	<i>wî / wê</i>	<i>ew tişt</i>	<i>xwestibe</i>
<i>Dibe ku</i>	<i>em, hûn,</i>	<i>hatibin</i>	<i>me, we, wan</i>	<i>çar pirtûk</i>	<i>biribin</i>
<i>Dê</i>	<i>ez</i>	<i>çûbim</i>	<i>Min ê</i>	<i>ev kar</i>	<i>kiribe.</i>
<i>Her çend</i>	<i>ew</i>	<i>çûbin</i>	<i>wan</i>	<i>karê xwe</i>	<i>kiribe</i>

#### Mînak:

*Heke me ew ji cem hoste Melko kirîbe jî em dibêjin me ew ji Parîsê anî.*  
(Ronahî, 1985:91)

#### 1.4.2.6.3.4.2.4. Xwestekîya Pêknehatî

Koma duyemîn ku em navê xwestekîya dema borî ya pêknehatî lê dikin, qala sêwirandina tiştêkî pêknehatî dike. Di raweyên xwestekî yên dema niha de pêkanîna karekî heye ku hê derfetên pêkanîna wî karî hene, di koma raweyên xwestekî yên dema borî de dem di ser re derbas bûye, lê belê pêkhatina wê ne zelal e, hin caran jî encama wê ne teqez e. Herçî raweyên xwestekî yên dema borî yên pêknehatî ne, êdî dem di ser wan re derbas bûye û derfeta pêkanîna wan nîn e. Ew jî bi du forman derdikeve pêşberî me:

1- *bi+rayeka demaborî+qertefa xwestekî = bi+kir+a*

**Mînak:**

<i>Heke</i>	<i>min</i>	<i>bikira</i>
<i>Divê</i>	<i>tu</i>	<i>biçûya</i>
<i>Belkî</i>	<i>em</i>	<i>bihatana</i>
<i>xwezî</i>	<i>we</i>	<i>bixwesta</i>
<i>Min</i>	<i>ê</i>	<i>bikira</i>

Forma duyemîn li ser bingeha çîrokiya dema boriya têdeyî ava dibe.

2- *rayeka dema borî+dengê alîkar+lêkera alîkar+ qertefa xwestekiyê = got+i+bû+ya*

**Mînak:**

<i>Heke</i>	<i>min</i>	<i>kiribûya</i>
<i>Divê</i>	<i>tu</i>	<i>çûbûya</i>
<i>Belkî</i>	<i>em</i>	<i>hatibûya</i>
<i>xwezî</i>	<i>we</i>	<i>xwestibûya</i>
<i>Min</i>	<i>ê</i>	<i>kiribûya</i>

**Mînak:**

*Lê domamê, te zû bigota,*

*Minê qayîşa pişta xwe bifrota*



(H.Cindî, 2008:118).

\*\*\*

*Xuzla xêra xudêra minê gede lawikê xu **bidîta***

(Cindî, 2008:39).

\*\*\*

*Dewrêşo, xwezka dilê min **bixwesta***

*Dewrêşê Evdî delalê dilê min,*

*Di ber derê mala bavê mida **bihata** û **rawesta**,*

*Tasekî avê ji min **bixwesta**,*

*Minê li şûna fincanê avê û şûna fincanê çayê,*

*Minê cotê zermemika ji Dewrêşê xwera*

*Borim **bikira**, **bida** desta.*

*Mixseda dilê min gelek hebû-*

*Minê hêja ji rebê xwe **bixwesta**.*

(Cindî, 2008:56).

\*\*\*

*Xwezila xêra Xudê mîrê miraza ra*

*Cahabeke xêrê min ra **bihata***

***Bigotana** gede lawikê te nîşan danîye, kuştîye mera ser zinêre.*

(Cindî, 2008:146).

\*\*\*

*Hergê min **bizanbûya** dinya wa ye*

*Min şûra hêşîn, çend sîyara anqosî xwe ra **bianîya** ha li vir e*

*Minê serê heft qewazê te **jêkira**,*

*Bira koma te **bihata** hewarê...*

(Cindî, 2008:153).

Em ji bo vê mijarê nimûneyekê ji helbesta Ehmedê Xanî bidin:

*Ger dê **hebûya** me jî xudanek,*

*Alî keremek, letîfe danek,*

*Ilm û huner û kemal û ezan,*

*Ş'er û xezel u kitêb û dîwan,*

*Ev cins **biba** li ba wî me'mûl,  
Min dê alema kelamê mewzûn  
Alî **bikira** li banê gerdûn,  
Binave ruhê Melê Cizîrî,  
Pê hey **bikira** Elî Herîrî,  
Keyfek wê **bida** Feqê Teyran,  
Heta ba ebed **bima** hexjran"*  
(E. Xanî, 2004: 49).

#### **1.4.2.6.3.5. Avanî**

Ev kategorî ji alîyê wateyî ve bala xwe dide avanîya hevokê de, di hevokê biker li pêş e, yan bireser, biker xwe bi xwe kiriye yan bi yekî din daye kirin. Avanîyên sereke ev in: 1) *Lebatî*, 2) *Tebatî*, 3) *Dançêker*.

##### **1.4.2.6.3.5.1. Avanîya Lebatî**

Avanîya lebatî asayî ye, di vê avanîyê de biker li pêş e. Dema ku yek dibêje,

“*Min duh bi şev pirtûkeke helbestan xwend*”, ew hevokeke bi avaniya lebatî ava dike. Li vê derê kirde li pêş e. Di hevokên lebatî de dema em pirs kirdeyê bikin, ew bi awayekî zelal xwe nîşan dide. Ji bo ronîkirina mijarê em hevokeke din wekî mînak bidin.

“*Di bîst û çarê Çiriya paşîn de, şeva Çarşenbê piştî eşayê min dest avête kovara Hawarê û çend rûpelên wê bi kêf û eşiq xwendin*” (Ronahî, 1985:208).

Di vê hevokê de dema ku em pirs “kê?” ji pêvebera hevokê bikin, hingê cînavka *min* bi awayekî zelal xwe nîşan dide. Di vê hevokê debiker û (heke lêker têper be), xwe bi awayekî zelal didin dest. Di dema niha de *kî çi dike?*, di demên borî de *kê çi kir?* biker û bireserê nîşanî me didin. Heke lêker teneper be, hingê bi tenê kirde xuya dibe.

- *Kê dest avêt çi?*

- *Min (nivîskarî) dest avêt kovara Hawarê.*

### 1.4.2.6.3.5.2. Avaniya Tebatî

Li aliyê din di avaniya tebatî de biker bi paş ve tê kişandin, hin caran ser *bikerê* tê nuxamtin, bûyer bi xwe derdikeve pêş. Bûyer bi xwe jî ji ber ku xwe di bireserê de nîşan dide, lewma jî divê lêkera ku avaniya tebatî li serê ava dibe, lêkereke têper be. Her wekî Thackston (2006) bal kişandiye serê, di kurmancîyê de avaniya tebatî bi alîkariya lêkera *hatinê* pêk tê. Ev lêker li gorî dem, kes û raweyê tê kişandin, lêkera bingehîn di forma raderî de dimîne. Heke em yekemîn hevoka lebatî îcar bixin forma tebatî, dê bikeve rewşeke wiha: “*Duh bi şev pirtûkeke helbestan hate xwendin.*”

Îcar em nikarin pirseke bi rengê ya jorîn ji vê hevokê bikin. Lewma kirde li holê nîn e, heke hebe jî bi awayekî nuxamtî yan jî nerasterast derdikeve holê. Em ji hevokên tebatî pirsra çidikin. Dema ku em dibêjin, *çi hate xwendin?*, bersiva wê diyar e, ew jî *pirtûk* e. Ji bo zelalkirina mijarê em çend hevokan ji kovara Hawarê bineqînin û pêşkêşî we bikin:

\* *Di van febrîkan de Cola tête helandin û ji bo balafiran depên pola tête çêkirin.* (Ronahî, 1985:85).

\* *Diktoran qerara xwe da ko di zikê xanimê de girêkek çêbûye û ji lew ra diviyabû zikê xanimê bête vekirin û girêk bête derêxistin.* (Ronahî, 1985: 239).

\* *Li 19ê Tîrmehê di navbera Frensê û Japonyayê de lihavhatinek hate imzakirin.* (Nêrevan, 1998: 778).

\*\*\*

*Heylo Mîro, kela Toplaqelê warê paşa*

*Bejina Evdila begê min bejina çux-çerkeza şer-qumaşa*

*Divê Evdila begê min hatiye kuştin*

*Bira dewsê xweş be Şikrînpaşa*

(Cindî, 2008:191).

\*\*\*

*Dîsan mêrê çê, egît û ezîz wê bimirin, em ê bêne kuştin.* (Cindî, 2008:191).

\*\*\*

*Şêx Mirzayê şêxa dike gazî:*

*Fêrîk paşa, te male xirav be,*

*Ez tême kuştin,*  
*Tucara tera nayêm rayê.*  
(Cindî, 2008:153).

Her wekî ji mînakên jî diyar e, di avaniya tebatî de kêşana lêkerê li ser lêkera alîkar *hatinê* pêk tê, lêkera din di forma raderî de ye.

#### **1.4.2.6.3.5.3. Avaniya Hokerî**

Ew avani jî li ser lêkerên têper ava dibe. Her wekî çawa di avaniya tebatî de lêkera “hatin”ê li gorî kes û raweyê tê kişandin, di avaniya dançêker de jî lêkera “dan”ê bi heman awayî li gorî kes û raweyê tê kişandin. Di vê avaniyê de tu karekî nakî hinekên din li şûna te wî karî dikin. Bo nimûne, “*Wî deriyê mala xwe li ser xerad da çêkirin.*”

Em bi çend nimûneyên din vê mijarê bi dawî bikin.

*Dîsa miletê wî je re got; ji Xudanê di xwe bipirse, bila ji kerema xwe ji me re rengê wê çêlekê bide zanîn.* (Bedirxan, 1998:725).

*\*Ji lewre îngilîzan cihê bejtengê ê tengtir kola û tê de çaleke 50 mêtir dirêj û 6 mêtir kûr daye çêkirin.* (Ferho, 1998:994).

*\*Xanî bi vî awayî ji Même Alan re guhartoke nû, guhurtoke nivîsandî saz kiriye û ev guharto di hin cihên Kurdistanê de, nemaze di cihên ko lê medrese hene, li guhartoyên xelkê tesîr kiriye û ew kêma û zêde daye guhartin.* (Bedirxan, 1998:1025).

#### **1.4.3. Sentaksa Kurmancîyê**

Sentaks peyveke yûnanî ye, wateya wê sazkirin e, ji ber vê yekê di kurmacîyê de jê re *hevoksazî*, di soranî de jî *ristesazî* tê gotin. Heke em bi awayekî din bibêjin, sentaks ristin û honandina peyvan e, ji bo pêkanîna pêkhateyeke mezintir ku ew jî hevok e. Her wekî çawa di morfolojîyê de yekeya bingehîn morfem e, di sentaksê de jî hevok e.

“Sentaks li ser wan rêgez û rêzikan radiweste, ew ên ku dihêlin peyv li gorî pergalekê werin bal hev û hevokê pêk bînin. Piraniya zimanan hejmareke diyarkirî ya

peyvên bingehîn heye, lê belê mirov dikare van peyvan bîne bal hev û bi wan hejmareke bêşnor hevokan pêk bîne.” (Baker; 2003:265).

Mijara sentaksê heta dawîya sedsala 19an zêde nebû mijara lêkolîna zimanzanan, di destpêka sedsala bîstan de bi *Dibistana Pragê* kete rojevê. Lê belê piştî sala 1950yî bi rexnegirîya li ser *binyadgerîya klasîk* wekî qadeke xweser bû mijara lêkolîna zimanzanan.

Pirtûkên rêzimanî yên bi kurmancî bi gelemperî cihekî berfireh ji sentaksê re veneqetandine. Bo nimûne, zimanzanê kurd Qanatê Kurdo (1990) di berhema xwe ya bi navê *Gramera Zimanê Kurdî* de cih nedaye mijara sentaksê. Her wiha Reşîdê Kurd jî di berhema xwe ya bi navê *Rêzimana Kurdî: Zaravayê Kurmancî* (1996) de cih nedaye beşa hevoksazîyê. Li alîyê din Roger Lescot û Celadet Bedirxan (2001) jî di beşa sentaksê de hinek mijarên morfo-sentaksê nirxandine.

Feqî Huseyn Sağniç di berhema xwe ya bi navê *Hêmana Rêzimanê Kurdi* de mijara sentaksê bi vî rengî hildaye dest: “Hevok: Di nav peyvînek yan ji nivîsînekê da ew peyvên têgihdar yan jî wezîfedar ku li dû hev tene rêzkirin dibin komikek, ew kom jî bi serê xwe têgihêk îfade dike, xwestinek, agahiyek, ponijînek û kovaneke bê kêmasî dide diyarkirin, jê re hevok tê gotin” (Sağniç, 1991:18). Di berhema navborî de qala “celebên hevokan; hevokên navdêrî, hevokên lêkerî” jî hatiye kirin. Li alîyê din Kemal Badıllı (1992) di berhema xwe ya bi navê *Türkçe İzahlı Kürtçe Grameri - Kurmançça Lehçesi* (Rêzimana Kurdî (Zaravayê Kurmancî) ya bi Îzaha Tirkî) de beşek ji sentaksê re veqetandiye û tê de hêman û cureyên hevokê hatine pêşkêşkirin. Di pirtûkên nû yên rêzimana kurmancî de beşek ji vê mijarê re hatiye veqetandin û bi gelemperî ji alîyê wate û peywirê ve hevokên analîzkirin û beşên hevokê û cureyên wê tene qalkirin.

#### **1.4.3.1. Analîzkirina Hevokên Kurmancîyê**

Di rêzimana klasîk de hevok bi du awayan tene analîzkirin, ji alîyê wateyê û ji alîyê peywirê ve. Ji alîyê wateyê ve wekî cureyên peyvan (navdêr, rengdêr, hoker, lêker, daçek û hwd.) û ji alîyê peywirê jî wekî hêmanên hevokê (biker, bireser, têrker, pêveber) tene analîzkirin.

**Mînak:** *Dayika min îro zû derî vekir.*

Ev hevok ji alîyê wateyê ve hevokeke pêşkerî û erênî ye. Ji alîyê peyvsazîyê ve hevokeke sade ye. Ji alîyê cureyên peyvan ve; *dayik* (navdêr)+*a* (veqetandek), *min* (cînavk), *îro* (hokera demê), *zûzûka* (hokera çawanîyê), *derî* (navdêr), *vekir* (lêker). Ji alîyê hêmanên hevokê ve *dayika min* biker e, “*îro*” û “*zûzûka*” têrkerên hokerî ne, *derî* bireser e û *vekir* jî pêveber e.

Ji alîyê hêmanên hevokê ve *dayika min* biker e, *îro* (têrkera hokerî), *zûzûka* (têrkera hokerî), *derî* (bireser), *vekir* (pêveber).

Her wiha ji alîyê wateyê hevok ve wekî; hevokên pêşkerî, hevokên pirsîyarî, hevokên fermanî û hwd. Ji alîyê pêkhatinê ve wekî *ravek*, *komek* û *hevokan* jî *şahavok* û *lahevok* tên dabeşkirin.

Lê belê di zimanzanîyê de peyv wekî peyvên ferhengî (navdêr, lêker, rengdêr, hoker), peyvên rêzimanî her wekî lêkerên alîkar (karîn, xwestin), daçek (li, ji, bi, di...de), cînavkên kesane (ez, tu, ew, em, hûn, ew; min, te, wî/wê, me, we, wan), çendanînuma (hemû, gişt, hin, piçek, gelek, kêr, zêde, pir...), çawanînuma (carinan, tu carî, kêr caran...), gihanek (û, lê, yan...), diyarker her wekî cînavkên şanîdanê (ev, ew; vî, vê, van; wî, wê, wan), cînavkên nenasîyê (yek, hin, yekî, hinekan, gelek...)

Di analîzkirina nûjen de hevok wekî *dara hevokê* li gorî komekan tên dabeşkirin. *Komek* ew pêkhate ye ku ji çend peyvan pêk tê û li gorî rêzikên rêzimanî hatine ber hev û di hevokê de beşekê pêk tînin. Pênc cureyên komekan hene, her wekîfrazaya navdêrî (FN), frazaya lêkerî (FL), frazayarengdêrî (FR), frazaya daçekî (FD), frazaya hokerî (FH).

**1- Frazaya navdêrî (FN):** Ew cure fraza e ku raveberê wê ji navdêrekê pêk tê.

**Mînak:** *Xortê ciwankevirek avêt segê êrîşkar.*

**2- Frazaya rengdêrî (FR):** Ew fraz e ku ji rengdêrek û hokereke çendanîyê pêk tê.

**Mînak:** *Ew îro pir xweşik xuya dike.*

**3- Frazaya lêkerî (FL):** Ew fraz e ku herî kêr lêkerê û alîkar û pûvenûsên wê di nava xwe de dihewîne û serekê wê lêker e.

*Mînak: Îro xebata me dê zû dest pê bike.*

**4- Frazâ hokerî (FH):** Bi gelemperî di hevokê de qala wî tiştî dike ka karek kengî, li ku, çima, çawa qewimîye. Ew ê frazê de jî serekê frazê hoker e.

*Mînak: Em li bendê ne ku ew serê sibê zû were.*

*Ew pir bi lez dimeşe.*


**5- Frazâ daçekî (FD):** Qala wê frazê dike ku bi daçekekê dest pê dike anku serekê wê daçek e.

*Mînak: Ez ê bi balafîrê biçim Amedê.*


*Pirtûk li ser maseyê ye.*

### Dara hevokan


**Mînak I: Hevoka Navdêrî (biker+pêveber)**



**Mînak II: Hevoka lêkerî (biker+bireser+ pêveber)**



### Mînak III: Hevoka hevedudanî ya aloz



Kurtebêjeyên ku berê nehatibûn destnîşankirin ev in: veqetandek (V), daçek (D), Hejmarnav (JN), tewang (T), pêşdaçek (PêD), paşdaçek (PaD), rengdêr (R), hoker (Ho), veqetandeka berpêbûnê (VB).

#### 1.4.3.2. Di Kurmancîyê de Rêzbûna Peyvan

Her wekî ji mînakan jî diyar dibe di kurdî de rêzbûna peyvyan wekî *Biker + Bireser + Lêker* (BBL) anku *Subject + Verb+ Object* (SVO) rêz dibe. “Di hevokên kurmancî de bi giranî “*kirde*”<sup>3</sup> di destpêkê de, ”*lêker*” li dawiyê cih digire. Heke bireser hebe, ew dikeve navberê. Lewre jî di kurdî de rêzbûna bêjeyan bi gelemperî bi vî rengî “*KBL*” ye. Lê di hin hevokan de “*lêker*” piştî “*kirde*”yê tê. Hevokên ku bi lêkerên negerguhêz pêk tên û hokerên wan daçekan nagirin hevokên bi vî rengî ne” (Tan, 2015: 344).

#### 1.4.4. Watenasî

Ev beşa zimanzanîyê xebata li ser wateya peyv, komepeyv û hevokan e. Heke em bi awayekî din bibêjin, di zimanzanîyê de wate di çend astan de derdikeve pêşberî mirov; wateya peyvê, wateya hevokê û wateya deqê. Di rêzimanê de watenasî mijara herî dijwar e, ji ber ku têkiliya di navbera teşeya peyv û wateya wê de têkiliyeke ketûber e anku li ser lihevkerinê pêk hatiye.

<sup>3</sup> kirde: biker



Berî wê divê em bi bîr bixin ku di zimên de yekeya bingehîn deng e, tiştê ku dengê zimanî ji dengên din cuda dike ew e ku dengên zimanî dikarin wateyê hilgirin. Lewma jî diyardeya wateyê bi deng dest pê dike, piştî deng kîte û peyv tîn. Peyv ji morfeman pêk tîn, her morfemekê wate yan jî peywirek heye. Bi gelemperî morfemên ferhengî wekî peyv tîn binavkirin, lê belê hinek zimanzanan morfemên peywirdar jî wekî peyv bi nav kirine, hingî wekî *peyvên ferhengî û peyvên peywirîtên* dabeşkirin.

#### 1.4.4.1. Peyv û Wate

Mîna ku Ozsoy, Balci û Turan (2012) daye xuyakirin gava ku me got, “wate” hingî peywendîya bêjeyê û heybera ku wê dinimîne anku nîşane dide derdikeve holê. Bo nimûne *dar* wekî bêje ji sê dangan (d+a+r) pêk tê, ew di hişê mirov de beramberî têgihekê tê anku heyberekê nîşan dide ku ew heyber carinan li ser rûyê cîhanê bi awayekî şênber peyda dibe, carinan jî bi temamî xeyalî ye. Ji bo ku em wateya peyvekê bidin, em taybetîyên wê yên sereke destnîşan dikin ku wê ji tiştên din cuda dikin. Bo nimûne, gava ku em bibêjin, *beybûn* serê pêşîn em bala xwe didin hin taybetîyên wê. Her wekî; *kulilkeke rengîn ku li navê xelegeke zer, li dorê pelikên spi hene û bêhna wê xweş e...*

Di zimanzanîyê de mijara lêkolîn û lêhûrbûnê bi gelemperî wateya bingehîn anku wateya têgihî ye ku di ferhengan de rave dibe. Wateyên alîkar û wateyên mecazî di rêza duyemîn de cih digirin. Bo nimûne dema ku em dibêjin, *derzî* serê pêşîn ew amûra metal a ku serê wê tûj e û em pê karê dirûtinê dikin, tê bîra me; wateya wê ya ku li nexweşxaneyê ji bo tedawîkirina nexweşan tê bikaranîn, piştîre tê. Di Wikîferhengê de jî wiha hatiye ravekirin:

1. *Amûra dirûnê ya zirav û dirêj ya ku serikê wê tûj e û li dawîya wê kunikek heye ku dezî tê re dikin û pê didirûn,*
2. *Amûrek e ku serê wê wek derziya dirûnê tûj e û pê dermanên ruhn dikin demaran.*

Di xebatên zimanzanîyê wateya peyvan di gel hinek taybetîyên sereke bi komek (+) û kêmekê (-) ji tîn cudakirin.

### Mînak:

	dayik	çêlek	kevir	ap	dapîr	mehîn
giyanewer	+	+	-	+	+	+
mirov	+	-	-	+	+	-
ajal	-	+	-	-	-	+
mê	+	+	-	-	+	+

#### 1.4.4.2. Hevok û Wate

Di asta komepeyv û hevokan de ji bo diyarkirina wateyê divê mirov bala xwe bide hêmanên hevokê, bi qasî wateya peyvvan, rist û peywira wan û peywendiya di navbera wan de jî girîng û diyarker e.

Bala xwe bidin hevoka “*Gihayî çêlek xwar*” ji aliyê binyadî ve tu kêşeya vê hevokê nîn e. Heke em ji aliyê beşên axaftinê ve ji hev bibişkêvin, dê wiha be:

*Giha (navdêr)+y(dengê alîkar)+î (qertafa tewangê) +çêlek (navdêr) + xwar (lêker).*

Ji aliyê hêmanên hevokê ve *gihayî (biker) + çêlek (bireser)+ xwar (pêveber)* e. Lê belê dîsa jî her mirovekî ku bi kurdî dizane, dikare bi hêsani bibêje ku ev hevok şaş e. Nexwe kêşe di ku de ye? Helbet kêşe di wateyê de ye. Ji ber ku *xwarin* taybetîyeke ajal û mirovan e, giha nikare tiştêkî bixwe. Nexwe ji bo ku peyvek bibe bikera lêkera *xwarinê* divê xwedanê şiyana xwarina tiştêkî beanku mirov an jî ajal be. Bo nimûne heke ji yekî/ê bixwazin ku kêşeya wateyî ya vê hevokê çareser bike, hingî ew ê cihê biker û bireserê biguhêre, hevoka “*Çêlekê giha xwar*” saz bike û kêşeyê çareser bike.

Bi kurtasî her peyv nikare bi peywira *bikerîya* her *lêkerê* rabe. Wek nimûne em bala xwe bidin lêkera “*xwendin*”, divê bikera vê lêkerê jî xwedanê şiyana “*xwendin*”ê be; mirov be, bi *xwendin* û nivîsandinê bizane anku *xwende* be. Wekî

“*Pitik kovarê dixwîne*” yan jî “*pisîk rojnameyê dixwîne*” ne cihê bawerîyê ye, lewma jî ew hevok xwedanê nakokîya wateyî ne. Pitik piştî ku mezin bû û hînî xwendinê bû, dikare bixwîne, lê pisîk dê tu carî nekare bixwîne. “Ev rêbaz ji bo dahûrandina pêkhênerên têgihî yên wateya peyvê destpêkek e. Lê, ew rêbaz jî xwedî hinek arîşeyan e. Ev rêbaz ji bo diyarkirina pêkhênerengelek peyvên di zimanekî de dibe ku ew qas ne karîger be. Bo nimûne heke em peyvên mîna hişyarî, pend, gef bînin bîra xwe hingî reng e ev rêbaz ewende encamgir nebe” (Yule, 2010:115).

#### **1.4.4.3. Peywira Wateyî**

Her wekî Yule (2010) jî bal kêşaye serê, mirov nikare peyvê bi tenê wekî hilgira wateyê bibîne, divê mirovbala xwe bide peywira peyvê jî. Wekî mînak, heke bala xwe bidin hevoka, “*Kurikî pihîna xwe li gogê da*”, hingî em ê bibînin ku her hêmana hevokê xwedîyê peywirekê ye. Ew peywir jî bi taybetî li gorî lêkerê diguhere. Di lêkera *lê danê* bizavek heye. Li gorî wê peywira peyvên din jî diyar dibe. Di vê hevokê de *kurikî* kirox e, *gog* dûçarî lêdanê dibe, lewma jî *tişte* ye. Ev her du peywirên wateyî yên sereke ne. Kirox her tim ne mirov an jî giyanewerek e, dibe ku tişteki suriştî be jî, her wekî; “*bayî pel weşand*”.

Li alîyê din dibe ku lêker ne tevgerê, rewşekê diyar bike, her wekî “*Gog gilower e*”. Peywirên wateyî yên sereke ev in: *kirox* (heke lêkerekê bizavî hebe, kesê/a ku dike), *tişte* (ewa ku tevger rasterastbandorê lê dike), di pêkhatina bizavê de heke navgînek hebe, hingî ew jî peywireke wateyî nîşan dide. Mînak “*Serheng bi destê xwe serê wî mist da.*” Li vê derê “*bi destê xwe*” dibe “*navgîn*”. Heke tevger ji cihekî ber bi cihekî din be, hingî cihê destpêkê “*jêderk*”, cihê berî lê “*mebest*” e. Heke li holê lêkerekê mîna *dîtin*, *bihîstin* hebe, hingî li wir tevger nîn e, taqîkirin heye. Bikera hevokên wiha dibe *taqîker*.

#### **1.4.4.4. Wate li gorî Peywendîya Peyvan**

Peyv divê bi tenê wekî watehilgir û pêkhênerên peywirekê neyên dîtin. Peywendîya di navbera peyvan de jî di warê diyarkirina wateyê de xwedanê cihekî girîng e. Pîrî caran em ji bo ravekirina peyvekê, peyveke din bi kar tînin. Her wekî

*vîn* yanî *daxwaz* an jî em dibêjin *sosin* kulîlkek e... Hin caran jî em ji bo nasandina peyvekê ji dijwateya wê sûdê werdigirin.

#### 1.4.4.4.1. Peyvên Sîwaneyî û Binsîwaneyî

Dema ku em peyvekê ji aliyê wateyê ve rave dikin, em bi gelemperî ji sîwanepeyva wê sûd werdigirin. Her peyvek bi gelemperî dikeve bin sîwaneya peyveke din. Bo nimûne, peyv dibe heyberek, giyanewerek, kar û barek an jî hest û dilînek be. Piranîya peyvan dikevin bin sîwanekê. Mirov dişet ji wan peyvan re yên ku xwedanê wateyê sîwaneyî ne *sîwanepeyv* (hypernym) ji yên dikevin bin sîwaneyê re jî peyvên *binsîwaneyî* (hyponym) bibêje. Her wiha peyvên ku di bin heman sîwaneyê de jî mirov dikare wekî *hemcure* bi nav bike. Wekî mînak em dikarin tabloyeke wiha pêşkêş bikin:



Di vê tabloyê de peyva *giyanewer* sîwaneyan hemû peyvên din e. Mirov, giha, ajal di bin vê sîwaneyê de cih digirin. Peyvên gûz, hejîr, sêv hemcureyên daran; çêlek, ga û golik hemcureyên garanê; jin, mêr û zarok jî hemcureyên mirovan in.

#### 1.4.4.4.2. Peyvên Sernimûne

Di bin banê peyveke cureyî de gelek peyv hene, lê belê pirî caran ji van peyvek wekî *sernimûne* (prototype) derdikeve pêş. Bo nimûne, di kurdî *desêv* ji hemû fêkîyên din nûnertîya fêkiyan dike. Her wiha dema ku mirov dibêje, *kulîlk* serê pêşîn *gul* tê bîra mirov.



#### 1.4.4.4.3. Peyvên Hemwate

Peyvên wateya wan yek e û pirî caran li şûna hev têne bikaranîn, peyvên hemwate ne. Her wekî Yule (2010) jî bal kişandiye serê, ev wekhevî ne wekhevîyeke ji sedî sed e. Ji ber vê yekê jî me negot her tim, lê me got pirî caran li şûna hev tên bikaranîn. Hin caran mirov dema peyva hemwate di hevokê de li şûna peyvekê bi kar tîne cihê xwe nagire. Bo nimûne, li şûna *xulqê min teng bûye* mirov dikare bibêje *bêhna min teng bûye*, lê belê li şûna *bêhna min çikiya*, mirov nikare bibêje, *xulqê min çikiya*.

Peyvên *hemwate* di zimanekî de ji ber sedemên cur bi cur peyda dibin; hin caran ji ber hebûna devok û zaravayên cuda, hin caran ji ber peyvên ku ji zimanekî din hatine wergirtin û hwd. Di kurmancîyê de bi gelemperî peyvên *hemwate* ji ber hebûna devok û zaravayên cuda peyda dibin. Pirî caran peyveke ku li herêmekê tê bikaranîn, li herêmen din nayên zanîn. Em bi çend mînakanvê mijarê bi dawî bikin.

**Mînak:** *heftreng, keskesor, bûka baranê, qozeqer, kevana dawûd...*

*soberî, ajneberî, melevanî...*

*peyvîn, axaftin, şorkirin, qezîkirin...*

*bişirîn, beşîşîn, besimîn...*

*karîn, kanîn, şiyar...*

#### 1.4.4.4.4. Peyvên Dijwate

Peyvên ku ji alîyê wateyê ve dijberên hev in *dijwate* ne. Ew dijberî bi du cureyan e, hebûna yekê tê wateya nebûna ya din; her wekî *zindî-mirî, şev-roj, ketin-rabûn* hwd. Bo nimûne, dema ku *ronî* hebe, *tarî* tune ye, dema ku yek *mirî be*, êdî ne *zindî* ye.

Hinek dijwate hene, ew jî pileyî ne, her wekî; *mezîn-biçûk, kevn-nû* û hwd. Em dikarin bibêjin, “*Ew sê salan ji min mezintir e*”, “*Tu bihostekê ji wî dirêjtir î*”, “*Ev avahî gelekî nû ye*” û hwd. Lê em nikarin bibêjin, “*Îro ji duh şevtir e*”.

Di vê mijarê de tişteki ku divê em di bîra xwe de bigirin ev e; neyînîya peyvekê kêman dibe di wateya wê. Bo nimûne *xweş û nexweş* di wate ne, lê belê *hatin û nehatin* di wate ne.

#### 1.4.4.4.5. Peyvên Hemdeng

Carinan peyvek du wateyên ji hev cuda dide, ji peyvên wiha re peyvên hemdeng tê gotin. “Bo nimûne bêjeya *xalbi* sê wateyan derdikeve pêşberî mirov; birayê dayikê *xal*, wekî niqte *xal* û hemwateya şanikê *xal*. Her wiha bêjeya *gelek* di wateya xelkekde, *gelek* di wateya pirde jî derdikeve pêşberî mirov. Mînakên din jî bêjeya *ber* e, ew jî wekî pêşî, wekî zad, wekî kevirû wekî xalîçederdikeve pêşberî mirov. Bêjeya *bîrjî* hem wekî hafizahem jî wekî çalderdikeve pêşberî mirov.” (Tan, 2015: 78-79)

#### 1.4.4.4.6. Peyvên Hemreng

Hinek bêje jî her çiqas dengê wan ne yek be jî, awayê nivîsandina wan yek e. Em dikarin van peyvan wekî “*hemreng*” bi nav bikin. Peyvên hemreng ji ber ku du fonem bi heman tîpê hatine nîşandan, pêk hatine.

**Mînak:** *gur (gurg) - gur (wekî agir gur); pir (pireh)- pir (gelek): ker (heywana barkêş)- ker (kesê ku nabihîze); teng (sewiye)- teng (di wateya bêjeya fireh); çil (40) - çil (wekî çilek); ter (hîç)- ter (şil); kal (zebeşê kal) - kal (kalemêr)”*(Tan, 2015:79)

#### 1.4.4.4.7. Peyvên Pirwate

Carinan peyvek xwedanê çend wateyan e. Di ferhengan de hin caran di serê madeyê de çend caran cih digire. Peyvên wiha reng û dirûvê wan yek e, lê belê wateya wan cuda ye, hingî ew peyvên *hemreng* in, lê belê carinan jî di nav heman madeyê de xal bi xal wateyên peyvan tînan nivîsandin, ji van peyvan re peyvên pirwate tê gotin. Ew wate bi piranî tînkildarî hev in. Bo nimûne peyva *gulî* hem *guliyên darê* hene, hem jî *guliyê porê mirovan* heye. Carinan peyvekê deh wateyên wê yê cuda li pey hev tînan rêzkirin. Her wekî me di destpêka mijarê de jî diyar kir, pêşî wateya bingehîn, piştî jî wateyên mayî tînan rêzkirin.

# BEŞA DUYEM

## RABORÎYA XEBATÊN LI SER ZIMANÊ KURDÎ

### 2.1. LI ROJHILAT XEBATÊN LI SER KURDÎ

Li Rojhilata xebatên li ser kurdî pêşî di medreseyan Kurdistanê pêk hatine. Ji bilî wan jî hinek peywirdarên mîna Yusuf Diyadîn Paşa, Ewliya Çelebî der barê kurdî xebat kirine û agahî dane. Her wiha di destpêka sedsala bîstan de jî li Stenbolê hinek xebat der barê zimanê kurdî de hatine kirin. Em ê di vê binbeşê de bala xwe bidin wan xebatan.

#### 2.1.1. Li Medreseyan Xebatên li ser Kurdî

Di medreseyan de zimanê kurdî wekî zimanê alîkar anku zimanê raveker hatiye bikaranîn. Li gorî Lezeenberg (2014) piştî sedsala hejdehan di perwerdeyê de bikaranîna kurdî dest pê kiriye. Ji ber vê yekê, yekemîn ferhenga menzûm a bi kurdî û erebî *Nûbara Biçûkan a* ku Ehmedê Xanî di sala 1683'yan de nivîsandiye, ji bo hînkirina zimanê erebî ye anku ew jî pirtûkeke alîkar e.

Her wekî Kadîrî Yildirim (2011) daye zanîn, yekemîn pirtûka rêzimanî ya bi kurdîya kurmancî ji hêla Elîyê Teremaxî ve hatiye nivîsandin û navê wê jî *Serfa Kurmancî* ye. Leezenberg (2014) û Üneşi (2016), dane zanîn ku ev pirtûk di destpêka nivê duyemê sedsala 19an de ji hêla Aleksander Jaba ve ji bala meleyekî Hekarîyê hatiye peydakirin, Mele Mehmûdê Beyazîdî di sala 1958an jê re pêşgotinek nivîsandiye û radestî Jaba kiriye. A. Jaba pêwendî bi Akedemiya Împeratoriya Rusya ya li Petersburg (Lenîngirad) re daniye, bi taybetî nameyêke xusûsî ji rojhilatnasê Almanî Dorin re şandiye. Jê re behsa destnivîsê û pêşgotina wê kiriye û jê tika kiriye ku vê destnivîsê pêşkêşî Enstîtuyê bike. Dorin ji Jaba xwestiye ku destnivîsê wergerîne firasizî lê Jaba terzê nivîsîna nivîskar ya ku wekî rêbaza rojhilatîyan e wekî mazeret nîşan daye û wernegerandiye. Jaba di sala 1860î de

pêşgotina Mele Mehmûdê Beyazîdî ya ji bo vê pirtûkê wergerandiye frensî û ji Enstîtuyê re şandiye.

Mele Mehmûdê Beyazîdî di vê pêşgotinê de li ser vê mijarê wiha gotiye: “Malûmê te bibit ku telebe û fuqehayêd ekradan heta tarîxa hezarî, ilmê serfê ji kitêbêd erebî el îbare weku kitêba *Se’deddîn Teftezanî* ku *Se’dînî* dibêjinê û ji *Çarperdiyê* û ji *Se’dullah Gewre*, ji van emsal kitêban îstîbat û îxrac dikirin û îxraca ji kitêbêd erebiye jî zaf dijwar dibûye.

Paşî di tarîxa hezarî bi şûve ji qezayêd Hekariyan di qeza Mîksê da gundek heye *Teremax* dibêjin, ji wî gundî navê Elî mirovike xoyzihn û îdrak sahibîş û fitanet peyda bûyî, teleba ilm û funûnêd bedî’e kirî, mideyekî medîde li Bexda û Musil û Behdînan û Soran gerriyayî û mayî û xwendî û kesb kemal û funûnê ilûm kirî. Di fenê ilmê serfê da zêde miharet û risûx peyda kirî. Di zemanî xwedanî qewî zêde meşhûr û me’rûf bûye. Ê belku heta niha jî nav û nîşanêd wî di Kurdistanê da heyîn. Ewî Elîyê Teremaxî bi xwe bi destê xwe di nîva gundî mizgeft û medrese bîna kirine, û mideyekê bi xwe jî ders gotine. Weku dîtîye û muşahede kirine ku ilmê serfê fenekî zehmet û dijwar û asê ye. Ê muptedî zû bi zû sîxe û i’lalêd wan ji kitêbêd erebî îxrac nakin. Ji boyî hêsiya muptediyan bi zimanê kurmancan îbaretkî tesrîfê tesnîf kiriye ku ew îbaret di nîva telebeyêd ekradan qewî meqbûl û ehem û lazim e.

Elbette weku talibî murada xwendina serf û nehwa û made û mentiq û ulûmêd mayî dikin. Elbette berê metn û îbareya Elîyê Teremaxî bixwînin û ji ber bikin, paşî dest bi ulûmêd mayî bikin, lewranê ev ilmê serfê mêzîn e, elbette her tiştek hewceyê mêzînê ne da dirist û nediristiya wan kifş bibe, lewranê berê zaf medaris di welatêd Kurdistanê da hebûn û şuhreta ulûman jî gelek hebûn di kafeê bajêr û qeda û qesebe û gundêd ehlê Îslamêd Kurdistanê da, elbette, felabudde medreseyek û du sê û belku îdî zêde hebûn.” (Ûneşi, 2016: 92-93).

Abdurrahman Adak di pirtûka xwe ya bi navê *Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk* de, girîngîya vê berhemê wiha rave kiriye: “Yek ji wan ew e ku ne bi nezmê bi pexşanê hatiye nivîsandin. Mirov dikare vê berhemê wekî yekem berhema pexşan a kurdî bihesibîne. Ya duyem ew e ku ev berhem di destpêka serdema mîrektiyan de



hatiye nivîsandin. Wate di demeke zû de hatiye nivîsandin. Ya sêyem ew e ku berhem taybetiyên vegotina kurdiya kurmancî ya dema xwe bi me dide nîşandan. Ya çarem jî di berhemê de carcaran digel qaîdeyên zimanê erebî û farisî behsa rêzikên kurdiya kurmancî jî hatiye kirin. Bi vî awayî ji bo gramera kurdiya kurmancî wekî xebateke pêşîn tê hesibandin” (Adak, 2014: 269)

Her wekî Adak, Leezenberg (2014) jî ev berhem wekî yekemîn berhema pexşanî ya kurdî bi nav kiriye û gihastiye wê encamê ku sedsala hejdehan destpêka kurdîbûna mufredata medreseyên kurdan e û vê pêvajoyê bi Nûbihara Biçûkan Ehmedê Xanî, Serfa Kurmancî, Eqîda Îmanê dest pê kiriye û piştî hejmara pirtûkên bi kurdî zêdetir bûye. Her wiha Leezenberg daye zanîn ku bi vê kurdîbûna xwendinê re di kurdîya nivîskî de yekgirtinek û heta radeyekê jî hişmendîya neteweperweriya ziman geşe daye. Dîsa li pey agahiyên Leezenberg dane, Teremaxî zanîye ku kurdî û farisî gelekî nêzî hev in, lê erebî dûrî van her du zimanan e, wî bi tu awayî zimanek di ser zimanên din re negirtiye, kurdî ji erebî, farisî û tirkî kêmtir nedîtiye.

“Piştî Teremaxî, xebata duyemîn a ku li medreseyan hatiye bikaranîn Zurûf û Terkîba Mele Yunûs Xelqetînî (m. 1791) ye. Ev her du berhemên kurt der barê nehwa anku sentaksê de ne” (Leezenberg, 2014: 725).

Mele Mehmûdê Beyazidî jî bi van gotinan qala Mele Yunûs kiriye: “Mubtedêd Ekranan ji ibtîdada hîce û Qur‘anê dixwînin, paşî *Mewlûda Kurmancî*, paşî *Nûbihar* û *Pendê Ettarî*, paşî ji gerrî‘etê: Îcaz û Muherrîr û Enwarê dixwînin, îcarê îbaretê *Tesrîf û Zurûf û Terkîba Mela Yûnisê Helqetînî* dixwînin, ku eve hersêna bi zimanê kurmancî ne (...). Ew Elîyê Teremaxî û Mela Yûnus Helqetînî jî di gundêd xwe da medfûn in” (Ûneşi, 2016: 93)

### **2.1.2. Hin Xebatên li ser Kurdî di Dewra Osmaniyan de**

Li derveyî xebatên li medresayan, di dewra Osmaniyan de yekemîn xebata der barê kurdî de ferhenga kurdî-erebî ya Yusif Diyaadîn Paşa (1848-1906) ya bi navê *El-hediyyet El-hemîdiyye fil-luxet El Kurdiyye* (Ji zimanê kurdî diyariya hemîdî) ye. Ev berhem di sala 1893yan cara pêşîn hatiye çapkirin. Her wekî Jan Dost (2017) daye xuyakirin, danerê wê ereb bû lê li welatê kurdan demeke baş mabû û

pêwistiya ferhengeke bi vî awayî dîtibû. “Ew bû qaymeqamê Mûtkiya li Bedlîsê û li wir fêrî zimanê kurdî bû û ferhenga xwe ya navdar nivîsî. Ferhenga wî sala 1893an li Stenbolê çap bû” (Dost, 2017: 9). Di pêşeka vê ferhengê de jî der barê ziman û rêzimana kurdîya kurmançî de hinek agahî hene.

Pirtûkeke din a ku di dema Osmanîyan de li Stenbolê çap bûye, pirtûka Xelîl Xeyalî ya bi navê *Elifbayê Kurmançî* ye. Ev pirtûk di sala 1908an de çap bûye û 27 rûpel e. “Pirtûka Elifbayê Kurmançî bi nasandina herf û îşaretên herekeyan dest pê dike. Dûvre bi pevgirêdanên van herf û îşaretan peyv, di dawiyê de jî hevok pêk tên. Di bin sernavê “Îbare” de metnekî kurt ê xwendinê (r. 23-24) heye” (Arslan, 2014: 90).

Li gorî Arslan (2014) *Elifbayê Kurmançî*, cara ewil Mehmet Bayrak bi awayê xwerû (facsimile) weşandiye. Weşanxaneya Hîvda bi herfên ‘erebî lê bi hin guhertinan û bi navê Elifbêya Kurdî ji nû ve çap kiriye. Mamoste Qedrî, ev berhema girîng veguhastiye tîpên latinî û wekî gotarekê weşandiye.

Pirtûkeke din a ku di dema Osmanîyan de çap bûye, pirtûka *Qewaîdî Lisani Kurdî* ya Omer ‘Ewnî ye. Ev pirtûk jî di sala 1912-1913an de li Elezîzê çap bûye. Lê mixabin destxeta vê pirtûkê îro li holê nîn e.

Piştî vê pirtûkê, di sala 1918an de pirtûka *Mukaddîmet-ül İrfan* a Mehmet Mhirî li Stenbolê di çapxaneya Necm-i İstikbal de hatiye çapkirin. Ev pirtûk ji 17 rûpelan pêk tê. Li pey agahîyên Geverî (2017) dane, Ebdurrehîm Rehmî Hekarî di sala 1920an de di kovara Jînê de der barê kêşana lêkerên kurdî de di bin sernavê *Tesrîfa Fi’îlan* de bê tablo weşandine.

Piştî Şerê Yekem ê Cîhanê di sala 1921ê Cemiyeta Telebên Kurd bi navê Hînkere Zimanê Kurdî yekemîn berhema fêrkirina kurdî daye ber çapê. Ev berhema jî li Stenbolê li Çapxaneya Necm-i İstikbal çap bûye. Di pêşgotinê de tê diyarkirin ku armanca kitêbê hînkirina peyivîna kurdî ye, ji ber vê jî wan zêde bala xwe nedaye rêziman û rastnivîsê.

Her wekî ku ji navê wê jî tê fêmkirin kitêb du zaravayî ye û tê de hemû hevok û nivîs ji bilî tirkîya osmanî, bi kurmançî û babanî (soranî) ne. Her wekî me li jorê jî

da zanîn girîngiya vê pirtûkê ev e ku yekemîn pirtûka hînkirina zimanê kurdî ye û ji hêla saziyeke kurdan ve hatiye amadekirin û weşandin.

“Pirtûk bi “Bir İki Söz/Çend Gotin/Çend Qiseyek” dest pê dike. Paşê ders ders dewam dike. Hejmara dersa dawî 15 e, lê dersên 3, 4, 8 û 11an tune ne. Piştî dersan derbasî metnên xwendinê dibe (r. 47-58). Ev metin jî wekî dersan bi tirkîya osmanî, kurmancî û babanî ne. Beşa dawî ya kitêbê “Birkaç Mükâleme/Çend Peyivîn/Çend Qise” ango diyalogên rojane ne (r. 59-64). Di rûpelê dawî de jî rastiya xeletiyên çapê hatine rêzkirin. Nivîskar an jî amadekarê *Hînkirê Zimanê Kurdî* nediyar e. Ji ber ku li ser kitêbê navê tu kesî tune” (Arslan, 2014: 121).

### **2.1.3. Di Sedsala 20an de Hin Xebatên Kurdan ên li ser Kurdî**

Her wekî ji binbeşa li jor jî diyar dibe xebatên kurdan ên der barê ziman û rêzimana kurdî de di sedsala 17an de dest pê dikin. Pêşî wekî destxet, piştî derketina çapê jî bi awayekî çapkirî pirtûk hatine çapkirin. Di sedsala 20an de ji ber mercên siyasî, pirtûkên der barê zimanê kurdî de herî zêde li Iraq û Yekîtiya Sovyetê hatine çapkirin. Li gorî Amir Hassanpour (1997) li Iraqê di navbera salên 1920 û 1977an de der barê zimanê kurdî de 88 pirtûk hatine çapkirin, her wiha li Yekîtiya Sovyetê jî 9 pirtûkên rêzimanê hatine çapkirin. Li Tirkîyeyê bi tenê di dawîya sedsalê de derfeta çapkirina pirtûkên bi kurdî bi dest ketiye, piştî wê der barê zimanê kurdî de pirtûk hatine çapkirin. Em ê li vê derê hinek berhemên der barê ziman û rêzimana kurdî bi taybetî kurdîya kurmancî de pêşkêş bikin.

Li gorî pêşgotina ku Mamo Cûmî çapa 1991ê ya pirtûka Reşîdê Kurd *Rêzimana Kurdî* (1996) re nivîsandiye di sedsala 20an de yekemîn kurdê ku pirtûka rêzimanê nivîsandiye Se'îd Sidqî Kaban e. Li pey agahiyên ku di pirtûka bi navê *Kurdish Grammarians* ya Îrec Mêhrbexş de hatine pêşkêşkirin, Kaban di sala 1920an de pirtûkeke rêzimanê bi navê *Gullzar* amade kiriye, lê belê ew pirtûk nehatiye çapkirin, piştî Kaban li ser bingeha vê pirtûkê pirtûka ya bi navê *Muxteserî Serf û Nehiv î Kurdî* pirtûkek amade kiriye, ev pirtûk di sala 1928an li Bexdayê çap û belav bûye. Her wiha Kabanî di sala 1927an de jî pirtûkeke xwendinê ya bi navê *Qiraa'tî Kurdî* amade kiriye, ev pirtûk jî ji 67 rûpelan pêk tê.

Piştî Kaban, di sala 1929an de zimanzanê navdar Tewfîq Wehbî (1891-1984) pirtûka xwe ya bi navê *Destûrî Zimanî Kurdî* li Bexdayê daye ber çapê.

Li Şamê jî Celadet Alî Bedirxan (1893-1951) di Kovara Hawarê (1932-1943) de dest avêtiye mijara rêzimana kurmançiyê û di hejmarên 16, 17, 18, 25, 26, 27, 28, 29, 30, 31, 32, 33, 34, 34, 40, 42, 43, 44, 45, 46, 47, 48, 50, 51, 53, 54 de der barê rêzimana kurmançiyê gotar belav kirine. Ev xebatên Celadet Bedirxan di sala 1994an de bi navê *Bingehên Gramera Kurdmancî* ji hêla Weşanên Nûdemê ve li Stockholmê hatine çapkirin.

Piştî wê bi salekê, pirtûka Tewfîq Wehbî ya bi navê *Destûrî Zimanî Kurdî* hatiye weşandin. Di sala 1956an de heman pirtûk îcar bi zimanê erebî derketiye, heman salê Nûrî Elî Emîn ji bo xwendekarên kurd rêzimanek bi navê *Qewa'îdî Zimanî Kurdî le Serf û Nehiw da* derxistiye.

Di sala 1953yan de Kamûran Bedirxan pirtûka xwe ya bi navê *Langue kurde. Tome I: Elements de grammaire extraits des cours donnes a l'Ecole Nationale des Langues Orientales Vivantes*. li Parîsê daye ber çapê. Di sala 1971ê jî Kamûran Bedirxan pirtûka xwe ya bi navê *Rêzana Zimanê Kurdî* derxistiye. Di sala 1976an îcar wî li gel Dr. Şivan pirtûka bi navê *Zimanê Kurdî/ Kürt dili* derxistiye. Di salên 1940î de Reşîdê Kurd bi navê *Rêzimana Kurdî (Zaravayê Kurmancî)* pirtûkek nivîsandiye û li Swêdê Weşanên Komela Jinên Kurdistanê di sala 1956an de ew pirtûk çap kiriye.

Li gorî ku Qanatê Kurdo di pirtûka xwe ya bi navê *Gramera Zimanê Kurdi - Kurmanci- Sorani* (1990) de daye xuyakirin, wî di sala 1957an de bi zimanê rûsî pirtûka rêzimanê ya bi navê *Gramatika Kurdsкого Yazika Kurmanci* (Rêzimana Zaravayê Kurmancî) derxistiye. Paşê jî wî pirtûka xwe ya bi navê *Kurdski Yazik (Zimanê Kurdî)* weşandiye. Her wiha ev pirtûka wî bi zimanê kurdî bi navê *Zimanê Kurdî. Rêziman* di sala 1981ê ji nav weşanên Komkarê li Frankfurtê hatiye çapkirin. Piştî di sala 1961ê de pirtûka rêzimanê ya Cegerxwîn bi navê *Awa û Destûra Zimanê Kurdî* hatiye çapkirin. Di sala 1962yan de Ela'îdîn Sicadî pirtûka xwe ya bi navê *Destûrî Ferhengî Zimanî Kurdî* derxistiye.

Li Kurdistanana Iraqê yek ji zimanên berhemdar ê hemdem jî mamoste Abdulrahman Hacî Ma'rif (1940 -2007) e. Xebatên wî yên der barê zimanê kurdî de ji bo xebatên zimanzanîyê yên gelek kesan bûne palpişt û bingeh. Hinek ji xebatên wî ev in:

Wişey Zimanî Kurdî, Bexdad, 1975.

Zimanî Kurdî le ber Roşnayî Fonetîk da, Bexdad, 1976.

Wuşeronan le Zimanî Kurdî da, Bexdad, 1977.

Ma kutiba 'an al-lughat al-kurdiyye, Bexdad, 1978.

Rêzmanê Kurdî, bergî yekem, morfolojîya, beşî yekem, naw, Bexdad, 1981.

Nûsînî Kurdî be Elfubêy Erebi, Bexdad, 1986.

Rêzmanê Kurdî, bergî yekem, wuşesazî, beşî duwem, cênaw, Bexdad, 1987

Raberî serçawe le barey zimanî Kurdîyewe, Bexdad, 1987.

Rêzmanê Kurdî, bergî sêhem, awellnaw, Bexdad, 1993

Rêzmanê Kurdî, bergî cuwarem, jimare û awell-kirdar. Bexdad, 1998.

Di sala 20an de yekemîn pirtûka rêzimanê ya ku li Tirkîyeyê derketiye, pirtûka mebûsê Rihayê Kemal Badıllı ye. Navê vê pirtûkê *Türkçe İzahlı Kürtçe Grameri - Kurmançça Lehçesi* (Rêzimana Kurdî ya bi Ravekirina bi Tirkî- Zaravayê Kurmancî), di sala 1965an li Enqereyê hatiye çapkirin. Roger Lescot piştî mirina Celadet Bedirxan bi 19 salan anku di sala 1970'yî de xebata xwe û Celadet Bedirxan a bi navê *Grammaire Kurde (Dialecte kurmandji)* li Parîsê daye ber çapê.

Pirtûkeke din a rêzimanê ku li Zanîngeha Selaheddîn wekî pirtûkê dersê hatiye xwendin, xebata Dr. Nesrîn Fexrî û Dr. Kurdistan Mukrîyanî ya bi navê *Rêzimanî Kurdî*: bo polî yekemî beşî zimanî kurdî- Zankoy Selaheddîn ye. Ev pirtûk jî di sala 1982yan de hatiye çapkirin.

Sadiq Baha'addîn Amêdî di sala 1987an pirtûka xwe ya bi navê *Rêzimana Kurdî: Kurmancîya Jorî û Jêrî Hevberkirî* ji nav weşanên Zanîngeha Selaheddînê derxistiye. Pirtûka bi navê *Dersên Zimanê Kurdî* ya Baran (Kemal Burkay) di sala 1988an de ji nav Weşanên Roja Nû li Stockholmê hatiye weşandin. Li Tirkîyeyê piştî xebata Kemal Badıllı, di sala 1991ê de Feqî Huseyn Sağnıç pirtûka xwe ya navê *Hêmana Rêzimanê Kurdi* ji nav Weşanên Melsayê derxistiye.

Di sala 1995an de Mûrad Ciwan ji nav Weşanên Jîna Nû, li Swêdê pirtûka xwe ya bi navê *Türkçe Açıklamalı Kürtçe Dilbilgisi. Kurmanc Lehçesi*. daye ber çapê.

Fêrgîn Melîk Aykoç di sala 1996an de ji nav Weşanên Înstûta Kurdî ya Berlînê pirtûka xwe ya berawirdkirina zaravayên kurdî bi navê *Kurdîzan: Rûberkirina Zaravên Kurdî* daye weşandin.

Her wekî kesên biyanî yên li ser zimanê kurdî xebat kirine, ewên kurd en li ser kurdî xebat kirine jî dabeş dibin ser du koman; koma pêşî rewşenbîr û têkoşerên xebatên siyasî ne, ji dilsojî, dilsoziya xwe dest avêtine mijarê û berhemane dane. Her wekî Se'îd Sidqî Kaban, Reşîdê Kurd, Cegerxwîn, Baran, Mûrad Ciwan, Dr. Şivan, Feqî Huseyn Sağniç û hwd. Bi gelemperî armanca van kesan danîna rêzikên zimanê kurdî û pêkanîna zimanekî yekgirtî ye. Wan kesan li qadê xebat nekirine, ew li ser berhemên nivîskî xebitîne.

Koma duyem jî di warê zimanzanîyê de xwe baş gihandiyê, li zanîngeha xebat kirine û pisporîya wan a zimanzanîyê pêk hatiye. Her wekî Qanatê Kurdo, Celadet Bedirxan, Kamûran Bedirxan, Tewfîq Wehbî, Abdulrahman Hacî Me'rif û hwd. Van kesan bi piranî li qada akademîk xebat kiriye, xebatên wan ji çarçoveya rêzimana klasîk zêdetir dikeve qada zimanzanîya giştî.

Di sedsala 21ê de jî gelek pirtûkên der barê ziman û rêzimana kurdî de hatine weşandin, lê belê ew li derveyî çarçoveya xebata me dimînin, ji ber ku xebata me bi sedsala 20an bisînorkirî ye.

## **2.2. LI EWROPAYÊ HIN XEBATÊN LI SER KURDÎ**

Ji bilî van xebatên ku me li jorê qala wan kir, gelek berhemên der barê kurdan de ji hêla mîsyoner û geştîyarên ewropî ve hatine çapkirin. Her wekî lêkolînerên mîna [Bruinessen (2014); Omarkhali & Mossaki(2014)] jî balê dikêşin ser, kesên ku di sedsalên 18, 19 û di destpêka sedsala 20an de der barê kurdî de xebat kirine û berhem dane, bi gelemperî sê cure ne: Hinek mîna Garzonî û Thomas Bois mîsyoner in, hinek jî mîna Cecil J. Edmonds, Pierre Rondot û Roger Lescot peywirdarên saloxgerî, leşkerî û dîplomatkî en dewletan in. Ji bilî van kesan hinek kesên mîna

MacKenzie, MacCarus, Orbelî, Edmonds, Joyce Blau û hwd. jî li zanîngehan xebatên akademîk li ser kurdî kirine. Di vî warî de sê dewlet derdikevin pêş; Rûsya, Îngilistan û Fransa.

### **2.2.1. Li Ewropayê Yekemîn Xebata Kurdî**

Her wekî Martin Van Bruinessen (2014) di gotara xwe ya bi navê *Kurdish Studies in Western and Central Europe* (Xebatên Kurdnasîyê li Rojava û Naverasta Ewropayê) de daye xuyakirin yekemîn xebata der barê kurdî de ji hêla mîsyonerê îtalî Maurizio Garzoni ve hatiye nivîsandin. “Garzoni di 1797’an de pirtûka rêziman kurdî *Grammatica e Vocabolario Della Lingua Kurda* (Rêziman û Peyv di Zimanê Kurdî de) nivîsandiye. Peder Garzoni 18 salan li bajarê Amedîye maye, ev pirtûka xwe li Romayê weşandiye. Ji ber vê yekê Garzoni wekî bavê kurdnasîyê jî tê binavkirin” (Tuğrul, 2010: 4).

“Garzoni di sala 1734an de bajarê Torino hatiye ser rûyê dinyayê û di sala 1762yan de bi peywira belavkirina dînê Mesîhî çûye bajarê Mûsilê, piştî du salan jî ji wir çûye Amêdîyê. Ew bi qasî bîst salan li Amêdîyê jiyaye, li nav Kurdistanê geriyaye.

Ev berhema di navbera salên 1774 û 175an de hatiye nivîsandin. Di ferhenga wê de nêzî 4600 peyv cih digirin ku ew jî peyvên kurdiya Amêdîyê ne. Pirtûk ji van beşan pêk tê: Pêşek, alfabe, hejmar, navdêr, lêker, cînavk, navê demsal û rojên hefteyê. Piştî wan jî endamên laş û hinek hevok ji bo axaftinê. Piştî wê beşa ferhengê dest pê dike” (Ebdulla, 2015: 25). Garzoni di sala 1804an de koça dawîn kiriye.

### **2.2.2. Xebatên Kurdî li Rûsyayê**

Li vî welatî xebatên der barê kurdî de hê di dema çarîtîyê (sedsala 19an) de dest pê kiriye û di serdema Sovyetê de jî berdewam kiriye. “Rojhilatnasên mîna Peter Lerch, Aleksander Jaba û Ferdînannd Justi li vî welatî di warê kurdnasîyê de bîngeheke xurt ava kiribû” (Bruinessen, 2014:21).

Pirtûka sêyemîn a der barê zimanê kurdî de, di sala 1857-58'an de ji hêla Peter Lerch ve hatiye nivîsandin. “Navê pirtûkê *Forschungen über die Kurden und die iranischen Nord Chaldäer* (Lêkolînên li ser Kurdan, Keldaniyên Bakurî yên Îranî) e” (McCarus, 1958:3).

Xebatên kurdnasiyê hin caran jî ji hêla sîxur û balyozên hin dewletan ve hatine kirin. Armanca wan kesan jî pêkanîna daxwazên dewleta wan bûye.

Li Rûsyayê kesê ku pêşî qala kurdî kiriye “P. S. Pallas e, wî di sala 1787an de di *Comparative Dictionaries of all Languages and Dialects* (Ferhengên Hevrûkirina Hemû Ziman û Zaravayan)de qala zimanê kurdî jî kiriye.” (Tuğrul, 2010: 12)

“Piştî şoreşa Sovyetê wekî siyaseta xurtkirina çandî ya neteweyên biçûk xebatên çand û zimanî yên der barê kurdan de berdewam kir. Li Ermenistana Sovyetê ji bo kurdan 40 dibistan hatine avakirin, gelek pirtûk ji bo kurdan hatine çapkirin û di Enstîtuya Çand û Dîrokê de beşa kurdî hatiye vekirin” (Bruinessen, 2014:21).

Di serdema Sovyetê de bi pêşengîya kesên mîna Marr û Orbelî, ne tenê xebat der barê kurdan de hatin kirin, pê re jî hinek ciwanên kurd ên mîna Ereba Şemo, Qanatê Kurdo wekî pispor hatine perwerdekirin. “Qanatê Kurdo û Ereba Şemo tevî Cukerman di sala 1933yan de du gotar der barê alozîyên zayend û îzafeyê yên zimanê kurdî de nivîsandin. Di vê demê de alfabeyeke kurdî ya li ser bingeha alfabeya latînî hate amadekirin û nîqaşên der barê pêkanîna kurdîyeke nivîskî ya yekgirtî de hatin kirin.” (Mossaki û Omarkhali, 2014:147).

Di sala 1959an de Orbelî biryar da ku komek kurdnasan ji beşa îranî cuda bike û di bin serokatîya xwe de beşeke cuda ava bike. Di nava vê komê de kesên mîna Qanatê Kurdo, Cukerman, Margarita Seda Borisovna Rudenko (1926-1976), îranînas ciwan Dementeva û xwendekarên doktorayê Smirnova, Zara Yusuvova, Kerim Eyûbî û Ordîxanê Celîl hebûn” (Mossaki û Omarkhali, 2014:150).

Qanatê Kurdo ji sala 1960î heta sala 1985an ku jiyana xwe ji dest da, der barê zimanê kurdî de xebatên giranbiha kirine, pirtûka wî ya der barê zimanê kurdî de yek ji van xebatan e. Her wiha Cukerman jî der barê rêzimana kurdî de hinek xebat



kirine. Ji bilî wan jî kesên mîna Smirnova, mêtê wê Eyyubî der barê zaravayên kurdî de berhem dane. Smirnova û hevserê wê Kerîm Eyûbî der barê zaravayê mukrî yê kurdî de 1968 û 1985an de du berhem zaravayê mukrî yê kurdî û denganiya zimanê kurdî (zaravayê mukrî) de dane çapkirin.

“P. L. Tsabolov xebata xwe ya bi navê *Pêşketina Dîrokî ya Denganiya Kurdî* di sala 1976an de, xebata xwe ya bi navê *Pêşketina Dîrokî ya Peyvsaziya Kurdî* di sala 1978an daye ber çapê” (Tuğrul, 2010:17).

Yek ji şagirtên Qanatê Kurd Zara Yusuvova ji sala 1961ê heta niha 70 xebatên zanistî der barê zimanê kurdî de amade kirine. “Yusuvova xebata xwe ya bi navê “Zaravayê Silêmanî yê Zimanê Kurdî” di sala 1985an de li Moskovayê daye ber çapê.” (Tuğrul, 2010: 18).<sup>4</sup>

“Ji wê komê Avaliani li Zanîngeha Semerqendê demeke dirêj mamostetîya kurdî kir, der barê rêziman kurdî de gelek berhem dan çapkirin. Di sala 1957an de Çerkes Bakayev ferhengeke kurdî-rûsî da ber çapê. Ferhengeke din a kurdî-rûsî jî hêla Farîzov ve hate çapkirin.” (Mossaki û Omarkhali, 2014:152).

### **2.2.3. Xebatên li ser Kurdî li Fransayê**

Piştî Rûsyayê du welatên ku di warê xebatên der barê kurdî de derdikevin pêş; Fransa û Îngilistan in. Ev her du welat ji ber desthilatîya xwe ya li ser Iraq û Sûriyeyê (pergala mandetîyê), li başûr û rojavayê Kurdistanê bi kurdan û kurdî re rû bi rû mane. Ji ber vê yekê peywirdarên mîna *Cecil J. Edmonds, Pierre Rondot, Roger Lescot* ji bo kurdî xebat kirine. Di vî warê de li Iraqê rola Tewfîq Wehbî û li Sûriyeyê jî rola Celadet Bedirxan û birayê wî Kamûran Bedirxan nayê jibîrkin.

“Li Fransayê di sala 1857an de rojhilatnasê rûsî *A. Chodzko* xebata xwe ya bi navê *Etudes philologiguges de la langue kurde* ya der barê zaravayê soranî de li Parîsê da çapkirin” (McCarus, 1958:3).

---

<sup>4</sup> Tuğrul navên bi rûsî yên berhemên van kesan bi tirkî nivîsandine, me jî xwe negihand navê resen ên berheman, lewma jî em jî navê berheman bi kurdî didin.

“Rojhilatnasê alman *Albert Socin* di cilda sêyemîn a xebata xwe ya bi navê *Die Sprache der Kurden, Grundriss der Iranischen Philologie* cih daye zimanê kurdî. Ev berhem di sala 1895an de li Strassbourgê hate weşandin. Berhema bi navê *Die Sprache der Kurden* (Zimanê Kurdan) bi bîbliyografiyayeke der barê zarava û wêjeya kurdî de dest pê dike. Di beşên mayîn de jî danganî, navdêr, lêker û hinek deq cih digirin” (McCarus, 1958:4).

“*P. Beidar* berhema xwe ya bi navê *Grammaire Kurde* (Rêzimana Kurdî) di sala 1926an de li Parîsê da weşandin. *Roger Lescot* xebata xwe ya bi navê *Grammaire kurde (dialecte kurmandji)* anku xebata Rêzimana Kurdî ku tevî Celadet Alî Bedirxan amade kiribû di sala 1970yî de li Parîsê da çapkirin. Di sala 1975an de *Joyce Blau* xebata xwe ya bi navê *Le kurde d’Amadiya et du Djabal Sindjar* (Kurdîya Amedîye û Çiyayê Şengalê) da weşandin” (Tuğrul, 2010:8-11).

#### **2.2.4. Xebatên Kurdî li Îngilistanê**

Her wekî me li jorê jî da xuyakirin têkiliya Îngilistanê bi kurdan û kurdî re ji ber plan û bernameyên wê yên li ser Rojhilata Navîn çêbû. Piştî têkçûna Împaratoriya Osmanî û wilayetên Mûsil-Kerkûkê ketin bin mandatîya Îngilistanê, peywirdarên vê rêveberîya herêmî yên leşkerî û dîplomatîk tevî hinek xwendeyên kurd der barê kurdî de hinek berhem dan. Hinek ji wan berheman li Bexdayê, hinek jî li Îngilistanê çap bûn.

“*Serdar Ely Bannister Soane* yek ji pêşengên xebatên kurdî ye. Ew li Kurdistana Iraqê hînî kurdî bûye û wî di sala 1913an de xebata xwe ya bi navê *Grammar of the Kurmanji or Kurdish Language* (Rêzimana Kurmancî an jî Kurdî) li Londonê daye ber çapê. Di sala 1919an de berhema xwe ya bi navê *Elementary Kurmanji Grammar* (Rêzimana Bingehîn a Kurmancî) li Baxdayê daye weşandin. Ev xebat kurdîya Silêmanîyê bingeh digire û armanca Soane ev e ku kurdî hînî leşker û peywirdarên xwe yên li başûrê Kurdistanê bike” (McCarus, 1958:4).

Xebateke din a ku li Bexdayê hatiye çapkirin jî pirtûka serpelê îngilîz *R. F. Jardin* bi navê *Bahdînan Kurmanji* (Kurmancîya Behdînanê) ye. Ev berhema ku di sala 1922yan de hatiye çapkirin, yek ji wan berheman e ku me kiriye mijara vê

xebata xwe. Di xebatên der barê kurd û kurdî de *School of Oriental and African Studies* (Dibistan Xebatên Rojhilat û Afrîkayê) cihekî girîng e. Bi taybetî mamosteyê kurdî yê vê dibistanê *C. J. Edmonds* di xebatên der barê kurdî de navekî hêjayî qalkirinê ye. *Edmonds* di sala 1937an de bîblîyografiyek der barê kurdîya başûr de amade kiriye. Ev berhema bi navê *A Bibliography of Southern Kurdish* xebatên ji sala 1920î heta 1936an digire nava xwe. Her wiha wî di sala 1945an de bîblîyografiya di navbera salên 1937 û 1944an de amade kiriye. Wekî berdewama xebata *Edmonds* îcar peyrevê wî *D.N. MacKenzie* di sala 1957an de bîblîyografiya berhemên salên 1945 û 1955an amade kiriye. Di sala 1966an de *Tewfîq Wehbî* û *C. J. Edmonds* ferhengek bi navê *A Kurdish-English Dictionary* (Ferhengeke Kurdî-Îngilîzî) daye ber çapê. *MacKenzie* di salên 1961 û 1962yan de bi navê *Kurdish Dialect Studies* (Lêkolîna Zaravayên Kurdî) berhemeke du cildî nivîsandiye.

### 2.2.5. Xebatên Kurdî li Almanyayê

Pirtûka Ferdinand Justi, ya bi navê *Kurdische Grammatik* (Rêzimana Kurdî) ku di sala 1880'yî de hatiye çapkirin yek ji pirtûkên pêşîn ên der barê zimanê kurdî de ye. Piştî Justi, di navbera salên 1884 û 1888an de di bin navê *Beitrage zum Kudischen Wortschatze* (Tevkarî Gencîneya Peyvan a Kurdî) ji hela *A. Houtoum-Schindler* ve hatiye kirin û li bajarê Leipzigê hatiye weşandin.

Di sala 1903î *Albert von le Coq*, berhema xwe ya bi navê *Kurdische Texte* (Metnên Kurdî) li Berlînê daye çapkirin. Der barê kurdî de berhemeke bi nav û deng jî ya *Oskar Mann* e. Ev berhema bi navê *Die Mundart der Mukri-Kurden* (Devoka Mukrî ya Kurdan) di sala 1906'an de hatiye çapkirin. Piştî Oskar Mann xebata xwe ya bi navê *Kurdisch-Persische Forschungen* (Lêkolînên Kurdî-Farisî) weşandiye.

Piştî wî di sala 1932yan de *Karl Hadank* *Mundarten der Zâzâ, hauptsächlich aus Siwerek und Kor* (Di serî de Devokên Siwêreg û Korê, Devokên Zazakî) li Berlînê daye weşandin.

Di sala 1982yan de *Zerdeşt Haco* teza xwe ya doktorayê bi navê *Indo-Iranische Sprachstudien. Kurdische Grammatic* (Lêkolînên Hind-Îranî. Rêzimana Kurdî) derxist. (Tugrul, 2010:32).

### **2.2.6. Xebatên Kurdî li Welatên din ên Ewropayê**

Di sedsala 19an de li Nemsayê kesên mîna *Karproth* û *Hammer* li bajarê Viyanayê der barê zimanê kurdî de berhem dane. Friedrich Müller di 1864an de berhema xwe ya bi navê *Kurmangi-Dialect der Kurdensprache* (Zaravayê Kurmancî ya Kurdî) daye weşandin.

Li Swêdê Bo Utas di sala 1986an de pirtûka bi navê *Kurdiska Dialekter och Skriftsprac* (Zaravayên Kurdî û Zimanê Nivîskî) li Upsalayê daye çapkirin. “Li Danîmarkayê zimanzan û etnolog *A. M. Benetictsen* û îranolog *A. Christensen* di sala 1921ê de berhema xwe ya bi navê *Les Dialectes d’Awroman et Perwa* (Zaravayên Hewraman û Perwayê) li Kopenhagê daye çapkirin” (Tugrul, 2010:41).

### **2.2.7. Xebatên Kurdî li Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê**

Li vî welatî yekemîn berhema der barê kurdî de ji hêla mîsyonerê bi navê *S. A. Rhea* ve di sala 1872an de berhemek bi navê *Brief Grammar and Vocabulary of Kurdish Language of the Hakkari District* (Kurtetek ji Rêzimana Zimanê Kurdî ya Herêma Hekarîyê) hatiye nivîsandin û di hejmara yekem a kovara bi navê “*Journal of African and Oriental Studies* de hatiye weşandin.

Xebateke din a li vî welatî di sala 1919an de ji hêla *Ludvig Olsen Fossum* ve hatiye nivîsandin. Ev xebata bi navê *A Practical Kurdish Grammar* (Rêzimanekê Pratîk Kurdî) li bajarê Minneapolisê hatiye çapkirin. Pirtûkeke din a der barê rêzimana kurdî de jî di sala 1958an de ji hêla mamosteyê Zanîngeha Michiganê *E. N. MacCarus* ve hatiye weşandin. Navê vê berhemê jî *A Kurdish Grammar Descriptive Analysis of The Kurdish of Sulaimaniya* (Rêzimanekê Kurdî Dahûrandina Şayesî ya Kurdîya Silêmanîyê) ye û li bajarê New Yorkê çap bûye. Ji bilî vê xebatê, *MacCarus* di 1967an de ferhengek bi navê *A Kurdish-English Dictionary*” amade kiriye û ev ferheng ji hêla Weşanên Zanîngeha Michiganê ve li vî bajarî hatiye çapkirin.

Her wiha *MacCarus* tevî kurdnas *Jamal Jalal Abdullah* ji bo hînkirina kurdî pirtûkek bi navê *Kurdish Basic Course* (Kursa Bingehîn a Kurdî) amade kiriye. Ev pirtûk di sala 1967an de li Michiganê hatiye çapkirin û ji van her sê beşan pêk tê:

“*Kurdish Readers: Vol. I, Newspaper Kurdish* (Pirtûka Xwendinê, C.I Kurdîya Rojnamegerîyê), *Vol. II, Kurdish Essays* (Gotarên Kurdî), *Vol. III, Kurdish Short Stories* (Kurteçîrokên Kurdî)” (Tuğrul, 2010: 44).

Li Michiganê xebateke din a der barê kurdî de ji hêla *Margaret Kahn* ve hatiye amadekirin. Navê wê xebatê *Borrowing and Variation in Phonological Description of Kurdish* (Di Şayesandina Dengzanî ya Kurdî de Guherbarî û Peyvqerzkirin) ye û 1976an hatiye çapkirin. Di sala 1985an de li Zanîngeha Michigan pirtûka Terry Lynn Todd a bi navê “A Grammar of Dimili Also Knowns As Zaza” hatiye çapkirin.



# BEŞA SÊYEM

## PÊŞKÊŞKIRIN Û ANALÎZA BERAWIRDÎ YA DU

### XEBATÊN RÊZIMANA KURMANCÎYÊ

Di vê beşê de dê du berhemên destpêkî yên rêzimana kurmancîyê bi nêrîneke zimanzanîya giştî werin pêşkêşkirin û li gorî pîvanên rêzimana nûjen dê werin analîzkirin. Her du berhem, ji ber du sedeman hatin neqandin; yek ji wan sedeman girîngîya van a dîrokî ye, sedema duyemîn jî ev e ku ev li qadê hatine amadekirin û xebatên rêzimana şayesî ne.

Di beşê de piştî danasîneke kurt van xebatan û nivîskarê wan, dê ji aliyê fonetîk, morfolojî, sentaks û semantîkê ve werin dabeşkirin û bi nêrîneke berawirdî were analîzkirin. Bi taybetî kategorîyên rêzimanî yên mîna zayend, mêjer, tewang nasyarî û beşên axaftinê dê bibin warê sereke yên vekolan û lêhûrbûnê. Piştî jî dê her du xebat werin birawirdkirin û encamên ku ji vê lêkolînê hatine bidestxistin jî dê di beşa encamê de werin pêşkêşkirin.

### 3.1. XEBATA SAMUEL A. RHEA

Ev xebat di sala di sala 1869an de pêşkêşî American Oriental Society hatiye kirin û di *Journal of the American Oriental Society*, (Vol. 10 (1872 - 1880), pp. 118-155) de hatiye weşandin. Navê vê xebatê *The Brief Grammar and Vocabulary of The Kurdish Language of The Hakari District* (Kurteyek ji Rêziman û Ferhengoka Zimanê Kurdî ya Herêma hekarî) ye. Ew xebat, yekemîn berhema rêzimanê kurmancîyê ye ku ku bi zimanê îngilîzî hatiye nivîsandin.

Her wekî ji navê wê jî diyar e, *Rheayî* piştî ku bi salan li herêma Culemêrgê mîsyonerî kiriye, xebateke wiha ji bo hêskirina karê peyrewên xwe pêwîst dîtiye. Devoka ku Rhea li ser xebitîye, devoka Hoza Hertûşî ye.

Li gorî pirtûkê, vê hozê mîrgeha Hekarî ava kiriye. Sînorên vê mîrgehê ji hêla peyrewê *Rheayî, J. H. Shedd* ve bi vî rengî hatine destnîşankirin: “Devera ku ev devok lê tê bikaranîn ya Hekarî anku ew hoz e ku mîrgeha dawîn a Culemêrgê ava kiriye. Para başûr a paşatîya Wanê ya niha ye. Li rojhilata wê mîrgehê sînorê Îranê, li rojavayê wê Mîrgeha Botan heye. Li başûrê wê deverên Tîarî, Pinyanîş, Destîgan û Şemzînan hene û li bakur sînorên wê digihêje Xoyê.” (Rhea, 1869:118)

### **3.1.1. Jîyana Samuel A. Rhea**

Nivîskarê vê xebatê mîsyonerê amerîkî Samuel A. Rhea di sala 1827an de ji dayik bûye. Li gorî pêşgotina ku ji hêla desteya weşanê ve hatiye nivîsandin, Rhea di havîna sala 1851ê de hatiye Kurdistanê, gundê Memikan ê Gewerê di nav nestorîyên vê herêmê de bi cih û war bûye. Heta nîsana 1859an heşt salan li vir maye, piştê ji ber arîşeyên tenduristî ve geriyaye Amerîkayê. Piştî wê, di çiriya pêşîn a sala 1860î de li Êrmîyeyê bi cih bûye û di sala 1865an de li vir koça dawîn kiriye û gora li Goristana Mîsyoneran a Azerbeycana Xerbî ye.

Dema ku Jardine li Gewerê bûye, bi kurdan re danûstandinên wî xurt bûne, wî girîngîyeke zêde daye kurdî, wî bi tenê ew ziman di danûstandinê xwe de bi kar anîye, tu caran pê gotareke dînî pêşkêş nekiriye. Ev gotara der barê kurmançîya Culemêrgê de berî ku Rhea ji Êrmîyeyê veqete di zivistanekê de hatiye amadekirin.

Rhea di warê bikaranîna suryankîya nûjen de xwedîyê berhemendî û şiyaneke zimanzanî ya taybet bûye. Di dema ku ji nişka ve ji karîgerîyê ketiye jî bi mebesta wergerandina încîlê li wan zaravayan, xwe di warê tirkîya tatarî anku rojhilatî de bi pêş xistiye.

### **3.1.2. Li gorî Rheayî Fonetîka Kurdî**

Xebatên rêzimana klasîk bi gelemperî bala xwe nadin dengan, bi tenê tîpan destnîşan dikin; bi kurtasî tîpên alfabe ya wî zimanî tîpên rêzkirin û ji alîyê bilêvkirinê ve ew bi zimanê(n) ku xwîner dizane re tê hevrûkirinê. Di vê xebatê de jî ew tişt hatiye kirin û dengên zimanê kurdî bi dengên zimanê îngilîzîyê re hatine berawirdkirin. Rheayî dengên kurdî bi peyvên îngilîzî rave kirine.

Li gorî Rheayî di kurmancîya Hekarîyê de deh dengdêr û sê pevdeng hene. Her wiha ji bo nedengdêran jî heman rêbaz bi kar anîye û ji bo wan jî mînakên xwe ji îngilîzî dane. Ji bo guhartoyên dengê /r/ jî gotiye dengê /r/ya lertzok wekî /r/ya almanî û fransî tê bilêvkirin. Wekî nedengdêr Rheayî 23 nedengdêr destnîşan kirine.

### 3.1.2.1. Di Xebata Rheayî de Dengdêrên Kurmancîyê

Em dikarin dengdêrên kurdîya kurmancîyê ku Rheayî di xebata xwe de dane, di tabloya xwarê de bi cih bikin:

	Deng	Peyvên mînak	Bi tîpên kurdî - IPA
Dengdêr	a	far, father	a [ɑ]
	ă	hat, man	e [æ]
	â	all, awful	IPA: [ɒ]
	ē	fate, male, they	ey
	e	met, pen	e [æ]
	ī	meet, mete, pique	î [I]
	i	pin, pit	ê [e]
	o	note, boat	ow [ə]
	u	rule, moon, fool	û [u]
	ũ	but, come, blood	a [ɐ]
	ai	aisle, pine	ay
	au	cow, sour	ew
	oi	boil	oy

Rheayî heşt dengdêr û çar jî pevdeng dane, ji ber ku wî mînakên xwe ji kurmancî nedane, em nikarin bi rastî jî taqî bikin, mînakên wî ji peyvên bi îngilîzî ne, ji ber vê yekê me bi tenê li gorî danganîya wan peyvan li ber wan tîpên alfabeya kurdî û tîpên IPAYê danîn berê. Her wekî tê zanîn di zimanê nivîskî de 8 dengdêr wekî fonem tên qebûl kirin, ji wan sê heb kurt in (e, i, u) û pênc heb (a, ê, î, û, o) jî dirêj in.



Ji bo taybetîyên danganîya Hekarî em dişên balê bikêşin ser gotinên Rojan Hazim (1994) ên di hejmara 14-15 a *Kovara Kurmancî* de. Li gorî diyarkirina Hazimî di hin devokên Hekarîyê de deng /û/ wekî /ü/ tê bilêvkin, her wekî *hûn > hün; bûk > e bük > kûr > kür; dûr > dür; bûk > bük...*

### 3.1.2.2. Di Xebata Rheayî de Nedengdêr

Rheayî der barê nedengdêran de jî wiha gotiye: “b, d, f, g, h, k, l, m, n, p, r, s, t, v, w, y, z” mîna heman tîpên îngilîzî tîn bilêvkin. Dengê /g/yê bi dengê xwe yê stûr mîna dengê di peyvên *get, give* û *goyê* de, /r/ jî bi guhartoya xwe ya lertzok mîna /r/ya di almanî û frensî de tê bilêvkin.

Dengê /ch/yê mîna dengê di peyva *church* de û /j/ jî mîna dengê di peyva *judge* de tê bilêvkin. Herçî dengê /sh/ ye, mîna dengê di peyva *she* de ye û /zh/ mîna dengê di peyva *pleasure* de ye. Dengên /kh/ û /gh/dengên qirikî ne. (Rhea, 1869: 119-120).

Li gorî vê ravekirinê nedengdêrên di berhemê de jî ev in:

	Deng	Peyvên mînak	Bi tîpên kurdî - IPA
Nedengdêr	b	far, father	b [b]
	j	judge	c [d̟ʒ]
	ch	church	ç [tʃ]
	d	fate, male, they	d [d]
	f		f [f]
	g	get, give	g [g]
	h		h [h]
	zh	pleasure	j [ʒ]
	k		k [u]
	l		l [l]
	m		m [m]
	n		n [n]
	p		p [p]
	r		r [r]

rr		r [r]
s		s [s]
sh	she	ş [ʃ]
t		t [t]
v		v [v]
w		w [w]
y		y [ʎ]
z		z [z]
kh		x [x]
gh		ğ (Ĝ) [ɣ]

Heke em wê listeyê bi dengên zimanê nivîskî re hevrû bikin, em ê bibînin ku di vê listeyê de dengê /q/yê cih negirtiye. Her wiha di nava xebatê de jî peyvên bi /q/yê bi /k/yê hatine nivîsandin, her wekî peyva *qenc* wekî *kenc* hatiye nivîsandin.

Ev yek balkêş e, ji ber ku em baş dizanin ku di hemû devokên kurmancîyê de dengê /q/ bi xurtî hatiye parastin. Her wekî di beşa rêzimanê kurdî de jî me destnîşan kiriye, Lescot & Bedirxan (2001), Thackston (2006) û Tan (2015) di berhemên xwe dengê /q/ nîşan dane. Li gorî agahîyan Rheayî zimanê suryankî pir baş dizanî û di wî zimanî de jî dengê /q/ heye, îcar çawa kêmasîyeke wiha pêk hatiye ev yek pir ne zelal e. Li gorî nîşeya ku weşanger daye, “Rheayî ji bo nîşandana dengên he (ح), t (ط) û qaf (ق) xal daniye ser tîpên /h/, /t/ û /k/ lê belê wî ev tîp di nivîsê de bi kar neanîne.

### 3.1.2.3. Li gorî Rheayî Fonolojîya Kurdî

Di vê xebatê de der barê fonolojîyê de tiştek nehatiye gotin. Di beşa lêkeran de qala guherîn û ketina hin dangan hatiye kirin. Rheayî ev mijar wiha hildaye dest:

“Hin lêkerên ku radera wan bi /-tin/ê diqede, di dema niha û raweya fermanî de tevî hinek guherînên din /t/ya /-tin/ê diavêjin, lê belê di demên borî de ew /t/ dîsa vedigere şûna xwe.

<b>Girtin</b>	
<b>Dem û rawe</b>	<b>Mînak</b>
Raweya fermanî	gire, girin
Dema niha	girim

<b>Helawîstin</b>	
<b>Dem û rawe</b>	<b>Mînak</b>
Raweya fermanî	helawîse, hilawîsin
Dema niha	hilawîsim

<b>Hajûtin</b>	
<b>Dem û rawe</b>	<b>Mînak</b>
Raweya fermanî	hajû, hajûn
Dema niha	hajûm

<b>Hawêtin</b>	
<b>Dem û rawe</b>	<b>Mînak</b>
Raweya fermanî	hawê, hawên
Dema niha	hawêm

Di lêkerên li xwarê de dengên *bêjen* ên berî /t/yê dibin dengê *bijen*.

<b>Biziftin (f&gt;v)</b>	
<b>Dem û rawe</b>	<b>Mînak</b>
Raweya fermanî	bizive, bizivin
Dema niha	bizivim

<b>Guhostin (s &gt; z)</b>	
<b>Dem û rawe</b>	<b>Mînak</b>
Raweya fermanî	guhoze, guhozin
Dema niha	guhozim

<b>Xwastin (s &gt; z)</b>	
<b>Dem û rawe</b>	<b>Mînak</b>
Raweya fermanî	xwaze, xwazin
Dema niha	xwazim

Lêkerek jî dengdêra berî nedengdêra dawîn diguhêre.

<b>Heraftin (a &gt; ê)</b>	
<b>Dem û rawe</b>	<b>Mînak</b>
Raweya fermanî	herêfe, herêfin
Dema niha	herêfim

Lêkerên li jêr jî di gel /t/ya “-tin”ê, nedendêra fizekî ya berî wê jî napejirîne.

<b>Êxistin</b>	
<b>Dem û rawe</b>	<b>Mînak</b>
Raweya fermanî	êxe, êxin
Dema niha	êxum, êxî, êxît

<b>Niwistin</b>	
<b>Dem û rawe</b>	<b>Mînak</b>
Raweya fermanî	biniwe, biniwin
Dema niha	niwim, niwî, niwît

<b>Şuştin</b>	
<b>Dem û rawe</b>	<b>Mînak</b>
Raweya fermanî	şû, şûn
Dema niha	şûm, şûî, şût

Lêkerek ji van dengdêrekê li xwe zêde dike.

<b>Bihîstin</b>	
<b>Dem û rawe</b>	<b>Mînak</b>
Raweya fermanî	bêhê, bêhên

Dema niha	bihêm
-----------	-------

Du lêker li şûna /t/ya /-tin/ dengê /j/yê li xwe zêde dikin.

<b>Firotin</b>	
<b>Dem û rawe</b>	<b>Mînak</b>
Raweya fermanî	froje, frojin
Dema niha	frojim

<b>Sotin</b>	
<b>Dem û rawe</b>	<b>Mînak</b>
Raweya fermanî	soje, sojin
Dema niha	sojim

Hemû lêkerên ku forma wan a raderî bi /-tin/ê diqede, di demên borî de ew /t/ bi şûn de vedigere, bi tenê /-in/ tê avêtin û formên dema borîya dûdar, çîrokîya dema borîya têdeyî û forma mercî paşgirên /-îye/, /-ibû/ û /-ibe/ digirin.

Lêker	Dema borîya têdeyî	Dema borîya dûdar	Çîrokîya dema borîya têdeyî	Mercî
girtin	girt	girtiye	girtibû	girtibe
heraftin	heraft	heraftîye	heraftibû	heraftibe
bihîstin	bihîst	bihîstîye	bihîstibû	bihîstibe

Du lêker /r/ya dawîyê winda dikin.

<b>Kirin</b>	
<b>Dem û rawe</b>	<b>Mînak</b>
Raweya fermanî	ke, ken
Dema niha	kem keî, ket, ken
Dema borîya têdeyî	kir
Dema borîya dûdar	kirîe
Çîrokîya dema borîya têdeyî	kirîbû
Mercî	kiribe

<b>Birin</b>	
<b>Dem û rawe</b>	<b>Mînak</b>
Raweya fermanî	bê, bèn
Dema niha	bêm, bêî, bêt, bèn
Dema borîya têdeyî	bir
Dema borîya dûdar	birîye
Çîrokîya dema borîya têdeyî	birîbû
Mercî	birîbe

(Rheayî, 1869: 129-131)

Rheayî ji bilî van, qala tu guherînên rêzikî nekiriye.

Lê li gorî Hazimî “Dengê /r/ bi taybetî di nîveka Colemêrgê û çarçoveyeke teng da nayê ber guh, li şûna dengê /r/ dengê /y/ derdikeve.. *herê* dibe *heyê*. Lê belê, heke «r» di serê bêjeyê da be herwekî dengê xwe tete bilêvkin. Tenê di nîvek û dawîya bêjeyê da dibe /y/. Her wiha “dengê /h/ jî di devokê Hekarîya da ji devokên dî zêdetir bi kar têt: herê/erê, rih/rî, bêhn/bîn, têhnî/tî, mih/mî, bahr/par, xwahr/xwar, pahtin/patin, kahnî/kanî, rêhl/rêl, heyv/hîv, sihwane/sîwane, mêhvan/mêvan...”

(Hazim, 1994: 144).

### **3.1.3. Morfolojîya Kurmancîyê di Pirtûka Rheayî de**

Di vê pirtûkê de di warê peyvسازیyê de zêde tiştek nîn e, her wekî pirtûkeke rêzimana klasîk cih daye beşên axaftinê û hinek kategoriyên rêzimanî.

#### **3.1.3.1. Li gorî Rheayî de Qertafên Kêşanê yên Kurmancîyê**

Rheayî di beşa lêkerên de qala hinek qertafên kêşana lêkeran û di beşa rengdêran de jî qala qertafên pileyên rengdêran kiriye, lê qertafên kêşanê bi serê xwe nebûna mijara vê berhemê, dîsa jî di nav mijarên din de qala wan jî hatiye kirin.

Di nav mijara navdêr û rengdêrê de qala qertafên kêşanê yên têkildarî navdêr û rengdêrê û di nav mijara lêkerê de jî qala qertafên têkildarî lêkerê hatiye kirin. Di vê xebatê de der barê tewangê anku kêşana navdêrê de zêde tiştêk nehatiye gotin. Der barê tewangê de bêyî ku were binavkirin û ravekirin, bi tenê ev tişt hatine gotin: “Piştî daçekên *bi* û *li* paşgira rewşê /-ê/ tê, her wekî *li şehrê, li esmanê*” (Rhea, 1869:122). Her wekî me di beşa rêzimanê de bal kişandiye serê, di kurmancîyê de tewanga navdêr û cînavkan xwedanê pergalekê ye, ev pergal bi mijara zayend, mêjer û ergatîfyê re jî rasterast têkildar e. Zayend û mêjera navdêrê li gel veqetandekê hin caran jî bi tewangê diyar dibe.

Di xebatê de jî bo qertafên rengdêran ev mînak hatine dayîn: “Payeya hevrûkirinê bi alîkarîya pêvekirina paşgira /-tir/ pêk tê. Her wekî *kenc* dibe *kenctir*, *dirêj* dibe *dirêjtir*. Ji bo hevrûkirina du tiştan /ji/ tê bikaranîn, wek nimûne, *Evrû germtir e ji duhu*. Ji bo payeya berztirîn bi vî rengî pêk tê: “*Ev mirov ji hemî kenctir e*”. (Rhea, 1869:122).

Ev xebat jî nîşan dide ku paşgira payeya berztirîn /-tirîn/ di kurmancîyê de zêde ne berbelav e. Hêjayî gotinê ye ku Yûsif Diyaadîn Paşa di pêşeke ferhenga xwe de qala vê qertafê kiriye. Wî di beşa *Alavên Ku Dikevin Dawiya Peyvê* de der barê vê mijarê de wiha gotiye: “*Tir* jî heye ku wateya baştiriyê dide wek *qenctir* û *alimtir* û hwd. tê gotin *qenctirîn* jî ku ew jî forma mubalexeyê ye” (Dost, 2017: 36).

Her wekî me li jor jî diyar kir, qertafên kêşanê yên bi lêkerê re peywendîdar di nava beşa lekerê de hatine ravekirin. Mirov dikare wan qertafan wekî; qertafên kesandinê, pêşgira dema niha /di-/ , pêşgira raweyên xwestekî /bi-/ , paşgira dema borîya dûdar /-e/ û paşgirên raweya fermanî rêz bike.

Rheayî qertafên kesandinê wekî *personal endings* (dawîkerên kesîn) bi nav kirine û bi vî rengî pêşkêş kirine: “Di kurdî de dawîkerên kesîn ev in: Ji bo yekhejmaran 1. /-m/, 2. /-î/, 3. /-t/; ew ên pirhejmar in, her sê jî /-n/ digirin. Wekî nimûneya lêkerên nerêzikî kêşana *kirinê* bi vî rengî ye:

### ***Yekhejmar***

#### ***1. ez kem***

2. *tu keî*

3- *ew ket*

### **Pirhejmar**

1. *em ken*

2. *hûn ken*

3. *wan ken*” (Rhea, 1869:122).

Pêşgira dema niha /di-/ di vê berhemê de wekî /it/ û /t-/ hatiye dayîn û der barê vê qertafê de wiha hatiye gotin: “Pêşgira /ti-/yê dema niha ya domdar pêk tîne. Her wekî, *ez tikem*” (Rhea, 1869:122-123).

Nivîskarê vê pirtûkê Rhea pêşgira raweyên xwestekî /bi-/yê bi van gotinan daye nasandin: “Qertafa /bi-/ dema niha ya nediyar an jî giştî pêk tîne, hin caran jî xwestekîyê pêk tîne. Her wekî *ez bikem*. Heke *dê* bikeve navberê, *dema bê* çêdibe. Her wekî *ez dê kem*, hin caran /bi-/ jî tê ber lêkerê û dibe *ez dê bikem (...)* Dema ku em pêşgira /ti-/yê bînin ber vê forma lêkerê, dema borîya berdest anku çîrokîya dema niha bi dest dikeve. Her wekî *min t’kir*” (Rhea, 1869:123).

Rheayî qertafa dema borîya dûdar /-e/ jî bi van gotinan pênase kiriye: “Ji bo pêkanîna dema borîya dûdar, ji bilî lêkerên bi kêşana sêyem, paşgirên /-e/ yan jî /-ye/ tê dawîya lêkerê, ew jî cînavkên koma duyem digirin, her wekî; *min kirîe*” (Rhea, 1869:123).

Li gorî Rheayî; “qertafên raweya fermanî du kesan; kesên duyem ên yekhejmar û pirhejmar digirin nava xwe. Paşgira wê raweyê jî /-e/ û /-in/ in, pêşgira /bi-/ tê ber lêkerê, her wekî *bike, biken*” (Rhea, 1869:123).

### **3.1.3.2. Di Xebata Rheayî de Qertafên Bêjesaz**

Her wekî me di beşa rêzimanê de nîşan da, di kurmancîyê de gelek qertafên bêjesaz (pêşgir, paşgir, navgir, navbergir) hene, lê belê di vê xebatê de der barê qertafên bêjesaz de tiştek nîn e, bi tenê di nav beşa navdêrê de bi van gotinan qala paşgira /-î/ (atî, yatî, îtî) hatiye kirin: “Gelek navdêrên razber ji rengdêran tînan bidestxistin. Dema ku /î/ (atî, yatî, îtî)yek bi dawîya rengdêrekê ve dibe, ev yek pêk tê, bo nimûne *dirêj > dirêjî, spî > spîyatî, reş > reşatî, padîşah > padîşahî* yan jî *padîşahahî*” (Rhea, 1869:121).



Di vê xebatê de peyvsazî kurmancîyê cih negirtiye, lê belê di mijara lêkeran de qala peyvsazîya lêkeran hatiye kirin. Her çî qas lêker li gorî awayê kêşana wan hatibin dabeşkirin jî tê de qala qertafên bêjesaz ên lêkersaz jî hatiye kirin. Bo nimûne:

#### **Kêşana yekem:**

“Ev kom ji lêkerên ku bi /-andin/ê diqedin pêk tê. Di pêkanîna rayeka dema niha, bê û raweya fermanî ya van lêkeran de /-andin/ dibe /-în/, her wekî *standin* dibe *stîn*. Ji bo bidestxistina rayeka dema borî jî /-in/ ji dawîya raderê tê avêtin, bi vî awayî *standin* dibe *stand* an jî bi gelemperî dibe *stant*. Ji vê rayekê bi pêvekirina /-iye/ dema borîya dûdar, bi lêzêdekirina /-ibû/ çîrokîya dema borîya têdeyî û bi pêvekirina /-ibe/ jî raweya mercî pêk tê.” (Rhea, 1869:123).

#### **3.1.3.3. Li gorî Xebata Rheayî Kategorîyên Rêzimanî**

Rhea kategorîyên rêzimanî di nav beşên axaftinê de pêşkêş kirine. Kategorîyên têkildarî navdêrê di bin sernavê navdêrê de û kategorîyên têkildarî lêkerê jî di bin sernavê lêkerê de hatine pêşkêşkirin.

Di vê xebatê de heft beşên axaftinê hatine pêşkêşkirin. Kategorîyên rêzimanî yên têkildarî navdêrê anku zayend, mêjer û rewş di beşa navdêrê, kategorîyên têkildarî lêkerê di beşa lêkerê de hatine dayîn. Ji beşên axaftinê bi tenê qala baneşanê nehatiye kirin. Li alîyê din, di nav beşên axaftinê de *hejmar* jî hatine dayîn.

Di xebata Rheayî de der barê navdêrê de agahîyên berfireh nehatine dayîn. Bi tenê der barê hinek kategorîyên rêzimanî yên têkildarî navdêrê yên mîna zayend, mêjer, binavkirin û rewşên navdêrê de hin nirxandin hatine kirin.

#### **Zayend**

Li gorî vê berhemê di zimanê kurdî de cudakirina *zayendê* nîn e. Di beşa navdêrê de der barê zayendê de wiha hatiye gotin: “Di kurdî de zayenda navdêran hin caran bi rêya bikaranîna peyvên cuda ji bo giyanewerên ji zayendên cuda pêk tê. Ji bilî vê jî, bi rêya peyvên *nêr* û *mê* tê destnîşankirin. Ev her du bêje ji bo diyarkirina

zayenda ajalan tèn bikaranîn, lê hin caran jî bi dûv peyvvan tèn xistin, bi vî rengî zayendê nîşan didin.” (Rhea, 1869:120).

Xebatên der barê zimane kurdî de nîşan didin ku ramana Rheayî di vî warî de çewt e, lewre di beşa rêzimanê de me bi jêgiranên ji berhemên cur bi cur (MacKenzie, Haig & Öpengin, Barbera) nîşan da ku di kurdîya kurmancî de cudatîya zayendê heye û ew jî bi riya veqetandek û qertafên tewang û banglêkirinê xwe nîşan dide. Li gorî Rojan Hazim di li herêma Hekarîyê ji bo navdêrên nêr qertafa tewangê ne /-î/, lê belê /-i/ ye. “Mînak: Ez çûm aşi. - Kê got? Wi mirovi got. Nanê Şivani” (Hazim, 1994: 145).

### **Mêjer**

Pirhejmarî li gorî vê berhemê bi alîkarîya paşgira /-an/ çêdibe. Her wekî “*mal* > *malan*, *mirov* > *mirovan*; *hesp* > *hespan*. Lê heke navdêr berî cînavka xwedîtîyê paşgira /-ê/ bigire, hingî ew paşgir nayê dawîya /-an/ê, li şûna wê /-ê/ tê bicihkirin. Lewma jî *malê min* dibe, *malêt min* ne *malanê min*, *bira* dibe *biraêt min*, *biraêt wî*, *biraêt wan*” (Rhea, 1869:121). Nirxandina Rojan Hazim a di vî warî de jî gotinên Rheayî diselmînin. Wî jî der barê veqetandeka pirhejmarîyê de ev mînak daye: “Gundîyêt Hekarîya, dara ji rêhlêd dûr tînin” (Hazim, 1994: 144) Lê dîsa jî di warê mêjerê de jî gotinên Rheayî kêr dimînin, her wekî me di beşa rêzimanê jî de destnîşan kiriye; di kurmancîyê de mêjer bi alîkarîya veqetandekê (-ên), qertafa tewangê (-an) pêk tê û mêjera navdêrên xwerû jî bi kêşana lêkerê tê destnîşankirin.

### **Binavkirî û nebinavkirî**

Di xebata Rheayî de der barê rewşa binavkirî û nebinavkirî ya navdêran de zêde agahî nîn in, der barê mijarê de ev tişt hatiye gotin: “Rengdêr û cînavkên şanîdanê her tim wekî pirtikên binavkirinê tèn bikaranîn û hejmara /êk/ wekî pirtika nebinavkirinê tê bikaranîn.

**Mînak:** *Hesp* hatiye. ([the] horse has come)

*Kitêbêk* bide min. (Give me a book)” (Rhea, 1869:120).

Heke em li beşa rêzimanê vegerin, em ê bibînin ku di kurmancîyê de peyva xwerû binavkirî ye, ji bo nebinavkirinê di kurmancîya nivîskî du qertaf hene; /-ek/ (yekhejmar) û /-in/ pirhejmar. Her wiha peyvên bi van qertafan li gorî rewşê ditewin û dikevin rewşa /-ekî/ (yekjimar/nêr), /-ekê/ (yekhejmar/mê) û /-inan/ (pirhejmar), hem jî veqetandekan digirin û dibin /-ekî/ (yekhejmar/ nêr), /-eke/ (yekhejmar/mê) û /-ine/ (pijhejmar).

Di vê xebatê de der barê rewşê de tiştêk nîn e. Bi tenê di beşa navdêran de ev tişt hatiye gotin: “Navdêran ji bo rewşê bi tenê guhartoyek heye; di hin devokan de ev rewş bi pêvekirina /-ê/ yan /-a/, di hinekan de jî pêvekirina /ra/yekê pêk tê. Lewma jî *şehr* dibe *şehrê* (to the city) , *minra* (to me), *mera* (to us), bi awayî rewşên berpêbûnê û akûzatîf tên nîşandan. Piştî daçekên /bi/ û /li/ paşgira rewşê /ê/ tê, her wekî *li şehrê*, *li esmanê*. Di rewşa xwedîtîyê de /ê/yek dikeve navbera navdêrên diyarker û diyarbûyî; *genimê Êrmî*, *mirovê çîya...*” (Rhea, 1869:120).

Her wekî me di beşa rêzimanê destnîşan kiriye, di kurmancî de rewşa xwerû û tewandî du rewşên bingehîn in, rewşa tewandî bi qertafan tê nîşandan. Li hin herêman jî tewanga navdêrên nêr bi tewanga hundirîn (ez diçim bajêr) pêk tê. Ev rewş ji bo pergala ergatîfî jî pir girîng in. Her çî rewşên din in, bi alîkarîya daçekan tên nîşandan. Nirxandinên Rheayî di vî warî de pir kêr û qels dimînin.

### 3.1.3.3.1. Cînavk di Xebata Rheayî de

Di berhema Rheayî de der barê cînavkan de ev tişt hatine gotin: “Cînavkên kesane, ji bilî kesê sêyem ê pirhejmar her yekê du form (forma yekem û forma duyem an jî forma kirdarî û forma xwedîtîyê yan jî bireserîyê) hene.

#### Cînavkên kesane

Koma yekem	Koma duyem
ez	min
tu	te
ew	wî
em	me
hûn, hingû	heve

wan	wan
-----	-----

Ji bo nîşandana xwedîtîyê cînavkek ji koma duyem tê ber navdêrê /-ê/ yan /-ê/ dikeve navberê, her wekî *malê te, malê heve, malêt wan* û hwd. Xwedîtîya teqez bi alîkarîya pêşgira /yê/ û heman cînavkan pêk tê. Her wekî *yê min, yê te, yê wî, yê me, yê heve, yê wan*. Cînavka vegerok *xwe* yan jî *xo* yan jî *bi xo* piştî cînavkan tê û rewşa vegerok pêk tê. Her wekî *ez, bi xo, tu xo* yan *tu bi xo* û hwd.

Cînavkên pirsyarî *kî, çî, kîjkî* ne, her duyên pêşîn peywira cînavkên girêkî jî pêk tînin. Nediariya wan bi alîkariya *her* çêdibe, mîna *her kî, her çî*” (Rhea, 1869:121).

Di vê xebatê de nîrxandinên der barê cînavkan jî bi giştî û gelemperî ne. Li gorî berhemên nûjen ên rêzimana kurmancî (Tan, Thackston, Kurdo) di kurmancîyê de gelek ev cureyên cînavkan hene. Her wekî; “Cînavkên kesane, cînavkên şanîdanê, cînavka vegerok, cînavka qertafî, cînavkên kesandinê, cînavkên berbihevîn, cînavkên lihevxiştî, cînavkên nebinavkirî, cînavkên jimarîn, cînavkên pirsyarî” (Tan, 2015: 125).

Rojan Hazim (1994) der barê cînavkên herêma Hekarîyê de jî daye zanîn ku kesê sêyem ê yekhejmar “ewî (nêr)” û “ewê (mê)” ye. Her wiha kesê sêyem ê pirhejmar jî “ewan” e. Di rêzgirtinê de jî kesê duyem ê pirhejmar “we” dibe “hewe”, li herêma Şemzînan li şûna “hewe” forma “hingo” jî tê bikaranîn.

### 3.1.3.3.2. Rengdêr di Xebata Rheayî de

Di vê mijarê de Rheayî zêde tiştêk negotiye, qala cureyên rengdêr û taybetîyan wan nekiriye. Bi tenê qala payeya hevrûkirin û raveka rengdêrî hatiye kirin. Her wekî me di beşa rêzimanê de destnîşan kiriye, di kurmancîyê de pênc cure rengdêr hene, taybetîyên wan jî ji hev cuda ne.

Rheayî der barê rengdêran de ev agahî dane: “Ji bilî payeya hevrûkirinê rengdêr nayên kêşanê, ji bo ravekirinê li pey navdêran tînin û /ê/ yek dikeve navberê, her wekî *mirovê bilint, berê koîm, malê mazin*. Payeya hevrûkirinê bi alîkarîya pêvekirina paşgira /-tir/ pêk tê. Her wekî *kenc* dibe *kenctir*, *dirêj* dibe *dirêjtir*. Ji bo

hevrukirina du tiştan /ji/ tê bikaranîn, wek nimûne, *Evrû germtir e ji duhu*. Ji bo payeya berzîrîn bi vî rengî pêk tê; *Ev mirov ji hemî qencîr e*” (Rhea, 1869:122).

### 3.1.3.3.3. Hoker di Xebata Rheayî de

Rheayî der barê hokeran de ev agahî dane: “Hokerên cih û fermanê ev in: *kî derî, kanî, ji kî derî, li kî derî, l’êre an li hêre, li vir j’êre, wêrî, wê derî, li wêrî, evrazî, jore, xwarî, li xwarî, nişîv, li derwe, li wê der, nêzûk, dûr, ji dûr*.

Hokerên demê ev in: *kengî, kînga, hengî, wê çaxî, wê demî, wê gavî, wê cari, niha an jî nuke, heta nuha, ji nuha, ji ber nuha, hiç, qut an jî qet, dîsan, paşî, spêde, dreng, ji mêje, car car, gelek car, çent car, pêş, berê, berahî, dûmaî evrû, îrû, duhu, pêr, subahî, par, pêrar*.

Hokerên çawanî û çendanîyê ev in: *çeve, kureng, bo çi, ho, horeng, we, ehwe, hinde, hint, bes, jî, wekû, gelek, qewî, piçek, zêde, kenc, spehî, rend, belkî, koma, elbete, bî şik, drust, micid, yanî, belî, herê, ne, çû, ma, gelêk, beranber, pêkwe yan jî pêkîeve, dumaî, beleş, herwe, sanaî, zû, hêdî.*” (Rhea, 1869:133-134).

Em dişên bibêjin ku di xebata Rheayî de agahîyên der barê hokeran de ji beşên din zêdetir û zelaltir in.

### 3.1.3.3.4. Daçek di Xebata Rheayî de

Li gorî Rheayî di kurmancîyê de daçek ev in: “*bi, bes, bê yan jî bî, ber, bin, bo, çahr nukar, dû, gel, heta,, li, lalê, li ba, mabên an jî mabeyn, nav, navbend, nêzûk, nik, pê, sebeb, ser, yê, ji, ji bedel, ji bil, jûr.*” (Rhea, 1869: 134).

Her wekî me di beşa rêzimanê de nîşan daye daçek di kurmancîyê de gelek in û rist û peywira wan jî ji hev cuda ye. Di kurmancî de hem daçek, hem jî bazinedaçek hene. Hin hoker rewşa navdêrê diyar dikin, hin hokerên cih û demê çêdikin. Her wiha bi alîkarîya daçekan lêkerên daçekî û cînavkên lihevxiştî jî pêk tên.

### 3.1.3.3.5. Gihanek di Xebata Rheayî de

Di pirtûkê de ev gihanek hatine pêşkêşkirin: “*eger, ema, an, bulu, çimakî, çunkî, dîsan, heke, hem, hêj, ile, ja, ku, lakîn, ne ke, ne ku, sebeb, û, wekû, yan, ji, jî, ji bereng.*” (Rhea, 1869:134). Di agahîyên Rheayî di vê mijarê de jî di ser re ne.

### 3.1.3.3.6. Hejmar di Xebata Rheayî de

Di vê berhemê de hejmar jî wekî beşeke axaftinê hatine pêşkêşkirin: “*1. êk, 2. du, 3. sê, 4. çahr, 5. pênc, 6. şeş, 7. heft, 8. heşt, 9. neh, 10. deh, 11. yanzdeh, 12. danzdeh, 13. sêzdeh, 14. çahrdeh, 15. panzdeh, 16. şanzdeh, 17. hefdeh, 18. heşdeh, 19. nûzdeh, 20. bîst, 21. bîst û êk, 22. bîst û du, 30. seh, 40. çil, 50. penceh, 60. şêst, 70. hefteh, 80. heşteh, 90. nawêt, 100. sad, 200. dused, 1000. hizar*”

Hejmarên rîzîn ji bilî hejmara pêşîn (evil) yên mayî bi alîkarîya /-ê/ yekê pêk tên. Her wekî *duê, sêyê, çahrêû* hwd.” (Rhea, 1869:122).

### 3.1.3.3.7. Baneşan di Xebata Rheayî de

Di vê xebatê de der barê *baneşanê* de tiştêk nehatiye gotin.

### 3.1.3.3.8. Lêker û Kategorîyên Rêzimanî yên Têkildarî Lêkerê

Wekî hemû pirtûkên rêzimanê, di vê xebatê de jî ji lêkeran re cihekî berfireh hatiye veqetandin. Lêker li gorî forma kêşana wan ji hev hatine dabeşkirin, bi nimûneyan li gorî dem û raweyan mînak hatine dayîn.

#### 3.1.3.3.8.1. Kes û Kesandin di Xebata Rheayî de

Rheayî der barê kesandina lêkeran de ev agahî dane: “Di kurdî de qertafên kesandinê ev in: Ji bo yekhejmaran 1. –m, 2. –î, 3. –t; ew ên pirhejmar in, her sê jî /-n/ digirin. (Rhea, 1869:122). Em dikarin wekî mînaka kesandinê pêşî lêkera *standinê* bidin:

yek jimar	pirjimar
ez bistînim	em bistînin

tu bistînî	hûn bistînî <b>in</b>
ew bistînî <b>it</b>	wan bistînî <b>in</b>

(Rhea, 1869:124).

Rheayî di xebata xwe daye zanîn ku lêkera *bûn* bi awayekî din tê kişandin, lê belê wî der barê vê mijarê de tiştek negotiye. Bes di beşa raderê de cînavk li gorî lêkera *bûnê* ya ku ew lêker rewşê nîşan dide bi vî rengî kişandine:

### Erênî

<b>yek jimar</b>	<b>pirjimar</b>
ez <b>im</b>	em <b>in</b>
tu <b>î</b>	hûn <b>in</b>
eve	wan <b>in</b>

### Neyînî

<b>yek jimar</b>	<b>pirjimar</b>
ez nîn <b>im</b>	em nîn <b>in</b>
tu nîn <b>î</b>	hûn nîn <b>in</b>
ev nîn <b>e</b>	wan nîn <b>in</b>

(Rhea, 1869:132)

S. A. Rheayî der barê mêjera bi alîkarîya kêşana lêkerê de tiştek negotiye. Heta kêşana lêkerê jî her tim yekjimar daye. Pîrî caran yekhejmar li şûna pirhejmarîyê tê bikaranîn, her wekî *çend hesp heye*, piştî hejmarekê jî heman tişt dibe, her wekî *bîst mirov*.

### 3.1.3.3.8.2. Ergatîfî di Xebata Rheayî de

Di vê xebatê de der barê ergatîfîyê de tiştek nehatiye gotin, lê belê cuda kêşana hinek lêkeran di demên borî de bala wî kişandiye û di wê mijarê de ev tişt hatine gotin: “Li gel vê, di dema borî ya nediyar û dema borî ya sade de, lêkerên bi kêşana yekem ji bilî lêkera *bûnê*, qertafên kesandinê nagirin, li şûna cînavkên koma

yekem, cînavkên koma duyem (min, te, wî, me, heve, wan) digirin. Di pêkanîna wan de /-n/ya raderê jê tê birin, her wekî *min kir.*” (Rhea, 1869:123).

### 3.1.3.3.8.3. Dem û Rawe di Xebata Rheayî de

Her wekî me li jorê jî da xuyakirin, dem û raweyên bingehîn di vê berhemê de di nav beşa lêkeran de hatine pêşkêşkirin. Di vê berhemê de raweyên pêşkerî û xwestekî ji hev nehatine cudakirin.

#### Dema Niha

Dema niha ya pêşkerî di nav mijara lêkeran de bi navê *dema niha ya domdar* hatiye destnîşankirin. Der barê pêkhatina vê demê de ev tişt hatine gotin: “Pêşgira /ti-/yê dema niha ya domdar pêk tîne. Her wekî *ez tikem.*” (Rhea, 1869:122-123)

Mînakên wê li gorî formên kêşana lêkeran ji hev cuda hatine dayîn. Em ê li vir van mînan hemûyan li pey hev rêz bikin:

<b>yekhejmar</b>	<b>pirhejmar</b>
ez tistînim	em tistînin
ez tikotim	em tikotin
ez tiçemîm	em tiçemîmên
ez tikenim	em tikenim

(Rhea, 1869:124-125-127-128)

#### Dema Bê

Dema bê di vê xebatê de wiha hatiye ravekirin: “Her wekî; *ez bikem*, heke *dê bikeve* navberê, dema bê çêdibe. Her wekî; *ez dê kem*, hin caran /bi-/ jî dê ber lêkerê û dibe *ez dê bikem*” (Rhea, 1869:123).

#### Mînak:

<b>yek hejmar</b>	<b>pirhejmar</b>
ez dê stînim	em dê stînin
ez dê kotim	em dê kotin



ez dê çemîm	em dê çemîm
ez dê kenim	em dê kenin

(Rhea, 1869:124-125-127-128)

### **Dema Boriya Têdeyî (Dema Borîya Sade)**

Di dema borî ya nediyar û dema borî ya sade de, lêkerên bi kêşana yekem ji bilî lêkera *bûnê*, qertafên kesandinê nagirin, li şûna cînavkên koma yekem, cînavkên koma duyem (min, te, wî, me, heve, wan) digirin. Di pêkanîna wan de /-n/ya raderê jê tê birin, her wekî “*min kir*” (Rhea, 1869:123).

#### **Mînak:**

#### **Kêşana yekem:**

Ev kom ji lêkerên ku bi /-andin/ê diqedin pêk tê. (...) Ji bo bidestxistina reha dema borî /-in/ ji dawîya raderê tê avêtin, bi vî awayî *standin* dibe *standan* jî bi gelemperî dibe; *stant*.

<b>yekhejmar</b>	<b>pirhejmar</b>
min stant	me stant
te stant	heve stant
wî stant	wan stant

(Rhea, 1869:123)

#### **Kêşana duyem:**

“Forma raderî ya lêkerên bi vê kêşanê bi /-an/ an /-în/ an jî bi -ûn/ê diqede. Rayeka van lêkeran di dema kêşanê de naguhere, em dişên pêkhatina deman a di van lêkeran de di ser lêkera *kotanê* re nîşan bidin.

<b>yekhejmar</b>	<b>pirhejmar</b>
min kota	me kota

(Rhea, 1869:125)

#### **Kêşana sêyem:**

“Lêkerên vê komê dibin du bir: 1. Lêkerên ku radera wan bi /-ian/ê diqede û lêkerên ku radera wan bi /-în/ê diqede. Taybetîya hevpar a van lêkeran ev e ku di

dema borîya sade, dema borîya dûdar, dema borîya berdest û çîrokîya dema borîya têdeyî û raweya mercî de, her wekî dema niha lêker di dema kêşanê de qertafên kesandinê digire. Her wiha di hemû deman de cînavkên koma yekem tê bikaranîn.

<b>yek hejmar</b>	<b>pirhejmar</b>
ez çemîam	em çemîan
tu çemîaî	hûn çemîan
ew çemîa	wan çemîan

(Rhea, 1869:127)

<b>yek hejmar</b>	<b>pirhejmar</b>
ez kenîm	em kenîn
tu kenê	hûn kenîn
ew kenî	wan kenîn

(Rhea, 1869:128)

### **Dema Boriya Dûdar**

Li ser vê demê di pirtûkê de ravekirineke berfireh nîn e, ev dem jî di nav beşa lêkeran de hatiye ravekirin. “Ji bo pêkanîna dema borîya dûdar, ji bilî lêkerên bi kêşana sêyem, paşgirên /-e/ yan jî /-ye/ tê dawîya lêkerê, ew jî cînavkên koma duyem digirin, her wekî; *min kirîe*” (Rhea, 1869:123). Mînakên vê demê jî dîsa li gorî kêşana lêkeran hatine pêşkêşkirin:

#### **Kêşana yekem:**

Ji vê rayekê bi pêvekirina /-iye/ dema borîya dûdar bi dest dikeve.

min standiye	me standiye
--------------	-------------

(Rhea, 1869:124)

#### **Kêşana duyem:**

Forma raderî ya lêkerên bi vê kêşanê bi /-an/ an /-în/ an jî bi /-ûn/ê diqede.

min kotaye	me kotaye
------------	-----------

(Rhea, 1869:126)

**Kêşana sêyem:**

“Lêkerên vê komê dibin du bir: 1. Lêkerên ku radera wan bi /-fan/ê diqede û lêkerên ku radera wan bi /-fn/ê diqede.

ez çemîame	em çemîane
tu çemîaî	hûn çemîane
ew çemîaye	wan çemîane

(Rhea, 1869:127).

ez kenîme	em kenîne
tu kenîf	hûn kenîne
ew kenîye	wan kenîne

(Rhea, 1869:128).

**Dema Boriya Berdest**

Di vê xebatê de dema borîya berdest wiha hatiye ravekirin: “Dema ku em pêşgira /ti-/yê bînin ber vê forma lêkerê dema borîya berdest anku çîrokîya dema niha bi dest dikeve. Her wekî “*min tikir.*” (Rhea, 1869:123). Mînakên vê demê jî her wekî demên din di nav cureyên kêşana lêkeran de hatine pêşkêşkirin.

**Kêşana yekem:**

Ev kom ji lêkerên ku bi /-andin/ê diqedin pêk tê.

<b>yekhejmar</b>	<b>pirhejmar</b>
min tistant	me tistant

(Rhea, 1869:124).

**Kêşana duyem:**

Forma raderî ya lêkerên bi vê kêşanê bi /-an/ an /-fn/ an jî bi /-fn/ê diqede.

<b>yekhejmar</b>	<b>pirhejmar</b>
------------------	------------------

min tikota	me tikota
------------	-----------

(Rhea, 1869:125).

**Kêşana sêyem:**

Lêkerên vê komê dibin du bir: Lêkerên ku radera wan bi /-îan/ê diqede û lêkerên ku radera wan bi /-în/ê diqede.

<b>yekhejmar</b>	<b>pirhejmar</b>
ez tiçemîam	em tiçemîan
ez tikenîm	em tikenîn

(Rhea, 1869:127-128).

**Çîrokîya Dema Borîya Têdeyî**

Rheyî ev dema wiha rave kiriye: “Ji bo bidestxistina çîrokîya dema borîya têdeyî , /-bû/ tê ber lêkerê, her wekî; *min kirîbû*” (Rhea, 1869:123). Mînakênvê demê jî di nav cureyên kêşana lêkeran de hatine dayîn.

**Kêşana yekem:**

Ev kom ji lêkerên ku bi /-andin/ê diqedin pêk tê.

<b>yekhejmar</b>	<b>pirhejmar</b>
min standibû	me standibû

(Rhea, 1869:124).

**Kêşana duyem:**

Forma raderî ya lêkerên bi vê kêşanê bi /-an/ an /-în/ an jî bi /-ûn/ê diqede.

<b>yekhejmar</b>	<b>pirhejmar</b>
min kotabû	me kotabû

(Rhea, 1869:126).

**Kêşana sêyem:**

Lêkerên vê komê dibin du bir: 1. Lêkerên ku radera wan bi /-îan/ê diqede û lêkerên ku radera wan bi /-în/ê diqede.

<b>yekhejmar</b>	<b>pirhejmar</b>
------------------	------------------

Oez çemîabûm	em çemîabûn
tu çemîabûî	hûn çemîabûn
ew çemîabû	wan çemîabûn

(Rhea, 1869:127)

<b>yekhejmar</b>	<b>pirhejmar</b>
ez kenîbûm	em kenîbûn
tu kenîbûî	hûn kenîbûn
ew kenîbû	wan kenîbûn

(Rhea, 1869:129)

### **Raweya Fermanî**

Di vê xebatê de der barê raweya fermanî de agahî nehatine dayîn, bes di nav beşa lêkerê de mînak ji wê jî hatine pêşkêşkirin.

<b>yekhejmar</b>	<b>pirhejmar</b>
bistîne	bistînin

(Rhea, 1869:123).

<b>yekhejmar</b>	<b>pirhejmar</b>
bikote	bikotin

(Rhea, 1869:125).

<b>yekhejmar</b>	<b>pirhejmar</b>
biçemîê	biçemîên

(Rhea, 1869:127).

<b>yek hejmar</b>	<b>pirhejmar</b>
bikene	bikenin

(Rhea, 1869:128).

### Dema Niha ya Xwestekî

Dema niha ya xwestekî di berhemê de wekî *dema niha ya nediyar* hatiye binavkirin û bi vî rengî hatiye ravekirin: “Li aliyê din /bi-/ dema niha ya nediyar an jî giştî pêk tîne, hin caran jî xwestekîyê pêk tîne. Her wekî; *ez bikem*” (Rhea, 1869:123). Mînakên wê demê jî wekî demên din di nav cureyên lêkeran de hatine pêşkêşkirin:

<b>yek hejmar</b>	<b>pirhejmar</b>
ez bistînim	em bistînin
tu bistînî	hûn bistînin
ew bistînit	wan bistînin

(Rhea, 1869:124).

<b>yek hejmar</b>	<b>pirhejmar</b>
ez bikotim	em bikotin
tu bikotî	hûn bikotin
ew bikotit	wan bikotin

(Rhea, 1869:125).

<b>yek hejmar</b>	<b>pirhejmar</b>
ez biçemîm	em çemîm
tu biçemî	hûn çemîm
ew çemît	wan biçemîm

(Rhea, 1869:127).

<b>yek hejmar</b>	<b>pirhejmar</b>
ez bikenim	em kenin
tu bikenî	hûn bikenin
ew bikenit	wan bikenin

(Rhea, 1869:128).

### Dema Borî ya Xwestekî û Dema Bê ya Pêknehatî

Rheayî di berhema xwe ev dem wekî *dema mercî* bi nav kiriye û wiha rave kiriye: “Paşgira /be-/ bi heman awayî dema mercî pêk tîne, di vê demê de bêjeya erkî (particle) /dê/ berî cînavkê tê, her wekî; *dê min kirêbe*”. (Rhea, 1869:123). Mînakên vê demê di nav minakên kêşana lêkeran de hatine pêşkêşkirin:

yek hejmar	pirhejmar
dê min standibe	dê me standibe

(Rhea, 1869:124).

yek hejmar	pirhejmar
dê min kotabe	dê me kotabe

(Rhea, 1869:126)

Di mînakên de dema borî ya xwestekî û dema bê ya pêknehatî li gel hev hatine pêşkêşkirin, her wekî;

yek hejmar	pirhejmar
ez dê çemîabam	em dê çemîaban
tu dê çemîabaî	hûn dê çemîaban
ew dê çemîaba	wan dê çemîaban

(Rhea, 1869:128).

yek hejmar	pirhejmar
ez dê kenîbam	em dê kenîban
tu dê kenîbaî	hûn dê kenîban
ew dê kenîba	wan dê kenîban

(Rhea, 1869:129).

### Çend lêkerên Nerêzikî

Ji bilî van çend heb lêkerên din hene ku forma fermanî û dema niha ya van lêkeran bi temamî ji forma raderî û demên din cuda ye. Ev lêker jî ev in:

<b>Dîtin</b>	
<b>Dem û rawe</b>	<b>Mînak</b>
Raweya fermanî	bînî, bînîn
Dema niha	bînim
Dema borîya têdeyî	dît
Dema borîya dûdar	dîtîye
Çîrokîya dema borîya têdeyî	dîtibû
Mercî	dîtibe

<b>Gotin</b>	
<b>Dem û rawe</b>	<b>Mînak</b>
Raweya fermanî	bêje, bêjin
Dema niha	bêjim
Dema borîya têdeyî	got
Dema borîya dûdar	gotîye
Çîrokîya dema borîya têdeyî	gotibû
Mercî	gotibe

Lêkereke din jî heye ku di dema niha û raweya fermanî de du formên wê hene:

<b>Hatin</b>	
<b>Dem û rawe</b>	<b>Mînak</b>
Raweya fermanî	werin, werin
Dema niha	êm, êî, êt, ên
Dema borîya têdeyî	hat
Dema borîya dûdar	hatîye
Çîrokîya dema borîya têdeyî	hatibû
Mercî	hatibe

Lêkera *bûn* ew qas nerêzikî û awarte ye ku divê temamî were dayîn:

<b>Bûn</b>
------------



<b>yekhejmar</b>	<b>pirhejmar</b>
be	bin

### **Dema Niha**

<b>yekhejmar</b>	<b>pirhejmar</b>
ez im	em in
tu î	hûn in
ew e	wan in

### **Dema Bê**

<b>yekhejmar</b>	<b>pirhejmar</b>
ez dê bim	em dê bin
tu dê bî	hûn dê bin
ew dê bît	wan dê bin

### **Dema Borîya Têdeyî**

<b>yekhejmar</b>	<b>pirhejmar</b>
ez bûm	em bûn
tu bûî	hûn bûn
ew bû	wan bûn

### **Dema Borîya Dûdar**

<b>yek hejmar</b>	<b>pirhejmar</b>
ez bûme	em bûne
tu bûî	hûn bûne
ew bûye	wan bûne

### **Çîrokîya Dema Borîya Têdeyî**

<b>yek hejmar</b>	<b>pirhejmar</b>
ez bûbûm	em bûbûn
tu bûbûî	hûn bûbûn

ew bûbû	wan bûbûn
---------	-----------

### Mercî

yek hejmar	pirhejmar
ez dê bame	em bain
tu dê baî	hûn bain
ew dê ba	wan bain

Forma neyînî ya vê lêkerê di dema niha de bi awayekî nerêzikî pêk tê û bi vî rengî ye:

yek hejmar	pirhejmar
ez nîn im	em nîn in
tu nîn î	hûn nîn in
ew nîn e	wan nîn in

Di demên din de “ne” berî forma lêkerî tê, her wekî “ez dê nebim”, “ez nebûbûm”, “nebe”, hemû lêkerên mayî jî bi heman awayî dibe neyînî” (Rhea, 1869:129-132).

Di vê xebatê de di warê dem û raweyan de zêde kêmasî nîn e. Dem û raweyên ku di kurmanciyê de karîger hatine pêşkêşkirin.

### 3.1.3.3.8.4. Avanî di Xebata Rheayî de

Di vê berhemê de der barê avanîyan de zêde tiştek nehatiye gotin, bi tenê *avanîya tebatî* (passive voice) hatiye pênasekirin û di cihekî de jî qala *avanîya hokarî* (causative) hatiye kirin.

#### 3.1.3.3.8.4.1. Avanîya Tebatî

Rheayî di berhema xwe de bi vî rengî qala avanîya tebatî kiriye: “Pêkanîna avanîya tebatî di kurdî de bi vî awayî pêk tê; berî forma raderî ya lêkerê, demên lêkera *hatinê* tîn danîn û li ber wê jî daçeka /li/ tê bicihkirin. Her wekî; *hatin li kuştin*. Pîrî caran li forma raderî /-î/ya navdêrên razber tê zêdekirin, her wekî; *hatin li kuştinî*.”

### Mînak:

Dema niha	ez tēm li kuştin
Dema borîya têdeyî	min hat li kuştin <sup>5</sup>
Dema borîya dûdar	min hatiye li kuştin
Çîrokîya dema borîya têdeyî	min hatibû li kuştin
Mercî	dê min hatibe li kuştin

Lê belê avanîya lebatî ya kesê yekem ê yekhejmar di dema borîya dûdar û çîrokîya dema borîya têdeyî de wateya tebatî dide. Her wekî “wî kuştîye (ew hatiye kuştin)”, “wî kuştibû (ew hatibû kuştin)” (Rhea, 1869:133).

Di vê mijarê de alîyê balkêş di avanîya tebatî de bikaranîna daçeka /li/ ye, îro ev daçek di devokan de jî bi ber çavan nakeve. Mirov nizane ka bi rastî jî ew daçek di devoka wê herêmê de hebû, bi demê re ji holê rabû yan jî Rheayî bi şaşî ew form li devoka herêmê zêde kiriye?

Rheayî diyar kiriye ku “avanîya lebatî ya kesê yekem ê yekhejmar di dema borîya dûdar û çîrokîya dema borîya têdeyî de wateya tebatî dide” û der barê mijarê de jî ev mînak dane “*wî kuştîye (ew hatiye kuştin), wî kuştibû (ew hatibû kuştin)*”. Tiştê ku li vir xuya dike, Rheayî raweya çêbiwar wekî avanîya tebatî pejirandiye. Mînakên ku wî dane jî di rastîya xwe de divê wiha bin: *ew kuştî ye, ew kuştî bû*.

### 3.1.3.3.8.4.2. Avanîya Hokarî

Rheayî di berhema xwe de bi tenê di mijara lêkerên ku bi /-andin/ê diqedin de qala avanîya hokarî kiriye û wiha gotiye: “Lêkerên ji vê komê bi piranî sedemkar (causative) in, hempayên wan ên negerguhêz jî hene, ev ji wan hatine bidestxistin. Lêkerên bi vê kêşanê ev in: *afîrandin, elimandin, berandin (birîan), bizdandin (bizdîan), çandin, çemandin (çemîan), dirandin (dirîan), êşandin (êşan), gehandin (gihaştin), gerandin (gerîan), hekindin, helandin, helinandin (helatin), helînandin (helîan), hijandin (hijîan), ceribandin, kemilandin, kesandin an jî xesandin, qetandin,*

<sup>5</sup> Her ji van mînak diyar e, Rheayî mijara ergatîfîyê zêde fehm kiriye, lewma jî mînaka xwe li gorî zimanê xwe ava kiriye. Ev mînak li gorî rêzika ergatîfîyê çewt in. Li şûna wan pêwîst e; *ez hatim kuştin, ez hatime kuştin, ez hatibûm kuştin, ez dê hatibûma kuştin, ez dê hatibim kuştin* bihata nivîsandin.

*kêşandin, xeniqandin (xûndiqîn), xorandin (xorîan), xwandin an jî xondin, kosandin, mirandin (mirin), niwandin (niwistin), perxandin, raçandin, reşandin (reşîan), sekinandin (sekinîn), şiandin, şelandin, şemirandin, şibandin (şibîan), şidandin (şidîan), şikandin (şikestin), standin, tirsandin (tirsîn), westandin (wastin), zringandin” (Rhea, 1869:124-125).*

Ev lêkerên ku wekî forma hokarî hatine pêşkêşkirin, hemû jî lêkerên têper in, avanîya hokarî di kurmancî de bi alîkarîya lêkera /dan/ pêk tê. Lê belê Rheayî di berhema xwe de qala vê mijarê nekiriye.

### **3.1.4. Li gorî Xebata Rheayî Sentaksa Kurmancîyê**

Di berhema Rheayî de der barê sentaksê de tiştek nîn e. Rheayî qet qala hevokên kurmancîyê nekiriye. Lê belê di dawîya berhemê de du deqên kurt cih girtine, ji bo der barê devoka herêmê de agahîyê bide em vê deqê li xwarê pêşkêş dikin.

#### **“Diaya bo Xwedê**

*Babê me ye b’esmanê, nawê te mokedas bît; padîşahîyê te b’êt; rizayê te bît, wekû l’esmanê ye, weto l’erdê jî; bide me evro nanê rûjê; j’ karêt me, b’bore, kureng em jî borîn kerdarêt me; û me ne be l’ticerib, belî me xulas b’ke j’ şerê; sebeb yê te ye padîşahîî û kudset û celal, ebed il ebed: amîn.*

#### **Meteloka Kurê Destbelav**

*Û dîsan Îsa gote wan: mirovêk hebûn du kur; û gote kurê kiçke: babo bide min par d’gahête min j’ malê te; û malê xo l’wan lêk weh kir. Û paş kindek roşan ew kurê kiçke Cuma kir hemû tişt ku g’heştê û çu memleketê dîr û wê derî malê xo belav kirneh ku t’geriya b’pîsîê. Wekî xerc kir her tiştê xo (ewe) hebû granî êk mezin kewimî l’wê memleket, û ma ûlac; û çu tûbe l’merov êk j’ şarê wê memleket, û ew rê kir deştê l’çerandinî berazan; û gelek t’wîya l’tejî kirin zikê xo j’ wan heroban ya t’berazan t’xwarin; û çu merov nedayê. Weku hat lalê xo, goft: çend xolam d’malê babim, nan l’wan zêde ye; û ez l’hêre j’ bîrsîan berze t’bim. Dê rabim, çûna nik bab im, dê bêjimê: babo, min gunha kiriye” (Rhea, 1869: 155).*

Der barê wate û watenasîyê de jî di vê berhemê de tu agahî nehatine dayîn.

### **3.1.5. Nirxandina Giştî ya Berhema Rheayî**

Bi awayekî gelemperî, her wekî ji navê berhemê jî diyar e, Rheayî di berhema xwe de der barê danganî, morfolojîya kurmançîya herêmê kurte-agahî pêşkêş kirine. Armanca wî ew e ku kurmançîya herêmê fêrî mîsyonerên piştî xwe bike, bi vê yekê jî karê wan hêsantir bike. Di dawîya berhemê de jî ferhengokek danîye.

Di vê berhemê de dengên kurdî li gorî dengên îngilîzî bi awayekî berawirdî hatine dayîn, mînakên wê ji zimanê îngilîzî hatine pêşkêşkirin. Li gorî Rheayî di kurmançîya Hekarîyê de deh dengdêr û sê pevdeng hene. Her wiha ji bo nedengdêran jî heman rêbaz bi kar anîye û ji bo wan jî mînakên xwe ji îngilîzî dane. Rheayî mînakên xwe ji kurmançîyê nedane, lewre jî xebat derfetên taqîkirina dangan nade mirov.

Di warê morfolojîyê de Rheayî bi tenê cureyên peyvan pêşkêş kirine, qertafên kêşanê yên têkildarî navdêrê di mijara navdêrê de, yên têkildarî rengdêran di nav rengdêran de û dem û rawe jî di nava lêkeran de destnîşan kirine. Mijara peyvsazîyê ji bilî lêkeran di nav berhemê de qet cih negirtiye. Lêker wekî rêzîkî-nerêzîkî, hevedudanî ji hev cuda kirine. Der barê hevoksazî û watenasîya kurmançîya herêmê de tu agahî nîn in.

### **3.2. XEBATA SERPEL R. F. JARDINE**

Xebata duyemîn a ku em ê li ser rawestîna, ji hêla serpelê îngilîz R. F. Jardine ve di sala 1922yan li Bexdayê hatiye çapkirin. Ew xebata bi navê *Bahdînan Kurmanjî a Grammar of The Kurmanjî of The Kurds of Mosul Division and Surrounding Districts of Kurdistan* (Rêzimana Kurmançîya Kurdên Parêzgeha Musil û Herêmên li Derdora Wê yên Kurdistanê) ji 114 rûpelan pêk tê û qala rêzimana devoka Behdînan dike.

Armanca vê berhemê jî ew e ku kurmançîya deverê hînî peywirdarên mandatîya îngilîz ên li Iraqê bike. Ev xebat bi qeware û naveroka xwe ji xebata Rheayî berfirehtir û têkûztir xuya dike. Her wekî ji navê pirtûkê jî diyar e, ev pirtûk

kurmancîya parêzgeha Musilê û herêmên derdora wê bi taybetî devoka Behdînan rave dike.

### **3.2.1. Jiyana R. F. Jardine**

Di pirtûkê de der barê jînenîgarîya Jardine de tiştek nehatiye gotin. Li gorî agahîyên di pirtûkê de serpel Jardine di mandatîya îngilîz a Iraqê de cîgirê nivîsgeha sîyasî ya Duhokê ye. Li gorî agahîyên di pirtûka bi navê *The Survey of Palestine Under British Mandate* (1920-1948) nivîskarê vê xebata ku bûye mijara lêkolîna teza me Robert Frier Jardine di sala 1894an de ji dayik bûye û di sala 1982yan de koça dawîn kiriye. Jardine di 1917an de wekî peywirdar hatiye başûrê Kurdistanê 5 salan bi mijara kurd û suryanîyan re eleqedar bûye.

Di sala 1924an de wekî endamekî delegasyona îngilîz a Civata Neteweyan ji bo kêşeya sînoran çûye Stenbolê. Di sala 1925an de wekî peywirdarê teheqûqê Komîsyona Sînoran a Tirkiye û Iraqê kar kiriye. Di sala 1926an de ji bo nîqaşên Komîsyona Peymana Sêlayanî wekî şêwirmendê Balyozê Îngilîzan çûye Enqereyê. Di sala 1925an de bûye Mufetîşê Rêveberîyê yê Musilê. Di sala 1936an Li Filistînê bûye Serperiştê Mufetîşan. Piştî wê, di şerê Duyem ê Cîhanê de li Qudsê şêwirmendîya fermanîyê giştî kiriye. Paşê heta 1948 li wir gelek peywir wergirtine û di wê salê de malnişîn bûye. Jardine bi kurdî û erebî zanî bûye” (Gavish, 2005: 250).

### **3.2.2. Li gorî R. F. Jardine Deganîya Kurmancîyê**

Jardine dengên kurmancîyê li gorî peyvên îngilîzî rave û şîrove kirine. Li pey agahîyên ku wî dane; di kurmancîya wê deverê de 9 dengdêr û 3 pevdeng hene. Herçî dengên nedengdêr in, ew jî 28 heb in. Jardine jî her wekî Rheayî pergala deganî ya kurdî, li gorî zimanên din pêşkêş kirine.

Di vê xebatê hemû dengên bingehîn ên kurdî hatine destnîşan kirin. Lê belê, ew pevdengên ku hatine diyarkirin, der barê wan tu mînak nehatine dayîn, lewre jî taqîkirina wan ne pêkan e. Di berhemê de cudatîya dengên bingehîn (fonem) û

rengedengan nehatiye kirin. Bo nimûne dengên mîna; /û/, / h/, / t/, /z/ û hwd. ne fonem in.

### 3.2.2.1. Dengsazî

Jardine der barê taybetî û jêderka dengên kurmancîyê de tu agahîyên zimanzanî nedane, dengên kurmancîyê bi alîkarîya hinek dengên ji zimanên din rave û şîrove kirine.

	Deng	Peyvên mînak
Dengdêr <sup>6</sup>	ā	wekî /a/ya di peyva <i>fatherdetê</i> bilêvkin, li Amedîyê wekî /a/ya di peyva <i>ball</i> de.
	a	dişibe dengêkî di navbera /a/ya peyva <i>flat</i> û /u/ya di peyva <i>rush</i> de.
	ē	dengêkî mîna /a/ya peyvagatê an jî /e/ya peyva frensî <i>bête</i>
	e	her wekî dengê /e/ya di peyva <i>pet</i> de tê bilêvkin.
	ī	mîna /ee/ya di peyva <i>meetde</i> , tê bilêvkin.
	i	mîna /i/ya di peyva <i>sit</i> de ye
	ō	Her wekî bilêvkirina mirovên skoçî ya /o/ya peyva <i>boat</i> tê bilêvkin, lê hin caran jî mîna /o/ya di peyva <i>broadde</i> ye.
	ū	Mîna /oo/ya di peyva <i>boot</i> de ye.
	u	mîna /u/ya di peyva <i>put</i> de
	ü	mîna dengê /u/ya di peyva frensî <i>rendude</i>
	ai	dengêkî di navbera /i/ya peyva <i>bite</i> û /oy/ a di peyva <i>boy</i> de ye.
	aw	bi lêvkirina wê wekî dengê /u/ ye ku piştî wî /a/yeke dirêj tê.
	ew	wekî dengê /ou/ya di peyvên <i>mounth</i> û <i>small</i> de.

Dengên li xwarê her wekî heman dengên îngilîzî tînen bilêvkin: b, p, t, d, j, ch, r, s, sh, f, g (hişk e), h, l, m, n, v, w. Ev herfên li xwarê jî di vê pirtûkê de ji bo nedengdêran hatine bikaranîn:

	deng/ tîp	Bilêvkin û peyvên mînak	Bi tîpên kurdî
--	-----------	-------------------------	----------------

<sup>6</sup> Tablo ji hêla me ve hatine çêkirin.

<b>nedengdêr</b>	zh	mîna /j/ya frensî ya di peyva <i>jour</i> de	j
	rr	/r/ya lertzok	ɾ
	kh	mîna dengê “ch” ya di peyva <i>loch</i> de	x
	gh	dişibe xeyna erebî, lê bi qasî wê ne ji qirikê ye.	-
	q	/k/ya ji qirikê	q
	h	dişibe /h/ya erebî ya ji qirikê, lê bi qasî wê hişk nayê bilêvkin	-
	ţ	mîna /t/ya zimanê îtalî ji serê zimên û ji nav diranan derdikeve.	-
	z	ji heman dengê îngilîzî zêdetir bi fîzekî derdikeve	z

(Jardine, 1922: VI)

Li gorî berhemê di kurmancîya vê herêmê de ji bilî van nedengdêrên; *b, c, ç, d, f, g, h, j, k, l, m, n, p, q, r, s, ş, t, v, w, x, y, z* ku di kurmancîya nivîskî de hene, dengên /r/ya lertzok, (ح) /h/ û “ġ” xeyna erebî, /t/ya nehilmî û /z/ya pir fîzekî jî di devoka vê herêmê de hene.

Her wekî ji navê xebatê jî diyar e, ev xebat devoka Behdînan bingeh digire. Ji ber ku der barê vê xebatê de berhemên qadê zêdetir in, mirov dikare vê xebatê û wan xebatan berawird bike. Di vî warî de xebata herî tekûz a MacKenzie ya bi navê *Kurdish Dialects Studies* e. Em ê jî di hin waran de pirtûka MacKenzie wekî referans nîşan bidin.

Ji bo berawirdkirinê em dişên li vir tabloya dengên wê herêmê ji pirtûka MacKenzie pêşkêş bikin. Lê belê divê em diyar bikin ku MacKenzie jî cudatîyek nexistiye navbera dengên bingehîn û rengedengan, wî hewl daye ku hemû dengên di devokên herêmê de destnîşan bike.

### Tabloya denganiya kurmancîyê -I

Nedengdêr							
	Lêvî	diranî, pidûyî	pêşezmandevî- pidûyî	ezmandevî	paşezmandevî	qirîkî	pûkî



<b>Girtî-peqokî</b>	þ p b	t, t̃ d	ç <sup>7</sup> j <sup>8</sup>	k̃ k g	q		
<b>Fîzekî</b>	f, v	s, s̃ z, z̃	ş <sup>9</sup> ž <sup>10</sup>	x γ <sup>11</sup>		h̃ <sup>12</sup> ç	h (ç) <sup>13</sup>
<b>Difnî</b>	m	n					
<b>Rexkî</b>		l					
<b>Lerzokî</b>		r r̃					
<b>Nîvdengdêr</b>	w						

### Tabloya denganiya kurmancîye - II

Dengdêr			
	pêş	nav	paş
girtî	î û		ô
vekirî		i ê	u
nîvgirtî		a <sup>14</sup> ā	

(MacKenzie, 1961:39)

Li gorî MacKenzie (1961) cudatîya di navbera devoka Duhok û Amedîyê de hebûna cudatîya /p/, /t/ û /k/yên hilmî û nehilmî ye. Lê belê Jardine, qala vê cudatîyê nekiriye, bi tenê daye zanîn ku dengên /p/, /t/ û /k/ wekî heman dengên îngilîzî ne.

#### 3.2.2.2. Dengzanî (Fonolojî)

Amadekarê vê berhemê der barêguherîna dengên bêjen (voiced) bi yên bijen (voiceless) di dema kêşana lêkeran de ku di kurmancîyê de guherîneke rêzikî ye, ev agahî dane:

<sup>7</sup> Ev tîp beramberî /ç/ kurmancî tê.

<sup>8</sup> Ev tîp beramberî /c/ya kurmancî ye.

<sup>9</sup> Ev beramberî dengê /ş/ ya alfabeya kurmancî ye.

<sup>10</sup> Ev tîp beramberî /j/ya kurmancî tê.

<sup>11</sup> Ev tîp beramberî ( ğ ) erebî tê.

<sup>12</sup> Ev beramberî (ح)ya erebî tê.

<sup>13</sup> Ev nîşane beramberî (ع)ya erebî tê.

<sup>14</sup> Ev deng beramberî /e/ alfabeya kurmancî tê.

“Hin caran /s/ û /ş/ya ku berî dawîkera raderê tê, di dema niha de dibin /z/ û /j/, her wekî;

Rader	Reha dema borî	Reha dema niha
xwastin	xwast	xwaz
kuştin	kuştin	kuj

Dengê /f/ yê ku berî dawîkera /-tin/ tê di reha dema niha de dibe /v/, her wekî,

Rader	Reha dema borî	Reha dema niha
axeftin	axeft	axe $\nu$
vangaftin	vangaft	vangav

Kîteya /-ar/ ya ku berî dawîkera /-tin/ tê, dibe /-êr/, her wekî;

Rader	Reha dema borî	Reha dema niha
henartin	henart	henêr
hijmartin	hijmart	hijmêr
veşartin	veşart	veşêr

Heke berî dawîker /-tin/ dengdêreke dirêj were anku gava reh bi dengdêreke dirêj biqede, di pêkanîna reha dema niha de dengê /ş/ an jî /j/ li rehê tê zêdekirin.

#### Mînak:

Rader	Reha dema borî	Reha dema niha
avêtin	avêt	avêj
fîrotin	fîrot	fîroş
sotin	sot	soj

(Jardine, 1922:23-24).

### 3.2.3. Morfolojîya Kurmancîyê di Pirtûka Jardine de

Di vê berhemê de ji mijarên morfolojîyê re cihekî berfireh hatiye veqetandin. Di beşa yekemîn (Part I) a pirtûkê de mijarên têkildarî morfolojîyê yên mîna beşên axaftinê û taybetiyên wan, peyvsazîya navdêr, rengdêr û lêkeran û dem û rawe hatine pêşkêşkirin. Di xebata Jardine de cihekî diyar ji peyvsazîya kurmancîyê re hatiye

terxankirin. Hem der barê peyvazîya navdêr û rengdêrê de hem jî der barê peyvsazîya lêkeran de agahî dane. Di vê berhemê de agahîyên der barê peyvsazîya navdêr û rengdêran de di bin sernavê *Pêkanîna navdêran di kurmancîyê de* hatine pêşkêş kirin. Agahîyên ku wî der barê mijarê de dane bi rengî ne:

“**Navdêrên dariştî:** Paşgirên ku bi formên sade ve dibin û navdêrên dariştî pêk tînin, hema bêje hemû mîna yên farisî ne.

**/-van/**[(farisî /-ban/) wateya payîn û parastinê dide]: *rizvan, aşvan, şivan, gavan...*

**/-kar/**[(farisî /-kar/) wateya biker û pêkhêner dide]: *gunehkar, nîvkar, minnikar...*

**/-ger/**[(farisî /-ger/) wateya pîşekaran dide]: *asinger, zêrgir, bargir...*

**/-dar/**[(farisî /-dar/) wateya xwedîtîyê dide]: *nobedar, domdar, dendar, qerdar...*

**/-stan/** [(farisî /-stan/) wateya cih û war dide]: *qevristan, felastan..*

**/-yar/**(wateya nûnertîyê dide): *cutyar...*

Pêkanîna navdêrên razber ji rengdêran bi van paşgiran pêk tê:

/-î/	germî, çakî
/-anî/	mirovanî
/-etî/	biçûketî
/-ahî/	tezahî
/-hatî/	spîhatî
/atî/	kûratî
/-ma/	sarma

#### **Navdêrên hevedudanî**

(du navdêr): *segav, kurraxal...*

(rengdêr û navdêrek): *reşmal...*

(navdêr û forma lêkerî): *nanxwar...*

(forma lêkerî û navdêr): *bîjin...*

(daçek û navdêr): *bêjin...*

**Du navdêrên têkildar li pey hev:**

*hatin û çûn (traffic)*

*kirîn û firotin (trade)*

**Qafiyekirina beşa duyem a navdêrekê:**

*kul û mul (baggage)*

*dar û ber (wood)*

*tişt û mişt (food etc.)*

**Heman peyv tê dubarekirin:**

*kirçkirç (crackling)*

*teqibteqib (continual pursuit)*

**Rengdêrên Hevedudanî**

**Navdêr û rengdêr tèn ber hev.**

*dilreş, dudil, serxoş...*

**Daçek û û navdêr:**

*bêmarîfet, bêfehîm...*” (Jardine, 1922: 45-46).

Her wekî me li jorê jî diyar kir, Jardine ji peyvsazîya lêkeran re cihekî taybet veqetandiye, lê belê wî pêşgirên lêkersaz wekî bêjeyên serbixwe destnîşan kirine û lêkerên ku bi van pêşgiran hatine dariştin jî wekî lêkerên hevedudanî bi nav kirine. Jardine ji bo van lêkeran bêjeya *compound* bi kar anîye ku ew jî tê wateya hevedudanî, lê belê dema ku mirov bala xwe nirxandina wî ya mijarê, mirov dibîne ku wî lêkerên hevedudanî û dariştî ji hev cuda hildane dest.

Nirxandina Jardine ya li ser peyvsazîya lêkerên kurmançî bi vî rengî ye: “Tu xebata li ser cureyên lêkeran di kurmançîyê de bêyî qalkirina lêkerên hevedudanî dê ne tekûz û tamam be. Ji ber ku bi alîkarîya wan di kurmançîyê de gelek qadên wateyê tê dagirtin. Lêkerên hevedudanî yên asayî bi alîkarîya lêkereke alîkar û navdêr, rengdêr û parengên kurdî, erebî û tirkî pêk tèn.

Ji bilî van, hinek lêkerên hevedudanî yên cuda hene ku ji hin lêkerên alîkar û qertafan pêk tèn -ku beşek ji wan hê jî wekî hoker û daçek tèn bikaranîn, lê piranîya

wan esl û feshlê wan hatiye jibîrkin. Ewa li xwarê lîsteya van qertafan û wateya wan a zelal an jî texmînî ye:

<b>Tabloya pêşgirên lêkersaz<sup>15</sup></b>		
<b>Qertaf</b>	<b>Wate bi îngilîzî</b>	<b>Wate bi kurdî</b>
da	down, back, enclosed	ber bi jêr, ber bi paş, dorgirtî
hel <sup>16</sup>	up, loose, in pieces	ber bi jor, sist, parçe parçe
der	out, finally	derve, dawîya dawîn
ber, ver <sup>17</sup>	up, upon, in hand	jor, li ser, di des de
rû	low, down	nizim, xwar
ve <sup>18</sup>	down, back, enclosed	xwar, ber bi paş, dorgirtî
ra	up, away	ber bi jor, dûr
lê	at, to, against	li, ber bi, dij
tê	inside, fully, together	tê de, bi tevahî, tev

Lîsteyeke van lêkeran di pêvekan de hatiye dayîn, em li xwarê çend mînakên berbelav didin: *ra kirin*, *ve xwarin*, *tê gihêştin*, *rû niştin*, *ver girtin*, *da nian*, *der ketin*, *hel ênan*, *ber dan*, *lê ve bûn*, *lê bûneve*.

Mîrov dikare dema û cihê bikaranîn û bikarneanîna van pêşgiran bi tenê di pratîkê hîn bibe. Ev rêzikên li xwarê pirî car bi kêr tên, lê ne her tim.

<b>Tabloya Lêkerên Hevedudanî</b>	
ber avêtin	throw away, slip (a foal)
ber dan	let go, abandon
ber êxistin	to cover
da bûn	be relaxed, subsided
da çandin	to plant
da êxistin	to close
da kirin	to enclose

<sup>15</sup> Ev tablo ji hêla me ve hatiye çêkirin.

<sup>16</sup> Her çiqas wekî “mel” hatibe nivîsandin jî ji mînakana diyar dibe ku “hel” e.

<sup>17</sup> Jardine pêşgira lêkersaz /wer-/ , tevî pêşgira /ber-/ bi rengê /ver/ nîşan daye û di mînakana de jî bi vî rengî bi kar aniye.

<sup>18</sup> similiar meaning hatiye nivîsandin, lewma jî me bêjeyên li ber “da” li ber wê jî nivîsandin.

da ketin	fall down
da nîan	place, put down
da kêşan	destroy, pull down
da niştin	sit down
da hatin	subside, be reduced
da hatin	return
da enan	fall, bring down
da hêlan	lower, allow to descend
der dan	emit
der ênan	put off
der êxistin	turn out, discharge
der kirin	put out, take out
der ketin	go out, ascend
der kêşan	pull out
hel çûn	disappear
hel çinîn	pluck, gather
hel brizkîn	to sparkle
hel bûn	to melt
hel bûn bi ser	to meet
hel girtin	raise, take up
hel hatin	come up, effervesce
hel ênan	raise, bring up, harvest
hel kêşan	pull up
hel birin	carry off
hel kirin	kindle, light
hel ênan	put up, accommodate
hel avistin	hang up
hel kendin	churn up
lê bvardin / bihurîn	pass over
lê çûn	leak, go for
lê dan	hit

lê êxistin	hit
lê gerîan	seek
lê kirin	break
lê keftin	quarrel
lê kêşan	draw out
lê vebûn eve	go back on one's word
ra bûn	rise
ra kirin	raise, remove
ra êxistin	spread out
ra we stan	halt
ra bvardin / bhûrîn	forgive, cross
tê kirin	fill, pour into
tê gihêştin	understand
tê da nîan	place inside
tê ve dan	mince, mix
ve xwarin	drink
ve guvaştin	trample on
ve kirin	open, fix
ve stan	stop, be tired
ve şartin	to hide
ve gerîan	turn back, search
ve dan	to bite, move out of the way
ve ghûrîn	change
ve bjardin	collect
ve bûn	loose, open
ve cûtin	to chew
ve mirrîn	to die
ver girtin	to catch
ver pêçandin	fold up
ver qulebandin	turn upside down

(Jardine, 1922: 37-39).

Her wekî ji jêgirane jî xuya dibe, di vê xebatê de bi tenê pêşgirên lêkersaz hene, di vê xebatê de qala paşgirên lêkersaz ên mîna /-în/ û /-andin/ê nehatiye kirin.

### 3.2.3.1. Beşên Axafînê

Di vê xebatê de Jardine beşên axafînê yê mîna navdêr, rengdêr, cînavk, hoker, daçek, gihanek dane. Li gel van, di nav mijara navdêr û rengdêran de wî cihekî taybet ji veqetandek û hejmarnavan re veqetandiye. Lê wî cih nedaye bangnîşanan.

#### 3.2.3.1.1. Navdêr

Jardine navdêr û rengdêr bi hev re hildane dest. Lê berî ku der barê navdêr û rengdêrên kurmancîyê agahîyan bide, wî bi ravekan dest bi mijarê kiriye. Her wiha Jardine hejmar, navên demsal, meh û rojan jî di nav mijara navdêrê de dane. Her wekî tê zanîn hejmar di gelek pirtûkên rêzimanê de wekî beşeke axafînê tên diyarkirin. Her çî navê demsal, meh û rojan in, wekî mînakên navdêran em ê li vir pêşkêş bikin:

*Navdêr: cûtek, kitek, kitkit, hefte*

*Rojên hefteyê: şemb, êkşemb, duşemb, sêşemb, çarşemb, pêncşemb, eîne an roja cema*

*Çar demsalên salê: behar, paîz, havînî, zivistan*

*Mehên salê (hêv êt salî): kanûn a mezin, şewat, adar, nîsan, gulan, hezeran, tîrmeh, tebax, êlûl, çerî a berî, çerîa dûê, kanûn a buçûk.*

*Demên rojê:*

*- saet çend e?*

*- saet heşt, kêm deh duqîqe” (Jardine, 1922:8).*

#### 3.2.3.1.1.1. Qertafên Kêşanê yê Têkildarî Navdêrê

Jardine di vê xebatê de wekî qertafên kêşanê, qertafên ravekê dane. Wî hinek ji qertafên tewang û nebinavkirinê jî dane, lê belê têr û tesel li serê agahî nedane. Wî der barê ravek û qertafên ravekan anku veqetandekan de ev agahî dane: “Raveka navdêr û rengdêran bi gelemperî navdêr an jî rengdêreke yekjimar wek raveker tê ber



raveberê anku navdêra ku tê ravekirin û qertafên /-ê/ û /-a/yê wan bi hev ve girê dide. Dema raveber nêr be /-ê/, dema ku mê be /-a/ digire.

**Mînak:**

*bab ê kiçik*

*daik a kurik*

*mêr ê pîr*

*jin a buçûk*

*Xeta xwar ij ga ê pîr e*<sup>19</sup>

**Nîşe:** *Mala fela* tê wateya xanîyê wan, lê *malê fela* tê wateya mal û hebûna wan.

Heke navdêra ku tê ravekirin ji aliyê wateyê ve pirjimar be, qertaf dibe/-êt/.

**Mînak:**

mal êt gund

dwar êt asker

sê mêr êt keleş

drav êt qulib zivirit xwedan ê xwe

dar êt drêj (...)” (Jardine, 1922:1-3).

Di vê xebatê de wekî qerfata tewangê bi tenê qala qertafa navdêra nêr /-î/yê hatiye kirin. Herçî qertafên nebinavkirinê ne, bi tenê qertafa yekhejmarîyê /-ek/ hatiye vegotin, lê belê qala qertafa pirhejmarîyê /-in/ê nehatiye kirin. Em wê jî ji mijara kategorîya rêzimanî *navdêra nebinavkirî* re dihêlin.

### 3.2.3.1.1.2. Kategorîyên Rêzimanî yên Têkildarî Navdêran

Di vê berhemê de kategorîyên sereke yên têkildarî navdêr hatine ravekirin. Ew kategorîyên ku em ê li xwarê qala bikin ev in: zayend, mêjer, binavkirin. Di vê xebata Jardine de qala kategorîyeke din hatiye kirin ku ew jî *biçûkkirin* e û di kurmancîyê de bi paşgira /-ik/, /-ok/ pêk tê û di gelek berhemên rêzimanê ew wekî qertafên bêjesaz hatine binavkirin.

<sup>19</sup> Her wekî ji mînakên jî diyar Jardine veqetandek ji raveberê cuda nivîsandine, her wiha daçeka /ji/yê jî wekî /ij/ nivîsandiye, di devoka vê herêmê ev cure bilêvkirina daçekan heye.

### 3.2.3.1.1.2.1. Zayend

Jardine pêşî di mijara ravekê de qala zayendê kiriye û wiha gotiye: “Dema raveber nêr be /-ê/, dema ku mê be /-a/ digire” (Jardine, 1922:1). Di mijara zayendê de jî bi van gotinan mijara zayendê rave kiriye: “Navdêra ku neketibe ravekê ji bo nîşandana zayendê nayê kêşanê. Heke cudakirina zayendê pêwîst bike rengdêrên *nêr* û *mê* tên bikaranîn. Ev peyv ji bo peyvên ku bi xwe xwedîyê zayendekê ne, nayên bikaranîn.

#### **Mînak:**

Hêştir (navê giştî ye), hêştirênêr, hêştiramê.

Xeberamê ser yê mêr kevit...” (Jardine, 1922:3).

Di mijara ravekê de qala zayendê hatiye kirin, lê belê di mijara tewangê de ravekirina zayendê qels û tevlihev e. Wekî din jî Jardine pirî caran zayenda bêjeya çewt daye. Her wekî MacKenzie (1961) daye zanîn, “tewang di hemû devokên Behdînî (Akrê, Zaxo, Şêxan, Surçî) de li gel mêjerê (pirjimar û yekjimar), zayenda rêzimanî (nêr û mê) jî nîşan dide.” (MacKenzie, 1961: 152). Lê belê Jardine di berhema xwe de ev mijar bi rêk û pêk hilnedaye dest û zelal nekiriye.

### 3.2.3.1.1.2.2. Mêjer

Mijara mêjerê jî hem di veqetandekê de, hem jî di tewangê de xwe nîşan dide, ji ber veqetandek û qertafên tewangê heke yekhejmar bin, di gel zayendê, mêjerê jî nîşan didin. Her wiha yek pirjimar bin, bi tenê mêjerê nîşan didin. Lewma jî wî mêjera yekhejmar di nav ravekê û zayendê de nîşan daye, lê belê pirhejmarîya bi riya tewangê cuda nîşan daye.

#### **“Pirjimar**

Navdêra ku neketiye ravekê bi paşgira /-a/ yan jî /-an/ê dibe pirhejmar.

#### **Mînak:**

*aqlê kurmanca paşî têt.*

ber > **beran**

sed > **sedan**

goyî > **goyan**” (Jardine, 1922:3).

Jardine mijara mêjerê ya bi alîkarîya ravekê daye; *babê kiçikê, dayka kurik, malêt gund...* Wî pirhejmarîya bi alîkarîya tewangê jî daye; her wekî; *ber > beran*. Lê belê wî qala pirhejmarîya nebinavkirî; *mirovîn hatin*, dîsa forma tewandî ya navdêra pirhejmar (*hevalinan xwest*) nekiriye. Ji ber heman egerê, wekî qertafa nebinavkirinê bi tenê, /-ekî/ hatiye dayîn. Lê belê her wekî, MacKenzie (1961) destnîşan kiriye, paşgirka /-ek/ wateya nebinavkirinê dide peyvê.

**Mînak:** *jinek* û *mirovêk* hebûn.

Ew paşgira nebinavkirinê di ravekê de ji bo navdêrên nêr dibe /-ekî/, ji bo navdêrên mê dibe; /-eke/, di forma tewandî de ji bo navdêrên nêr dibe /-ekî/ û ji bo navdêrên mê dibe /-ekê/... Di vê berhemê de qala van tiştan qet nehatiye kirin.

### 3.2.3.1.1.2.3. Binavkirin

Di berhema Jardine de ev mijar wekî sernav heye, lê belê agahîyeke têr û tesel tê de cih negirtiye. Bi van gotinan qala mijarê hatiye kirin: “Di kurmancî de artîkela binavkirinê nîn e, ji bo nîşandana navdêra nebinavkirî qertafa /-ekî/ tê ber navdêrê. Mînak: *mirovêkî, carekî<sup>20</sup>, rojekî...*” (Jardine, 1922:4). Jardine di xebata xwe de qala qertafa nebinavkirinê ya pirhejmarîyê /-in/ê nekiriye.

### 3.2.3.1.1.2.4. Piçûkkirin

Di vê berhemê de *piçûkkirin*wekî kategorîyeke rêzimanî ya têkildarî navdêr hatiye destnîşankirin. Ji bo vê yekê jî paşgirên /-k/<sup>21</sup>, /-ok/ û /-kok/ wekî paşgirên piçûkkirinê hatine binavkirin. Ev mijar di pirtûka Jardine de wiha hatiye ravekirin: “Navdêr û rengdêrpîrî caranbi alîkarîya paşgira /-k/, /-kok/û /-ok/ wateya piçûkkirinê werdigirin. Mînak: *kurr > kurrk, jin > jink, kuçik > kuçkok, mencelok, paîzok (kulîlka payîzê)*” (Jardine, 1922:4).

<sup>20</sup> ji ber ku wî qertafa tewangê ya navdêrên mê nedaye, hemû peyvên yekhejmar wekî nêr tewandine.

<sup>21</sup> Di vê berhemê de wekî /-k/ hatiye destnîşankirin, lê belê qertafa ku wateya delalî û piçûkkirinê dide bêjeyekê /-ik/ ye, her wekî kêr > kêrik, dar > darik...

### 3.2.3.1.1.2.5. Rewş û Tewanga Navdêran

Jardine der barê rewşa navdêran de ew tişt gotine: “Di kurmancî de bi tenê yek paşgira diyarkirina rewşê heye. Ew ê di vê xebatê de wekî paşgira rewşa tewandî (oblique case) were binavkirin. Ew dengdêra /-î/ ye.

**Nîşe:** Dibe ku ew jî hempaya rewşa xwedîtîyê ya farisîya kevn be.

Rewşa navkî û baneşanî bi navdêra bêyî kêşan anku xwerû pêk tê. Rewşên mayî bi paşgira rewşa tewandî û bi daçek an jî bê daçek pêk tê.

#### **Mînak:**

*Hirç pesî dixwet.*

*Ezmanê devî, daqoqê serî.*

*Nezanî xoşa canî.*

Mînakên li jor mînakên rewşên tewandî, xwedîtî û datîv in.

Bikaranîna paşgira tewangê tevî daçekan:

*Çi tikene kwarî (kewarê), ew dehête xwarî.*

*Bab ji aşî têt, kurr ji aşî xeber det.*

*Beharî kuştî, paîzî şûştî*

*bi darî kotan*

*bi dermanî*

**Nîşe:** Di rewşa baneşanî de forma navdêrê navkî tê bikaranîn. Peyva banglêkirinê /ya/ berî navdêrê tê, yan jî paşgira /-o/ bi navdêrê ve dibe.

ya şêx!

xudêwo!

Kuro!

#### **Paşdaçek:**

Paşdaçeka /da/ bi mebesta diyarkirina rewşa cihî piştî navdêr û bêjeyan tê. Carinan berî navdêra ku /da/ digire, pêşdaçeka /di/ jî tê bikaranîn.

li bajêrî **da**

di gelî **da**

Paşdaçeka /re/ (bi taybetî li Botan û li herêma êzdîyan) bi gelemperî piştî navdêr û cînavkên tê bikaranîn ku berî wan pêşdaçeka /bi/ tê.

bi kî **ra**?

bi jin **ra**

jin bîne bi lawînî da kurr bi te **ra** bigehên

Paşdaçeka /va/ piştî wan navdêrên tê ku rewşa derketinê nîşan didin.

ji wî **va**

ji pêş qesrî **va**

**Nîşe:** Di forma pirjimarî de nîşaneya rewşê nîn e.

Wan melhemê dilan in.”(Jardine, 1922:5-6).

Her wekî diyar e, di nava rewşa navdêran de qala tewanga navdêran hatiye kirin, lê belê bi tenê tewanga navdêra nêr hatiye destnîşankirin û bi tu awayî qala tewanga navdêrên mê nehatiye kirin. Qertafa tewangê ya navdêrên pirhejmar jî di mijara pirhejmarîyê hatiye pêşkêşkirin. Lê belê wî di mijara cînavk û rengdêrên şanîdanê de formên wan ên tewandî; çî nêr, çî jî mê pêşkêş kirine.

### 3.2.3.1.2. Rengdêr

Di vê berhemê de navdêr û rengdêr di nava hev de hatine pêşkêşkirin û hatiye gotin ku rengdêr nayên kişandin. Rengdêrên şanîdanê jî di nav cînavkên şanîdanê de bi vî rengî hatine nîşandan:

<b>Rengdêrên şanîdanê</b>	
<i>xwerû</i>	<i>tewandî</i>
<i>ev</i>	<i>vî</i>
<i>ew, ew ... he, wo... he</i>	<i>wî, wê...he</i>
<i>ev, van, va</i>	<i>evan, eve</i>
<i>wan, wa, wan ... he</i>	<i>ewan, ewa, ewa he</i>
<i>wa he, wa êt, henne</i>	<i>ewan... êt, henne</i>

(Jardine, 1922:9)

Dîsa di nav mijara navdêran de rengdêrên çendanîyê wekî formeke awarte hatine qalkirin, ji ber ku ji rengdêrên çawanîyê cudatir in û berî navdêrê tên. Jardine der barê vê mijarê de wiha gotiye: “Awarte: hejmarên tam, rengdêrên şanîdanê û pirsiyarî berî navdêra ku rave dikin tên.

**Mînak:**

**du** bahîv

**ew** mêr

**çend** kes

**kîj** derga

**hindex** mirov

Her wiha rengdêra *xoş, xweş jî wisa ye; xoş mêr, xoş tam*” (Jardine, 1922:2).

Der barê rengdêran de cihê herî zêde ji mijara pileyan re hatiye veqetandin û wiha hatiye gotin: “Forma hevrûkirinê bi zêdekirina paşgira /tir/<sup>22</sup> li rengdêran pêk tê.

Mînak: *buçûk > buçûktir, drêj > drêjtir, pehn > pehntir, aqil > aqiltir, bisexawet > bisexawettir, mêr > mêrtir, zîrek > zîrektir, tûj > tûjtir, giran > girantir, terr > terrtir*

*hişk > hişktir, sanaî > sanaîtir, zahmet > zahmettir, bilind > bilindtir, nizim > nizimtir*

Payeya berztirîn bi riya lêzêdekirina peyva *ji hemî* li forma hevrûkirinê pêk tê.

*nerm > ji hemî nermtir, zaf > ji hemî zaftir, buçûk > ji hemî buçûktir, nazik > ji hemî naziktir*

Ev ên li xwarê jî yên nerêzikî ne:

*mezin > mestir, çak > çêtir, gelek > pêter*

**Mînak:**

*Dû rûvî çêter in ji şêrekî ama dû şêr çêter in ji hemî.*

*Şerr ji belatî çêtir e.*

*Hingivîn ji şeker şirîntir e.”* (Jardine, 1922:6-7).

<sup>22</sup> Nivîskarî ew paşgir wekî /-ter/ daye, lê belê ji berhemê ne diyar e ka ew /e/ tam beramberî kîjan dengî tê, her wiha wî bi xwe jî di çend mînakan de “tir” nivîsandîye, lewma me jî ji bo hêsankirinê “/-tir/ bi kar anî.

### 3.2.3.1.3. Cînavk

Di vê berhemê de ji mijara cînavkan re cihêkî berfireh hatiye terxankirin. Cureyên cînavkan ên mîna; şanîdan, kesane, vegerok, girêkî, nebinavkirî û pirsiyarî hatine pêşkêşkirin. Her wiha tê de qala tewanga cînavkan jî hatiye kirin. Di pirtûkê de mijar wiha hatiye ravekirin:

#### “Cînavkên şanîdanê

<i>Xwerû</i>	<i>tewandî</i>
<i>Eve</i>	<i>vî, evî</i>
<i>Ewe</i>	<i>wê, ewî, ewê</i>
<i>van, va</i>	<i>evan, va</i>
<i>wan, wa, wanhe, wahe</i>	<i>ewan, ewa, ewan he, ewa he</i>

**Nîşe:** Peyva /her/ berî cînavk û rengdêrên şanîdanê tê û navdêra ku ew şanîdêr cihê wan digirin, destnîşan dike. Mînak: **her** eve; **her** ewe; **her** van; **her** wan

**Mînakên bikaranîna şanîdêran:** Eve çêtir e ji ewê he; çî bêjnê; da kel bêtê; ev kitêb, her ew he; belê, eve û ew he her yek e; ev kitêbe<sup>23</sup> û ew kitêb he her wekî yek e; ev mirov he

**Nîşe:** Hokerên /hosa/, /wosa/ ji bo şanîdanê tînan bikaranînin.

**Mînak:** hosa mirovekî; hosa camêra neman; wusa fe'elekî devêt cizaekî şedîd.

#### Cînavkên Kesane

<i>Xwerû</i>	<i>tewandî</i>
<i>ez</i>	<i>mîn</i>
<i>tu</i>	<i>te</i>
<i>ew</i>	<i>ewî, wî, wê</i>
<i>em</i>	<i>me</i>
<i>hûn</i>	<i>hewe, êwe, hûngo</i>
<i>wan, wa</i>	<i>ewan, ewa, awe</i>

**Mînak:** Ez tîm; ew min de kuşt, ewê got bo hewe bêjnê

<sup>23</sup> Di vê mînakê û mînaka piştî wê de evû ew rengdêr in.

Cînavkên xwedîtîyê bi alîkarîya cînavkên kesane yê tewandî û veqetandekan pêk tê.

*mal a min; cenabê te; xeberê wî*

**Nîşe:** Ji bo rêz û hurmetê bikaranîna kesê duyemîn ê pirjimar û yekjimar di kurdî de bi qasî zimanên din ên rojhilat ne berbelav e.

**Cînavka vegerok** ji bo hemû rewşan “xo” an jî “xwe” ye.

Li ku derê cînavkeke ku navdêra wê li kirdeyê vedigere hebe, divê li wir ev cînavk were bikaranîn. Bo nimûne em nikarin bibêjin, “em buçûkê me daênin”, divê em bibêjin, “em buçûkê **xo** daênin.

**Mînak:**

*Tola xwe li ser dişmin ê xwe nehêle.*

*Her yek û esl ê xo*

*Bixor kirî derman nîn e.*

**Cînavkên girêkî** li gel cînavkên girêkî “yê”, “yêa”, “yêêt” ku me li jorê qala wan kir, “ku” jî tê bikaranîn û dibe ku cînavka girêkî neyê bikaranîn jî.

“Jin ku hat”, “jin yêa hatî” girêkî nakevin kêşanê, bi alîkarîya cînavkan rewşa tewandî nîşan didin.

*Mêr ku kiç a wî hat*

*Mêr yê kiç a wî hat.*

*Mêr ku kiç a xo êna*

*Mêr yê kiç a xo êna*

*Mêr ku bêjnê Heme*

Pirî caran girêkî nayên bikaranîn, her wekî; *mar gestî ji werisî ditirsit.*

**Cînavkên nebinavkirî** yê herî berbelav ev in: *her ku yan jî heku, hindî, heçuwext, herçu, heçu yan jî heçî, hingî, heçuerdî...*

Mînakên bikaranîna wan: **Heçî** kerrek he, kurrek he; **hindî** av boş bit, aş xoştir bit

*hindî min; hingî ew ma'qûl bû; heçû rût e xeber pût e*



Cînavkên pirsiyarî yê berbelav in: *kî, çi, çend, kengî*. *Kî û çi* her du jî hem wekî cînavk, hem jî wekî rengdêrên pirsiyarî tî bikaranîn: *kîj, kîjk; bo çi; kanî, ka; kêrê* (êzdî li şûna wê, “kî derê” dibêjin); *kîve, kîva; çendî; ta kengî; ka....an; çend cara*

**Mînak:** *çi tov mêre; ki mêt; ez nazanim, ka dehêt an nahêt; kanî ew?; kîve çû?*

**Nîşe:** Li şûna peyva pirsê *ayaya* farisî di kurmançiyê de *gelo* tê bikaranîn.

- *Gelo ew meşxul e?*

**Nav û cînavkên nebinavkirîyên** berbelav ev in: *kes, her, dî/ dîtir, hindek, fulan kes, yekî, çend, yekûdû, çu, hemî, cemî, fulan, gellek, ba 'z, ba 'zekî*

Mînakên bikaranîna wan: *Kes nehat; çu nîn e; çu kes nehat; her kes, hemî kes; çu dî nîn e; kî dî; çend roja dî; yeka dîtir; hindî nîsan e, zînet a behar e; hindî jin in, hindî jan in; wan hej yek û du naken*" (Jardine, 1922:9-13).

### 3.2.3.1.4. Hoker

Di vê xebatê de der barê hokerê de ev tişt hatine nivîsandin: “Di kurmançiyê de ji bo diyarkirina hokeran formeke nû nîn e. Mirov dişê qala van sê cureyan bike: hokerên resen, rengdêrên ku wekî hoker tîne bikaranîn û hokerên ku bi hevedanîna daçek û navdêran pêk hatine.

Eva li xwarê listeyeke hokerên herî berbelav e: *belî, erê, naam, ihtîmal, na xêr, belkî, meger, helbet, wa, wesa, hosa, ho, wuho, gellek, bivênevê, qewî, zor, gellek, heqîqet, heta, xeflet, têkva, pêkva, têkel, carek, her, qet, digel, gellek gellek bit, nuha, nuho, nûka, na na, nê, dibit, ne dûr, mu'ayyen, çawa, pîçek, ancax, herwekî, gellekna, nihayet, muayen, bêsebeb, eger, bikullî, bo çi, hindî, bi tini, hindek, heme, kêk kêk bit, nûka û pêva, elan, wê care, ev care, gelek cara, carek ji cara, her care, hemû care, daîmen, dûmahî, nihayet, wextî da, zû, carekî dî, dîsan, kêre, kê dere, vêre, vê dere, vira, li hêre, hêre, wêre, wê dere, li wêre, kî ve, hî ve, ho ve, ho, wo, wo va, kanî, ka, hemû, her cî, hindek cî, vê gavê, wê gavê, çu care, kêk care, care care, berî hingî, qet, ebed, pwê mabênî, ji mêjî, dreng, avraz, nîşîv, serva, jorva, li nav, dormedorva, piştva, vî cehî, erdekî, heçû erdî, vî rex, wa rexî ha*” (Jardine, 1922: 14-15).

Di nava mijara pileyên rengdêran de bi van gotinan qala pîledarîya hokeran jî hatiye kirin: “Radeya herî bilind bi alîkarîya bêjeyên *herçî* û *heçû* pêk tê. Ev bêje berî forma asayî û hevrûkirinê tîne.

*heçu zû bit, werre hêre*

*heçu derengtîr hat "* (Jardine, 1922:7)

### **3.2.3.1.5. Daçek**

Jardine mijara daçekan bi vî rengê li xwarê hildaye dest: "Mirov dikare bibêje ku di kurmançiyê de daçek du cure ne:

- a) Daçekên resen ên pêvdivî bi qertafeke pevghandinê nîn e di navbera wan û navdêrên ku ew bandorê lê dikin de.
- b) Navdêrên ku wekî daçek tîn bikaranîn û hewcedarî qertafeke pevghandinê ne.

Ev lîsteya li jêrê piranîya daçekên ku herî zêde tîn bikaranîn digire nava xwe.

*Daçekên rasteqîn: ij, 'j; le, 'l; di; a; bo; gel, degel, dgel; bi, pi, 'b, 'p; bê; ber; 'lba, nik, , dûv, cum; ij ber; ta, heta; lu ku...*

*Daçekên navdêrî; ber, lber, pêş, lpêş, berahî; şûn, şûn, pişt, 'lpişt, dûv; lal (a); ser, 'lser, jûr, jûrva, selal; etraf (êt), gir, dor; tenişt, beramber, muqabil; dûmahî; nêzik; tê, têda; dinav, nav, 'lnav, navbên, navrêz; j xêr, 'j bil; heqq, xusûs" (Jardine, 1922:14-15).*

### **3.2.3.1.6. Gihanek**

Der barê gihanekan de Jardine ev tişt gotine: "Di kurmançiyê de hejmara gihanekan pir kême û pir kême tîn bikaranîn. Lîsteya gihanekên ku herî zêde tîn bikaranîn li xwarê ye: *û, hinde, yan, an an, ema / hema, meger, eger, wa lo, heçu, îna, me dam ku, da, heta, xûze ku, lo, ji ber ku, çûnku, ji ber wî, weku, ta, gelo, bilamanekî...*" (Jardine, 1922:15-16).

### **3.2.3.1.7. Baneşan**

Di vê xebatê de der barê bangnîşanan de tiştê nehatiye gotin, bi tenê di mijara navdêrê de qala rewşa bangnîşanî hatiye kirin.

### 3.2.3.1.8. Hejmar

Di vê xebatê de hejmar nav navdêran de hatine pêşkêşkirin ku di rastîya xwe de jî ew navdêr in. Di vê berhemê tewanga hejmarên rêzîn bi qertafa /-ê/ hatiye dayîn, lê belê di mijara tewanga navdêran de qet qala vê qertafê nehatiye kirin.

Hejmarên bingehîn: êk, yek (1); dû (2); sê (3); çar (4); pênc (5); şeş (6); heft (7); heşt (8); neh, nuh (9); deh (10); yazdeh (11); dwazdeh (12); sêzdeh (13); çardeh (13); panzdeh (15); şazdeh (16); heftdeh (17); heştdeh (18); nehdeh (19)<sup>24</sup>; bîst (20); bîst û yek (21); bîst û du (22); bîst û sê (23); sih 830); çil (40); pêncil, pêncî (50); şêst (60); heftê (70); heştê (80); not (90); set, sed (100); hezar (1000); pêncî hezar (50.000); çar set û haştê û sê (483); pêncî û heşt hezar û heştê sê (58.083); sê sed û sih û sê (333); milyonek (1.000.000).

Hejmarên ku cihê tiştan digirin bi gelemperî yekjimar in, em kêman caran forma *sedan* û *hezaran* dibihîzin.

**Hejmarên rêzikî:** *yê ewwel / yê berî, yê duwê, yê sêyê, yê çarê, yê pêncê, yê şeşê, yê heftê, yê heştê, yê nuhê, yê dehê...*

**Hejmarên şikeskî:** *nîvek, ji sê yek, ji çar yek, ji pênc yek û hwd.*

Daçeka /ji/ dibe ku hin caran neyê bikaranîn: *dehêk, ji bîsta du û niv...*

**Hejmarên hokerî:** *du cara sê cara, sih cara...*” (Jardine, 1922:7-8).

### 3.2.3.1.9. Lêker

Wekî piraniya berhemên rêzimanê, di vê xebatê de jî beşa herî berfireh ji lêkeran re hatiye veqetandin. Her wiha hemû kategoriyên rêzimanî yên têkildarî lêkeran jî di vê beşê de hatine pêşkêşkirin. Jardine li gel kategoriyên din ên rêzimanî cihêkî ji forma raderî ya lêkeran veqetandiye, me divê berî ku derbasî mijara kêşana lêkeran bibin wê beşê li vir pêşkêş bikin, da ku der barê forma navdêrî ya lêkeran de boçûna wan nas bikin: “Wate û bikaranîna raderên kurmancîyê: Ji navdêra ji lêkerê çêkirî ku di îngilîzî de bi paşgira /-ing/ pêk tê di kurmancîyê de rader e. Bikaranînen

<sup>24</sup> Formeke balkêş e, mirov nizane ka bi rastî formeke wiha heye yan wî ji ber xwe ve çêkiriye.

herî berbelav ên raderê ev in: *Av bo vexwarinê; berî suwarkirin; Ez hazir im bo sondîxwarin; Ji gotin heta kîrin rêa hezar salan; Lêhatin çêtir ji jêhatin*<sup>25</sup>.

Dibe ku wekî bikera komekê were, her wekî;

*Axeftinê* wa kerbê me vekir.

An jî wekî bireser were;

Me çu *axeftinê* wa nebhîst.

Heye ku radera lêkerekê bibe ravebera navdêreke din, lê belê ew rader mîna erebî navdêrekê di rewşa bireserî de bandorê li navdêrê nake. Lêkera di peywendîya raveka xwedîtîyê de ev navdêra di forma demên borî de û di forma navkî de ye.” (Jardine, 1922: 36-37).

Her wekî di gelek pirtûkên rêzimanê de hatiye destnîşankirin, lêker di forma raderî de navdêr in û zayenda wan jî mê ye. Lê belê di vê xebatê de ew hem di ravekê de hem jî di tewangê de wekî nêr hatine kişandin.

### 3.2.3.1.9.1. Kesandin û Qertafên Kesandinê

Di vê pirtûkê mijara kes û kesandinê wiha hatiye ravekirin: “**Qertafên Kesandinê (Lêkera Pevgihandinê):** Ev pevgîn (kopula) di îngilîzî de cihê /am/, /are/, /art/ û hwd. digirin. Ev qertaf bi navdêr, rengdêr û hwd. ve dibin û wateya pêveberê didin wan. Du formên wan hene; yek ji wan piştî nedengdêrê tê û ya jî piştî dengdêrê tê.

Mêjer	Kes	Piştî nedengdêrê	Piştî dengdêrê	Mînak	Mînak
yekjimar	yekem	-im	-me	Ez nesax im.	Ez bîrsî me.
	duyem	-î	-î yan jî -e	Tu kêfxoş î.	Tu kore î
	sêyem	-e	-e	Ew li ber hukmê jin e.	Ew westaî e
pirjimar	yekem	-in	-ne	Em îslam in.	Em fela ne.
	duyem	-in	-ne	Hûn kurmanc in	Hûn yezdî ne.
	sêyem	in	-ne	Wan melhemê dilan in.	Wan cû ne.

<sup>25</sup> Di vê berhemê de tewanga raderan an nehatiye kîrin, an jî wekî navdêrên nêr bi /-î/yê hatiye kîrin, lê di kurmancîyê rader wekî navên lêkeran mê tîk bikaranîn. Mîna; ji gotinê, heta kîrinê;, lêhatin çêtir e, ji jêhatinê.

### Neyînî:

Di forma neyînî de na yan jî ne tê ber pêveber yan jî berî qertafên kesandinê kêteya /nîn/ tê.

*Ez nîn im.*

*Tu nîn î.*

*Ew nîn e.*

*Em nîn in.*

*Hûn nîn in.*

*Wan nîn in.*

### Mînak:

*Ez ne aşiq im yan jî ez aşiq nîn im.*

*Tu ne birsî ye yan jî tu ne birsî nîn î.*

*Ew ne kore ye, yan jî ew kore nîn e.*

*Em ne fela ne, yan jî em fela nîn in.*

*Wan ne cû ne, yan jî wan cû nîn in.*” (Jardine, 1922:18-19).

Jardine qertafên kesandinê yên lêkeran ji yên navdêr û rengdêran cuda dane:

“Di dema nihade *dawîkerên kesî* her tim wiha ne:

Kes	Yekjimar	Pirjimar
1-	-m	-in
2-	-î	-in
3-	-t	-in

**Nîşe:** Kesê duyem ê yekjimar carinan dibe /-e/, kesê sêyem ê yekjimar jî carinan dibe /-e/, carinan jî dibe /-tin/. Di demên borî de dawîkerên kesî her tim wiha ne:

Kes	Yekjimar	Pirjimar
1-	-m	-in / -n
2-	-î	-in / -n
3-		-in / -n

(Jardine, 1922:22).

### 3.2.3.1.9.2. Kêşan û Rehên Lêkeran

Di vê berhemê de ji kêşan û rehên lêkeran re cihekî taybet hatiye veqetandin. Mijara rehên lêkeran di pirtûkê de wiha hatiye ravekirin: “Di kurmançiyê de heke mirov her hêmana lêkerê binase, mirov dikare lêkeran li gorî rêzikan bikêşe.

Hêmanên bingehîn ev in: *rader, reha dema niha, reha dema borî.*

Rader bi deng /-n/ diqede, berî wê dengdêreke kurt an jî dirêj tê. Reha dema borî bi cudakirina dengê /-n/ û dengdêra kurt a berî wê, ji forma raderî tê bidestxistin. Rader dibe ji reh û dawîker pêk hatibe, di kurmançî de ew dawîker ev in: /-tin/, /-din/, /-stin/, /-ştin/, /-an/, /-în/.

Her çî reha dema nihaye, ew jî bi gelemperî bi jêkirina van dawîkeran pêk tê. Lê belê gelek guharte di ser lêkerên cur bi cur re bandorê li vê rêzika berbelav dikin” (Jardine, 1922: 23).

### 3.2.3.1.9.3. Amraz û Qertafên Kêşanê yên Têkildarî Lêkeran

Jardine di berhema xwe de bi vî rengî qala amraz û qertafên kêşanê yên tekildarî lêkeran kiriye: “Ji kêşana lêkerên li jorê, mirov dişê van pîvanên li xwarê bibîne: Dema bê her tim bi pêşgira /dê/ yan jî /da/ tê nîşandan; pêşgira /de/ (bi gelemperî wekî /t /an jî /it/ tê bilêvkirin) di dema niha û berdewamîyê de tê bikaranîn da ku hesta karekî ku hê didome bide; pêşgira /bi-/ (bi piranî wekî /‘b/ an /ib/ an jî /pi/ tê bilêvkirin) nîşana raweyên xwestekî ye; raweya fermanî bi gelemperî mîna kesê duyem û sêyem ê dema niha ya xwestekî ye, lê belê kesê duyem ê yekjimar ne tê de, ew kurttir e û di navbera /-i/, /-e/ û /-a/ de diguhere; pêşgira forma neyînî ya dema bê û raweya xwestekî /na-/ , ya demên din /ne-/ ye” (Jardine, 1922: 22).

### 3.2.3.1.9.4. Ergatîfî

Di vê berhemê de der barê ergatîfîyê de tiştek nehatiye gotin, lê wekî diyarde qala kêşana lêkeran a li gorî bireserê hatiye kirin ku ew jî di kurmançiyê de nîşaneyê ergatîfîyê ye. Der barê vê mijarê de wiha hatiye: “Di demên borî de biresera yekser a lêkerên têper dikeve rewşa xwerû (navkî) û lêker ji aliyê kesandin û mêjerê ve bi wê

re lihevkiřî ye. Heke li holê biresereke yekser tune be, hingî lêker bi hêmana ku wekî bireser tê dîtin re lihevkiřî ye.

Di xebata li ser kurmancîya behdînî de berî her tiştî fehmkirina vê taybetîyê girîng e. Ji aliyê filolojîk ve mirov dikare vê avasazîyê bi rewşa farisîya kevn re hevrû bike; di vî zimanî de jî dema ku parenga dema borî dihat bikaranîn, kara (agent) diket rewşa tewandî û bireser dibû biker.

***Mînak:***

*Te ez xwastim.*

*Min tu xwastî.*

*Hewe ew xwast\_.*

*Ewî hûn xwastin.*

*Me tu xwastî.*

*Wan ez xwastim.*

*Te em xwastin.*

*Ewî em xwastin.*

**Yekjimar**

min	tiştêk xwast
te	
ewî	
me	
hewe	
wan	

**Pirjimar**

min	kitêba <sup>26</sup> xwastin
te	
ewî	
me	
hewe	

<sup>26</sup> Li gorî rêzika ergatîfîyê divê “kitêb” ne forma tewandî de be.

wan	
-----	--

**Nîşe:** Ahenga demên borî li gorî rêzikeke taybet a xweserî vê beşa kurmancîyê pêk tê. Biresera mantiqî ya dema borî bi rewşa xwerû (navkî) tê nîşandan û ji alîyê kes û mêjerê ve lêker bi wê re lihevkerî ye. Her çî bikera mantiqî (kara) ye, ew jî di rewşa tewandî de ye. Li alîyê din, bikera lêkera têneper di rewşa xwerû de ye” (Jardine, 1922:29).

### 3.2.3.1.9.5. Dem û Rawe

Di vê xebatê de dem û rawe li gorî lêkeran ji hev hatine cudakirin. Pêşî lêkera *bûn* hatiye dayîn. Di vê berhemê de wateya “to be”, hem jî wateya “to become” ya lêkera /bûn/ê hatiye destnîşankirin û di vê mijarê de ev tişt hatine gotin:

“Lêkera Bûn (Reha dema niha /bi/) -I		
Dema niha ya merci (gnomic)	Dema niha ya pêşkerî	Neyînî
<i>Ez bim</i>	<i>Ez debim</i>	<i>Ez nabim</i>
<i>Tu bê</i>	<i>Tu debê</i>	<i>Tu nabê</i>
<i>Ew bit</i>	<i>Ew debit – debê- debitin</i>	<i>Ew nabit (nabê)- nabitin</i>
<i>Em bin</i>	<i>Em debin</i>	<i>Em nabin</i>
<i>Hûn bin</i>	<i>Hûn debin</i>	<i>Hûn nabin</i>
<i>Wan bin</i>	<i>Wan debin</i>	<i>Wan nabin</i>

**Wateya wan:** *ez im; ez dibim, ez ê dibim<sup>27</sup>; ez nabim, ez ê nabim û hwd.*

“Lêkera Bûn (Reha dema niha /bi/) -II		
Dema bê	Dema niha ya xwestekî	Neyînî (ji bo herduyan)
<i>Ez dê bim</i>	<i>Ez bibim - bim</i>	<i>Ez nabim</i>
<i>Tu dê bê</i>	<i>Tu bibê - bê</i>	<i>Tu nabê</i>
<i>Ew dê bit- dê bê</i>	<i>Ew bibit, bit, bibê, bê</i>	<i>Ew nabit (nabê)- nabitin</i>
<i>Em dê bin</i>	<i>Em bibin, bin</i>	<i>Em nabin</i>
<i>Hûn dê bin</i>	<i>Hûn bibin, bin</i>	<i>Hûn nabin</i>

<sup>27</sup> Ji ber ku di zimanê nivîskî de dema niha û dema fireh bûne yek, me ji bo cudakirina her duyan forma behdînî bi kar anî. Di kurmancîya derdora Semsûrê de forma *ez dibime* jî heye.



<i>Wan dê bin</i>	<i>Wan bibin, bin</i>	<i>Wan nabin</i>
-------------------	-----------------------	------------------

<b>“Lêkera Bûn (Reha dema niha /bi/) - III</b>		
<b>Kes</b>	<b>Raweya fermanî</b>	<b>Neyînî</b>
2	<i>bî yan jî be</i>	<i>Nebî - nebe</i>
3	<i>bit (bila bit)</i>	<i>Nebit (bila nebit)</i>
2	<i>bin</i>	<i>Nebin</i>
3	<i>bin (bila bin)</i>	<i>Nebin (bila nebin)</i>

Dawîkera kesê sêyem ê yekhejmar di dema niha de bi piranî dibe /-itin/.

**Mînak:**

*Weku mirî mel'ûn nebit, gûr teng nabit.*

*Her ro em debin e mêwan êt wî.*

*Bela bibin.*

*Dibit.*

*Nabit e çu.*

*Hemîa debin e çend?*

*Yê îş drav mam ê xwe şerm biket.*

*Buçuk êt xwe dê save bin.*

<b>Dema borî (reha dema borî /bû/ - /bî/ -I</b>	
<b>Dema borîya têdeyî</b>	<b>Neyînî</b>
<i>Ez bûm</i>	<i>Ez nebûm</i>
<i>Tu bûî</i>	<i>Tu nebûî</i>
<i>Ew bû</i>	<i>Ew nebû</i>
<i>Em bûn</i>	<i>Em nebûn</i>
<i>Hûn bûn</i>	<i>Hûn nebûn</i>
<i>Wan bûn</i>	<i>Wan nebûn</i>

<b>Dema borî (reha dema borî /bû/ - /bî/ -II</b>	
<b>Dema borîya berdest</b>	<b>Neyînî</b>

<i>Ez debûm</i>	<i>Ez nedebûm / nebûm</i>
<i>Tu debûî</i>	<i>Tu nedebûî / nebûî</i>
<i>Ew debû</i>	<i>Ew nedebû / nebû</i>
<i>Em debûn</i>	<i>Em nedebûn / nebûn</i>
<i>Hûn debûn</i>	<i>Hûn nedebûn / nebûn</i>
<i>Wan debûn</i>	<i>Wan nedebûn/ nebûn</i>

**Mînak:** *Hêş xelas nebî; wa bû; em berî we debûn (tibûn; bû behar – behar debû; nebû e çu – çu nebû; em bêhîvî tibûn – bîjin (jinebî); bî pûç – çak debî*

<b>Demên ku ji parenga dema borî /bûî/ û /bî/<sup>28</sup> hatine bidestxistin -I</b>	
<b><i>Dema borîya dûdar</i></b>	<b><i>Neyînî</i></b>
<i>Ez bûîme</i>	<i>Ez nebûîme</i>
<i>Tu bûîe</i>	<i>Tu nebûîe</i>
<i>Ew bûîe</i>	<i>Ew nebûîe</i>
<i>Em bûîne</i>	<i>Em nebûîne</i>

<b>Demên ku ji parenga dema borî /bûî/ û /bî/ hatine bidestxistin -II</b>	
<b><i>Çirokîya Dema borîya têdeyî</i></b>	<b><i>Neyînî</i></b>
<i>Ez bûîbûm / bîbîm</i>	<i>Ez nebûî bûm / nabîbîm</i>
<i>Tu bûîbûî / bîbî</i>	<i>Tu nebûîbûî / nabîbî</i>
<i>Ew bûîbû / bîbî</i>	<i>Ew nebûîbû / nebîbî</i>
<i>Em bûîbûn / bîbîn</i>	<i>Em nebûîbûn/ nabîbîn</i>
<i>Hûn debûn</i>	<i>Hûn nedebûn / nebûn</i>
<i>Wan debûn</i>	<i>Wan nedebûn / nebûn</i>

<b>Demên ku ji parenga dema borî /bûî/ û /bî/ hatine bidestxistin -III</b>	
<b><i>Xwestekî pêknehatî</i></b>	<b><i>Neyînî</i></b>

<sup>28</sup> Li gorî Jardine ev dem ji parenga dema borî ya lêkeran bi dest dikevin. Ev tîbînî balkêş e, lewre heta niha di berhemên din ên rêzimana kurmancîyê de tiştêkî wiha nehatiye gotin. Di farisî de ev yek zelal e, demên wiha li ser parenga dema borî ava dibin, her wekî *xorde'em, xorde'î, xorde'est, xorde'im, xorde'id, xorde'end*. Lê belê ji bo kurdî ev rewş ne zelal e. Dibe ku Jardine bi tesîra farisî tiştêkî wiha gotibe.

<i>Ez bûîbama / bîbama</i>	<i>Ez nebûîbama / nabîbama</i>
<i>Tu bûîbaîa / bîbaîa</i>	<i>Tu nebûîbaîa/ nabîbaya</i>
<i>Ew bûîbaya / bîbaya</i>	<i>Ew nebûîbû / nebîbî</i>
<i>Em bûîbana / bîbana</i>	<i>Em nebûîbana / nabîbana</i>

Forma kurt ya vê demê wiha ye:

<b>Xwestekî pêknehatî</b>	<b>Neyînî</b>
<i>Ez bam</i>	<i>Ez nebam</i>
<i>Tu baî</i>	<i>Tu nebaî</i>
<i>Ew ba</i>	<i>Ew neba</i>
<i>Em ban</i>	<i>Em neban</i>

(Jardine, 1922:19-22).

### **Dem û Raweyên bi Lêkerên Rêzikî**

Her wiha di vê berhemê de piştî dem û raweyên bi dema bûn, di bin sernavê *demên lêkerên rêzikî* de bi hin lêkerên din dem û rawe hatine pêşkêşkirin, ew jî li gorî rehên lêkeran ji hev hatine cudakirin û bi vî rengî hatine destnîşankirin: “Demên ku li reha dema niha hatine avakirin:

- a) *dema fireh*
- b) *dema niha ya pêşkerî*
- c) *dema bê*
- d) *dema niha ya xwestekî*
- e) *raweya fermanî*

Dema fireh bi pevxistina reha dema ya lêkerê û dawîkerên kesandinê pêk tê.

Her wekî;

<b>Rader</b>	<b>Reha dema niha</b>	<b>Mînak</b>
xwastin	xwaz	Ez xwazim
		Tu xwazî
		Ew xwazit
		Em xwazin

		Hûn xwazin
		Wan xwazin

**Bikaranîn:** Ev dem ji bo tevgereke ku di demeke nediyar de pêk hatiye yan jî bi lêkerên hevedudanî re tê bikaranîn.

**Mînak:**

*Dewar êt baş alîq êt xo bi xo zêde ken.*

*Ga û hesp şerr ken, gûlik ser pê kevit.*

*Cana mirov derkevit, nava mirov dernakevit<sup>29</sup>.*

Pêşgira dema niha tê ber forma dema fireh û forma dema niha ya pêşkerî bi vî rengî tê bidestxistin:

<i>ez dexwazim</i>
<i>tu dixwazî</i>
<i>ew dixwazît</i>
<i>em dixwazîn</i>
<i>hûn dexwazîn</i>
<i>wan dexwazîn</i>

**Mînak:**

*Weku hirç pîr debitin, kutûla pê dekenin.*

*Tu çî deçînî, ew<sup>30</sup> dehelînî.*

Forma neyînî ya dema fireh û dema niha ya pêşkerî bi vî rengî ye: ez naxwazim; tu naxwazî; ew naxwazît; em naxwazînû hwd.

Ev pêşgira /de-/ carinan dikeve navbera pêşgira forma neyînî û reha lêkerê. Her wekî,

Seyê me li ber derê me *natrawît*, li derê xelqî *derawît*.

**Mînak:**

Malê kulus naçite gorî.

<sup>29</sup> Di vê hevokê de hem zayenda *can*, hem jî *nav* şaş hatiye bikaranîn, di kurmanciyê zayenda van peyvên nêr e, lewma jî divê ev hevok bi vî rengî be “canê mirov derkevit, navê mirov dernekeve.”

<sup>30</sup> Li vê derê jî li gorî zimanê nivîskî ev cînavk diviya “ewî/ ewê” bûya.

Sorgul bê istrî nabit.

**Dema bê** bi danîna daçeka /dê/, /da/ li ber forma dema fireh pêk tê.

ez da xwazim
tu da xwazî
ew da xwazit
em da xwazin
hûn da xwazin
wan da xwazin

**Neyînîya dema bê**

ez naxwazim
tu naxwazî
ew naxwazit

**Mînak:**

*Da hêm an dê hêm.*

*Heke hûn zû neçin, ew dê revit.*

*Çi tikene kwarî, ew dê hêt xwarî.*

*Yê ji mişka bibet, dê hinbana koşit.*

**Dema niha ya xwestekî** bi danîna pêşgira /bi/ li ber forma dema fireh pêk tê.

ez bixwazim
tu bixwazî
ew bixwazit
em bixwazin
hûn bixwazin
wan bixwazin

Forma neyînî ya dema niha ya xwestekî mîna forma neyînî ya dema bê ye.

**Bikaranîn:** Ev dem ji bo kar û bizavên ku pêkhatina wan ne teqez e û piştî raweyên hekanî, bilanî, mecbûrî, daxwazî û hwd. tê bikaranîn.

**Mînak:**

*Ez nawêrim biçim.*

*Tu nezanî baxêvî.*

*Neşiya biçit.*

*Hûn devên biçin.*

*Heke ji te bêfursat, xûrta neke li zabûnî.*

*Jin bînî bi lawinî, da kurr bi te re bigehên.*

Di kurmancîyê de raweya fermanî ji bilî kesê duyemîn ê yekjimar her wekî forma dema niha ya xwestekî ye;

*bixwazî, bixwaze, bixwaza*

*bixwazit, bixwazin*

**Neyînî:**

*naxwazî, naxwazit û hwd.*

Forma neyînî ya fermanî jî wekî forma neyînî ya dema niha ya xwestekî ye.

Mînakên bikaranîna forma raweya fermanî û dema niha ya xwestekî:

*Nuha bide deha bistêne.*

*Mirov xûndar bit, qerrdar nebit.*

*Mirov dikê rojekî bit, bela mirîşkê salekî nebit.*

*Kêm bixwe, her gav bixwe.*

*Li jina negere, li xizma bigerre.*

*Bixwe goşt, suwar be goşt û lê de goşt.*

*Xizmet bike pîran, wekî pîr debê, xizmet bibîne” (Jardine, 1922:025-28).*

### **Demên ku li ser Reha Dema Borî Ava Dibin**

Jardine demên ku li ser reha dema borî ava bûne jî bi vî rengî destnîşan kirine:

“Demên li xwarê li ser reha dema borî ava dibin:

a) *Dema borîya têdeyî (preterite)*

b) *Dema borîya berdest (imperfect)*

<b>Dema borîya têdeyî</b>	
<i>Rader</i>	<i>Reha dema borî</i>
<i>Xwastin</i>	<i>xwast</i>

<i>Cînavk</i>	<i>Mînak</i>
<i>ez</i>	<i>xwastim</i>
<i>tu</i>	<i>xwastî</i>
<i>ew</i>	<i>xwast</i>
<i>em</i>	<i>xwastin</i>
<i>hûn</i>	<i>xwastin</i>
<i>wan</i>	<i>xwastin</i>

<b>Dema borîya Berdest</b>	
<i>Rader</i>	<i>Reha dema borî</i>
<i>Xwastin</i>	<i>xwast</i>
<i>Cînavk</i>	<i>Mînak</i>
<i>ez</i>	<i>dexwastim</i>
<i>tu</i>	<i>dexwastî</i>
<i>ew</i>	<i>dexwast</i>
<i>em</i>	<i>dexwastin</i>
<i>hûn</i>	<i>dexwastin</i>
<i>wan</i>	<i>dexwastin</i>

(...)

***Mînak:***

*Şol kir.*

*Şol dekir.*

*Her ro şol dekir.*

Mînakên ji bo zelalkirina mijara wateya demên borî

*Te ez nevíam çavekî, min tu nevíaî her du çavan.*

**Demên bi Lêkerên Alîkar ên bi Parenga Dema Borî**

Gava mirov paşgira /-î/ li reha dema borî zêde dike, parenga dema borî bi dest dikeve.

<b>Reha lêkerê</b>	<b>pareng</b>
Xwast	xwastî

**Wate:** Ji alîyê rêzimanî ve parenga dema borî ya lêkerên têper tim di wateya tebatî (pasîf) de ye.

**Bikaranîn:** Bikaranîna parengan li gel lêkera /bûn/ê wan dike rengdêra pêveberî, heye ku wek rengdêreke asayî were bikaranîn.

***Mînakên bikaranîna parenga dema borî:***

*Dou cerebandî çêtir ji mastî necerebandî.*

*Şol kirî malê xwe, xoşdevîa xelqî.*

*Cuwan e, hespî nealemî neden destê nezanî.*

*Aqlê jina li koşê danaî, wekî radibit, bilav dibit.*

**Dema Borîya Dûdar:** Dema borîya dûdar bi alîkarîya parenga têkûz û pevgihînerê pêk tê.

ez xwastîme
tu xwastî /xwastîe
ew xwastî / xwastîe
em xwastîne
hûn xwastîne
wan xwastîne

**Çîrokîya Dema Borîya Têdeyî:** Dema ku mirov lêkera /bûn/ê li parenga dema borî zêde dike, çîrokîya dema borîya têdeyî bi dest dikeve.

ez xwastî bûm an jî bîm û hwd.
tu xwastî bî
ew xwastî bûî
em xwastî bûn
hûn xwastî bûn
wan xwastî bûn

**Xwestekîya Pêknehatî :** Qertafa xwestekîya dema borî tê ber parenga dema borî û ev dem bi dest dikeve.

ez xwastî bama / bam
----------------------



tu xwastî baîe / baî
ew xwastî baya / ba
em xwastî bana / ban
hûn xwastî bana / ban
wan xwastî ban / ban

**Nîşe:** Çîrokîya dema borîya têdeyî û xwestekîya pêknehatî ya lêkerên têper pir kêr tên bikaranîn, bes gava ku bikereke di rewşa tewandî de hebe, ew dem tên bikaranîn.

**Mînak:**

*Min darek daî çerxa wî.*

*Heke paşîmana şax lê hatibana da çine esmana.*

*Heçû te ji min xwastî baya, min daba te.*

*Wekî em hatin ew hêş nehatîbî.*

**Hekanîya Xwestekîya Pêknehatî:** Ev rawe bi tenê wekî binhevoka encamî ya hevokên mercî tê bikaranîn. Daçeka /da/ tê ber forma xwestekîya pêknehatî û ev rawe bi dest dikeve, her wekî;

*Heke ez nerevîbama, ewan ez da kuştibama.*

*Heke dabanca bi destê min hebaya, min ew da kuştiba (ez wî dikujim).*

**KÊŞANA LÊKERA “HATIN”**

dema fireh	reha dema borî	dema bê	xwestekî
hêm	têm	dê hêm	bihêm /bêm
hê	tê	dê hê	bihê / bê
hêt	têt	dê hêt	bihêt / bêt
hên	tên	dê hên	bihên / bên
û hwd.	û hwd.	û hwd.	û hwd.

**RAWEYA FERMANÎ**

Kes	yekjimar	pirjimar
Kesê duyemîn	werre	werrin

Kesê sêyemî	bihêt / bêt	bihên / bên
-------------	-------------	-------------

Forma neyînî ya dema niha “nahêm” û ya dema bê û xwestekî *nahêm* an jî *naêm* e.

<b>Dema Borîya Têdeyî</b>	<b>Dema borîya berdest</b>	<b>Dema borîya dûdar</b>	<b>Çîrokîya dema borîya têdeyî</b>	<b>Xwestekî pêknehatî</b>
hatim	dehatim	hatîme	hatîbûm	hatîbama / bam
hatî	dehatî	hatî	hatî bû / bî	hatî baîa / baî
hat	dehat	hatî	hatî bû / bî	hatî baya / ba
hatin	dehatin	hatin	hatî bûn / bîn	hatî bana / ban

(Jardine, 1922: 28-32).

Jardine berhema xwe de piştî destnîşankirina dem û raweyên lêkerên ku wekî rêzikî bi nav kirine, hinek lêker jî wekî nîvrêzikî bi nav kirine û der barê kêşana wan de jî bîr û boçûnên xwe bi rengî derbirine:

<b>Beşên bingehîn ên hin lêkerên nîvrêzikî</b>				
<b>Wateya bi îngilîzî</b>	<b>Rader</b>	<b>Reha dema borî</b>	<b>Reha dema niha</b>	<b>Raweya fermanî</b>
see, find	dîtin	dît	bîn	bibîne
say	gotin	got	bêj / bê	bêje / bêe
eat	xwarin	xwar	xwa	bixwe
do	kirin	kir	k	bike
remain	man (din)	ma	mên	bimêne
throw off	êxistin	êxist	êxe	êxe
give	dan	da	de	bide
allow	hiştin / hêlan	hişt / hêla	hêl	bihêle
go	çûn / çon	çû / ço	çi	herre
give birth	zan	za	zê	bizê
stop	stan	sta	stê	stê
take away	birin	bir	be	bibe
bring	ênan	êna	ên / îin	bîne
put	da-nian / dê-nandin	-nia / -nand	-ne	-ne

Tabloya Hevrûkirî ya Reha Dema Niha ya Lêkeran

Dema fireh (gnomic)								
ênan	da-nian	dan	birin	gotin	dîtin	-stan	êxistin	kirin
înim	danem	dem	bem	bê-im	bînim	stem	êxem	kem
înî	dane	de	be	bê-î	bînî	ste	êxe	ke
înit	danet	det	bet	bê-it	bînit	stet	êxet	ket
înin	danen	den	ben	bê-in	bînin	sten	êxen	ken

Dema niha ya pêşkerî

tînim	dedanem	dêdem	debem	debêim
debînim	-stem	dekem	dexem	

Dema bê

da înim	dê danem	dê dem	dê bem	dê bêin
dê bînim	-stem	dê kem	dê exem	

Raweya fermanî

bîne	dane	bide	bibê	bibêe
bibîne	-ste	bike	bi-êxe	

(Jardine, 1922:32-33).

Di vê pirtûkê de ji kêşana lêkerên *hebûn* û *vîyanê* cihekî taybet hatiye terxankirin. Jardine ev mijar jî wiha hildaye dest:

“**Lêkera hebûn:** Ev lêker bi tenê bi kesên sêyem (yekjimar û pirjimar) re tê kişandin. Her wekî *there is* û *there are* a di îngilizîyê de. Gava ku bi rewşa tewandî re tê bikaranîn, dikeve forma *to have* a îngilîzî. Di vir de kêşana xwestekî di rewşeke awarte de ye, ew jî wekî lêkera /bûn/ê tê kêşanê.

Dema fireh	Dema niha	dema bê	xwestekî	fermanî
hêe	dehêe	dê hebit	hebit	bibit
hênne	dehenne	dê hebin	hebin	bibin

Dema niha ya pêşkerî wekî *tihea* tê bilêvkirin.

### Demên borî

DB têdeyî	DB berdest	DB dûdar	Çîrokîya DBT	Xwestekî pêknehatî
hebû	dehebû	hebûe	hebûbû	hebaya
hebûn	dehebûn	hebûne	hebûbûn	hebana

Di demên borî de gelek caran lêkera alîkar a asayî /bûn/ li şûna vê lêkerê tê bikaranîn. Ji bo hemû deman neyînîya lêkera /bûn/ê tê bikanîn.

### Mînakên bikaranîna lêkera *hebûn*:

*Min tişt hêe te çu nîne.*

*Bela wî mirov zaf hebin.*

*Heku murad hebit dê çare hebit.*

*Heke hewe aql heba vê gavê te dewlet dê hebaya.*

**Lêkera vîan:** Bikaranîna lêkera /vîan/ baldarîyeke taybet dixwaze. Formên sereke yên vê lêkerê ev in:

rader	reha dema borî	reha dema niha	dema niha	fermanî
vîan	vîa	vîa	devem, deve û hwd.	bive

### Demên borîya têdeyî

vîam
vîaî
vîa
vian
û hwd.

### Dema borîya dûdar

vîame
vîaî
û hwd.

**Wate:** Bêyî nîşandana kesan bi wateya *it wants* (dixwaze) û *what is wanted is* (tiştê tê xwestin) tê bikaranîn.

**Mînak:**

*Devêt ez hazir bim.*

*Devêt seyekî dujwar.*

*Mirov devêt yan ezman xoş hebit yan nanê genim.*

Forma bi cînavkên tewandî bikera daxwazê nîşan dide, her wekî; *min devêt, te devêt, me vîa...*

Her wiha dibe ku bi vî rengî jî were bikaranîn;

*Ez devêm biçim.*

*Xelqî ew xoş devia.*

Heke bi vî rengî li xwarê were bikaranîn, dibe ku wateya fermanî bide:

*Hûn devên her vê gavê karê xo ken.*

**Nîşe:** Di kurmancîyê de zêde ne zehmet e ku wateyê cuda yê daxwazê werin pêşkêşkirin.

**vîan:** *wish, want, feel necessary*

**hez an jî hez kirin:** *like, prefer, love*

**xwastin:** *demand, seek*

**razî bûn:** *to be willing, content, agree*

**Mînak:**

*Ez hez kem biçim.*

*Ez devim biçim.*

*Ez dexwazim biçim.*

*Ez razî me biçim.*

Hevokên li xwarê mînakên rêzikên li jor in.

*Rake bi nanê xwe, berde canê xwe.*

*Hêş neberdaîe bêjit inşale subehî em dê berdene belê evroke em wî bernaden.*

Diyarkirin û cextlêkirina ji bo dema niha û domdarîyê bi alîkarîya partîkela /wê/ û /we/ pêk tê. Ev partîkel berî partîkela domdarîyê /de/ tê. Ev partîkel bi awayê li xwarê xwe nîşan dide:

*wê tihêe: there is*

*Ew we tibêjit: he is saying*

*Wê tihebû: there was*

*Wê tèn: they are coming*

Dema ku ev partîkel bi dema borîya dûdar re were bikaranîn, wê yekê nîşan dide ku encamên wê kirina ku lêker dide, hêşta karîger in.

*Wê tihatî: has come (and is here)*

*Ewe wa kirî: he has done it.*

*Wê tikuştîme: they are dead.” (Jardine, 1922: 34-35).*

### **3.2.3.1.9.6. Avani di Xebata Jardine de**

Der barê avaniyan de di vê berhemê de agahiyeke berfireh nîn e, lê belê heta astekê qala avaniya tebatî û hinek lêkerên “hokarî” hatiye kirin.

Avaniya tebatî di vê berhemê de di mijara kêşana lêkera *hatinê* de bi vî rengî hatiye qalkirin: “Lêkera *hatin* a ku ji bo avaniya tebatî tê bikaranîn: Dema karaya lêkerê nehatibe nîşandan û bi awayekî rêzimanî neyê naskirin, hingî *avaniya tebatî* bi alîkarîya lêkera *hatin* bi awayekî nerasterast û bi forma raderî ya lêkerê tê pêkanîn.

*Her wekî;*

*Ez hatime girtin.*

*Ez da hati bama girtin.*

*Ez dê hême girtin.*

**Mînak:** *Ser yê hatîe birrîni, nahête kirrîni.” (Jardine, 1922:32).*

Avaniya hokarî, wekî formekê nehatiye qalkirin, lê belê hinek lêker wekî lêkerên hokarî hatine binavkirin û bi van gotinan hatine pênasekirin: “Lêkerên ku forma wan a raderî bi /-andin/ê yan jî bi forma wê ya kurtbûyî /-an/ê bi dawî dibin, wekî lêkerên hokarî tèn binavkirin, ji ber ku ew bi gelemperî forma hokarî yan jî têper a lêkerên teneper nîşan didin. Her wiha ew paşgirên navborî piştî hinek lêkerên ku bi eslê xwe bi erebî ne û bûne malê kurdî jî tê dîtin.

Pêkanîna lêkerên hokarî bi vî rengî pêk tê; dawîkera /-and/ li reha dema niha ya lêkera teneper tê zêdekirin û di dema niha de jî ew /-din/ tê jêbirin, /-an/ jî dibe /-ên/ carinan jî dibe /-în/.

**Mînak:**

<b>radera netêper</b>	<b>reha dema borî</b>	<b>reha dema niha</b>
tersîn	tersî	ters
<b>radera têper</b>	<b>reha dema borî</b>	<b>reha dema niha</b>
tersandin	tersand	tersên
<b>radera netêper</b>	<b>reha dema borî</b>	<b>reha dema niha</b>
hejîn	hejî	heji
<b>radera têper</b>	<b>reha dema borî</b>	<b>reha dema niha</b>
hejandin	hejand	hejên
<b>radera netêper</b>	<b>reha dema borî</b>	<b>reha dema niha</b>
revîn	revî	rev
<b>radera têper</b>	<b>reha dema borî</b>	<b>reha dema niha</b>
revandin /revan	revand / reva	revên

Evên li jêr jî çend peyvên bi eslê xwe bi erebî ne ku bûne malê kurmancî û ketine forma lêkerên kurmancî:

şelehe	şelandin
tele'e	tele'andin
qelege	qelepandin
ceme'e	ceme'andin
cerebe	cerebandin

(Jardine, 1922: 33-34).

Di ravekirina vê mijarê de jî bandora farisî berbiçav e. Dema ku em bala xwe bidin rêzimana farisî em vê yekê bi awayekî zelal dibînin. Her wekî Ebbas'elî Vefayî di berhema xwe ya bi navê *Destûrê Zebanê Farsî* (دستور زبان فارسی) de nîşan daye, di farisî de “paşgira /-an/ di pêkanîna lêkerên têper ji lêkerên teneper û ji lêkerên têper jî di pêkanîna lêkerên hokarî de bi kêr tê.

**Mînak:**

*drext lerzed > Ê drext ra lerzand (dar hejiya > wî dar hejand)*

*Û xeza ra xored > Û xeza ra be kûdek xorand. (Wî xwarin xwar > wî xwarin bi zarok da xwarin / bi xwarin da)* “(Vefayî, 1391:45).

Di mînaka pêşîn de ji lêkereke têneper, lêkereke têper hatiye bidestxistin, di mînaka duyemîn de ji lêkereke têper, lêkereke hokarî hatiye bidestxistin. Di vê berhemê de qala avanîya tebatî hatiye kirin, lê belê avanîya hokarî (sedemkar) çewt hatiye ravekirin. Lê belê di kurmancîyê de rewş cuda ye; her wekî Thackston (2006) jî daye zanîn ev avanî bi alîkarîya lêkera “dan” tê pêkanîn. Naskirin > dan naskirin; zanîn > dan zanîn; xuya kirin > da xuyakirin...

### **Mînak:**

*“Ew xwe dide naskirin.*

*Wî derd û kulên gundiyan bi eskeran didane zanîn.*

*Gelo tu ê bikaribî xwe bidî naskirin?*

*Ew di wir de dide xuya kirin, ku kurd ne tirk in.”* (Thackston, 2006:70).

Lê belê Jardine bi tu awayî qala vê formê nekiriye.

Bandora farisî li ser Jardine bi vê yekê tenê nesînordar e, wî daye zanîn ku hin demên mîna dema borîya dûdar û çîrokîya dema borîya têdeyî li ser ser parenga dema borî ava bûne, di farisî de ev yek pir zelal e, her wekî; “*refte’em, refte’î, refte’est, refte’im, refte’îd, refte’nd*” (Öztürk, 1995:40), lê belê di vî warî delîleke cihê bawerîyê li holê nîn e.

### **3.2.4. Di Xebata Jardine de Sentaksa Kurmancîyê**

Di pirtûka Jardine de ji sentaksa kurmancîyê re beşeke taybet hatiye terxankirin. Her wiha di beşa pêvekê de der barê şêwaza kurmancîyê de Jardine ev tişt gotine: “Taybetîya şêwaza kurmancî kurt û sadebûna wê ye. Li şûna hevokên aloz û têkel ku ji gelek komekan pêk hatine, hevokên sade û bêyî gihanek tîbî bikaranîn. Wekî nîşaneyê vê şêwazê em jêgiraneke ji gotara Macaulay ya der barê Clive (Cehangir) de pêşkêş dikin:

*Cehangir ehwalê xwe dît in ne çak in. Ser hevalê xwe ne emîn e. Ihtîma da bitîne xaîn an mîrîni naketin. Bela ji qabilîyeta xo tenaea eskerê xo jî canmêr in û mezbût in, hema kê mîrîni di şîmanî bîst cara giranter in.*



*Berahê wî ve rûbalekî mezin hêe derbaz sanaêe, ema piştê wan da girit. Cehangir jî mirovekî bêters e, çu tereddê naket, bela ser. Vî maslehat piçek dudil bû, çunkî heke qerarê xo xerab derkevî, her xo mesuûl e. Vê care Umere êt xo cemandin, qismê ezam got, şer naken. Cehangir got, ez jî wa bêjim” (Jardine, 1922: 47-48).*

Der barê hevoksaziya kurmanciyê de jî di berhemê de ev tişt hatine gotin: “Hevokên sade: Rêzbûna hevokên sade bi gelemperî wiha ye:

biker + pêveber + pevgîn (copula)

**Mînak:**

*Zêdedehî ne ziyan e.*

Heke guhatina cihê pêveberê wateyê neguherîne, lêker li pey pêveberê tê. Bala xwe bidin cudatîya di navbera van mînakan de:

<b>Mînak</b>	<b>Wate (bi îngilîzî)</b>
<i>Mêr pîr bû.</i>	The man was old.
<i>Mêr bû pîr.</i>	The man became old.
<i>Axur mabû xalî.</i>	The stable remained empty (as previously) it had been empty.
<i>Axur xalî mabû.</i>	The stable remained empty as previously.
<i>Hirç mezin diyar bû.</i>	The bear a big one was visible.
<i>Hirç diyar bû mezin.</i>	The bear seemed big.

**Mînak:**

*Heke nêrî birhan dibêjit, kurî bilinbaz.*

*Nabit çu.*

*Hemî debitine çend.*

Her wiha carinan li pey lêkerê biresera nerasterast jî tê. Her wekî;

*Şûna şêra rûvîan dekene gêre.*

**Aheng**

Di hemû demên lêkerên têneper û di demên niha ya yên lêkerên têper de, ji aliyê kes û mêjerê ve lêker bi bikera mantiqî re lihevkişî ye. Di demên borî de lêkerên têper ji aliyê kes û mêjerê ve bi biresera mantiqî re lihevkişî ye. Heke bikera

rêzimanî ji alîyê wateyê ve pirjimar be, lêker jî pirjimar e. Heke hevokê du biker hebin, lêker bi gelemperî bi wateya tevekî re ahengdar e.

***Mînak:***

*Ez revîme digel vî mêrî.*

*Vî mêrî ez revandime.*

*Ev mêr dê min revênit.*

*Rê debine behost, dijmin nabine dost.*

*Heke dost hezar be kême, heke dijmin yek be zor e.*

*Ez û ew hatime.*<sup>31</sup>

**Nîşe:** Heke du bikerên lêkereke neyînî hebin û ew lêker qala her du bikeran dike, hingî bi gelemperî lêker hema piştî bikera yekemîn tê û bi wê re lihevkirî ye.

*Ne ew ma û ne ez...*

**Gotara neyekser:** Derbirînên neyekser ên mîna daxuyanî, raman û nîyet û hwd. di kurmancîyê de bi awayekî yekser tên gotin.

*Mişk tekbr kir; em zencilek bikene stûra pşika.*

*Wa gote mulla; kerê me kerê te kuşt.*

*Rûvî nesîhet kir; bo kelereş baverê xo neêne bi xasê xoş.*

*Muayen nebû; ka hêş mirie yan sax e.*

**Hevokên têkel:** Komeka alîkar û bikaranîna wan di raweyan de.

Raweyên pêşkerî ji bo kar û bizavên ku pêkhatina wan wekî rastîyeke bêguman tê pejirandin. Herçî raweyên xwestekî ne, pêkhatina wan ne teqez e yan jî li ser pêkhatina wan şik û guman heye. Bikaranîna wan komekên alîkar dê ji mînakên li xwarê were fehmkirin.

***Mînak:***

**Komekên Rengdêrî**

*Eve her ew mêr [e ku] min nas kirî.*

*He ku mirov tu nas deke, em dekene hebesî.*

*Heçî qomî baya, em pê hiss bîn.*

---

<sup>31</sup> Forma rêzimanî ya vê hevokê wiha ye: Ew û ew, em hatine.

### **Komekên demî**

*Hingî ew me'qûlê me bî, em rehet bîn.*

*Heçu gava ew baya maqûlê me, em rehet bana.*

### **Komekên cih**

*Ez çûme wê malî yea ewe ez êname wêrê.*

*Heçu jê duxel pêda bit, kevrişk têne wêre.*

### **Komekên sedemî**

*Hêş ewî najûtîe **ji ber ku** şûv nîn e.*

Sedema pêdivî bi /da/ tê nîşandayîn:

*Xuşka adar bide min rojekî sar **da** ez gez gîsk pê bikeme dar.*

*Qasim pêlavêt xo taze şûştin û dana ser banî **da** hişk bin.*

### **Encama rasteqîn**

*Baran hind hat, xelq neşîa derkevin ji malê xwe.*

### **Komekên nelihevîyê**

*Gelek bizava kir, hema ji wî nehat.*

*Bela biçûk bitin, zîrek e.*

*Ereb şiptî mêş e, hindî kiş deken, her tèn pêş.*

*We lo em dûr in, dilê me desojit.*

### **Komekên mercî**

Komekên mercî bi *heke* pêk tên, hin caran ew *heke* jî nayê bikaranîn.

### **Mînak:**

***Heke** tu nezanî, çav de cîranî, **heke** tu nezanî pîra bide cwanî.*

*Kitik ne li mal e, daweta mişkan e.*

***Heke** mêr da li avî, çî li çok e, çî li lêva hemî yek e.*

*Mirvanî tiva ser evrazî, her ser mirovî dikevit.*

***Heke** ruxsa hebitin.*

***Heta** panîa destî reş nebit, tama devî xoş nabit.*

Li vir *heta* ji bo mercê hatiye bikaranîn.

### **Komekên hevrûkirinê**

Ev komek bi rêya herî hêsan a pêkan pêk tê.

**Mînak:**

*Hema mêrekî çak e, bela ne wekî Evderaman.*

*Sermaya Mosul **ne şiptî** sermaya Amed.*

***Çawa** ilmê min nagehêt ser wî darî, **hosa** jî agahê min nîn e li gosterî.*

*Ev gir û ew gir her du bilindîyek e.*

***Hindî** zû bit, çêtir bit.*

*Hindî av boş bit, aş xoşter bit.*

**Komebêjeyên bi her wekî**

*Behsê xo kir, **her wekî** bêhîvî bû.*

***Hindî** detersin ji wî ke neho ew sultanê wa.*

*Doulet hate serî bi zêra, **heç ku** kerî xelq debêjin îşt tu aferî.*

**Xwezî**

*Ew bi peyva **xuze** dest pê dike.*

***Xuze** ew bêto.*

***Xuze** ew hatîba o.” (Jardine, 1922: 40-44).*

Mijareke din a ku di vê berhemê cih jê re hatiye veqetandin, mijara hevokên bi lêkerên alîkar e. Her çi qas Jardine ev mijar di nav ravekirina raderan de bi cih kiribe, ew mijar zêdetir di nav mijara sentaksê de cihê xwe dibîne.

“**Nîşe:** Forma raderî ku di îngilîzîyê de piştî lêkerên mîna *to be able (karîn)*, *to which (kîjan)*, *to be afraid (tirsîn)*, *to dare (wêrîn)*, *to be necessary (pêwîst bûn)* di kurmancîyê de bi forma dema niha ya xwestekî xwe nîşan dide.

**Mînak:**

*Ez **nawêrim** biçim.*

*Min **navêt** biçim.*

*Ewî **tersî** biçit.*

***Devêt** em bèn.*

***Lazim bû** da em bèn.” (Jardine, 1922: 37).*

### 3.2.5. Di Berhema Jardine de Watenasî

Di vê berhemê de der heqê watenasîyê de tiştêk nîn e, bi tenê di ravekirina hin deman de qala wateya wan deman jî hatiye kirin. Bo nimûne der barê wateya dema fireh de ev tişt hatine gotin: “Ev dem ji bo tevgereke ku di demeke nediyar de yan jî bi lêkerên hevedudanî re tê bikaranîn.”(Jardine, 1922: 25).

Li cihekî jî der barê wateya dema niha ya xwestekî de jî ev têbînî hatiye pêşkêşkirin: “Ev dem ji bo kar û bizavên ku pêkhatina wan ne teqez e û piştî raweyên hekanî, bilanî, mecbûrî, daxwazî û hwd. tê bikaranîn” (Jardine, 1922: 26).

### 3.2.6. Nirxandina Giştî ya Berhema Jardine

Her wekî çawa mebesta pirtûka Rheayî hêsankirina karê mîsyoneran e, armanca ya Jardine jî hêsankirina karê peywirdarên dewleta îngilîz e. Pirtûk ji hêla Government Press ve di sala 1922’yan de li Bexdayê hatiye çapkirin. Tiştê ku di vê xebatê de serê pêşîn balê dikêşe; berawirdkirina kurdî û farisî ye. Jardine di çend cihan de kurdî û farisî hevrû dike. Bo nimûne di mijar paşgirê bêjesaz de, li ber paşgirên kurdî forma wan a farisî jî dide û dide zanîn ku “paşgirên ku bi formên sade ve dibin û navdêrên dariştî pêk tînin hema bêje hemû mîna yên farisî ne” (Jardine, 1922: 45). Her wiha di mijara veqetandekê jî dîsa bal kişandiye ser têkilîya kurdî û farisî.

Jardine jî her wekî Rheayî pergala denganî ya kurdî, li gorî zimanên din pêşkêş kirine. Li gorî di kurmançîya wê deverê de 9 dengdêr û 3 pevdeng hene. Herçî dengên nedengdêr in, ew jî 28 heb in. Di vê xebatê hemû dengên bingehîn ên kurdî hatine destnîşan kirin. Di vê berhemê de jî ew pevdengên ku hatine diyarkirin, der barê wan tu mînak nehatine dayîn, lewre jî taqîkirina wan ne pêkan e.

Di warê morfolojîyê de ev xebat li gorî xebata Rheayî birêkûpêktir e. Di mijara morfolojîyê de cihekî berbiçav ji peyvسازیya navdêr, rengdêr û lêkeran re hatiye terxankirin; çend awayên cuda yên pêkhatina bêjeyan hatine destnîşankirin; bi riya pevgihandina peyvan, li pey hev rêzkirina peyvên têkildarî hev, dubarekirina

peyvekê û hwd. Ji bilî wê jî paşgir û pêşgirên ku bêjeyên nû pêk tînin hatine destnîşankirin.

Jardine di gel peyvsazîyê di nav beşên axaftinê de kategorîyên rêzimanî yên têkildarî wan pêşkêş kirine. Bo nimûne, têkildarî navdêrê kategorîyên mîna zayend, mêjer, binavkirin û piçûkker hatine pêşkêşkirin. Di mijara ravekê de qala zayendê hatiye kirin, lê belê di mijara tewangê de ravekirina zayendê qels û tevlihev e.

Bi heman awayî, mijara tewangê baş nehatiye ravekirin, bo nimûne; tewang navdêrên mê hîç nehatiye qalkirin û ew jî wekî nêr hatine tewandin. Ji ber vê yekê, kategorîyên rêzimanî yên mîna mêjer û binavkirinê jî pir zelal nebûne. R. F. Jardine, di cînavkan de cînavkên xwerû û tewandî ji hev cuda kirine. Di vê mijarê tiştê balkêş ev e ku wî, rengdêr û cînavkên şanîdanê jî ji hev cuda kirine. Li gorî wî, /ev/ û /ewe/ cînav in, /ev/ û /ew/ jî rengdêr in.

Kategorîyên rêzimanî yên têkildarî lêkerê (kesandin, rewş, dem û rawe, avanî û xuyang) jî ji bilî xuyangê bûne mijara vekolana Jardine. Qertafên kesandinê, ji bo lêkeran bûn wekî *pevgîn* (enclitic copula), wekî qertafên kesandina lêkeran mîna *dawîkerên kesîn* (personal endings) hatine binavkirin û destnîşankirin.

Li ser rewşa lêkeran di ravekirina mijara ergatîfîyê de qala rewşa xwerû û tewandî hatiye kirin. Her wiha di mijara cînavkan de jî qala rewşên xwerû û tewandî hatiye kirin. Her çî mijara dem û raweyan e bi awayekî berfireh hatine nirxandin û raweyên bingehîn hatine vegotin. Di vê mijarê de tiştê balkêş ew e ku dema fireh û dema niha ji hev hatine cudakirin, her wiha hinek demên mîna dema borîya dûdar û çîrokîya dema borîya têdeyî wekî du demên ku li ser *parenga dema borî* avakirî, hatine destnîşankirin. Mijara sentaksê di vê pirtûkê de li gorî pîvanên pirtûkeke rêzimana klasîk ji xwe re cihekî baş dîtiye; hevok û cureyên hevokan ên sereke di vê pirtûkê de hatine destnîşan kirin. Mijara watenasîyê wekî pîranîya pirtûkên rêzimanê yên wê serdemê nebûye mijara lêkolîn û lêhûrbûnê.

Wekî encam em dikarin bibêjin ku pirtûka Jardine li gorî pirtûka Rhea, xebateke berfirehtir û birêkûpêktir e. Mijara ergatîfîyê her çiqas nehatibe binavkirin jî hatiye ravekirin, bandora zimanê farisî li ser Jardine berbiçav û vê yekê hin caran

rê li ber xera kiriye. Bo nimûne hinekî jî bi bandora farisî paşgira /-andin/ a ku di kurmançiyê de lêkerên têper çêdike, wekî paşgira hokariyê nîşan daye.

### 3.3. BERAWIRDKIRINA HER DU XEBATAN

Piştî ku me her du xebat pêşkêş û analîz kirin, niha jî em dişên her xebatan berawird bikin. Xebata Rhea wekî kurteyêke der barê devoka Hekarî de hatiye amadekirin. Her wekî ji navê wê jî diyar e, xebateke berteng e. Rheayî mijar bi kurtebirî hatine vegotin. Lê xebata Jardine ya ku 53 salan piştî ya Rhea hatiye nivîsandin, bi qeware û naveroka xwe têkûztir û berfirehtir e; piraniya mijarên têkildarî morfoloji û sentaksê di vê pirtûkê de hatine pêşkêşkirin.

Kêmasiya sereke ya her du xebatan jî ew e ku amadekarên wan ne kurdîaxêvên resen in, hinek formên kurdî baş fehm nekirine û çewt rave kirine. Bo nimûne li gorî Rhea di kurmançiyê de zayenda rêzimanî nîn e. Wî wekî cînavka kesê seyem a yekhejmar bi tenê /wî/ daye, qet qala cînavka /wê/ nekiriye. Di veqetandekan de jî qala veqetandeka /-a/yê nekiriye. Peyva *mal* ku peyveke mê ye, wekî nêr daye û gotiye; *malê te...*

Her wiha Jardine jî hin taybetiyên kurdî baş fehm nekirine, lewma jî xwestiye ji farisî sûd wergire, carinan ji ber vê yekê tiştên çewt gotine. Bo nimûne, Jardine ji ber ku di farisî de wisa ye, ji bo kurdî jî diyar kiriye ku demên borîya dûdar û çîrokîya dema borîya têdeyî li ser parenga dema borî ava dibin, lê belê ev dîtin ji bo farisî rast be jî, ji bo kurdî em nikarin heman tiştî bibêjin. Wekî din jî hem Rhea hem jî Jardine lêkerên ku bi /-andin/ê diqedin wekî lêkerên hokarî destnîşan kirine û pirî caran zayenda peyvan çewt dane.

Her du xebat jî, bi mebesta fêrkirina zimanê kurdî bi alîkariya zimanê îngilîzî hatine amadekirin û di çarçoveya rêzimana klasîk de mane. Her du jî, xebatên rêzimana şayesî ne, form û kategoriyên ku di zimanê gelêrî de berhev kirine. Di her du xebatan de piştî danasîna dengên kurdî bi awayekî berawirdî, beşên axaftinê û di nav de jî kategoriyên sereke yê rêzimanî hatine pêşkêşkirin.

Di xebata Jardine de kategoriyên mîna zayenda rêzimanî û tewanga navdêran hatine destnîşankirin. Lê belê wî bi tenê tewanga navdêrên nêr rave kiriye, qala

tewanga navdêrên mê nekiriye. Mijara ergatîffiyê di her du berheman de jî nîn e. Lê belê her duyan jî bi awayekî cudatîya kurdî ji zimanên din fehm kiriye, wan daye zanîn ku di demên borî de biker cînavkên koma duyem (tewandî) digire û lêker bi bireserê ve lihevkirî ye. Jardine ev mijar hê bi zelalî rave û şîrove kiriye.

Di her du xebatan de jî herî zêde ji lêkeran re cih hatiye veqetandin. Hem Rhea, hem jî Jardine hejmar wekî kategorîyeke rêzimanî destnîşan kirine. Jardine di berhema xwe de qala kategorîya biçûkkirina navderan jî kiriye û paşgirên /-ik/ û /-ok/ê wekî paşgirên biçûkker bi nav kirine.

Jardine ji bilî mijarên morfolojîyê, beşeke taybet ji sentaksê re jî terxan kiriye û mijara hevoksazîyê bi awayekî berfireh hildaye dest. Tiştêkî din ê balkêş jî ev e ku Jardine cînavk û rengdêrên şanîdanê ji hev cuda kirine; cînavk wekî /eve/ û /ewe/, rengdêr jî wekî /ev/ û /ew/ pêşan dane. Her çî Rheayî ye, wî î di avanîya tebatî de daçeka /li/ li ber lêkera /hatin/ê danîye, lê belê ew form di tu devokên kurmancîyê nîn e.

Di encamê de em dikarin bibêjin ku ev her du berhem di gel hemû kêma û kurtîyên xwe hem ji ber girîngîya xwe ya dîrokî, hem jî ber naveroka xwe hêjayî lêkolîn û lêhûrbûnê bûn.



## ENCAM

Di dawîya teza xwe de me divê em bi çend rêzikan encamên wê destnîşan bikin. Ziman bi qasî ku navgîna ragihandina hest û ramanan e, ew çend jî di pêkhatin û têşegirtina kesayetî û nasnameya mirovan de xwedanê cihekî taybet û girîng e. Ji ber vê yekê jî mijara zimên ji mêj ve bala mirovan; bi taybetî kesên ramanger û lêkolîner kişandîye ser xwe. Ji serdema berî zayînê ve, li ser zimanên cur bi cur ên cîhanê xebatên lêkolînî tên kirin.

Yek ji van zimanên ku bûye warê gelek lêkolîn û vekolînan jî zimanê kurdî ye ku li Rojhilata Navîn, piştî erebî, tirkî û farisî, xwedîyê girseya herî mezin a axêveran e. Cara pêşîn li medreseyên Kurdistanê li serê xebat hatine kirin, hê di sedsala 17an de yekemîn berhema rêzimanî bi navê *Serfa Kurmancîyê* bi destê Eliyê Teremaxî hatiye nivîsandin. Piştî wê, di sedsala 18an de Mele Yunûsê Xelqetînî xebatên xwe yên *Tesrîf û Zurûfê* nivîsandin. Ev her du berhem di medreseyên Kurdistanê de di perwerdeyê de hatine bikaranîn. Li aliyê din ji sedsala 18an pê ve zimanê kurdî bala mîsyoner û peywirdarên ewropî jî kişandîye. Di sala 1787an de mîsyonerê îtalî Maurizio Garzoni (1734-1804) pirtûkek der barê rêzimana kurdî de nivîsandîye.

Piştî berhema Garzoni, xebata mîsyonerê amerîkî Samuel A. Rhea (1827-1865) ya bi navê *The Brief Grammar and Vocabulary of The Kurdish Language of The Hakari District* (Kurteyek ji Rêziman û Ferhengoka Zimanê Kurdî ya Herêma hekarî) tê, ku piştî mirina wî bi çar salan di sala 1869an di kovara *Journal of the American Oriental Society* de hatiye weşandin. Li hêla din, di sala 1893yan de Yûsif Diyaadîn Paşa (1848-1906) ferhengeke kurmancî -erebî ya bi navê *El-hediyyet El-hemîdiyye fîl-luxet El Kurdiyye* (Ji zimanê kurdî diyariya hemîdî) nivîsandîye, di pêşeka vê ferhengê jî hinek rêz û rêçikên zimanê kurdî hatine ravekirin.

Di sedsala 20an de jî çî kurd çî jî ne kurd gelek kesan der barê zimanê kurdî de xebat kirine û berhem dane. Bo nimûne di sala 1908an de Xelîl Xeyalî *Elibayê Kurmancî* li Stenbolê daye ber çapê. Her wiha di sala 1912-1913an de Omer 'Ewnî li Elezîzê pirtûka *Qewaîdî Lisanî Kurdî* nivîsandiyê. Piştî wê di sala 1918an de Mehmet Mihrî *Mukaddîmet-ûl Îrfan* daye çapkirin. Di sala 1921ê de Civata Telebên Kurd yekemîn pirtûka fêrkirina kurdî *Hînkere Zimanê Kurdî* li Stenbolê weşandiyê. Di sala 1922yan îcar serpelê îngilîz R. F. Jardine xebata xwe ya bi navê *Bahdînan Kurmanjî a Grammar of The Kurmanjî of The Kurds of Mosul Division and Surrounding Districts of Kurdistan* (Rêzimana Kurmancîya Kurdên Parêzgeha Musil û Herêmen li Derdora Wê yên Kurdistanê) li Bexdayê daye çapkirin. Piştî wê jî bi sedan xebat li ser zimanê kurdî bi zaravayên cur bi cur ên kurdî hatine kirin.

Xebatên der barê zimanê kurdî de pêşî wekî xebatên amatorî, li qadê hatine amadekirin, lê belê piştê li welatên cur bi cur hinek sazîyên akademîk, kursîyên kurdî vebûne û li wan sazîyan xebatên akademîk û zanistî derketine holê. Li gel kesên mîna Garzoni, Rhea, Jardine ku bi awayekî amatorî bala xwe dane kurdî û berhem amade kirine, hinek kesên mîna Edmonds (1889-1979), MacKenzie (1926-2001), Ernest N. McCarus (1952 - 1995) li zanîngehan xebatên akademîk der barê kurdî de amade kirine.

Her wekî kesên biyanî yên li ser zimanê kurdî xebat kirine, ewên kurd en li ser kurdî xebat kirine jî dabeş dibin ser du koman; koma pêşî rewşenbîr û têkoşerên xebatên siyasî ne, ji dilsojî, dilsozîya xwe dest avêtine mijarê û berheman dane. Her wekî Se'îd Sidqî Kaban, Reşîdê Kurd, Kemal Badıllı, Cegerxwîn, Dr. Şivan, Feqî Huseyn Sağniç û hwd. Bi gelemperî armanca van kesan danîna rêzikên zimanê kurdî û pêkanîna zimanekî yekgirtî ye. Wan kesan li qadê xebat nekirine, ew li ser berhemên nivîskî xebitîne.

Koma duyem jî di warê zimanzanîyê de xwe baş gihandiyê, li zanîngeha xebat kirine û pisporîya wan a zimanzanîyê pêk hatiye. Her wekî Qanatê Kurdo, Celadet Bedirxan, Kamûran Bedirxan, Tewfîq Wehbî, Abdulrahman Hacî Me'rif û hwd. Van kesan bi piranî li qada akademîk xebat kiriye, xebatên wan ji çarçoveya rêzimana klasîk zêdetir dikeve qada zimanzanîya giştî.

Li gorî zimanzan û lêkolînerên mîna MacKenzie, MacCarus, Jahani, Korn, Edmonds, Minorsky zimanê kurdî zimanekî ji malbata Hind-Ewropî, yek ji zimanên îranî ye. Ji aliyê erdnîgarî ve zimanê kurdî zimanekî bakurê rojavayê Îranê ye. Ji aliyê dîrokî ve kurdî di serdema qedîm de paşmayîyê zimanê medî û di serdema navincî de jî paşmayîyê partî ye.

Zimanê kurdî her çiqas bi zimanê farisî re xizm be û ji aliyê gencîneya peyvan û formên rêzimanî ve gelek aliyên kurdî û farisî yên hevpar hebin jî, her du zimanên serbixwe ne. Dema ku mirov ji aliyê denganiya dîrokî (historical phonetics) ve bala xwe dide her du zimanan, mirov dibîne ku hinek guherînên rêzîkî yên dangan di navbera her du zimanan de hene. Ew jî nîşan dide ku kurdî zimanekî bakurê rojavayê Îranê, farisî jî zimanekî başûrê rojavayê Îranê ye. Ji aliyê morfolojîk ve hinek formên qedîm ên ku di zimanê kurdî de hene, di zimanê farisî de nîn in. Bo nimûne, di kurdîya kurmancî de zayenda rêzimanî û taybetîya ergatîfî hene. Ev her du taybetî di farisî de nîn in.

Wekî gelek zimanan, di zimanê kurdî de jî gelek zarava û devok hene. Li gorî Adak (2016), Sheyholislami (2015) zaravayên sereke yên kurdî ev in: kurmancî, soranî, goranî, zazakî û lûrî. Di nav zaravayên kurdî de jî hinek guherînên rêzîkî yên dangan hene. Her wiha ji aliyê morfolojîk ve jî hinek cudatî balê dikêşin. Bo nimûne di hinek zaravayan de zayenda rêzimanî heye, di hinekan de nîn e.

Me ji bo teza xwe du xebatên rêzimana kurmancîyê yên ku bi zimanê îngilîzî hatine nivîsandin neqandine. Her du xebatên ku bûne mijara lêkolîna me, hem ji ber ku xebatên destpêkî ne, hem jî ji ber ku li qadê hatine amadekirin û nimûneyên rêzimana şayesî (descriptive grammar) ne; bi naveroka xwe girîng û balkêş in.

Yek ji van xebatan ji hêla mîsyonerê amerîkî Samuel A. Rhea ve wekî kurteyêke der barê devoka Hekarî de hatiye amadekirin û sala 1869an di kovara *Journal of the American Oriental Society* de hatiye weşandin. Her wekî ji navê wê jî diyar e, xebateke berteng e. Xebata duyem a ku bûye mijara teza me jî ji hêla serpelê îngilîz R. F. Jardine ve di sala 1922yan de hatiye nivîsandin, li Bexdayê hatiye çapkirin. Ev xebat, bi qeware û naveroka xwe ji ya Rheayî têkûztir û berfirehtir e. Li

gel vê yekê her du berhem jî berhemên rêzimana klasîk in, kategorîyên rêzimanî yên rêzimana klasîk hildane dest.

Kêmasîya sereke ya her du xebatan jî ew e ku amadekarên wan ne kurdîaxêvên resen in, hinek formên kurdî baş fehm nekirine û çewt rave kirine. Bo nimûne li gorî Rhea di kurmançiyê de zayenda rêzimanî nîn e. Her wiha Jardine jî hin taybetiyên kurdî baş fehm nekirine, lewma jî xwestîye ji farisî sûd wergire, carinan ji ber vê yekê tiştên çewt gotine. Bo nimûne, Jardine ji ber ku di farisî de wisa ye, ji bo kurdî jî diyar kiriye ku demên borîya dûdar û çîrokîya dema borîya têdeyî li ser parenga dema borî ava dibin, lê belê ev dîtin ji bo farisî rast be jî, ji bo kurdî em nikarin heman tiştî bibêjin. Lewre di farisî dibêjin, *refte'em*, lê em bi kurdî de nabêjin, *çûyîme*, em dibêjin *çûme*. Wekî din jî hem Rhea hem jî Jardine lêkerên ku bi /-andin/ê diqedin wekî lêkerên hokarî destnîşan kirine ku ew jî çewt e, di kurmançiyê avaniya hokarî bi alîkarîya lêkera /dan/ê çêdibe, her wekî “*min da kirin*”. Wekî din jî Jardine jî wekî Rheayî pirî caran zayenda peyvên çewt dane.

Hem Rhea, hem jî Jardine hejmar wekî kategorîyeke rêzimanî destnîşan kirine. Jardine di berhema xwe de qala kategorîya biçûkkirina navderan jî kiriye û paşgirên /-ik/ û /-ok/ê wekî paşgirên biçûkker bi nav kirine. Her wiha Jardine beşeke taybet ji peyvsaziyê re jî terxan kiriye û mijara hevoksaziyê bi awayekî berfireh hildaye

dest.

Di dawîya vê lêkolînê de em dikarin bibêjin ku her du berhem jî tevî hemû kêma û kurtiyên xwe, ji hêjayî lêkolîn û lêhûrbûnê bûn. Wekî kereseiyên destpêkî yên rêzimana kurdîya kurmançî me ji wan gelekî sûd wergirt.

Di dawîya lêkolînê em di warê fonetîk, fonolojî, morfolojî, sentaks û semantîka kurmançiyê de gihastin van encaman: Di kurmançiyê de ji bilî 31 dengên bingehîn (fonem) ên ku Celadet Bedirxan destnîşan kirine û di alfabeya xwe de jê re tîp danîne, çend fonemên din jî hene. Heşt dengên hilmî û nehilmî yên ku bi tîpên /p/, /ç/, /t/, /k/ tên nîşandan di kurdîya kurmançî de fonem in. Her wiha /r/ya lertzok ku Jardine bi du /r/yan nîşan daye jî fonem e. Ji bilî wan di kurmançiyê de hinek rengedeng hene. Dengê /ü/ ku di gelek devokan de heye, yek ji wan rengedengan e. Her wiha /a/ ku dengê di navbera /a/ û /o/yê de ye jî wisa ye. Dengê eyn ê erebî ku

tê ber dengdêrên kurt ên mîna /u/, /i/ û /e/ û rê li ber tunebûna wan digire, bi heman awayî /h/ya erebî ya ku cihê /h/ asayî digire jî rengedeng in.

Ji alîyê dengzanîyê ve di kurmancî de hinek guhartinên dengan ên rêzîkî hene. Yek ji wan di her du berhemana de jî hatiye destnîşankirin, ew jî di dema kêşana hinek lêkeran de pevguherîna dengên bêjen û bijen e. Ji alîyê morfolojîk ve di kurmancîyê de kategorîyên mîna kêşana navdêr û lêkeran, di rengdêr û hokeran de jî pîledarî girîng e. Di kurdî de peyvên xwerû, nexwerû (hevedudanî, pêkhatî û aloz) hene. Pêşgirên bêjesaz di kurdîya kurmancî de bi piranî lêkeran pêk tînin, paşgir navdêr, rengdêr, hokeran çêdikin. Her wiha rehên lêkeran jî wekî morfemên bêjesaz bi kêr tên.

Kurdî ji layê rêzbûna bêjeyan ve zimanekî biker+bireser+ pêveber (SOV) e. Di kurdî de li gel hevokên sade û hevedudanî, hevokên aloz jî hene. Zimanê kurdî yê gelêrî hevokên axaftina nerasterast (indirect speech) qebûl nake. Di xebatên rêzimana kurdîya kurmancî de qada herî beyar, qada watenasîyê ye. Ji bo xebatên zimannasî û ferhengasîyê di vê qadê pêdivî bi xebatê heye.

Wekî gotina dawî, em dikarin bibêjin ku bi vê lêkolînê me xwest em tîşkê bêxin ser hinek alîyên xumam ên rêzimana kurdîya kurmancî, ji kesên ku dixwazin di vî warî de bixebitin re bibin alîkar. Heke ev daxwaza hinekî be jî bi cih hatibe, em ê kêfxweş bibin.

## ÇAVKANÎ

Adak, A. (2014). *Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk*. İstanbul: Weşanên Nûbihar.

Adak, A. (2016) Kürtler Dil ve Edb. Maddesi. *Türkiye Diyanet Vakfı İslâm Ansiklopedisi*. Ek 2 Kâfûr, Ebül'l- Misk-Züreyk, Kostantin. İstanbul: Türkiye Diyanet Vakfı Yayın Matbaacılık ve Ticaret İşletmesi.

Aronoff M. û Miller J. R. *The Handbook of Linguistics*. New York: Blackwell Publishing.

Arslan, M. (2014). *Di Dewra Osmaniyan De Weşangeriya Kitêbên Kurdî (1844-1923)*. Teza Çapnekirî ya Lîsansa Bilind. Mêrdîn: Zanîngeha Mardîn Artukluyê Enstîtûya Zimanên Zindî yê li Tirkiyeyê Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî.

Aydın M. (2007), *Dilbilim El Kitabı*, İstanbul: 3F Yayınevi.

Badıllı, K. (1992). Türkçe İzahlı Kürtçe Grameri- Kurmançça Lehçesi. Ankara: Med Yayıncılık.

Baker, C. M (2003). Syntax. Di nav *The Handbook of Linguistics* de (265-294). Mark Aronoff & Janie Rees- Miller (Ed.) Blackwell Publisher, Oxford.

Bedirxan, C. (1998). Gramêra Kurdmancî; Mêjer (H.31). *Hawar 2*, Hejmar: 24-57. Stockholm. Weşanên Nûdem.

Bedirxan, C. (1998). Gramêra Kurdmancî; Tewang (H.32). *Hawar 2*, Hejmar: 24- 57. Stockholm. Weşanên Nûdem.

Bedirxan, C. (1985). Behira Azovê. *Ronahî*, Hejmar: 5. Berhevok Ronahî. Şam: Çapxana Jîna Nû.

Bedirxan, C. (1985). Mehkema Hawarê û Deyindarê Şermende. *Ronahî*, Hejmar: 12. Berhevok Ronahî. Şam: Çapxana Jîna Nû.

Bedirxan, C. (1998). Memozîn. *Hawar 2* (Hejmar 45). Stockholm: Weşanên Nûdemê.

Bedirxan, K. (1998). Tefsîra Qur'anê. *Hawar 2* (Hejmar 29). Stockholm: Weşanên Nûdemê.

Bedlîsî, Ş. (2007). *Şerefname*. Ziya Avcı. (werger). Stenbol: Weşanên Avesta.

- Bidlîsî, Şerefhan. (2007), Şerefname, Weşanên Avesta, Stenbol.
- Boulden, L. (2008). *.Basic Sorani Grammar*. Hyattsville: Dunwoody Press.
- Bruinessen, M. (2011). *Türkoloji Varsa Kurdoloji de Vardır; Kürdoloji Kürtlerle İlgili Tüm Bilgileri Kapsar*, Bîr, hej. 1. (Hevpeyvîn Seîd Veroj).
- Bruinessen, M. (2014). A History of Russian Kurdology: With a brief Literature Overview. *Weiner Jahrbuch für Kurdische Studien*, 2. Jahrgang 2014, pp. 8-96.
- Bussman, H. (2006). *Routledge Dictionary of Language and Linguistics*. London: Routledge.
- Bynon, Theodora. (1979). The Ergative Construction in Kurdish. *Bulletin of the School of Oriental and African Studies*, University of London Vol. 42, No. 2, In Honour of Thomas Burrow (1979), pp. 211-224
- Campbell, L. (2002). The Handbook of Linguistics. *The History of Linguistics*. Blackwell Publishing; Blackwell Reference Online.
- Celîl, O., Celîl, C. (1978). *Zargotina K'urda*. Moskova: Neşîrxana Naûka.
- Cemîyeta Telebên Kurd. (2008). *Hînkere Zimanê Kurdî*. Weşanên bgst. Stenbol.
- Chalker, S., Weiner, E. (2003). *The Oxford Dictionary of English Grammar*. Oxford University Press. Published Online.
- Cigerxwîn. (1982). *Şefağ Dîwana 6'a*. Stockholm: Weşanên Roja Nû.
- Cigerxwîn. (1982). "Şefağ Dîwana 6'an, Weşanên Roja Nû, Stokholm.
- Cigerxwîn. (1988). *Folklor Kurdi*. Stockholm: Weşanên Roja Nû.
- Cindî, H. (2008). *Kilamên Cimeta Kurda*. Yerêan: Weşanxana Lîmûş
- Crystal, D. (2008). *A Dictionary of Linguistics and Phonetics*. Blackwell Publishing, USA.
- Dost, J. (2017) *Ferhenga Hemîdî Kurdî-Kurdî*. Yusif Diyadîn Paşa. Amed: Weşanên Dara.
- Duranti, A. (1997). *Linguistics Anthropology*. Los Angeles: Cambridge University Press. Edited by: Mark Aronoff And Janie Rees-Miller
- Edmonds ,C. J. (1945). A bibliography of southern Kurdish, 1937–1944. *Journal of The Royal Central Asian Society* Vol. 32 , Iss. 2,1945.

Edmonds, C. J., (1937). A bibliography of Southern Kurdish 1920–36. *Journal of The Royal Central Asian Society* Vol. 24 , Iss. 3, 1937.

Ferho, S. (1998). Cebeltariq. *Hawar* 2 (Hejmar 43). Stockholm: Weşanên Nûdemê.

Gavish, D. (2005). *A Survey of Palestine under the British Mandate, 1920-1948*. London: RoutledgeCurzon Studies in Middle East History.

Geverî, A. (2017). Sê Tabloyên Ebdurrehîm Rehmî Hekarî yê Derheq Kêşana Lêkeran de. *Derwaze*, Jimare 1, rr. 148-155.

Hassanpour, A. (2005). *Kürdistan'da Milliyetçilik ve Dil -1918-1985*. İstanbul: Avesta.

İmer, K., Kocaman, A., Özsoy, S. (2011). İstanbul: Boğaziçi Üniversitesi Yayınevi.

Jardine, R. F. (1922). *Bahdinan Kurmanji*. Baghdad: Government Press.

Karaağaç N. (2009). İşlevsel Dilbilim. *Türk Dili ve Edebiyatı Dergisi*, ss.35-42

Kıran, Z., Kıran, A. (2000). *Dilbilime Giriş*. Seçkin Yayınları. İstanbul.

Korn, A. (2009). *The Ergative System in Balochi from a Typological Perspective*. Article 3, Volume 1, Issue 1, Summer 2009, Page 43-79.

Korn, A., Jahani, K. (2015). *Grammaticalisation in the verb system in Iranian*. [https://www.linguistik.fb05.uni-mainz.de/files/2015/01/Abstract\\_Korn\\_Jahani.pdf](https://www.linguistik.fb05.uni-mainz.de/files/2015/01/Abstract_Korn_Jahani.pdf) (tikandin: 27.01.2017)

Kurd, R. (1996). *Rêzimana Kurdî*. Paris: The first electronic edition published by the Kurdish Museum, Library and Archive, London 2011.

Kurdo, Q. (1990). *Gramera Zmanê Kurdi*. Stockholm: Weşanên Roja Nû.

Lescot, R., Bedir Han, C. (2001). *Kürtçe Grameri (Kurmanci Lehçesi)*. İstanbul: Avesta Yayınları.

Leezenbeng, M. (2015). Elîyê Teremaxî and the Vernacularization of Medrese Learning in Kurdistan. *Kurdish Studies; Empire, ethnicity and identity*. (Edit: Djene Rhys Bajalan and Sara Zandi Karimi). New York: Routledge.

Limbert, J. (1968). The Origins and Appearance of the Kurds in Pre-Islamic Iran, *Iranian Studies*. Vol. 1, No: 2, England.

Mackenzie, D. N. (1954). Gender in Kurdish. *Bulletin of the School of Oriental and African Studies*, University of London, Vol. 16, No. 3 pp.528-541



Mackenzie, D. N. (1957). A bibliography of Southern Kurdish. 1945–55”, *Journal of The Royal Central Asian Society* Vol. 44 , Iss. 1,1957

MacKenzie, D.N. (1959). The Language Of The Medians.*Bulletin of the School of Oriental and African Studies*. Volume 22, Issue 2 June 1959 , pp. 354-355.

MacKenzie, D.N. (1961). *Kurdish Dialect Studies I*. London: Oxford University Press.

MacKenzie, D.N. (1961). The Origin of Kurdish, *Transactions of the Philological Society*, pp. 68-86.

Mahamadi, Hamid. (1996). Çend Nîşe li ser Pêşveçûnên Fonolojîk ên di Kurdî de. *Kovara Zend*, hejmar 1, Stenbol: Weşanên Enstîtuya Kurdî.

Garzoni, M. (1787). *Grammatica e Vocabolario Della Lingua Kurda*. Hewlêr: Dezgay Çap û Bilawkirdinewey Bedirxan.

McCarus N. E. (1958). *A Kurdish Grammar- Descriptive Analysis of The Kurdish of Sulaimaniya, Iraq*, Spoken Language Services, Inc. New York: American Council of Learned Societies.

Minorksy, V. (1988). *Kürtler*. Köln: Weşanên Helebçe.

Nêrewan. (1998). Mesela Hindîçînyê. *Hawar 2* (Hejmar 31). Stockholm: Weşanên Nûdemê.

Omarkhali, Kh., Mossaki, N. (2014). Kurdish Studies in Western and Central Europe. *Weiner Jahrbuch für Kurdische Studien*, 2. Jahrgang 2014, pp. 140-177.

Özsoy, S. , Balçı, A. ,Turan, D. (2011). *Genel Dilbilim II*. Eskişehir: Anadolu Üniversitesi Yayınları.

Özsoy, S. , Balçı, A., Turan, D. (2012). *Genel Dilbilim I*. Eskişehir: Anadolu Üniversitesi Yayınları.

Öztürk, Mürsel. (1995), *Farsça Dilbilgisi*, Murat Kitapevi Yayınları, Ankara.

Qado, Ş. (1994). *Stranên Mihemed Şêxo*. Qamişlo

Qedî, M. (2011). Eliyê Teremaxî û Dîtinên wî yên li ser Rêçikên Rêzimana Kurdî, *Kovara Bîr*, hej-1, Stenbol.

Rhea, S. A. (1869). Brief Grammar and Vocabulary of the Kurdish Language of the Hakari District. *Journal of the American Oriental Society*, Vol. 10 (1872 - 1880), pp. 118-155

Rıfat, M. (1990). *Dilbilim ve Göstergibilimin Çağdaş Kuramları*. İstanbul: Düzlem Yayınları.

Sağnıç, F. H. (1991). *Hêmana Rêzımanê Kurdi*. İstanbul: Melsa Yayınları.

Saussure, F. (1959). *Course In General Linguistics*. Wade Baskin (wergera îngilîzî).New York: Philosophical Library.

Sheyholislam, J. (2015). The Kurds. *The Language Varieties of Kurdish*. (r. 30-51). Vienna: Austrian Federal Ministry of the Interior Herrengasse 7.

Tan, S. (2015). *Rêzımana Kurmancî*. (Çapa Sêyem).Stenbol:Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê.

Todd, L. T. (1985). *A Grammar of Dimili Also Known As Zaza*. Ann Arbor : Michican University.

Tuğrul, A. (2010). *Batı'da Kürdoloji Çalışmaları ve Kurumları*. Yayınlanmamış Yüksek Lisans Tezi. İstanbul: İÜ. Sosyal Bilimler Enstitüsü.

Üneşi, A. (2016). *Tesrîfa Teremaxî*. Teza Çapnekirî ya Lîsansa Bilind. Mêrdîn: Zanîngeha Mardîn Artukluyê Enstîtûya Zımanên Zındî yên li Tirkıyeyê Şaxa Makezanista Zıman û Çanda Kurdî.

Wahby, T. & Edmons, C. J. (1966). *A Kurdish-English Dictionary*, London: Oxford University Press.

Xanî, E. (2004). *Mem û Zîn*. Amed: Weşanên Lîs.

Xeberguhêz. (1985). Hindik Rindik. *Ronahî*, Hejmar: 13. Berhevok Ronahî. Şam: Çapxana Jîna Nû.

Yıldırım, K. (2013). *Baba Tahirê Uryan*. İstanbul: Avesta

Yule G. (2010). *The Study of Language* (fourth edition), Cambridge: Cambridge University Press.

Vefayî, A. (2012). *Destûrê Zebanê Farisî*. Sazmanê Mutal'e û Tedvîn Kitab 'Ulûmê 'Insanî Danişgeha Semt Merkezê Tehqîq û Tos'ieê 'Ulûm 'Insanî: Tehran.

## ÇAVKANÎYÊN ELEKTRONİK

Ahangar, A. A., Oostendorp, van M. , Soohani, B. (2013) Relationship between Phonological and Geographical Distance: Persian, Sarawani Balochi and Sistani Dialect, *GEMA Online® Journal of Language Studies* 117 Volume 13(2), <http://journalarticle.ukm.my/6328/1/3309-7244-1-SM.pdf> (tikandin: 22.05.2017)

Barbera, G. (2001). Exploring Gramamatical Gender in New Iranian Languages and Dialects: An Overview with Some Typological Considerations. *Proceeding of the First Seminar of Iranian Dialectology*. Hassan Baghbidi. (Ed.) Department of Dialectology; Iranian Academy of Persian Language and Literature. [https://www.academia.edu/3753267/Gender\\_in\\_New\\_Iranian](https://www.academia.edu/3753267/Gender_in_New_Iranian) (tikandin: 12.01.2018)

Bynon, T. (1979). The Ergative Construction In Kurdish. *Bulletin of the School of Oriental and African Studies*. Volume 42, Issue 2 June 1979, pp. 211-224. [http://www.kurdishacademy.org/sites/default/files/ergativity\\_construction\\_in\\_Kurdish\\_1979\\_bynon.pdf](http://www.kurdishacademy.org/sites/default/files/ergativity_construction_in_Kurdish_1979_bynon.pdf) (tikandin: 15.01.2018)

Cambrige Dictionary, <http://dictionary.cambridge.org/dictionary/english/language> (tikandin: 17.02.2017)

Edmonds, A. J. (2012), The Dialects of Kurdish. Gotara ku li Zanîngeha Koyê hatiye pêşkêşkirin. [https://www.academia.edu/3692325/The\\_Dialects\\_of\\_Kurdish](https://www.academia.edu/3692325/The_Dialects_of_Kurdish) (tikandin: 25.05.2017)

Haig, G. & Öpengin, E.(2014). Gender in Kurdish Structural an Socio-cultural Dimension. [https://www.academia.edu/6001901/Gender\\_in\\_Kurdish\\_Structural\\_and\\_socio-cultural\\_dimensions](https://www.academia.edu/6001901/Gender_in_Kurdish_Structural_and_socio-cultural_dimensions) (tikandin: 25.12.2017)

Hazim, R. (1994). Devok Hekarîyê. *Kovara Kurmancî, hejmar 14-15*. Parîs: Enstîya Kurdî ya Parîsê. <https://www.institutkurde.org/publications/kurmanci/telechargement/ku1415.pdf> (tikandin: 25.03.2018)

Hickey, R. Sytax. <https://www.uni-due.de/ELE/Syntax.pdf> (tikandin: 14.09.2017)

Korn, A. (2014). In search for a new model: Iranian Isoglosses revisited. <https://asiatica.wikispaces.com/file/view/Korn+abstract.pdf> (tikandin: 12.01.2018)

Kurdish Language ii. History Of Kurdish Studies. (dîroka tikandinê: 22.05.2015), <http://www.iranicaonline.org/articles/kurdish-language-ii-history-of-kurdish-studies> (tikandin: 15.05.2017).

Mêhrbexş, Îreç. *Kurdish Grammarian*. [https://tnpd12-1m.cloud-cdn.ir/dli/20180328-0133528-Kurdish\\_Grammarians.pdf](https://tnpd12-1m.cloud-cdn.ir/dli/20180328-0133528-Kurdish_Grammarians.pdf) (tikandin: 25.03.2018)

Pîrbal, F. (2007). The emergence of Kurdology. *Kurdish Globe* Silêmanî. <http://www.kurdishglobe.net/article/DDF08CE3A95370ABF3185484BDE66B38/Th e-emergence-of-Kurdology.html> (tikandin: 22.05.2015).

Thackston, W. M. (2006). *Kurmanji Kurdish: A Reference Grammar with Selected Readings*, Rênas Media,  
[https://www.fas.harvard.edu/~iranian/Kurmanji/kurmanji\\_1\\_grammar.pdf](https://www.fas.harvard.edu/~iranian/Kurmanji/kurmanji_1_grammar.pdf) (tikandin:  
18.11.2017)



## PÊVEK

### FERHENGOK

KURDÎ	TÏRKÎ	ÎNGİLÎZÎ
avanî	çatı	voice
bazinedaçek	---	curcimposition
bêjen	titreşimsiz, ötümsüz	voiceless
bêjer	konuşucu	speaker
beşên axaftinê	sözcük türü	words class
bihîzer	dinleyici	listener
bihîzyarî	işitsel	audial
bijen	titreşimli, ötümlü	voiced
biker	özne	subject
binsîwaneyî	alt sözcük, altanlamlık	hyponym
bireser	nesne	object
çawanînûma	niteleyici	qualifier
çendanînûma	niceleyici	quantifier
dahûrandina pêlawazî	bürünsel çözümlene	prosodic analysis
dawîker	takı	ending
dawîkerên kesîn	şahıs ekleri	personel endings
dema borî ya pêknehatî	----	Past Perfect Conditional
dema borîya berdest	sürekli geçmiş zaman	past continuous, imperfect
dema borîya dûdar	duyulan geçmiş	past perfect tense
dema borîya dûr	önceki geçmiş zaman	pluperfect
dema borîya têdeyî (sade)	görülen geçmiş zaman	preterit, simple past
dema fireh	geniş zaman	gnomic, simple present tense
dema niha ya pêşkerî	şimdiki zaman	continuous present
dema niha ya xwestekî	Present Subjunctive	Dilek kipi şimdi zaman
denganî, fonetîk	fonetîk	phonetics, phonemic
dengdêr	ünlü	vowel
dengzanîn	ses bilgisi	phonology
dijwate:	karşık anlamlı	antonym
diyarde	olgu	phenomenon, fact
dûvdemî, dîyakronîk	artzamanlı	diacronic
ergatîvîya parçeyî	yarı ergatif	splite ergative
giyanewer	yaşayan, canlı	animate
hêma	imge	image
hemdeng	sesteş	allophone, homonymic

hemreng	eşbiçimli	isomorphic
hemwate	anlamdaş	synonym
hevenav	cins isim	common name
hevok	cümle, tümce	sentence
hevoka têkel	karmaşık cümle	complex sentence
hevoknasî, sentaks	sentaks	syntax
heyber	varlık	entity
hilmî, hişk	soluk, sert	aspirated
hokarî, sedemkar	ettirgen	causative
karîger	etkin	effective
kirox	yapıcı	agent
komek	cümlecik, yantümce	clause
komekên nelihevîyê	ödünleyici yantümce	concessive clauses
komepeyv, fraz	söz öbeği	phrase
mêjer	sayı	plural/singular
navbergir, navbend	---	interfix
navgîn	araç	tool, mean
navgir	içek	infix
nedengdêr, dengdar	ünsüz	consonant
nehilmî	soluksuz	unaspirated
nîşane	gösterge	signs
nîşanek	işaret	marker, remark
parenga dema borî	geçmiş zaman ortacı	past participle
Parenga dema niha	şimdiki zaman ortacı	perfect participle
paşdaçek	sonedat	postposition
paşgir	sonek	suffix
pergal	dizge	system
pêşdaçek	önedat	preposition
pêşgir	önek	prefix
pevdeng	çift ünlü	diphthong
pêveber	yüklem	predicate
pevgîn	koşaç;	copula
pirtik	artical	tanımlık, artikel
qertaf	ek	affix
raveber	tamlanan	determined
ravek	tamlama	determinative group
raveker	tamlayan	determinative
raweya fermanî	emir kipi	imperative
raweya xwestekî	dilek kipi	subjunctive
rayek, reh	kök	root
reftar	davranış	behaviour
rewş	durum	case
rewşa amrazî	araç durumu	instrumental case
rewşa cihî	kalma durumu	locative case
rewşa datîv, rewşa berpêbûnê	yönelme durumu	dative case

rewşa derketinê	çıkma durumu	ablative case
rewşa navkî	yalın durum	nominal case
rewşa xwedantîyê	iyelik durumu	possessive case
rêzik	kural	rule
rêzîle	dizi	chain
rêzîleyî	zincirleme	chaining
rêzimana erkî	işlevsel dilbilgisi	functional grammar
rêzimana hilberînî	üretimsel dilbilgisi	generative grammar
rêzimana rêzikparêz	kuralcı dilbilgisi	prescriptive grammar
rêzimana şayesî	betimsel dilbilgisi	descriptive grammar
serdar	major	binbaşı
serenav	özel isim	proper name
sernimûne	prototip	prototype
têrker	tümleç	complement
watenaşî	anlambilim	semantics
xuyang	görünüş;	aspect
yeke	birim	unit
yekedeng	sesbirim	phoneme
yekereng	biçimbirim	morpheme
yekewate	anlambirim	moneme, morpheme
zayend	cinsiyet	gender



T.C.

Mardin Artuklu Üniversitesi  
Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü  
Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı

Yüksek Lisans Tezi

**KÜRTÇE (KURMANCİ) GRAMERİ’NİN  
İNGİLİZCE YAZILMIŞ İKİ BAŞLANGIÇ ESERİ:  
DİLBİLİMSEL VE DİLBİLGİSEL BİR ANALİZ**

Sami TAN  
14711024

Danışman  
Dr. Öğr. Üyesi Mustafa ASLAN

Mardin 2018